Îro 01/09-2010 a ye



Esker ji bo ku gerîla bikşînin nava şer gelek qompoloya li herêma parastina medya pêk tînin. Carna cilên cardavana û carna cilên gerîla li xwe dike digerê li çiya û baniya. Carna cardavana dide dûv xwe derdikeve nêçira Kurda.

Belê rojekê Îran û rojekê Tirkiyê operesyona li herêma medya pêk tîne. Tîmên taybet xwe di qunter/kendalên çiya da veşerdikine û gerîla nêçir dikine. Bi vê şiklê 6 gerîla şehîd bibûn. Esker ji bo ku ji vê bêçalekiyê suid wer bigirê herêmê dişewtînê herêmê maîna rêdixîne. Îro jî li herêma Dersim, Mêrdîn û Colemêrgê operesyon hebûn.



Belê hevalên hêja; provakatorên/nijadperestên Înegolê li dijî Kurda serîrakirî, malê û karxanê Kurda şewitandî hemû serbest hatin berdan. Pekî eger ku ew Kurd bibûyana çiye bihata serê wan?

Bi salan zindan û îşkencê giranê bi para wan bibûyana. 1700 şaredar û nunerê BDP/DTP e bêsual û bêpirs di girtingehê dane. Hê nizanin ji bo çi tên darizandin.

Îro yekê îlanê roja Aşitiya cîhan e.



Li medya Tirk nuçeya ewil ne aşitiyê. Nûçeya ewil Danîmarka niha hişyar bû ku Roj tv e probaganda terorîsta dike. Ser dozgerê Danîmarî li dijî Roj tv doz vekir. Roj tv e di demeka kin da bê girtin.

Nûçeya duemîn jî hêzên Amerîka ji Îraqê xwe kişandin. De ka niha Kurdê Îraqê çi bikine.! Hetanî niha di bin sîwana wan da bûn. Niha ew jî ji dest wan çû.

Belê Kerwana BDP îro li **Dersimê** bû. Ji aliyê deh hezaran ve hatin pêşwazî kirin. Hevserokê BDP Selhattin Demîrtaş li ber peykerê **Seîd Riza** yî li Dersimê.



Gava ku min ew nûça ji we re dinvsand polîsê Danîmark jî xwe avête ser buroya Roj tv e dest da ser komputurê Roj tv. Almanya jî amedekariya wê dikine.

Belê hevalên delal; Îro hêzên Amerîkî muharîb ji Îraqê vekşiyan. Cigirê serokdewlet Amerîka Josef Biden li Bexdayê bû. Ew êvarî derbasî Hewlerê bû.

**Îro 02/09-2010 a ye.**




Va kerwana êdî ranewestê û ti hêz jî nikarin wê lêhiyê bidin sekinandin. Îro du rojin li Tirkiyeyê şabûnek heye. Dewelta Danîmarka li dijî **Roj tv** doz vekiriye û polîsa dest dayê ser buroya Roj tv li Danîmarka. Wezerata dervaya Tirkiyeyê spasiya xwe ji dewleta Danîmark re şand. Dereng bû lê bi ya me bû. Belê hevalên hêja; Ji sala 2004 an pêva ketine dûv Roj tv e ku bigirin. Lê bi şunekirin. Niha Amerîka hêzên xwe ji Îraqê dikşîne. Ji wan re Tirkiyê gereg e û îhtiyaciya wan a bi Tirkiyeyê heye.

Lê em ê çawa dilê Tirka bikin.

“Em ê Roj tv e bidin girtine.”

Îro ew dibe. Sibê serokfermandarê Amerîka Michael Mullen tê Tirkiye yê. Li gor medya ji bo esker kişandine rîya Tirkiyê ye bi kar bîne û tengasiya xwe ya li Afganî bîne ziman. Lê Tirkiyê jî daxwazên xwe jî wî hene. Îstîxbarata PKK e.

Lê ez vê bêjim ma qet Tirk şa nebin ku Kurdê bêtelevizyon bimînin. Îro STÊRK tv dest bi weşanên xwe test kir. Kurd ne bêalternatîf in. Newroz Tv e heye, Komala tv e heye.

“Ji bo aştiyê tu neçare ku bi Birêz Ocalan re hevdîtinê bike.”



Belê va Kerwana nayê rawestandin. Îro serokê KCD birêz Ahmet Tûrk û hevserokê BDP Selhattin Demîrtaş û Gultên Kişanak li Batman/Elîhê bûn. Ji aliya 60 hezarî ve bi sloganên “*Bijî Ocalan û mixatab Ocalan e*” hat pêşwazî kirin. “*Em ê sandoqa vala bişînin Ankarê û li 13 îlona em bibin xwedî gotin* ” Birêz Tûrk jî dest nîşan kir. “*Ji bo aştiyê tu neçare ku bi Birêz Ocalan re hevdîtinê bike*.”

Belê îro heftekê rayagiştiya Tirkiyeyê bi hatina serokwezîra Amedê kilît bûye. Eceba Erdogan kîjan mesajê bide Amediya. Di sala 2005 an da hatibû Amedê û li xwe mikur hatibû ku “*Li vî welatî pirsa Kurda heye û ew pirsa ne pirsa min tenê, pirsa me hemûya yê. Em ê digel hev vê şaşitiyê çareser bikin*” Piştî wê axavtinê xwe ya dîrokî deng jê derneket. Lê hê jî li dijî Kurda har bû.

Lê vê carê ji li xwe mikur hat ku dewletê li Dersimê qetliyameka giran kiriye. 70 hezar Kurd di kêre re derbas kirine û çemê Munzur bi xwîna ciwanan sor bûye û bi sed hezaran


enfal kiriye. Gotinên xwe dibêje û pişt re jî dibêje; "*Zarok dibin jin dibin hemê hedef in. Yek al yek dewlet û yek ziman tu vê qabul nake. Bila ji vir herin*".

Serokwezîr sîbê bê Amedê dîsa wan derewan bike here.



Di berî ku serokwezîr bê bi hezaran polîsên bi unîform û ewqas jî yên sivîl li kolanan terorê dimeşînin. Polîs li sukê kî tê ber wî/wê jê nasnama wî/wê dipirsê. Mirovên ku jê şik/şupê dike dibê qereqol. Emniyetê destûra 11 roja sehî/pirsin wergirtiye.

Ji KCK e Bozan Tekin daxuyanî da rayegiştî gotin serokwezîr protosto bikin. Ji malê xwe dernekevin nen wî guhdar nekin. Mirovê ku her tim dubare dike dibêje; yek dewlet, yek al, yek ziman û mafê nasnake wî prostosto bikin. Serokwezîr suçdarê şerê. Qetîlê zaroka ye. Qetîlê gelê Kurd e.



**Belê hevalên hêja**; îro cîgirê serok dewletê Amerîka Josef Biden mêvanê Kurd bû. Sibê serokfermandarê Amerîka Michael Mullen bê Tirkiyeyê bi serokfermandarê nuh Îşik Koşaner re hevdîtinan pêk bîne. Belkî ew jî piştî hevdîtina bi Koşaner re derbasa Başûr bibe.

**Belê hevalên delal**; ez ji we re behsa komkujiyeka din a me bikim. Ewqas kom kujiyê me pir in ku em êdî hesabê wan nizanin. Kîjan axa Kurdîstanî dikolî li wir kom kujî derdikeve.



**27ê Tebaxa 1979** an di saet 17;00an de li Balafirgeha Sînê 11 kurd di heman demê de bi gulebaranê hatin înfazkirin. Înfaz kirina wan ne dinyayê bîhst û ne jî dinyayê xwast ku bibhîze.

Piştî komkujiyên li Merîwan, Sine û Seqiz, îro jî 31.salvegera komkujiya li gundên Qarnê û Qelata li Rojhilatê Kurdistanê ye. Xumeynî 19'ê Tebaxa 1979'ê li dijî kurdan Cîhad îlan kiribû û piştî vê li gelek deverên Rojhilatê Kurdistanê, ji aliyê hêzên rejîmê ve li hember gelê kurd komkujî pêk hatibûn.

Îro 03/09-2010 a ye.

Belê îro çend rojin rojeva medya Tirkiyeyê gera serokwezîra Amedê bû. Îro ew gera wî pêk hat. Lş berî ku serokwezîr bê balafirên şerê li ezmana ezman didirandin bi dengê xwe. Bi 75 mîlletvekîlê xwe û bi qurmayê xwe ve hatin Amedê. Abdulkadir Aksu û Mehdî Eker Îsmaîl Aslan xwe wek peya dabûn kêlekê.




Hinek gotin serokwezîr li Amedê gavên nuh bavêje, hineka gotin serokwezîr wek sala 2005 an bi axive. Lê hat mizgina girtingeheka dina mezin da Kurda. *"Em ê girtingeha Amedê bikin mûzê, lê em ê di demeka kin da girtingeheka dina pir mezin li Amedê çêbikin"*

*Me zimanê Kurdî serbest kir, Trt 6 24 seata weşanan dike.*"

Lê nabêje me heftekî di ber vê rojnama Azadiya welat û Rojev ceza kir û ew bi mehekê girtin.

-Pekî kîngê girtingeha Amedê bigire û bike mûzê?



-Ne diyar e. Kîngê dest bi girtingeha nuh kir. Pîrê nemre biharê tê.

Lê kî hat mitînga wî. Nêzika deh hezara cardavan di jorî pênç hezaran polîs û nunerên îstîxbaratê. Ji Xarpit û Riha, Sêrtê û ji Batmanê heval û dostê xwe hatibûn. Deh hezar jî Amedî hatibûn. Serokwezîr girseya ku dipayî nehat. Sîwar hat peya û dilêikestî çû.

Li Amede ew bilbao yê ku afîşê BDP li lê hamû bo paça hatin girtin. Fermo li bilbaoyê kêlekê binêr e. Analîza Medya Erdogan li Amedê ti tişt bi dest xwe nexist, dest vala vegerî Ankarê.

Belê gava ku serokwezîr li Amedê bû, li Wanê BDP li ya bi 30 hezarî mitînga xwe bi darxistibû.





Hevseroka BDP Gulten

Kişanak *“Em ji derewê Erdogan têr in. Zîhniyeta Erdogan bi ya qatîlê Kurda Esat Oktay ve wek hev e”.*

*"Tu jîyana 12'ê Îlonê dirêj dikî. Ji ber wê em dibêjin boykot. Em zîndana Amedê, Mazlum Dogan, Kemal Pîr û çaran ji bîr nakin. Serokwezîr dibêje em wê zîndana Amedê bikin dibistan. Esat Oktay Yildiran jî digot 'Ev der dibistane. Em wê hemû kesî bikin tirk' Zîhniyeta Tayyîp Erdogan û ya Esat Oktay heman zîhniyet e"*



PKK e bêçaleî îlan kiriye. Lê operesyonên him eskerî û him jî siyasî didomin. Di nava vî hefteyî da bi dehan hevalên me hatin girtin. Li yekê îlona roja aşitiya cîhanê gelê Kurd du ewledên xwe dinê hêja li Araratê şehîd dan. Fesît Bozkurt û Ahmet Salih Yildirim.

Mesaj Ocalana hefteyî: Ger hevdîtin bidomin ez ê rolê xwe bilîzim

KESÊN SIVÎL BI MIN RE HEVDÎTIN PÊK TÎNIN

Ocalan ragihand ku li Îmraliyê bi wî re hevdîtinan pêk tînin û got; "Heyeta bi min re hevdîtin pêk tîne, ji kesên sivîl pêk tê. Carên destpêkê heyetên leşkerî bi min re hevdîtin pêk dianîn. Lê heyeta niha ji kesên sivîl pêk tê. Nizanim, ger em li daxuyaniyên hikûmetê yên vê dawiyê binêrin, dibe ku bi carekê qut bikin jî".










Her du alî, PKK jî û dewlet jî her tiştê diavêjin ser milên min. Ez dikarim du hefteyên din vê berpirsiyariyê hilbigirim, lê dîsa girêdayî pêşketina ye. Lê ger pêşketin hebin ez ê rolê xwe bilîzim, lê dema li daxuyaniyên Serokwezîr Erdogan dinêrim, şaş dimînim, ji Kiliçdaroglu jî wêdetir dipeyve. Li aliyekê hevdîtin pêk tînin, li aliyê din çima wisa dikin, galgalên nijdaperestiyê pêş dixin, ma nijadperestiyê gur dikin? Divê wiha nekin, wê ev nêzîkatî bi her kesî bide windakirin. Gelo wê çawa bi van hesabên biçûk pirsgirêkê çareser bikin! Dema ez li daxuyaniyên di derbarê pirsgirêkê de dinêrim, pir şaş dimînim. Bi nêzîkatiyên ewqas erzan, pirsgirêk çareser nabe, bi galegalên nijadperestî nabe". Ev herdu hefteyên Ii pêşya me pir girîngin. Wê di 15-20'ê îlonê de gelek tiştên din zelal bibin'

DIVÊ BOYKOT BOYKOT BÊ BERFIREHTIRKIRIN

EZ Ê DU HEFTEYAN LI BENDÊ BIM.

Îro 05/09-2010 a ye.

Şelmaqa ku li Amedê ku li binê guhê serokwezîr, wezîr Mehdî Eker, Abdulrahman Kurt û Îsmaîl Aslan, Abdukadir Aksu qetîlê Kurda ketî ew şaş û mat kirin. Serokwezir ew çar roja di ber wê ew şandibûn Amedê û lê wan li Amedê gelek hewldan ku gel bê mîtînga serokwezîra Amedê û ku serokwezîr jî destê xwe li pişta wan bide bi wan re bêje"Eferim" we gelek kes berhevkirine.

Lê ji xeynî Cardavan û nunerên AKP kes nehat mitîngê. Erdogan şaş û maş çû Ankarê. Gava ku gehşt Ankarê devê xwe avitê mepûsên BDP bi eslê xwe Tirk Ufuk Uras û Akin Birdal û serokê BDP Selhattîn Demîrtaş Amedê temsîl nakin û ew ne Kurd in. Selhattin ji Xarpitê û Akin Birdal ji Nigdê ufuk Uras ji Stanbolê bûye. Lê Mehdî Eker, Îsmaîl Aslan û Abdulrahman Kurt, Abdulkadir Aksu temsîl dike.



Haydî siktir/kêm bibe ji vê dere here! Heft bavê Selhattin Demîrtaş Kurd in.

Belê hevalên hêja; Kerwana BDP duh li **Îzmîrê** bû û ji aliya deh hezaran ve bi sloganên bijî Apo hatin pêşwazîkrin.

Îro Kerwana BDP li Amedê û li Stanbol **ê** . Polîs çiqas li ber xwe da ku li hember Amediya astengiya bi derxînin jî lê hewldanên wan pere nekirin. Nikarin wê lêhîyê ku diheriqê bidin sekinandin.

Li jor meşvanan balafirên şer nizm difirin. Helîkopterên polîsa li ezmanan bi dengê xwe guhên meriva kerr dikirin. Polîsa eskera meydana Îstasyonê dorpêç kiribûn.

Dengê Amedê bi dengê Stanbolê ve bûn yek. Di jorî sed hezarî re li parka Koşuyoliyê bi siloganê bijî **“Xweseriya Demokratî”, “bijî Ocalan”** bi rengên kesk, sor, zer hatin pêşwazî kirin. Li Stanbolê jî di jorî 40 hezarî re tevlî mîtîngê bûn. Baraneka giran di barî bi rojî bûn dîsa jî gelê Kurd partiya xwe hevalên xwe bi tenê cîhnehîştin hatin mîtînga BDP. Ev dîmên jêr ji mîtînga Amedê ne.






Şaredarê Amedê birêz Baydemîr bersiv da serokwezîr: “Ti kar û barê te li wan derna tunen.”

AMED LI BER XWE BIDE !

Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr bi kurdî dest bi axaftinê kir. Baydemîr, bi gotina "Amed li ber xwe bide, a ruh dide te berxwedan e, ji bo evîna gurzek azadî



mistek adalet û demokrasî di ber xwe bide" Baydemîr, Serokwezîr Erdogan bi zimaneki tund rexne kir û wiha got: "Kujerên Ceylan Onkol, Enes Ata, Musa Anter, Hrant Dînk ji Serokwezîr Erdogan ka li kune? Brêz Erdogan ka te çi kir, te faîlên van kesan dît? te hesap ji wan pirsî?" Te çima hesap ji wan ne pirsî? Niha jî tu dixwaze bi girtina Girtîgeha Amedê ser bûyeran bincil bike? Birêz Serokwezîr an muzakere, an jî partiya tabelayan, tercîh ya te ye." Başdemîr, anî ziman ku neviyên kesên ku di Girtîgeha Amedê de rastî îşkenceya giran hatine, niha li şûna bav û kalên xwe di girtîgehê de rastî binpêkirina mafan tên û wiha axivî: "Brêz Erdogan ka te çi kir? Divê girtîgeh ne xera bibe,



ne jî bibe dibistan. Dema bibe dibistan dê dîsa li vê dibistanê bi 'Sonda me' soda înkarkirinê bi zarokan bidin xwarin. Brêz Erdogan te hêj faîlê Enes nedîtiye ma ev e edaleta te. Tu dê bi girtin û veşartina van sûcan edaletê û demokrasiyê bîne Serokwezîr? Ger ku tu bixwaze kujerê Apê Mûsa û Hrant Dîng bibîne."

Belê hevalên hêja; hevserokên KCD e birêz Ahmet Tûrk û Aysel Tugluk bi heyeteka girana ji mepûs û nivîskara pêk tê Siri Sakik, Bengî Yildiz, temsîlvanê Hewlerê Ruşen Mahmutoglu û nivîskar Altan Tan îro li bajarê Silemanyê bi serok komarê Îraqê Mam Celal hevdîtin pêk anî. Mijara vê hevdîtine Konferansa Kurd bû. Di vê civînê de, ji YNK'ê Omer Fetah, Îmad Ehmed, Necmedîn Kerîm, Qadir Hemecan, Behroz Gelalî û Mehmûd Hacî Salih jî amade bûn. Ew dê Sibê derbasî Helwerê bibine bi Neçîrvan Berzanî û serokwezîr Berhem Salih re hevdîtinanpêk bînine.

Îro 06/09-2010 a ye.

Min duh ji we re nivisandibû esker bi top û tanqê xwe ketine rê berve sînorê Kurdistanê



diçên. Çûn li kêleka çemê Dîclê ewir in. Ji berbanga sibê de herêma Diclê û çiyayê Çiravê bombe baran kirin. Grubek esker xwastin ku derbasî aliyê dinî Kurdîstanê bibin. Lê gerîla destûr neda wan. Dîsa wek berê xwe di kendalê çiyada veşartibûn. Gerîlayek şehîd kirin. KCK daxuyanî da rayagiştî got; "*Em li ser soza xwe ne. Em çalekiya pêk ninin. Lê dewlet me provakê dike ji bo ku me bikşîne nav şer*"

Belê hevalên hêja dîsa wek berê mîtînga Amedê hezm nekirin. Lig elek nunerê BDP doz vekirin. Hûn qîrîyana we slogana "*Em xweseriya Demokratîk dixwazin*"

Belê hevalên hêja gava ku dozger li ser meşvanên Amedê doz vedikir, dozgerê Amedê jî li Kurda ceza dibirî. Di sala 2008 an da gava ku Rojnama Azadiya welêt hat girtine, şaredarê **Kurtalanê Necat Yilmaz** bi hevalên xwe ve rojnama Azadiya welêt belav kirine. Ji bo wê bi ser 13 hevalan da 13 meh ceza birin.

Belê hevalên hêja; Heyeta KCD/BDP di bin serokatiya hevserokên me de li Silemanyê



hevditinên germ pêk anin. Mam Celal li ber deriyê qerargaha xwe ew bi kêfxweşî pêşwazî kirin. "**Hûn bi xêr hatin**" Heyetê bi Mam Celal re bi dostanî û birtî hevdîtina xwe bi dawî kirin û kêfxweş ji hev veqetîn. Îro derbasî Hewlerê bûn. Wê hevdîtine bi dosatnî û biratî derbas bûyî tirk hesûd kirin. Kurd li hev tên!

İro 07/09-2010 a ye.

Ji cejna Remazanê re du roj ma ne û di ser agirbest û çalekiya PKK e îlan kirî re sê heftê



derbas bûn. Lê operesyonên eskeriyê li dijî PKK e qet ti roja kêm nebûn. Îranê bombe kir, tirka keşif kir, Îranê bombe kir Tirka keşif kir. Amerîka îstîxbarata xwe qet kêm nekir. Piştî serokfermandarê Amerîka Mullet hat Tirkiyêye piştgiriya îsîxbarat hê jî zêde bû. 6 gerîla jîyana xwe ji dest dan. Lê dîsa jî gerîla bersiv neda wan.

Belê hevalên hêja, di stranên me şer de gelek cara dayik gazî hev dikin distirên. "*Por kurr e, rebene, rabe xeberek ji min re hatiye dibêjin li çiyayê Bagokê şer heye. Şehîd û şuhudê me hene*" Belê şehîdê me hene li gor medya Tirkiyeyê 9 gerîla hatine kuştin. Ew dilê min diêşîne. Tirk ji aşitî û bêçalekiyê fêm nakin.

Îro dîsa qasetek ketiyê înterneta bûyara Dortyolê tê da diaxivine. *“Lêxin va firsenda careka din nakeve destê me, Kurda bikujin karxanê û avahiyên wan bişewtînin. Ma ji vê derê Dortyolê kêm bibin herin”* Ew dengana dengê partiya nijadperest **MHP** bûne.



Belê ji KCK birêz Murda Karayılan nunerê dewletê eskerî hîşyar kirin. *“Eger rewş wiha bidome li dijî me her roj operesyon pêk bên em ê bêçalekiyê di ber çavan re derbas bikin. Ji roja ku me çalekî îlan kiriye pêva esker û tîmên taybetî ji bo ku me bikşînin nava şer li hember me bi her cureyî operesyon û şer dikine. 6 hevalên me şehîd ketin. Her roj herêm tê bombe kirin û dar û daristan tên şewitandin. Pevajoya di navbera 12 tebax û 20 îlonê de pir girîng e. Em ji bo dîyalogê amedene”*

Belê şandaya KCD di bin sîwana hevserokên me ji Başûr îro vegerîn. Birêz Tûrk daxuyanî



da raya giştî got; *“Em ji bo aşitiya mainde dixebitin û hewldidin. Divê herkes vê bike. Em li ser mijara konferansa netewî jî bi hevaln ve hemfikirin.”*

Kerwana BDP îro li Çewlîkê/Bîngolê bû. Ji aliyê hezaran ve bi sloganên

Ji beriya mitîngê, sîrodên “Ey şoreşger”, “Kizil guller açinca”, “Herne Pêş”, “Lêxin Gêrîlla Lêxin û “Dîren ha Diyarbekir” gelê Çewlîkê coşand û bênavber diruşmên “Bijî Serok Apo”, “Şehîd Namirin” û “Qatîl Erdogan” qêriyan.

Îro 08/09-2010 a ye.

Ji zikê gelê Kurd xwîn û êş diheriqê. Li van rojên ezîzû mubarek dîsa bi qeleşî ketin xwîna 9 gerîla. KCK daxuyanî da bû. Li dijî me şerekî giran heye. Lê em li ser soza xwe ya bêçalekiyê ne.

Elbet ewledên Kurd li riyeka pîroz şehîd dikevine ji bo azadiya welatê xwe şehîd dikevine. Li ser rûyî dinyayê hemû şerên azadiyê bi bedel tên bi destxistin. Lê şerê me bi Îran, Îraq û Tirkiyeyê re 60 salê didome. Hê jî em şehîdan didin. Şehîdên me rûmeta me ne.

Gelê Wanê ji bo şehîdên xwe rabûye ser piya û polîsê Tirk li dijî wan terorê dimeşîne. Bi qazê û bi tundiyê êrîşê dibe ser çalekvana. Gelek kes hat binçav kirin û mepûsên Kurd rakirin nexweşxanê. Polîs dîrek ew kirin hedef.




...pûsa Kurd Sevahir Bayindir/(wênê ewil) bi tundiya ...sa Kurd Fatma Kurtulan ji ber tundiya polîsa rakirin

Belê Kurdîstanê şîn heye. Li her cejnê û li her îdê wiha bûye. Gelê Kurd qet ticara cejnê xe bi dilrehetî pîroz nekirine. Lê kêleka wan hertim şîn, tundî û girtîbûn hebûye. **BDP** hemû pîrozbahiyên xwe îptal/betal kirin. Ji bo me ne cejnê şîne, êş e.

Îro 09-10/09-2010 a ye.



Îro 26 emîn salvegera şahdeta rejîsorê mezin Yilmaz Gûney e. Ez li ber şahdeta wî sere xwe xar dikim. Ew jî wek Ehmet Kaya û weki serokê KDP a İranê Qasim Milo li Fransa jîyana xwe ji dest da û gora xwe li Fransayê. Em ê rojekê wan bi merasîmên mezin hemûya bînin ser axa wan û li ser axa wan wan veşerin. Ew rojan jî ne dur in.

Belê îro roja **Remezanê** Gelê Kurd bi êş û girî reş girêdane kete cejna Remaza ne. Lê em çi bikin ji me re wek qeder bûye, ji Kurda re hertim cejn bûne dojeh. Newroz dibe stirî di çave dijim re dice xar e. 15/tebaxê tirs û xofê digirê ser wan.

Îro jî gelê Kurd neh ewledên bedena xwe wenda kirin. Termê wan şandin Meletyê.

Duh Kurd dikuştin jî kesi deng dernediket weki bêxwedî bûn. Lê îro bi xwedî ne. Li 6 bajarê Kurdîstan û sê bajarên Tirkiye yê Edenê, Mersîn û Stanbolê bi deh hezaran dewleta Tirk rûreşiyên wan şermezar kirin. "*Em bi can û dil li cem we ne ey şehîd" Hûn em in, em jî hûnin. Rîya me riya we ye. Bi jî Apo. PKK e gel e gel li vir e*" Xortên Kurd jîyan li niştecihê Stanbolê kirin kirin dojeh.

Amedê bi deh hezaran bersiv da.

Hevseroka BDP Gulten Kişanak; "Li çiya baniya li me megerin em li vê derê ne. Em bi hesanî nehatin van merhelana. Me bedelên giran dan"

Ez gazî Serokwezir dikim, bila des tji kuştina me berdin.

*"BILA DAWIYA TE NE WEK YA SADAM BE"*





Serokê şaredariya Amedê Osman Baydemîr: "Ew ên ku 9 gerîla di vê cejnê pîroz da kuştî ji mirovatiyê nesîb negirtine" Heremzedê ne. Rûreş û bextreş in".

Belê hevalên delal; Gelê Wanê, Gewerê û Colemêrgê li ser pîyanê di navbera wan û polîsan de şerekî pir giran heye. Çek bi kar tên. Xortê 15 salî Enver Turan bi guleya esker birîndar bû û di qomê dayê. Ji ber kevirên welatparêza li Gewerê tanqa eskerî reviya û qulîpî sê esker giran birîndar bibûn.



Bi hezaran dayik li gorîstanan bûn gore şehîdên xwe bi kulîlkên kesk, sor û zer dixemilandin. Ew çiqas bi êş bin jî lê serbilind bûn. Li goristên bi dayikên din re hevdû hemzbez dikirin. Ji hev re dibûn destek û piştgir.

Nunerê HPG dibêje; "*Bi çar helîkoptera û bi balafireka F-16 bi seatan bi ser gerîla da bombe barandin. Lê em dê tola hevalên xwe ji wan werbigirin*".




**HPG** nasnama deh gerîlayên jîyana xwe ji dest dayî eşkerê kirin.

*Mahmut Kadri * Beytullah Özkan * Ferman Özlü *Nuri Kahraman * Uğur Kar * Ulaş Bozan, * Recep Kutlar * Musab Döman, * Yusuf Şah * Hasan Doru*

**10/09 Belê hevalên hêja**; Kerwana BDP îro li Bursayê bû. Ji Înegolê de bi sedan




welatparêz hatin tevlî meşa BDP ya ji bo boykota guhertina qanuna bingehî bûn. Axavtvan mepûsê **BDP Akin Bîrdal** bû.


Lê gava ku Akin diaxivî faşîstekî êrîşa ser wê mêrxwazî kir. Kulmek li wî da. Lê Kurda ew girt bi lêdanê ew kirin pincar. Ew êrîşa jî bi plan bûye. Êrîşvan Bîlgehhan Şîmşek du sê roja di vê li Batmanê jî bûye.. Waliyê Bursayê dibêje; bi qasî **500-600 BDP** yî hebûn, 660 polîsên fermî û sivîl hebûn.

Birêz **Akin Bîrdal** gava ku serokê KMM/ÎHD bû di sala 1998 12 gulan da jî rastî êrîşeka çekdarî hat û hê 8 gulê di bedena wî da ne

Belê ew li me didin me dikujin, mal û karxanê me dişewtînin û me deh sala ceza dikin. Êrîşvanê ku li 12/04-2010 Samsunê êrîş serokê DTP birêz Ahmet Tûrk kirî piştî du meha bi merasîmeka giran hat serbestberdan.

Polîsa li Sîlopiyê li 03/06-2010 da mepusa Kurd Sevahir Bayindir da û hefer/kalça wê şikenendin.

Li 08/09 li mepûsa Kurd Fatma Kurtulan dan, ew rakirin nexweşxane.




Mesaja Ocalan: Mirina ziman mirina mêjî ye.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan biryara boykotkirina referandûmê wekî daxwaza çareseriya demokratîk û destûreke bingehîn a demokratîk bi nav kir

Eger hikûmet, ji destûreke bingehîn a demokratîk a dikare hemû kesan hembêz dike, biavêje, kurdan dikaribû bibêje 'erê'

'Heta 20'ê Îlonê her tişt zelal dibe'

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêvajoya bêçalakîtiyê ya wê di 20'ê îlonê de bi dawî bibe jî nirxand, hefteya piştî refandûmê wekî hefteyeke diyarker bi nav kir û wiha got:



" Min bi hin rayedarên dewletê re hevdîtinên pêk anîn. Rojên di navbera 13-20'ê îlonê gelek girîng in. Divê mirov li pêşketinên li vê demê binêre. Wê demê dê her tişt diyar bibe. Vê gavê ne mumkûn e, mirov tiştekî zelal bibêje. Di sala 2001'an de jî, tiştên heman rengî qewimî bûn. Wê demê rayedarên leşkerî hevdîtin pêk dianîn. Lê belê di sala 2001'î de, ji nişkê ve dawî li hevdîtinan anîn. Tê zanîn, wê demê mudaxeleyê Ecevît hatibû kirin. Niha jî, rayedarên tên, girîngiya pêvajoyê ferq kirine û di nava van de yên ku dibêjin wiha naçe jî hene."

Li gorî min, serokê fermandariya giştî yê niha Işik Koşaner, ji peymanên dema Buyukanit û Başbûg kûrtir çêkirine. Di dema Başbûg û Buyukanit de hin nakokiyên bi hikûmetê re hebûn. Lê belê niha wisa xuya ye ev nakokî kêmtir kirine. Jixwe serokê nû daxwaza operasyoneke li derveyê sînor aniye ziman! AKP jî wê di vê pêvajoyê de hewl bide bi rêbazên xwe kurdan bixapîne. Wekî mînakên dawî, dê meleyên nêzî xwe bixe dewrê."

"Şehadetên gerîlayan ên rojên dawî mirov gelek xemgîn dikin. Ev şehadetên di pêvajoya bêçalakîtiyê de hêrsa mirov zêde dikin. Divê pêvajoya bêçalakîtiya leşkerî şaş neyê fêmkirin. Mafê parastina rewa û bersivdayînê her tim heye.

**Talûkeya qirkirinê**

Îro 11/09-2010 a ye

Belê li 48 seata 148 kes hatin girtin. Bi tenê li Stanbolê 49 kes hatin binçav kirin. Êrîşvanê



ku êrîşa ser parlamenterê BDP birêz Akin Bîrdal kirî li 2 îlonê li Amed û Batmanê jî bûye. Wî xwastiyê li wir jî êrîşa ser hevserokê KCD Ahmet

Tûrk û serokê şaredariya Amedê Osman Baydemîr jî bike. Lê firsend nediye.

Belê hevalên hêja; îro 11 îlon ê. Di ser êrîşa li Amerîka li 11 îlonê bûyî 11 salsderbas bûn. Li 11emîn salvegera êrîşa li Amerîka pêk hatî Rahipê Amerîka xwe amededikine ku Qurana pîroz bişewtînin ji bo ku va êrîşa Mislimana pêk aniye. Seroka Almanya Melker rojnamevanê Danmarî ku li peximberê Mislimana Hz Mihemed heqeretkirî bi xelateka mezin xelat kir.

Lê li deqîqa dawîyê rahîba ji çalekiya xwe paşve gav avêtin.

Îro jî bi deh hezaran Kurd li ser pîya bûn. Hetanî ku azadîya xwe bi destnexînin jî ji vê meydanê narin. Li Gewerê şer hebû. Li Colemerg û Amedê xwepêşandinên mezin hebûn.

Belê sibê li Tirkyeyê hilbijartinê Referandumê hene.

Îro 12/09-2010 a ye.

Spas Amed, spas Colemêrg, Muş, Batman, Wan, Şirnax, Dersîm, Agirî, Mêrdîn Cizîrê, Gewer, Beyşebab, Şemzînan. Spas ji gelê Kurd re. Di dûv pariya nebezin, xwe li sîyên tarî negirtin neçûn, guhê xwe nedan firîskiya di dûv neyara neçûn.



Îro dîsa li kêleka partiya xwe û li kêleka serokê xwe û ala "**Xweseriya Demokratîk**" bilind kirin.

Di vê referendumê da polîs ji ber deriyê mal û karxanê welatparêza kêm nebûn, li sukê girtin, li kar girtin, birçî cîhştin, tazî cîhştin, bi zindanan dan tirsandin, sermayedar kirin ser, ronekbir kirin ser, ji Ewrûpa mirov anîn, gazî **Şivên Perwer** kirin, gazî ne yarên PKK e wek **Kemal Burkay** kirin ji bo ku tesîrê li ser gel bikin, wan bikşînin cem AKP li referandumê dengê "**ere**" bidin. Gelek hewldan dan lê dîsa jî ji vî gelî û Kerwanê re nebûn asteng.

Vê care dest bi tundiye kirin. Nêzika 40-50 çavderên BDP ê ji bo referendum hatî gorev kirine hatin binçav kirin. Bi bi qasî 250-300 kesên din ê ji dorê hatin binçav kirin.

**Belê hevalên delal**; Îro ti kes neçû serkarê xwe. Li Kolana ji polîs, esker, Caradavan û kuçikan bêtîr ti kes tune bû.




Polîs bi panzera li sukê annons dikir. *"Bên dengê xwe bidin. Ên ku dengê xwe nadayî me tespît kirine. Ew ê li dawiyê poşman bibin. Em ê 22 lîra ceza ji wan bistînin"*.

Lê gelê Kurd di referamndume da dengê xwe bilind kir got ez jî divê merhele de heme.

Tu be min nikarî hereket bikî.

Li rayegiştiya Tirkiyeyê ew ramana hakim bû. "BDP qezenç kir. Bê BDP va siyaseta nameşe. Gelê herêmê dîsa piştgiriya xwe ya BDP û Ocalan nîşan da. Serokê PKK e Ocalan bandoreka xwe ya giran li ser gelê herêmê heye. Divê em vê ji bîr nekin. Qerta Ocalan hê jî zêde bû. Tirkiyê bi sê perça bû. Îsamîstir, Nijadperest û Kûrd. Gelê Kurd qezenç kir. Rêxistinên wek HAK-PAR û Tev Kurd û yên din ê li cem AKP cîyê xwe girtî ma ew niha fedî bikin. "***Serê xwe bi quna xwe dan***". Ez bawerim ew niha pir şerm dikine. Sibê ji bo Kurda rojeka nuh ye. Termê neh gerîla li Meletyê. Sibê xizmên xwe termê gerîayên xwe werbigirin.

Îro 13/09-2010 a ye

Boykot kirina Kurda ya referandumê nunerê dewleta Tirk û esker şoq kirin. Derdora û




neyrên Kurda wiha bawer dikirin ku Kurdê ji bo derewe Erdogan dengê ”**ere**” bidin wî. Lê wiha nebû. Kud di referandumê da rola xwe ya mifte lîst in. Dengê Kurda ji ya duh hê zêdetir bû. Wadên serokwezîr gelê Kurd ji daxwaza xwe ya Kurdîstan û Xweseriya Demokratîn paş vegav neavêtin.

Spas spas ji wî gelî qehreman re.

Boykota Kurda ne tenê li Tirkiyeyê deng da nuner û saziyên YE û Amerka jî kêfxweş bûn.

de



Raportorê Parlamentoya Ewropa yê (PE) yê Tirkiyeyê Ria Oomen Ruijten got, divê piştî referandûmê derbarî mafên kurdan û elewiyan gav bêne avêtin.

Medya Tirkiyê jî bi vekirî li xwe mikur hat gotin; Bandora Ocalan li herêmê zêdewek duh yê.

Rojnama Akşam Serdar Akinan: Ocalan mohra xwe li referandumê da. Bandora xwe ya li ser PKK e jî bi vê referandumê da eşkerê kirin. Bandora BDP/PKK li herêma me ya Rohjhilat heye.

Rojnama Vatan Rûşen Çakir: BDP bi stratêjî û polîtîka xwe ya ji bo Referandumê bi serket. Va jî bi zelalî nîşanî me dide BDP/PKK e hêzeka xwe ya mezin li herêmê heye êdî ti kes vê înkar neke.

Hevserokê BDP Selhattin Demîrtaş "*Muhatap PKK ve Öcalan e*".

Demirtaş got ya gîrîng pêvajoya piştî 20-ê îlonê ku dema agirbesta ku PKK îlan kiriye bi



dawî dibe ye û got " Me got ku ê piştî referamdûmê titek jî nebe. Mêzekin li Tirkiyeyê her tişt normal xuya dike. Heke em dixwazin bêçalakîtiya PKK-ê dom bike divê hukumet gav bavêje."

Karayılan**:** Statuya Katalonya çêbe em çek datînin

Serokê Konseya Rêveber ya KCK-ê Murat Karayılan daxuyaniyek da rojnameya Spanî El



Mundo û têde got heke ew modela spanya ya Katalonya yê bidest bixin ewê jî dev ji çekan berdin û em ê jî çekan deynin û radestî Neteweyên Yekbûyî bikin"

Encamên referandumê:

Li bajarên Kurdistanê nisbeta bikaranîna dengan jî weha ne:

Îro 14/09-2010 a ye.

BI DEH HEZARAN GERÎLA BIN AX KIRIN

Belê hevalên hêja xizmên 10 gerîla duh li Meletyê bûn ji bo ku cenazê gerîla werbigirin.



Di seat 13:00 an da cenazê xwe bi tilîlî ya bi sloganên şehîd namirin wergirtin ber ve Colmerg, Cizîrê, Hezex û Agiriyê rê girtin. Lê li ser rêya ji aliyê hezaran ve şehîd namirin hatin pêşwazî kirin.

Gava ku cenazê Beytûllah Ozkan kete nava bajarê Colemêrgê ji 7 salan da bigire hetanî 70 saliya daketin nava bajer cenazê xwe pêşwazî kirin. Bi alên partiyê û ala Xweseriya demokratîk defn kirin. “Bavê Ozkan ji Colemêrgiyan re spas kir ku wan ew bi tenê cîhnehîştine. “***Şehîdê min şehîdê we ye***”



Cenazê Ugur Kar li Şirnaxê ji aliyê 50 hezarî ve, cenazê Yusuf Şahîn ji aliya 60 hezarî, **Ulaş Bozan** li Agriyê ji aliyê deh hezaran ve hatin pêşwazî kirin.

Parlamenterê BDP'ê yê Colemêrgê Hamît Geylanî, Bengî Yildiz, şaredarên Colemêrgê,



Geverê, Şemzînanê, Çelê, Bajêrgehê, rêveberên BDP'ê û parlamanterê **CHP kevn Esat Canan** gelek kes jî tevli meşê bûn. Darbesta Ozkan, jî bi gulan hate xemilandin.

Dîmenên li jêr ji Colemêrg, Cizîrê, Hezexê hatin.

Belê hevalên hêja; Kurd boykota referandumê qezenç kir. Dinya alem jî bû şahîd ku Kurda dengê xwe li dijî dewleta Tirk bilind kir.



Îro BOYKOTEKA din a pêwîst dest pê dike. "Em perwerdeya zimanê dayikê dixwazin"

Ez bawerim Kurdê we jî qezanç bikin. Zarokên Kurd dibistana boykot bikin û perwerdê bi zimanê Kurdî bixwazin. Ew boykota ji aliyê gelek

saziyên Kurda wek serokê Baroya Amedê M. Emîn Aktar; *"Ger em perwerdeya zimanê dayikê bînin rojevê û bikşînin rojeva Tirkiyê dê baş be."* û wek Egtim-sen Abdullah Karahan û KMM/ÎHD piştgirî dan vê boykotê.

"KNK'ê jî banga boykotkirina dibistanan kir" *Rojeva Kurdan perwerdeya bi zimanê Kurdî û Xweserî ye*.

Belê hevalên hêja; îro li Amedê û Brûkselê doz hebûn. Doza li Amedê ya 54 şaredarên Kurd bû. Şaredara di sala 2008 an da bi hinceta jahr kirine Ocalan daxuyanî dane rayegiştî. Ji bo wê dozger ji wan re 170 sal ceza xwast. Lê îro ew doza betal bû.Encama Boykot e.

Doza duyêmîn ji ya Birêz Hrant Dînk bavê delalê di sala 2007 an da ji aliya nijadperestave hatî kuştine bû.

DMME Tirkiyeyê ji doza Dîngk mehkum kir.



Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewropayê (DMME), ji ber doza qetilkirina rojnamevanê ermen Hrant Dînk Tirkiye li gorî xalên madeyên DMME'yê yên 2-10 û 13'yan hatine binpêkirin 133 hezar euro ceza li birîn û mehkum kir.

Rakel Dink jina Hrant: "Got *"biryara dadgehê heqbûna wî nîşanda. Sibê rojbûna Hrant Dink e, biryara DMMEê diyariyek bo rojbûna wî ye. Pereyê ki dadgehê wekî tezmînat daye, dê di navbera sê saziyên perwerdeyê de were parvekirin"*.

Îro 14/09-2010 a ye.

Belê gelê Kurd duh 10 ewledên bedena xwe gerîla oxir kirin û ew di dilê xwe da veşartin. Ew girseya gela ji 60-70 hezarî pêk hatî di çavê Tirkan re çû xar e. Îro li hemê medya sernivîseka hevpar hebû. Cenazê terorîsta ji aliya deh hezaran ve hatiyê pêşwazî kirin. Va têyê wata serhildana.

Îro jî şehîd Hesen Doru û Ferman **Ozlû** ji aliyê deh hezaran ve li Wanê hatin oxir kirin. Lê gava ku Kurda zarokên xwe di gorîstên da vedişartin polîsa jî operesyon li dijî welatparêzê tevlî merasîma oxirkirina gerîla bûyî digirtin binçava. Li Colemêrg û Wanê 32 kes hatin girtin. Terora dewletê bi her cureyî li dijî gerîla dimeş e. Parêzerên birêz Ocalan bi hinceta mixelefeta hawayê neçûn Îmraliyê.

Lê îro nuçeyeka balkêş li rojnama Akşam heye rojnamevana me Özlem Akarsu bi Ocalan re hevdîtin pêk anî û pirsên me bersiv dan. Lê nizanim çiqas rast e?

Öcalan: Me şansekî dawî da Erdoğan

"Ger me bigota 'na', guhertina destûrê di referandûmê de derbas nedibû. Me şansekî dawî da Erdoğan û divê vê yekê baş bibîne."




Abdullah Öcalan, bi rêya parêzerên xwe pirsên rojnameya Akşamê bersivandin.

"Ger me xwestibûya, di vê referandûmê de winda dikirin. Ger me bi gota 'na' derbasbûna vê yasayê nemumkun bû. Me şansekî dawî da Erdoğan û divê vê yekê bibîne. Hêvîdarim ku, ji vir şûndetir pêşketinên erênî derbarî destûreke nû û çareseriya demokratîk de çêbin."

Ger hevdîtin bidomin, ez mêjiyê xwe û mantixê xwe bikarbînim û dikarim rol bigrim.

Rojnamevanê Hurriyetê Cuneyit Ûlserver jî di quncikê xwedest nîşan dike; "Niha tam zamanê xwe bi BDP re rûnî".

Refarandumê bi me eşkerê kir ku rê li ber nemayê divê nunerê dewletê bi BDP re bi resmî hevdîtinan pêk bînin bi Ocalan re bi dizî hevdîtinan pêk bînin.

Belê hevalên hêja; îro mêvanên Tirkiyeyê û Amedê bi nirx hene. Em wan ji can û dil da silav dikin.

Şandeya **Yekitiya Ewropayê** ji *"Endamên Komîsyona Serbixwe ya Tirkiyeyê"* ku piştgirî didin endametiya Tirkiyeyê ya Yekitiya Ewropayê pêk tê. Serokatiya wê jî serokkomarê berê yê Fînlandiyayê û xwediyê xelata Nobel ya Aştiyê Martti Ahtisaari dike.



Di nav grûbê de wezîrê derve yê berê yê Spanyayê Marcelino Oreja Aguirre û misteşearê wezareta derve ya Avûstûryayê ê berê Albert Rohan jî hene.

Nunerê aşitiya Yekitiya Ewropayê ê îro bi nunerên saziyên sivîl yên Diyarbekirê û hevserokên KCD-ê Ahmet Turk û Aysel Tugluk re jî hevdîtinan bikin.

**Martti Ahtisaari** berê jî li ser navê NY li Kosova û li Namibyayê û di navbera ÎRA û Îngîlîstanê de jî beşdarî hevdîtinên aştîyê bûbû û ji ber van xebatên xwe Xelata Nobelê ya aştiyê girtibû. Navê Martti Ahtisaari ji alî Murad Karayılan û Abdullah Ocalan ve berê hatibû pêşniyarkirin.

Îro 15/09-2010 a ye.

Tirs û xofekê girtiyê ser hikumatê û Nimet Çûbûkçû wezîra perwerde yê. Duh tirsa boykota referandumê li pişta hikumatê bû, îro sê rojin jî tirsa boykota perwerde bûna bi zimanê Kurdî ketiyê dilê wan. Serokwezîr bi vê biryarê dîn dibe. Dibêje; Nabe nabe! Em vê qabul nakin. Îro danê sibê hevserokê BDP Selhattin Demîrtaş jî piştgirî da boykotkirina perewerda zimanê kurdî û gazî gelê Kurd kir ku zarokên xwe neşînin dibistana. Em perwerda bi zimanê Kurdî dixwazin. "*Ez jî li 20/09 an zarokên xwe heftekî naşînim dibistane. Hikumata hîngê bizana ka boykot çi ye*".



Belê nêzika 2 milyon zarok dibistana Tirka boykot bikin.

Lê wezîra perewerdeyê **Nimet Çûbûkçû** hevserokê BDP rexne kirin ku zaroka ji bo berjewendî û siyasetê bi kar tînin. Em ê li ser dê û bavê zaroka doz vekin û zaroka bi darê zore bînin dibistane. Dê bav berpirsiyar in.

Belê duh şandaya aqilmendên Ewrûpî duh li Amedê bûn. Bi serokê şaredariya Amedê re hevdîtin pêk anîn û birêz Baydemir kêfxweşiya xwe bi hatina wan anî ziman. "***Em bi salanê li hêviya we ne. Hûn bi xêr hatine bajarê me qedîm Amed e. Gelê Amedê li hêviya we ye***"

Amedê Osman Baydemîr : "*Hewcehiya bajarê ya herî lezgîn aştî ye*" Baydemîr, anî ziman ku ji bo çareseriya pirsgirêka kurd rêbazên ewlehiyê hemû hatin bikaranîn û tu rêyên din nemane û wiha got:



"*Rêbaza nehatiye ceribandin tenê diyalog, muzakere û îstîşare ye. Ji ber vê yekê em dixwazin ku ev rêbaz dest pê bike*."

Heyetê piştî Osman Baydemîr bi hevserokên KCD Ahmet Tûrk û Aysel Tugluk re hevdîtin pêk anîn.

Ahmet Türk û Aysel TuglukTûrk got; *"Herkes dibêje bila pirsgirêk bi rêya diyaligê bên çareserkirin. Me ji endamên şandê re got ku derfetek baş bo avêtina gavên bi bawer derketiye holê. Em hêvîdarin ev xebat bibin bingehek bo aşitiyek mayînde. Êdî em nikarin piştî 20 îlonê carek din daxwaza agirbestê bike. Em dê hêviya xwe bo çareseriyê biparêzin*"



**ANF** radigihîne ku heyeta serbixwe ya navneteweyî ya bi serokatiya serokkomarê berê ê Fînlandiyayê û xwediyê Xelata Nobelê Martti Ahtisaari di dema serdana xwe ya Diyarbekirê de eşkere kiriye ku pirsa herî giring a Tirkiyeyê pirsa Kurdan e, heta ew çareser nebe ne demokrasî li Tirkiyeyê cîbicî dibe ne jî ew dikare bibe endama Yekîtya Ewropayê. Balkişand ser Ocalan. *"Em ne ji bo  bibin navberiyê hatin vir. Em ji bo ku rapor bikin li vir in*".



Belê girseyên gelê ji **50-60-70** hezarî li cenazê gerîla pêk hatî û wan bi sloganên Kurdî oxir dikirî nunerê eskerî dan tirsandin.

Ewil dest bi binçavkirin û girtina welatparêza kirin. Nebû. Bi dehan welatparêz hatin girtin dîsa nebû. Pişt re êrîşa ser girseya gel kirin û bi dehan kes birîndar kirin û piştî hêzên tarî bi şev nîvê şevê xwe avêtin ser malên gundan  lê dîsa gel teslim negirtin.




Duh hevdîtina  parêzera bi birêz Ocalan re asteng kirin.

Belê hevalên hêja; Îro du sê rojin ez li bende me ku bûyarek hov li Kurdîstanê pêk bê. Ji ber ku kîngê pirsa Kurdî ji aliyê biyanan ve hatiyê niqaş kirin û hatiyê rojevê hemas planên qontra dikevin dewrê. Bûyarê wiha ye hov li welatê me gelek pêk hatin. Kuştina serok Komara **Turgut Ozal**. Bûyara 33 eskeran li Bîngol/Çewlîkê ji aliya Şemdîn Sakik ve hatî kirine. Kuştina 41 gundiyê **Bîlgê** û kuştin 8 eskerên sala çûnî bûyarên wiha ye hov bi dehan.

Lê  ew bûyara ku min ji esker û qontra dipayî vê sibê qewimî.

Îro danê sibê li Colemêrgê li hember minubusekê êrîşa bombeyî pêk anin û deh kesên di minûbusê da şehîd ketin. Xwastin van bûyarana bavêjin ser PKK e li bi serneketin. Xwastin vê bûyarê jî bi stûyê PKK e xînin lê bi serneketin. Li ser kar hatin girtin.

KNK Daxuyanî da got: *“Hikumata Tirk girseyên gelê li Colemêrgê hazm nikrin û Colemerg hedef nîşan da. Ew çalekiya ji aliyê me da pêk nehatiye û em li ser soza xwe ya bê çalekiyê ne. Lê hêzên dewletê bi her cureyî êrîşê li dijî me dik tên ser me”.*

Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş, têkildarî teqîna li Colemêrgê pêk hat û di encamê



de 10 welatiyan jiyana xwe ji dest da daxuyanî da û bal kişand ser dema teqînê. Demîrtaş got ku îro dê di navbera wan û hikûmetê de hevdîtineke nepenî pêk bihata. Piştî teqînê hevdîtina Hevseroka Gulten Kişanak, Selhattîn Demîrtaş û Alîkarê Serokwezîr Cemîl Çîçek û Wezaretê Dadê Sadullah Ergîn a di meclîsê de betal bû.

**Demîrtaş**: Eger ev bûyer neyê ronîkirin, wê demê hikûmet berpirsiyare vê bûyarê. *"Ew Provakasyona dewelta kûr e. Em ê sibê heyeteka ji deh kesa bişînin ciyê bûyar e”.*


Li cihê teqînê çanteyê 'Hakkarî Dag ve Komando Tugayı hebû'



Dozger dest danî ser alavên leşkeran yê li dûv wan mayî

Gundiyan gotin 100 metreyan nêzî cihê bûyerê çenteyeke ku mayinên antî-tank ên TSK'ê û guleyên hawanê tê de bûn dît û dest danîn ser çanteyê. Di çentê da ew neqşa eskeriyê jî hebû, ew çawa wê maîne bidin teqandine jî hebû.

KCK: Tu peywendiyên me bi teqîna Colemêrgê re nîne.



- Serokatiya Konseya Birêvebir’ê got: “*Ev çalakî, çalekiyek ya kontre ye*”.

Serokatiya Konseya Rêvebir ya **KCK**’ê têkildarî teqîna ku li hember minubusa rêwiyên sivîl pêkhatî û têde10 kesan jiyana xwe ji dest dayî daxuyanî da û ragihand tu têkileyek wan bi bûyerê re tûneye.

Belê hevalên hêja, du roja di ber hevserokên KCD ji bo randevuyê ji serok komar û serokwezîr re name şandin ji bo hevdîtina bêçakiyê. Îro serok komar tarixa hevdîtine da hevserokên me.

Belê du hat diyarkirin ku serok komar bi hevserokên KCD re hevdîtina pêk bîne. Lê ji boykota neşandina zaroka dibistana û vê bûyar hevdîtin paşve hat kişandin.

Îro 17/09-2010 a ye.

Belê kuçika neçîra xwe wergirtin li 6 îlonê 10 gerîla şehîd kirin û duh 10 welatparêz bi bombeyê li rê hatî rêxistine hatin şehîd kirin. Lê dewleta kolyanîst û dagirker nizanê her yekî ji wan şehîdan, li dûv xwe 10 gerîla cîhştin. Hêza gerîla hê jî bi hêz bû. Hers û kîna gelê Kurd hê jî li dijî wan zêde bû. Gelê Kurd bi vê hovitiyê gava ku din nêzîka azadî û serxwebûna bû.



Lê medya Tirk bi rêvebir û nunerê xwe ve şaşa bûn çawa vê bûyarê jî bavêjin ser PKK e, dest bi weşanên bûyarên berê kevn kirin, lê mizrak mezin bû di çaval helnehat. Gelê Kurd bi wan derew û rûreşiyên wan bawer nekir. Bi deh hezaran li dijî neheqiyê derketin. Sloganên "şehîd namirin. Bijî gerîla û bijî Ocalan" meşiyan.

Gava ku bi deh hezaran di nava şînê da bûn. Ji Wanê xebera şahdeta **Enver Turan ê** 15 salî ji aliya eskeran ve bi gulê wan hatibû birîndar kirine hat. Girseya gela ji deh hezara vê carê berve mala bavê Enver êrîş kirin û xwe dan kêleka wan. Lê bi hezaran jî polîsa ew dişopandin. Bi şehdeta Enver hêjmara kuştiya gehşt 11 an. Li seat 11:30 an da bombe li Gewerê li çarşiyê teqînek pêk hat 6 polîs û di kesên sivîl birîndar bûn.



Lê Amedê piştgiriyeka mezin dan Colemergiyan bi hezaran li kolana bi polîsan re ketin şer. Amed bû qada şer.

Îro hevserokên  BDP ê Selhattin Demirtaş û Gulten Kişanak li Amedê bûn ji bo ku doza **Celam Temîz Oz** û şaredarê Cizîrê **Kamîl Atak** û kuçikên din ê ku bi sedan Cizirî kuştî



wê dozê bi şopîne li dadigehê bûn. Piştî wê şopandine bi şaredarê Amedê Osman Baydemir û Ahmet Tûrk û girseyeka din a gela mezin ve bi sed erebeyî ketin rê çûn Colemêrgê. "Em li cem we ne. Hûn bi xwe jî dizanin kuştar kîne. Ew ên ku duh deh gerîla şehîd kirî, îro jî deh welatparêzên me şehîd kirin. Ew ê rojekê di xwîna we da vetisin"

KCK daxuyanî da; "*em bûyara hova ku li Colemêrgê bûyî bê bersiv cîh nînin û em li kêleka gelê xwe ne*"




Belê hevalên hêja; Boykot kirina dibistana Tirseka giran kiriye dilê Tirka. Îro jî ji gelek saziyan piştgiriya perwerda Kurdî hat. Lê li kêleka wî dangî dengekî din ê hê jî Tirka dide Tirsandine tê. KCK daxuyanî da got; " *Ciwanên Kurd eskeriyê boykot bikin neçên eskeriya Tirkan. Tirk wan li eskeriyê dikujin yan jî îmha dikin. Boykota perwerde bûne dê li her deverên Kurdîstan û metrepolên Tirkiyê bi hêzeka mezin pêk bê. Divê gelê Kurd li zimanê xwe li çanda xwe xwedî derkeve*"

Belê hevdîtina bi birêz Ocalan re îro pêk hat. Heyeta di bin serokatiya serokê Fînladiya xwediyê Xelata Nobelê Martti Ahtisaari hê li Tirkiyeyê hevdîtinên xwe pêk tîne. Lê Tirk ne dîrek lê îndirek ji hatina wî aciz in. Hinek derûdor dibêjin, eskeriyê û dewleta kur ji bo ku aciz bûna xwe nîşan bide ew çalekiya Colemêrgê pêk aniyê.

Sibê Kurd mêvanê Almanya û Stockholmê ne. Festîvala netewiya 18 an dest pê bike. Mêvanên me giran biha hene. Ez ji we re sibê behsa wê festîvalê bikim.

Îro 18/09-2010 a ye.

Li bajar Almanya Koln baran wek sicim ji ezmanan da tê xar e. Baê payizê li Ewrûpa



meriva dide qefilandin. Pêlkên dara zer li ber zer bûne ne û payiz ciyê xwe ji zivistanê re amde dike. Li herêma Colmêrgê şerekî giran û operesyonê giran pêk tê ne. Û operesyonên gelek mezin ji bo herêma parastina medya tên amedekirin. Îsal hersê mehê havînê Dersîmê her roj hat şewitandin û her roj bi ser da bomba hatin barandin. Bi dehan ciwan û gundî hatin kuştin. Dîsa jî xelkê Dersimê ji têkoşîna xwe paş ve gav neavêt.

Belê, îro 5 penç rojin ciwanên Kurd li ser riya Dortmund Kolnê ne. Li rê gelek cara rastî astengiyên polîsan hatin. Gelek cara posterên Ocalan û alên KCK ji dest wan hat girtin. Gotin; "Ew wêneyan qedexne".

Lê îro danê sibê bi tevlê bûna deh hezaran bi sloganên "*Bijî Ocalan, PKK e gelê gel jî em in. Şehîd namirin û gelê Colemêrgê ne bi tenê ye. Em fedayê Apo ne*" gelê Kolnê û Stockholmê ji xew hîşyarbûn. Almanya ji wî dengî re ne xerîb bû. Ji ber ku ew denga 11 salin li Almanya tê bîhstin.

Îro festîvala netewiya 18 emîn li Koln û Stockholmê hebû. Bi deh hezara welatparêz tevlî wan herdu festîvalana bûn. Bi deh hezaran gelê **Colemergê** silav kirin. "*Hûn ne bi tenê ne. Em li cem we ne"*

Festîvala 18 emîn ji bo bîranîna çar şehîdên me ji aliyê rejima Îranê ve hatî darda kirine hat nav kirin. Şahdeta wan hat silav kirin. Têkoşîna û berxedana wan hat silav kirin.

Mêvanên me ezîz biyan hebûn. Parlamentera BDP Emînê Ayna wek axavtvan hebû. Dengê Emînê gehşt Ankarê. Ankara ji wî dengî gelek aciz bû.

Li televizyonê Tirkiyeyê Nûça deqiqa dawiyê hat weşandin. "Mepûsa BDP Emînê Ayna dîsa li Almanya jahr verşî. Divê dengê ê bê qut kirin"

Hevseroka BDP Gulten Kişanak li Colemêrgê axivî: "*Erdogan Tu ne Serokwezîrê Colemêrgê ye!"*

Hikûmeta AKP'ê sersaxî ji gelê Colemêrgê nexwestiye. *"Helwesta hikûmet û serokomara ev e ku vî gelê êş û derdê wan bikin û li ser êşa wan siyasetê bikin. Ger ku bi qasî zereyê dilê wan biêşiya wê sersaxiyek ji gel bixwestana. Wê ev gel guhdarî bikiran û fêm bikirana. Li ser daxwaz gel dikaribûn lêkolînek bikirana. Bûyerê bêyî ku lêpirsîn bikin, wekî ku her tiştî dizane serokwezîr radibe û diaxive. Wê demê mafê me jî heye ku em jî bibêjin, gelo we ev plankiriye."*



**Belê hevalên hêja**; Ciwanên Kurd favorîtê festîvalê bûn. Meşa wan dilê gelê Kurd xweş kir. Gava ku mesaja Karayılan li festîvalê hat xwandin, ciwanan ew mesaja li ser piya guhdar kirin.




Belê, gava ku ciwanên Kurd li Koln di nava meşê da bûn. Ciwanên Kurdê li Stanbolê dijî jî li taxa Taksîmê bi polîsan ve di nava çalekiyan da bûn. Qada Taksîmê kirin qada şer. "Em fedayê Apo ne" Di navbera wan û polîsan de şer derket. Ciwanan kevirên kolana bi ser polîsan da barandin û agirê molotofa bi derlingê wan xistin. Polîs gelek ji wan girtin û birên polîsxanê.

Serokê Konseya Rêveber a KCKê Mûrat Karayılan: DI ROJÊN PÊŞ DE EM DÊ DAXUYANIYÊN GIRÎNG BIDIN GEL.

*“ Dewleta Tirk careke din soza xwe ku dabû me xwar. Dewleta Tirk heyet şand cem serok*



*Apo xwest ku em agirbestê îlan bikin. Me jî li ser vê yekê bêçalakîtî îlan kir. Ev bêçalakîtî wê biba agirbesta dualî. Dewleta tirk careke din soza ku dabû neanî cî. Operasyonên bi armanca îmhakirinê dan destpêkirin. Bi durûtî êrîşî hêzên me yên di rewşa bêçalakîtiyê de bûn kir. Li colemêrgê hemû hêz û leşkerên xwe seferber kirin û 9 hevalên me şehîd xistin .”*

Belê hevalên hêja; hê jî medya û rêvebirên Tirk seferber bûne ku bûyara Colemêrgê bi ser PKK e kin.

Mam Celal serok komarê Îraqê duh ji bo ku tevlî civîna NY bibe çû Amerîka û îro jî serok komarê Tirkiyeyê Abdullah Gûl çû Amerîka. Berî ku here Amerîka a di dilê xwe de derxist. “ ARMANCA ME TASVIYÊ KIRINA PKK E” *Em qet ticara bi rêxistina terorîst re danûstandina û bazartiyê pêk nînin.*

*Xwesariya Demokratîk ya bibe sebeba perçe kirine me. Em destûr nadin perwerda Kurdî*”

Belê hevalên hêja; Hevkariya Îran û Tirkiyeyê bi dostaniyeka mezin dimeşê. Du roja di ber




vê wezîrê Îranê ji bo planên li dijî PKK e hatibû serdana serokwezîr Erdogan. Gava ku ji hev veqetîn ew dîmênê li kêlekê li dûv xwe cîhşt in. Va paçkirina ne paçkirineka bedewe ye. Belkî jî bo qirkirina PKK e li hev hatine.

Ez bi çalakiya li Colemêrgê Öcalan şok bûm: Kare dewlet be, kare PKK be ji Öcalan got;




bi vê teqandinê esas hevdîtinên herî dawîn ên vê derê hatin dînamîtkirin, hatin bombekirin. Ev hevdîtinên bi min re gelek bi hêvî derbas dibûn, ez ji wan hevdîtinan gelek bihêvî bûm.

Serokê PKK-ê Abdullah Öcalan di hevdîtina vê hefteyê de ya bi awukatên xwe re, bi giringî li ser qetlîama Hekkariyê rawestiya ku 9 kesên sivîl hatibûn kuştin, 4 kes jî birîndar bûbûn.

**Öcalan** eşkere kir ku li Îmraliyê hevdîtin li gel wî dihatin kirin, pêvajoya hevdîtinên li gel dewletê û hukumetê gelek baş dimeşiya, tam di vê wextê de ev qetlîam hat kirin. Armanca vê qetlîamê sabotekirina hevdîtnan e.

Abdullah Öcalan rexne li daxuyaniyên serokwezîr û ên serokerkaniyê girt ku çima ew zûbizû îdîa dikin PKK-ê ev êrîş kiriye. Wî eşkere kir ku "êrîş dikare karê jîtem-kontrayekê be ku xwe derbasî nav PKK-ê kiriye, yan jî dikare karê grûbeka serberdayî ya nav PKK-ê be ku ji hin navendan tê îdarekirin. Ev dikare bi niyeteka qenc be jî, hinan ji rewşê wazîfe ji xwe re derxistibe (bi serê xwe kiribe). Dikare wek buyera li Batmanê a li hember Salih Özdemir wan be. Dikare karê milîsan jî be, bi aqlê tolhildana gundayetî encam dabe.

Öcalan got çawa dikare ji bal hin hêzên nav PKK-ê hatibe kirin, ew qas dikare ji bal hin dewletên biyanî jî hatibe kirin.Dikare hêzên kontra ên global û ên herêmê ên xêrnexwaz bi marîfeta hin hêzên hundur û derva ev kar kiribin, da rê li ber hevdîtinên me bigirin ku em ê bigihîştana hin encaman. Van kare ev kar di bin postê (maska) PKK-ê de ev kiribe.

Binêrin ez li ser îhtîmalan diaxivim. Dikare buyerek be ku di nav dewletê de hinan kiribe, çavkaniya wê dewlet be. Dikare bi haya serokerkaniyê û hukumetê bûbe û dikare bêhaya hukumet û serokerkaniyê bûbe. Belkî jî hêza serokerkanî û hukumetê têr nekir ew rê li ber vê buyerê bigirin. Di herdu halan de jî gelek muhîm e, ê encamên xeter jê derên. Gava min ev buyer bihîst ez şok bûm, halê min ê rûhî yê nuha wek kaosê ye, ez dixwazim fêhm bikim."

**Öcalan** herwiha belkişand ser wê ku ev êrîş dikare ji ber sedemên dijayetiya hêzên nav dewletê û pevçûna wan a li hemberê hev jî hatibe kirin. Belkî tê xwestin hin mihaweleyên niyet qenc bên sabotekirin. Tê xwestin bê gotin ku hêza me heye hûn bêyî me nikarin tu gavan bavêjin, çareseriyan bikin.

Öcalan got "ez di vê buyerê de ji nuha ve tu kesî tawanbar nake, dibe ku haya serokwezîr jê tunebe, dikare hedef ew hevdîtin bin ku li vê derê nuha bi min re tên kirin. Li vê derê hevdîtinên gelek bi mane bûn Dikaribû encamên gelek bi mane bidin. Meriv difikire ku tam di wexteka wiha de ev êrîşa Hekkariyê bû." Öcalan got "bi vê teqandinê esas hevdîtinên herî dawîn ên bi vê derê re hatin dînamîtkirin, hatin bombekirin. Ev hevdîtin gelek bi hêvî derbas dibûn, ez gelek bihêvî bûm. Tirkiye çiqas têkeve qonaxeka wiha pozîtîf a ber bi çareseriyê, pêşketin tên sabotekirin."

Öcalan buyer şiband a Guçlukonaxê ku piştî 14 salan derket ku eskeran di mînîbusê de gundî kuştine û pişt re ew tevî wasiteyê şewitandine. Di destpêkê de qetlîam ketibû

hustuyê PKK-ê. Öcalan got ev êrîş tenê bi hilbijartinên 2011-ê ve ne bestî ye pêwendîdar e bi îmhakirina kurdan. Eger hukumet û serokerkaniyê li hev kirine ev ji bo kurdan tehlîkeyeka gelek mezin e, provavaye jenosîdê ye, eger wiha be Hekkarî bi taybetî hatiye armanckirin. Ev dorlêgirtina Hekkarî û şirnexê ye. Wek dema berê çawa Dersim hat dorpêçkirin."

Abdullah Öcalan eşkere kir ku êrîşa li Hekkariyê gelek giring e buyer mutleqa divê bê ronahîkirin. Di vî warî de herkes çi dikeve ser milê wan divê bikin.

Abdullah Öcalan ji hukumeta Ak PArtiyê daxwaz kir bi biryarderî biçe ser buyerê û berpirsan derxe meydanê. Pêşveçûnê rêjên êbê girêdayî bi îradeya hukmetê ve ne. Di demekê de ku hevdîtinên ew qas giring dihatin kirin ev buyera Hekkariyê gelek meriv difikirîne.

## Odeya Tabîban:

### Ji ber ku operasyon didomin em bang agirbestê nakin



Konseya Navendî ya Yekîtiya Tabîbên Tirk û Odeyên li **Amed, Êlih, Agirî,** Mêrdîn, Sêrt, Şirnexê balkişand ku êrişa li Colemêrgê ku 9 kesan jiyana xwe ji dest dabûn û diyar kirin ku ev bûyer ji hêla "**hêzên tarî yên dewletê ve**" pêk hatiye. Serokê **DTO Şemsettîn Koç**, diyar kir ku heta operasyonên leşkerî yên heremê bidomin ew banga agirbestê nakin.

Jinan nameyek ji Serokwezîr Gul re şand: Înîsiyatîfek dîrokî werbigre.

186 rewşenbîr û hûnermedên di nav de nivîskar Yaşar Kemal jî cih digire berî referandûmê hatin cem hev koma bi navê "Koma Guhertîna Makezagonê" avakirin ji bo ku operasyon bi dawî bibin û aştî pêk bê biryara avakirina "Heyeta rûspiyan" girtin. Rewşenbîr û nivîskarên îmze avêtin bin metînê bang li hikûmet û muxalefetê kirin ku "bi BDP'ê re diyalogê pêk bînin". Her wiha ji bo çareseriyê kampanyaya îmzayan dan dest pêkirin.



Sibê li Tirkiyeyê Boykota dibistana dest pê dike û dawiya pêvajoya bêçalekiyê bê.

Îro 19/09-2010 a ye.

Dema bçalekiya ji alıya PKK e ve hati ilan kirine re ne roj ma ne seat ma ne. Lê hê ti deng



ti gav ji aliyê dewleta Roma reş ve ne hatine avêtin. Dîsa wek berê rayegiştî bixapînin PKK e wek rêxistineka terorîst nîşandidan û serok Ocalan biçûk bê watedar didin û dinirxandin.

Lê duh birêz Ocalan bi parêzerên xwe re daxuyanî şand bû. Medya tirk ew daxuyaniyên Ocalan li medya xwe bi rojan bi kar anin.

Îro iê seat 11:00 an serokfermandar Îşikkoşaner, serhevsarê ji operesyona berpirsiyar Erdal Ceylanoglu, serfermandarê Hawayî û serfermandarê bejayi/kara, serokê MÎT e, serokê emniyetê, wezîrê dade, wezîrê hundir, cîgirê serokwezîr Cemîl Çiçek ji bo bi dawî bûna pêvajoya bêçalekiyê ku ji aliyê PKK e ve hatî îlan kirine û bûyara li Colemêrgê pêk hatî û

boykotkirina zarokên Kurda li dibistanên Tirka, 4 seat li avahiya serokwezîr li hev civiyan û ew mijaran niqaş kirin.

Îro 20/09-2010 a ye

Belê hevalên hêja; îro li Tirkiyeyê destpêka dibistanan bû. Lê li Kûrdîstanê gelê Kurd bi







dengê hoporlorê polîsa û eskera ji xew hîşyar bû.

*"Mamostê li benda şagirdana herkes zarokên xwe bişîne dibistane.Yên ku zarokê neşandî dewlet wan fîşlemîşke"*. Ew banga bi qasî seat û seat nîvekê li kolanên **Amed,** Wan, Colemerg, Şirnaq û Batmanê gerî. Zaroka di cama û pencera re polîs û esker silav dikirin. "*Boykot heye Boykot, em hetanî*

*heftekî nen dibistana*" Hinek zarok jî ketibûn rê di destê wan da pankart hebûn. *"Anadilimizle egtîm gormek istiyoruz" "Em dixwazin bi zimanê zikmakî perwerde bibin. Zimanê me rûmeta me ye".*

Lê polîsa panqertê di destê wan da meraq dikirin. Polîsa ji wan dipirsî, ew nivîsê di destê we de çi ne? Çi dibêjin?

Anadilimizle egtîm îstiyoruz. Em bi zimanê xwe perewerde dixwazin. Li ber dibistana panzerên polis û perq kiribû. Lê li dawiyê panzerê eskeriyê ku gazî zarokan dikirî jî bê mecel man, ew jî hatin li kêleka panzerê polîsa perq kirin û kis kis keniyan.

**Gelmiyecekler/ zarok dê nene.**

Mamostetên gelek dibistanan jî bi seata pan û hêviya wan jî şikest ew jî çûn malê xwe.

Li metrepolên Tirkiyeyê ji zarokên Kurda neçûn dibistanan û mamostê Kurd li sukê dersa perwerde bûna zimanê Kurdî dida wan.

Na ne Ahmet Topu at.

Ehemet gogê bavêje. Em dixwazin bi zimanê xwe perwerde bibin.

Lê derdê hikumatê ne perwerda Kurdî bû. Wezîra perewerde **Nimet Çubukçû** çiqas jî hevserokên BDP hîşyar kiribin jî lê gotin û hîşyarîya wê per nekirin. BDP yî tam qadro li Amedê bûn û piştgir perwerda zimanê Kurdî dikirin. Selhatin Demîrtaş "*Amed bajarê gelê Kurd e û zimanê xwe Kurdiyê.*

*Gelê Kurd mafê xwe yî perwerdeyî dixwaze*"




Derdê hikumatê li banga Ocalan bû. Eceba îro Ocalan ji bo pêvajoy bêçalekiyê çi mesaj bide.

Seat li 10:29 an da nûçeya flaşşş li medya Tirk hat weşandin. *"PKK e bêçalekî heftekî din dirêj kir" "Ji Îmraliyê bersiv hat bêçalekî dirêj bû"*

KCK'ê daxuyanî da rayegiştî pêvajoya bêçalaktiyê hat dirêjkirin.

Serokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê pêvajoya bêçalakîtiya eskerî dirêj kir. KCK'ê diyar kir, ku heta daxuyaniya hefteya bê bidin, wê bêçalakîtiya eskerî dewam bike.

**KCK**'ê, bi vê wesîleyê hewldanên rayedar û çapemeniya tirk ên ji bo reşkirina tevgera azadiya kurd jî bi zimanekî tûnd rexne kir. KCK'ê diyar kir, ku şerê taybet ya dewleta tirk ku bi şerê psîkolojîk hewl didin gel û tevgera azadiyê bînin hemberî hev û lê belê ev hewldan wê negihêjin armanca xwe.

Bi vê daxuyaniyê KCK e herkesî nefeseka kur kişand û berda.

"Ji partiyên li meclîsê piştigiriya bêçalakiyê re hat"



Ji ber ku KCK biryar bêçalakatiyê dirêj kir partiyên ku komên wan di meclîsê dene

kêfxweşiya xwe anîn ziman. Partiya îktîdarê dem wekî kurt nirxand, CHP'ê diyar kir ku niyeta hikumeta AKP'ê ya ji bo çeresiriyê tune û BDP'ê jî destnîşan kir ku pêwiste di zûtirin demê de ji bo çareseriyê gav bê avêtin.

**CHP**: EGER ÇARESERÎ PÊK BÊ EM JÎ BEŞDARÎ BIBIN/Bikin

Li vî welatî aştî daxwaza me hemûyan e. Tu kes Tirkiyeyeke di nava şer de naxwaze."

BDP: "Roja ku xwîn narije, ji bo me qezenceke."

Bilançoya bêçalekiye: 544 binçavkirî,28 operesyon û 26 top barandin pêk hatin. Neh mirovê sivîl hatin şehîd û 19 jî gerîa jîyana xwe ji dest dan şehîd ketin. Li deh deverên Kurdîstanê agir bi daristana xistin. Dîsa jî em destê xwe yî aşitî û biratiyê dirêja dewleta Tirk dikin û bêçalekî heftekî din dirêj bikin.

Heyeta Rûspiyan: Bila çek bêdeng bibin/Hetanî em aşitiyê nebînin em naxwazin bimirin.



"Heyeta Rûsiyan a ji bo Aştiyê" bang li dewletê û PKK'ê kir ku bêçalaktiyê bidominin. Heyetê diyar kir ku biryara KCK'ê ya dirêjkirina bêçalaktiyê ya hefteyê ew gelek keyfxweş kirin e û wiha gotin: "Hêj me baweriya xwe ya ku welatê me û hemû cihan desthiladariya aştiyê, demokrasiyê û wekheviyê pêk bê winda

nekiriye." Prof. Dr. Gencay Gursoy jî diyar kir ku wan hêzekî siyasî ya bersiva bêçalaktiyê bidin nedîtine û wiha got: "Ji bo vê yekê divê em hemû bi hêz bixebitin ku da hikûmet û vina siyasî berisva bêçalaktiyê bide.

"**Heyeta Rîspiyan a ji bo Aştiyê**" ya ku di nav de Yuksel Selek, Tarik Ziya Ekîncî, Altan Oymen, Gencay Gursoy, Mete Tunçay, Ozden Sonmez û Kazim Genç jî heyî ji bo ku pevçûn bi dawî bibin û aştî pêkbê, li Otela Nîpponê ya Taksîmê daxuyanî dan çapemeniyê.

Îro 21/09-2010 a ye.



Îro jî zarokên Kurd neçûn dibistana. Îro jî polîs û esker bi panzera li nava mehala wek birûsk dizivirin û annons dikirin. "*Dibistan ve bûne zarokê xwe bişînin dibistanê, ma bên kitebên xwe perwerde bibin. Eger ew nen em kitebên perwerdê belaş nadin wan*" Lê zarokên Kurd guh bi wan ve nekirin neçûn dibistana. Li derva bi hevalên xwe ve dîx û ço

lîstin. Li ser deriyê hevşoyê dibistanê “bijî Ocalan û KCK” e nivîsandibûn.

Xedemên dibistana jî duh pêva sloganên li dîwara hatî nivîsandine reş dikirin. Boykota zaroka dibistanê rêvebirên dewleta Tirk şoq kirine. Gelek avahiyên wek **Egtîm-sen** û rêxistinên olî piştgirî dan perwerda zimanê Kurdî.



Dozger li ser TZK ya li doz vekiribû. Rêveberên TZP Kurdî îfade dan. TZP Kurdî Xecê Şen, ji KURDÎ-DER ê Remzî Azîzoglu û berdevkê **Enstituya Kurdî Firatê Dengizî** lêpirsîn hatibû destpêkirin û ji ber lêpirsînê rêveberan îfade dan. Kê biryara boykotê girt?`, `Kê ji were got dibistanan boykot bikin?`, `We bangekî bivî awayî li weliyan/dê bavên zaroka kir, **we çima bang kir?`** hatin pirsîn.

Belê hevalên hêja; li Tirkiyeyê bûyarên balkêş dibin. Dewlet bi serok Ocalan re hevdîtina pêk tîne, êdî ew nayê veşartin. Îro li Rojnama Tafar nûçeyeka balkêş hebû. Nûçe wiha bû

“Dewlet bi Ocalan re teqvîma aşitiye plan dikine û ji partiya BDP gavên aşitiyê hêvî dike”.

Lê Tirkiye dîsa ketiye hewldanên mezin ji bo tasviyê kirine PKK e. **Serokê MÎT e Hakan**



**Fîdan** îro 6-7 rojin li Amerîka ye ji bo tasviyê kirina PKK e bi rêvebirên Amerîka re hevdîtina pêk tîne û ji wan daxwaz dikine ku Kurdên li Ewrûpa radestî wan bikin û çavkaniyê PKK e fînans qurt bikin. Ez bawerim bi Mam Celal re jî hevdîtin pêk anî ne. **Mam Celal** li **Amerîka** yê destûrê nedin PKK yan bên Tirkiyeyê çalekiya bikin. Di nava lîderên PKK e de pêvçûn heye, rêxistin bûye gilok lihev hatiye pêçandin. Ji bo vê çalekiya dike.

Îro rojeva wezîrê Almanya hundir da jî PKK e bû. Wezîr li 22-23 vê mehê da bê Tirkiyeyê bi wezîrê Tirkiyeyî hundir re pirsa PKK e niqaş bike.

Sibê mepûsa Kurda kevn Aysel Tugluk a ku mepûsiya wê ji aliyê Tirka ve ji dest wê hatî girtine wek parêzerê birêz Ocalan biçûya Îmraliyê. Lê hê ew neçûyê Îmraliyê serokê girtingeha Îmraliyê ew hatina wê ya Îmraliyê asteng kir. Asteng kirin rewşa hewa nîşan da. Li ser vê parêzerên Ocalan jî ji bo roja înê serdana Ocalan bikin serîlêdan. Aysel Tugluk berî bibe mepûs jî parêzera birêz Ocalan bû.

Belê li Amedê civîn hene, li Qandîlê civîn hene û îro li Duhokê jî konferansa duyemîna jinên Kurdê hebû. Li wê konferansê gelek jinên me ronekbir û siyasetmeder jî hebûn wek Leyla Zana, Ala Talebanî û Feleknaz Uca hebûn.



Belê hevalên hêja; piştî 5 roja dilê nunerê dewleta Tirka bi Zeyneba Colemêrgiya ji aliya qontrave di qetliyama bombeyî li Gundê peyanusê bûyî û di wê bûyarê da giran birîndar bûyî û di wê êrîşê bombayî da wê diya xwe, xaltî, meta xwe wendakirî pê pir êşîyan e. Serokwezîr duh ji nexweşxanê re telefon kir. Aman Zeynebe xelas bikin. Zeynep ji aliyê terorîstan ve hatiye kuştin.

Lê wezîr ji we re listokeka kuçik şand û pê dilê Zeynebê xweş kir. Di medya da wiha hatibû nivîsandine Hunermend Ajda Pekan hat Meletyê ziyareta Zeynebe, lê wezîrê dewletê ji wê re listokê kuçik û herç şandin..




Îro 22/09-2010 a ye.

Va meha meha peyîza duyemîn ê hê li welatê me hewa gelek xweş û roj li ezmana dibirqê, ne ba heye, ne jî bahoz, ne jî baran dibarê. Duh



mepûsa Kurda **DTP** kevn **Aysel Tugluk** parêzara birêz Ocalana berê bû, li ser gelek hevdîtina ew duh girîk here Îmraliyê, bi birêz Ocalan re hevdîtinan pêk bîne, lê nikarî ku here, li ber wê rewşa hewayê kirin asteng. Ew çûyina **Aysel Tugluk** ne bi serê wê bû, ji aliyê wezîrê dadê û nunerê dinê dewletê ve li hev hatibûn ku Aysel here Îmraliyê. Lê bixwastana ya biçûya û ji we re keştiyeka kirê bikirana. Ew hertiştî bi zanistî dikin.

Îro jî roja parêzerên birêz Ocalanê din ê ku herin Îmraliyê. Ji wan re jî rewşa hewayê kirin asteng ew jî neçûn Îmraliyê.

Bi parêzeran re gotin îro herin sibê bên. Sibê dîsa Aysel Tûgluk jî bi wan re here. Belkî vê carê jî bêjin, em nikarin keştî xirab bûye. Li ba Tirka lîstik pir in.

Belê hevalên hêja; ez mizgînekê bidim we. Ne mizgineka giran e lê girînge. Kurd BDP/KCK bi polîtîka xwe û gelê Kurd bi boykota xwe ya referandumê û zarok bi boykota xwe ya ku neçin dibistanên Tirkiyeyê nunerê dewleta Tirkkirine şoqê. Şaş bûna çawa vê boykotê bişkenin. Dizanin dûv vê boykota kîjan boykot bê. Xortên Kurd çûyina ekseriye boykot bikin. Loma tirs ketiye dilê wan.

Bi dirêj kirina pêvajoya bêçalekiyê gelek dost û hevalên me û nunerê dewletê kêfxweş bûn. Nefeseka kur wergirtin.

Di berî buyara Colemêrgê bombeyî pêk bê, wezîrê dadê û cîgirê Serokwezir **Cemîl Çiçek** bi dizî randevû dabûn mepûsên BDP e bi wan re hevdîtinan pêk bînin. Lê gava ku bombe teqîn wan dev ji wê hevdîtina xwe berdan, gotin PKK e çalekiya Colemêrgê pêk aniye, em nikarin bi BDP li yan re hevdîtina pêk bînin.

Lê pişt re wan jî zanî ku çalekî ji aliya dewleta kur ve hatiye kirin. Îro **cigirê serokwezîr Huseyin Çelîk** bi eslê xwe yî kurd û kurmê heramî ku ji bedena me da ketî daxuyanî da rayegiştî ku ew dê hetanî du sê roja bi BDP li yan re hevdîtinan pêk bînin.

-Birêz Huseyin Çelik di nava vê hevdîtinê da hevserokê KCD Ahmet Tûrk û Aysel Tugluk jî heye an na?

-Na ew tunen.

-Çimaew tunen?

-Lê ew rêxistina ne rêxistineka fermî bûye û ew rêxistina nuh hatiye avakirin. Derewa dikine.

Ji bo dirêj kirina bêçalekiyê di serî da Seroka Civata Rêvebir a Komeleya Pîşesaz û Karsazên Tirkiyeyê (TUSÎAD) Ümit Boyner kêfxweşiya xwe li **Xarpit û Dersimê** ragihand, divê pêvajoya bêçalaktiyê were dirêjkirin. Boyner got, divê dewlet ji ber kiryarên di girtîgeha



**Diyarbekirê** de daxwaza lêborînê ji kurdan bike. Navê Dersimê îade bike û navê qereqolê li Wanê bi Mistefa Muxalî nav kirî biguhere. Hetanî teror li vê herêmê bi dawî nebe, ne demokrasî û ne jî herêm pêşve diçe.

****Doç. Dr. Kenter: Vê dozê aşitî û hevdîtinê bi dawî bikin. Ez kêfxweş bûm ku PKK e pêvajoya bêçalekiyê dirêj kiriye. Görüş, barış ve bitir…

***Prof. Dr. Gürsoy: Gava ku dê xizmeta aşitiyê bike herî girîng e. Divê şer bi dawî bibe.

****Rojnamevan Temelkuran: Agirbest û bêçalekî ji aliyê Kurdan ve ne hatiye îhlal kirin. Ew me bi şa kirin dide û pir girîng e. Bûyara li Peyanusê pêk hatî ez şermezar dikim.

Ez dibêjim malê we bişewitê! Medya Tirkiyê hê wek duh rûreşî û derewa li gelê Kurd dike û dixwaze çalekiya bombaya li Colemêrgê pêk hatî bavêje ser PKK e. Wiha nivîsandine û nunerê dewletê jî her firsenda ku derdikevin pêşberî televizyona wan gotina dubare dikine.

"Ew çalekiya PKK e kiriye. Ji ber ku di nava PKK li yan da îhtîlaf heye.

Bahoz Erdal dixwaze ciyê Murad Karayılan werbigire ji bo wê bi hev re şer dikine. Bahoz Erdan/Feyman Hiseyin grubek ji nava PKK e reviyane û ew çalkiyê bombeyî pêk anîne".

Îro **Bahoz Erdal** derketpêşberî rayegiştî û mesaj da; "Bila ti kes li bin ga li golika neger.



Em li ser pîyane. Di nava me da şahîn jî tunen û kevok jî tunen. Em beden û rihakin. Em fedaî ye PKK e ne. Ew ên ku rûreşiye dikin dibêjin çalekî PKK e kiriye, derewa dikin. Em 20 salin li wê herêmê ne bi nan û ava wan têr bûn. Em ê çawa li dijî gelê xwe rûreşiyeka wiha bikin Dewleta Tirk gelê herêma Colemêrgê, Şirnax, Şemzînan û Gewerê wek dijimin dizane . Bila faîl derkevin, em jî bi wan re bibin alîkar" Di wênê da şehîd hunermendê çiya (Foto Halil Uysal û Bahoz Erdal e.)

Belê roportaja ku birêz Murad Karayılan bi televizyona Îsraîlê re kirî, Tirk êşandine. Gotiye çi Karayılan? Karayılan gotiyê, " *Dijminê îsraîlê dijmine me jî*" Lê ew derewa dikine birêz Karayılan wiha negotiyê dibêje; "*Dewletên wek Îran, Îrak û Suryê dijminatiya Îsraîl dikin, dijminatiya PKK e jî dikin*"

Piştî vê nûçê medya Tirkiyê serî li dereweka din da; "Îstîxbarata Beyrûtê derbeyeka giran li PKK e dan. Li sinorê Beyrûtê sê PKK e li ya li ser navê Îsraîlê ajanîIsixûrî kirine ew ji aliya eskerên Beyrûtê ve hatin girtine."

Belê buyarên ku meriv pê kêfxweş dibin pêk tên. Duh hevserokê BDP li Colmergê li ser saxiyê bûn.

Mezinên eşîra Jîrkiyan hevserokên BDP'ê dawetî gundê xwe kirin. Li Colemêrgê rûspiyên



eşîra Jîrkiyan ku ev 21 sale li hemberî PKK'ê şer dikine û hetani niha di vî şerî de nêzî hezar û 500 cerdewanên wê jiyana xwe ji dest dane, hevserokên BDP'ê yên ji bo serdana Gundê Peyanisê hatine heremê vexwandin gundê xwe. Li ser vê yekê hevserokên BDP'ê Selahattîn Demîrtaş û Gultan Kişanak çûn gundê Jîrkiyan û ji aliyê mezinê eşîrê **Mehmet Adiyaman** ve bi girseyeka mezin hatin pêşwazîkirin. Adiyaman, di pêşwazîkirinê de xêrhadin da hevserokan û wiha got: "*Birêz serokê min, edî partiya me li ku be jîrkî jî dê li wê derê bin. Em dê ji vir û şûn de digel hev bin* ."

"*Selhatin Demîrtaş got; Li ser serê min û li ser çavê min, ew gotina te dilê 40 mîyon Kurd xweş dike. Spas spas.*"

Belê hevalên hêja; jinên Kurd jı bo konferansa xwe ya duyemîn duh li Duhokê bûn, îro derbasî Hewlerê bûn.

Serokê Herêma Kurdistanê Mesut Berzanî pêşwazî ji Leyla Zana û jinên din re kir.



Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî li Selahedînê pêşwazî ji siyasetmedar û çalakvana kurd Leyla Zana û Koma Jinên Kurdistanê yê aştiyê kir. Birêz Mesut Berzanî bi hatina wan kêfxweşiya xwe anî ziman. "Hûn bi xêr hatine welatê xwe. Ev axa axa we ye"

Boykot kirina Zaroka dibistanê dewam dike. îro jî zarok neçûn dibistanan û polîs û esker bi panzerê îro jî gazî zaroka kirin ku bên dibistana. Dozgerê Amedê li nunerê **TZK** yan doz vekir. Nunerê TZK çûn dadigehê îfade xwe bi Kurdî dan. Dozger li wan hers hat.

-Ma hûn bi Tirkî nizanin?

-Na em bi Tirkî baş xwe îfade nakin.

.Li dozên we di ber w eli vê dadigehê pêk hatî web i Tirkî îfade dan. Me ne wiha ye?

Îro 23/09-2010 a ye.

Belê malê we bişewitê!

Dijmin çalekiyên xwe jî wek hev in. Duh li Colemêrg li gundê peyanûsê 9 kesên sivîl û tevlî wan zarokên şîrce jî hebûn hatin kuştin. Îro çalekiyeka wiha li bajarê **Mahabetê** jî pêk hat. Bombeyek teqî 11 kesên Kurdê sivîl jîyana xwe ji dest dan. Metodê Tirka û Îraniya wek hev e.




Orgeneral Yemîbeşoglu dibêje; *'Me camî şewitandin û me bi ser Rûma dikir'*

Di axaftineka xwe ya kanaleka tv ya herî dawîn de orgeneral Yirmibeşoglu eşkerekir ku ew sala 1971-ê buye fermandeyê **Daîreya Herba Taybet** û vê rêxistina ji bo bilindkirina berxwedana gelê tirk li Qibrisê wan bi xwe camî şewitandine û xist stûyê Rûm a. Li **Qibrisê** di navbera salên 1955-58-ê de 16, salên 1963-74-ê de 100 camî, mescid û turbe hatin şewitandin

Belê rastiyek ji devê wî şemitî.

Li Colemergê generalekî gotibû ji bo ku em der û dora bidin tirsandin me carcara bombe li vir û wer didanteqandin û çalkî pêk tînan. Lê me ew çalekiyan bi ser PKK e dikirin.

Wan rojên ku derbasbûyî generalê li Kurdîstane gorev kirî Atilla Kiyat got, li wê demê kuştina faîlî meçhul polîtîka dewletê bû.

Belê hevalên hêja; îro û duh hemû rojê roportaja Karayılana ku li televizyonê Îsraîlê kirî mijara medya Tirk bû, lê bi şeklên cuda cuda bi rengên cuda cuda dihatin niqaş kirin. Aliyê derewa hê jî giran bû.

Murad Karayılan di hevpeyvîna xwe de wiha gotibû**:** *Em ji dostên xwe Îsraîlê tîka dikin ku alîkariya leşkerî ya bi Tirkiyeyê re bibirin. Alîkariya ku hîn didin Tirkiyeyê me dixe tengasiya û Tirkiyêwê teknîkê li dijî me bi kar tîne*"

Belê duh cîgirê serokwezîr Husyin Çelik gotibû dibe ku di nava sê çar rojan de bi nunerê BDP re hevdîtin pêk bên. Îro parêzerên birêz Ocalan çûn Îmraliyê. Ew li seat 11:00 an li keştiyê sîwar bûn. Li seat 12:05 an de cigirê serokwezîr **Cemîl Çiçek** û wezîrê dadê bi hevserokên BDP Selhattin Demîrtaş û Gulten Kişanak re hevdîtin pêk anî.



Pekî çima ew tarixa ji rayegiştî hat veşartin?

Cara berê li 15/09 an gava ku hevdîtin pêk bê bûyara **Colemergê/peyanusê** pêk hat 9 kesên sivîl jîyana xwe ji dest dan. Ji xeynî Demîrtaş û wezîrê dadê û cigirê serokwezîr xebera ti kesî ji wê hevdîtine tune bû. Nunerê Îstîxbaratê telefonê wan guhdar kirine û bûyara Colemêrgê pêk hat.

Dîsa ji bûyareka wiha ya bi wî rengî tirsiyan ji bo wê ji rayegiştî re negotin. Hevdîtin bi Selhatin Demirtaş, Gulten Kişanak û Hasîp Kaplan re 105 deqiqa ajot. Di atmosfereka baş û germ da derbas bû.

Belê hevalên hêja; va 85-90 salê ku em di nava xewneka wiha dabûn ku rojekê em nunerê dewleta Tirk re li masê rûnin hevdîtinan pêk bînin. Ew xewna Kurda îro pêk hat. Ez roja îro wek rojeka girîng dipejirînim.

PÊVAJOYEKA NUH DESTPÊDIKE.

Daxuyaniya Demirtaşa piştî hevdîtine: û wiha got: "Ev hevdîtin diviya beriya hefteyekê  pêk bihata. Lê ji ber bûyera li Colemêrgê hatibû taloqkirin. Em giringiyeke mezin didin hevdîtinên bi vî rengî. Hevdîtina me di vê çarçoveyê de pêk hat. Em hêvî dikin ku hemû pirsgirêk xizmetî çareseriyê bikin. Em dizanin tenê bi hevdîtinekê pirsgirêk nayê çareserkirin. Me xwest bi vê hevdîtinê bidin nişandan ku pirsgirêk bi rêya diyalogê dikare bê çareserkirin. Em dixwazin makeqanûnek nû bê çêkirin û pirsgirêk di vê çarçoveyê de bê çareserkirin. Me di hevdîtinê de pêşniyarên ji bo çêkirina makeqanûnê jî pêşkeş kir. Em dixwazin ev hevdîtin bidomin. Eger hevdîtin pêkneyên tu çareserî pêknayê. Em amadene ku ji bo aştiyê rol bigirin ser xwe”. "Em dixwazin, vê pêvajoyê vegerînin pêvajoya muzakereyan

Daxuyaniya cigirê serokwezîr C. Çiçek:

***RIYA ÇARESERIYÊ DIYALOG E.

***MAKEZAGONA NÛ ARMACA ME YA BINGEHÎ YE.

***KÊ BÛYERA COLEMÊRGÊ KIRIBE HOVITIYE





Cîgirê Serokwezîr û Berdevkê Hikûmeta AKP'ê Cemîl Çîçek ku di hevdîtina bi BDP'ê re kirî de cih girt piştî ku hevdîtin bi dawî bû daxuyaniyek da çapemeniyê. Çîçek wiha got: *“Ez dixwazim bala bikişînim ser du xalan. Ya ewil ew e ku wateyên pir taybet li van hevdîtinan nekin. Ev ne rast e. Şiroveyên gelek girîng li ser van hevdîtinan divê neyên kirin. Ev hevdîtin divê her tim hebin. Ne awarte ne. Hêviya min ew e ku diyalog di navbera hemû partiyan de pêk bê. Ev pirsgirêk ne tenê ya partiyekê ye. Li meclisê çê bû. Divê li Tirkiyeyê rûpelekî nû vebe. Di referandûmê de ev daxwaz hate ziman"*

Serokomarê Tirkiyeyê Abdullah Gul li Amerîka mesaja xwe da got; Gava ku pirsgirêka kurd bê çareserkirin, Tirkiye dê gelekî mezin bibe û bandora wê li ser cîhanê û bi gelemperî jî li Rojhilata navin zêde bibe. Lê alîkarî ji serok dewletê Amerîka xwasin jî bîr nekir. Gûl ji serok dewletê Amerîka Obama hê zêde alîkarî xwast ku ew bibin alîkar ji bo tavsiye kirina PKK e. Gul diyar kir ku divê di rêveberiyên herêmî de reform pêk bên û ev mijar dê bikeve rojeva parlamentoyê jî.



Rayedarê MİTê yê berê Cavat Oneş: Li İmraliyê hewldana çareseriyê hene.



Li Tirkiyeyê, rayedarê berê yê îstîxbaratê (MİT) Cevat Öneş got, derbari pirsgirêka kurd de, di navbera lîderê PKKê Abdullah Öcalan û dewletê de *"Bo aştî û çareserî hevkariyeke baş hene." "Bo danîna çekan divê xebateke cûda lê ya paralel hebe. Lewre, pêdiviya hewldana terorîstê ji çekan dûrxistin û beşdarikirina pêvajoya demokratîk heye. Em dibînin ku ev yek, ji hêla desthilatiya siyasî, civak û siyasetê ve hatiye qebûlkirin. Mixabin, em bi pêvajoyeke derengmayî dest pê dikin û me dem winda kir."*

Îro 24/09-2010 a ye.

Belê hevdîtineka girîng di navbera wezîrên hikumat û mepûsên Kurd de pêk hat. Duh dîsa hêvî dan me. Dîsa ji me re derew hatin rêzkirin, dîsa polîtîkayên xapandine kirin dewrê.




Birêz Ocalan di axavtineka xwe da wiha gotibû; “ *Ji bo çareserkirine vê pirsê ez îşqeka biçûk dibînî jî ez di dûv wê îşqê diçem û li ser wê bi roja lêkolînan dikim û dixwazim wê bizvrînim hêviya çareserkirina pirsa Kurdî”*

Îştê îro dîsa hêvî û îşqeka wiha li ber me vêxistine. Cîgirê serokwezîr C. Çiçek wiha dibêje; “ *Bes e êdî xwîn pir rijî. Divê va pirsa bêçareserkirin*” Lê meriv bi wan bawer nake.

Serokwezîr Erdogan jî sala çûyî gotibû; “*Bes êdî dayik negirîn. Tabûtê eskera nen, em dixwazin ji lorîkên çavê dayikan re bibin destmal*”

Pişt wî Serokkomar gotibû; “*Ji bo çarerserkirina pirsa Kurd tiştên baş pêk bêne*”

Lê piştî wê axavtine di nava salekê da gelek gund û daristan hatin şewita, bi sedan gerîla hatin şehîd kirin, bi hezaran şaredar û rêvebir, nunerên partiya DTP/BDP hat girtin û bi sedan zarokên temenê xwe 13-14-15-16 hatin girtin û li wan gelek îşkence hat kirin. Bi sedan operesyonê eskerî û operesyonên siyasî pêk hatin. Bi hezaran girtin binçav. Înşallah vê carê wek berê nabe.

Lê îro dîsa serokwezîr derket pêşberî rayageştî wek berê axivî; “*Ti kes ji me perewerda Kurdî ne pe. Ti kes nekeve baweriye wiha em bi serokê terorîsta û bi terorîstan re li masê rûnin û niqaşa bikine. Maalesef ti fantaziyê me wiha tunen. Eger xwastine hînî zimanê xwe bibin, ji xwe re qursa vekin*” Birêz Ahmet Tûrk dibêje; “*Îro gelek partî, rêxistin û rojnamevan bi serokwezîr bawer nakine. Em dê Kurd çava bi serokwezîr bawer bikin*”

Lê Kurda jî di cî da bersiv da serok wezir Erdoganê;

“*Tu jî li bendê nebe ku Kurdê dev ji perwerdeya bi Kurdî berdin!*”

Belê hevalên hêja; Îro mêvanekî Tirkiyeyê hêja jî heye. Wezîrê hundirî Almanyayê hundir



Thomas de Maiziere. Dîsa wek berê dosyê PKK e radestî wezîrê Alman kirin, bila îstîxbarata we li ser bixebitê. Lê nizanim wezîrê Alman kîjan dosya pêşkêşî wezîrê hundirî Tirkiyeyê kirin. Ew digel hev kardikin û îstîxbaretê didin hev. Wek du bira ne. Yek bê yekî nabe.

Piştî hevdîtine Wezîrê Hundirê Almanyayê Thomas de Maiziere çepeniyê re axivî wiha got: “*Helbet saziya îstixbaratê berpirsên (PKK) ên ku li Almanyayê dijîn baş nas dike û têkiliyên wan bi welatên di re agahdar e.*”

Belê hevalên hêja; gava wezîrê Almanya li Tirkiyeyê bû DMME jî biryara doza **Andrea Wolf** (Ronahî) ya PKK'î da û Tirkiye sucdar dît di benda 2'emîn xala **PMME**'yê îhlal kiriye mehkum kir.

Gêrîllaya PKK'ê Andrea Wolf (Ronahî) di 23'ê cotmeha 1998'an de li bejahiya Şaxê ya




Wanê di pevçûnekê de jiyana xwe ji dest dabû. Li gorî daxuyaniya şahidan piştî ku Wolf bi saxî hate girtin û şûnde bi saxî hate înfazkirin. Piştî cenazeyê Wolf hate dîtin, parêzera Wolf ê, **Eren Keskin**, li Dozgeriya Komarê ya Şaxê serlêdana suç kir. Doz bi biryara dizîbûnê bi encam bibû. Dayika Wolf Lîlo Wolf jî diyar kiribû ku keça wê hatiye înfazkirin di sala 2003'an de serî li DMME'ê dabû. Doza ku 7 salan berdewam kir bi encam bû. DMME'ê biryar da ku Tirkiye 2'emîn Peymana Mafên Miron a Ewropayê (PMME) a Mafê Jiyanê binpê kiriye û Tirkiye tawanbar kir.

Lê Tirkiyeyê jî dozek hebû. Doza serok **Ocalan, birêz Karayılan û Cemîl Bayik** bû.

Doza derbarî PKKê û Öcalan ket

Li Tirkiyeyê, doza PKKê ku Abdullah Öcalan, Murat Karayılan û Cemil Bayık jî di nav




de, derbarî 117 kesan de hatibû vekirin ji ber borîna demê ew doza ket.

Li gorî nûçeya NTVê, doza derbarî çalakiyên berê 1980ê ya 117 endamên PKKê ku ji hêla 8emîn Dadgeha Cezaya Giran a Enqereyê ve hatibû vekirin bi encam bû. Di ser dozê re 30 sala derbas bûye. Ew doz ket.

Belê hevalên hêja; Leyla Zana mepûsa DEP e bi hevalên xwe ve ji Başûr vegerîn . Lê gava ku ew hatin ber **Deriyê Xabur** bi hezaran jina ew pêşwazî kirin. “Em ji we re hezar carî spas dikin. Hûn me bi tenê cih nînin û hûn pî baskê me ne. Pas spas”




Leyla Zana, di derbarê ger û hevdîtinên xwe yên li Başûrê Kurdistanê diyar kir ku jinên kurd ji bo yekitiyek navneteweyî û mayînde berpirsiyara dirokî girtine ser milên xwe. Zana ragihand ku ji bo aştiyê çi ji destê jinan bê ew dê wê bikin. Min bi rêberên Kurda re jî hevdîtin pêk anî û ez bi dilekê xweş ji Hewlerê veqetîm.

Îro 26/09-2010 a ye.

Li qederê binêrê, Tirka qet ticara bawer nedikirin ku ew dê rojekê herin berlingê Mam Celal û Kek Mesut Berzanî. Li Tirkiyê Kîjan nûnerê dewletê û eskeran ji mala xwe radibûn wî/wê ew biçûk ditîn, bênirx û bêşahsiyet didîtin. Ew carna li avahiyên MIT e û carna li qereqola dikirin mêvan û bi wan henekê xwe dikirin.



Lê îro wezîr û Serokwezir diçên cem wan ji wan bi stûxarî mehçûbi alîkariyê dixwazin. Lê gava ku alîkariyê dixwazin di binê erdê ve diçên xar e. Ji ber kiryarên xwe duh ve fedî dikirin.

Alîkariya me ya PKK e bikin!

Gelek tengasî û zehmetiyê me li hember PKK e hene. Du rojan di ber wezîrê hundir gotibû, "*Ez dê di rojên pêş me da herim Hewlerê bi Mesût Berzanî re hevdîtina pêk bînim*".

-Birêz wezîr roj ne diyarê kîjan rojê herî hewlerê, Sibê an du sibê?

-Na na roj ne diyarê em li ser wê dixebit in.

Belê hevalên delal; ew ne bi serê xwe ne. Şîrikê wan hene, dewleta kur û dewleta Ergenekonê heye, ew ji wan ditirsin, ji wan ditirsin ku ew ê hevdîtine sabotê bikin. Cara berê gava wezîrên AKP bi mepûsên BDP re hevdîtina pêk bînin dewleta kur li Colemêrgê teqîn pêk anîn 9 welatparêz hatin şehîd kirin.

Hat zanin ku îro wezîrê hundir bi heyeta mezin çûne Hewlerê bi Kek serok Mesût Berzanî û serokwezîr Berhem Salîh re bi qasî sê seata hevdîtin pêk anîn.

Barzanî: "Ez amade me rola xwe bilîzim"

Barzanî û Atalay di hevdîtinê de behsa vekişîna PKK'ê kirine. Her wiha di hevdîtina sê seetan dewam kirîye, de mijara bingehîn PKK bûye. Di civînê de behsa xebatê PKK'ê yên

li ser sînorê Tirkiye û Iraqê, dirêjkirina agirbestê û pêvajoya demokratîk hatin guftûgokirin. Barzanî gotiye pêwîste PKK biryara bêçalakîtiyê dirêj bike.

Belê li hember PKK ketine tengasiyeka giran du-sê roja di ber vê wezîrê Almanî hundir li Tirkiyê bû. Bi lez û bez dosyayên ji derew û ji heqereta tijî pêşkêşî wî kirin. PKK e rêxistineka terorîst e. PKK e bi narkotîkê re têkiliyê xwe hene û bazara narkotîkê dike. Lê wî qehremanî jî dosyayê ji bo PKK e pêşkêşî wî kir. Nizanim di dosya wî da çi hebû.

Serokê MIT ê Hakan Fîdan ji bo mijara PKK e li Amerîka bû û bi gelek derûdoran re hevdîtin pêk anî ji wan ji bo tasviyê kirina PKK e alîkarî xwast. Du roja di ber ji Amerîka hatibû.



Lê gorî ku wezîrê hundir Beşîr Atalay gotî. “*Ew dê jî di demeka kin da here Hewlerê bi Kek Mesût re hevdîtinan pêk bîne*” Bêne rê!!!!

Li Tirkiyeyê mijara rojnamevan û ronekbir û mirovên rûspî PKK e bû. PKK e pêvajoya bêçalekiyê dirêj bike an na? PKK e hêzên xwe bikşîne dervayî sînor an na. Ew kişandina bi kîjan şiklê pêk bê. Rayagiştî çavê xwe berva hevdîtina **Aysel Tugluka** bi birêz Ocalan re sibê pêk bê kirine. Hevdîtin du cara hat asteng kirin. Belkî sibê jî bê asteng kirin.

Li Tirkyeyê wan bûyaran pêk tên, aliya eskerî jî amedekariyên xwe eskera li sînor bicih bike dikine û bi dewleta Îranê ve hevkariya bombe barandine li ser Kurda dikine. Îro sê rojin Îran bi ser gundên başûr de bomba dibarîne.

Belê hevalên hêja; werin em guh bidin ser nijadperast, qetîlê Kurda Arîf Dogan ka çi dibêje.

## Serê PKK'yiyekî 3 hezar lîre distandin

- Avakarê **JÎTEM**'ê yê ku ji doza Ergenekonê hatiye girtin û bi hinceta ku nexweşe serbest hatiye berdan, ji rojnameyekê re axivî. Dogan derbarê kirinên xwe yên gemar de agahî dan û wiha got: "*Me ji bo her PKK'iyekê ku dikuştî 3 hezar lîra werdigirtin. Hejmara PKK'iyên ku min kuştine, ez bi xwe jî nizanim. Tevî cerdevanan jî gelek endamên heneö bi qasî 10 hezar nunerê me yên JÎTEM'ê hebûn . Hemû ji dijminê PKK e bûn. Ji bo ku pera werbigirin gelek însanên bêsuç şivan û gavan dihatin kuştin* " (Foto General Arif Dogan, Velî Küçük/kuçik, Cem Ersever, sixûr Mahmut Yidlirim/Yeşîl)



*** Min JITEM ava kir.

***Ez ne poşmanim min JÎTEM avakiriye.




***Dema min Çatli dît, keça wezîrekî ji li cem wî bû.(Ez bawerim keça wezîrê hundir Mehmet Agar bû).

Belê hevalên hêja, Îro 27/09-2010 a ye

Di sala 1999 an da gava ku birêz Ocalan hat girtine li Gemlîk/Bursayê li ber lîmanê 30 rojî



artêşek rojnamavan, nûçevan û televizyoncû Tirk û bîyan konê xwe danî bûn li benda xebereka ji Îmraliyê bên bûn. Ew nobeta hetanî dawiya doza birêz Ocalan dewam kir. Piştî 11 salan îro dîsa ewqas rojnamevan ê nûçevanên biyan li Gemlîk/Bursa yê bûn. Ji ber benbanaga sibê da dest bi weşanên xwe kirin.

Îro piştî penç sala parêzera birêz Ocalana kevn mepûsa DTP ya ku mepûsiya wê ji aliyê dewletê ve ji dest wê hatî girtine çû Îmarliyê cem serok Ocalan. Elbet ew çûyina ne çûyine xwe ji dorê bû. Li ser navê KCD û bi destûra serokwezîr, wezîrê dadê Sadullah Ergîn bû.




Di sala 1993 an da jî Serok komarê ji aliyê Tirka ve hatî kuştine Turgut Ozal jî gelek cara heyet û rojnamevan şandibûn cem Ocalan û ji wî xwastibû ku ew dem bide wan. Lê di wê negheşt Ozal hat kuştine. Alanaiya wê kuştine hê jî didome. Hê duh kurê wî li ber dadigehê bû û xwastibû li ser kuştina wî lêkolîn pêk bên.

Parêzer Aysel Tugluk bi parêzerên din ve li seat 09:00 an li keştiyê sîwar bûn çûn Îmraliyê. Li seat 20:00 an da ji Îmraliyê vegerîn. Hê rojnamevan û nûçevan li benda wan bûn.

Min bi birêz Ocalan re hevdîtin pêk anî. “Hevdîtineka baş û êrênî bi birêz Ocalan re bû. Birêz Ocalan ji bo aşitiyê ramanên xwe diparêze û b ime re jî dibêje bi çar dest ali aşitiyê xwe di derkevin”.

Ocalan: Wê hewldana min jibo çareseriya aşitiyane bidome


- Hevseroka KCD'ê Aysel Tugluk, bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re li Girava



Îmraliyê hevdîtin pêk anî û vegeriya. Tugluk diyar kir ku wan bi Ocalan re hevdîtinek gelek girîng pêk aniyê û wiha got: "Me bi Birêz Ocalan re hevdîtin pêk anî. Ocalan di hevdîtnê de got 'dê ji bo pirsgirêka kurd li Tirkiyeyê bi awayekî demokratîk û aştiyene çareser bibe ked û baweriya min bi dome. Ji bo vê yekê jî divê hikûmet û dewlet ji bo çareseriyekî aştiyane û mayîn de vînekî çareseriyê dîne holê. Tirkiye di pêvajoyekî girîng de derbas dibe divê ev yek neyên hebakirin. Di vê demê de di serî de hikûmet, CHP, partiyên siyasî, rêxistinên sivîl ên civak, rewşenbîr û demokrat hemû kes berpirsiyar e.' Ocalan xwest hemû partî, saziyên sivîl û raydarên dewletê ji bo pêşeroja Tirkiyeyê di nava hewldanan de bin."

Em ji duh hê nêzîktira aşitiyê ne.

Ocalan got ku 'Ez ê ji bo pirsgirêka kurd li Tirkiyeyê bi awayekî demokratîk û aştiyan



çareser bibe dê di nav kedekê da bim.' Nêzîkahiya xwe wekî taktîk ne wekî stratejîk dibîne û divê rayagiştî jî vê yek wisa bizane. Di vê demê de di serî de hikûmet, CHP, partiyên siyasî, rêxistinên sivîl ên civak, rewşenbîr û demokrat hemû kes berpirsiyar e."

Belê ji Konseya Ewropayê mêvanê birêz Ocalan hebûn. Lê wan nikarî ji wezarata dadê destûrê werbigirin herin Îmraliyê.

Li ser navê Asambleya Parlementerên Konseya Ewropayê Heyeta ku di nav de Parlementerê Koma Sosyalîs a Luksemburgê Eydie Err, Endamê Koma Sosyalîst a Îngilistanê Jhon Auftin û Ji Koma Sosyalîst a Awusturyayê Albercht Concny pêk dihat, hate Stenbolê. Heyeta ku xwest der barê rewşa Ocalan de agahî werbigire çû Buroya Hiqûqê ya Asrinê. Piştî hevdîtinê serî li Wezareta Dadê da ku biçin Îmraliyê. Hate zanîn ku rayedarên wezaretê bersiva neyînî dane daxwaza parlementeran. Hate diyarkirin ku heyet wê ji bo çavdêriyan çend rojan li Stenbolê bimîne.

Belê hevalên hêja; Tirkiyê dixwaze ma PKK e dest ji şer berde, hêzên xwe bikşîne dervayî sînorê Tirkiyeyê.

Baş e. Tu wan dixwazî tu çima hê tezkera ji bo operesyona dirêj dike!Tu şer naxwazî. Îro sê-çar rojin li meclîsê ketine hewldana ku tezkerê dirêj bikin. Diçin Başûr li ber Kek Mesût digerin dibêjin, alîkariya me ya operesyona bike. Diçin Suryê alîkariya me ya li dijî terorê bikin. Ji bo vê di demeka kin da wezîrê hundir Atalay here Suryê û Îranê. Bi Îranê hevkariyeka mezin li dijî PKK e û digelhev herêmê bombe dikin. Va turşîye va çi lahanaye.

Îro 28/09-2010 a ye.

Belê hevalên hêja; li Ankarê trafixa dîplomasiyê gelek e. Îro mêvanê wezîrê hudir B.



Atalya Orgeneralê DYE'yê Austîn î ji ordiya Amerîkayî li Îraqê berpirsiyar hat Ankerê. Bi wezîrê hundir re 2 seata hevdîtin pêk anî. Mijar PKK e û listikê tasviyê kirina PKK e bû.

Dused metroyî li jêr wê hevdîtine, wezîrê parastin Vecdî Gonûl bi wezîrê parastineyî Îraqê

Casîm El Mafracî û Asîstanê cîgirê serok komarê Suryê Asistanı Korg. Hasan Türkmani re





hevdîtin pêk dianîn. "Li gel têkiliyên me yên gelek baş, em wê li ser mijara hebûna PKK'ê ya li Îraqê jî bi birêz wezîr re nîqaş bikin."

Mijar PKK e listikên li ser **Tevgera Azadiya Kurdîstanê** bûn.

Li avahiya MÎT e hevdîtin Aysel Tugluk a bi Ocalan re dihat nirxandin û mesajên birêz Ocalan dihat niqaş kirin. "Em ê çawa PKK e tasviyê bikin?"

Li avahiya serokfermanda mesaj birêz Mesût Berzanî dihat niqaş kirin.

-Gotiyê çi Mesût Berzanî?



-Êdî Kurd şerê hev nakin û Tirkiyê pêvajoya Boykotê bide berçavê xwe û PKK e jî pêvajoya bêçalekiyê dirêj bike. Operesyonên eskerî li herêma bên sekinandin û bombe kirina gundên me bê rawesatdin.

Civîn ne tenê li Tirkiyeyê pêk tê ne. Li Başr jî hene. Îro sê-çar rojin balyozxana Tirkiyê ji ber deriyê Mesût Berzanî ranabine. Duh jî nunerê balyozxanê li avahiya hikumatê bûn.

Serokê Balyozxanê Murat Özçelik, Aydın Selcen, bi Şefi Abduselam Reşit, Fuad Hüseyin, Felah Mustafa Mesût Berzanî re hevdîtin pêk anin.

Mijar PKK e û hevdîtina Aysel Tugluka bi Ocalan re bû.

Belê Tirk disa bi derew û durûtiya xwe polîtîka xwe ya li dijî Kurda dinyayê û Kurda dixapîne. Parêzera birêz Ocalan Aysel Tugluk ji got; " *Em ji polîtîk û helwesta Tirkiyeyê bi şik in, helwesta Tirkiyê ne zelalê, di tûrê wan da çareserkirin heye an tasviyê kirin heye em wê nizanin. Birêz Ocalan ramanên xwe ji bo aşitiyê wek duh diparêz e.*"




Rast dibêje; Kîngê Tirk rast axivîne ku îro rast bi axivin. Di ber balgiyê wan da hertim hilê û rûreşî, bextreşî û qeleşî heye.

Îro dadigeha Amedê li hevserokê BDP Selhattin Demîrtaş 10 mehê ceza birîn.



-Çi kiriye û kîjan derew kiriye Selhattin Demirtaş?

-Sê sala di ber vê Serokê Komela Mafê Mirovan (IHD) ya Amedê bûye, ji bo balê bikişîne ser rewşa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji Roj Tv de axivtin kiriye û pesna serokê terorîsta kiriye. Ji ber wê axaftinê ceza lê hatiye birîn.

Belê Boykota Kurda bi bandor bû û xwe re gelek buyarên baş pêk tên. Eşîreta JIRKIYAN dest ji cardavaniyê berdide. Ew jî Tirkiyê dide tirsandin.

Necman Adıyaman: *"Dest ji çek berdanê ne tenê eşîreta jîrkî jê berdide, ez gazî hemû eşîretên Kurd û yên herêmê dikim. Êdî çek bi kêrî ti tiştî nen. Nehlet bi ji çekan re. Ji bo ku ji aşitiyê re bibin alîkar divê em dest ji çeka berdin. Em bawerin ji aliya dewletê ve gavên çareserkirina pirsa Kurdî bên avêtin"*



Ew axavtin û gazî kirina Necman bi bandor bû. Li roja înê 175 cardavana çekên xwe radestî eskeriyê kirin. Duh jî 15 çardavana li Gewerê çekên xwe daynan.


Belê hevalên hêja; li Kurdîstanê gerîla hêzên xwe qismî kişandine der sînor. Lê esker bêşer ma ye. Lê operesyon pêk tên. Esker dest vala vedigerê qereqol, guh û pozên gerîla di destê wan da tunebû. Niha guh û pozê kera ji serokê xwe re anin. Duh li Şirnaqê bi qasî deh panzde kerh atin kuştin. Dibêjin ew ji terorîsta re çeka dibin û alîkarita wan dikin.



Îro 29/09-2010 a ye

Îro şeş rojin li herêma Şemzînan operesyon hene. Birêz Karayılan dibêje "*li dijî me jı bo şer seferber bûne. Li herêma Oramarê operesyon hene û gelek esker li herêmê tên bi cîh kirin. Dixwazin li dijî me povakasyonan bikin. Lê herêmê tîmên taybetî cîlên gerîla li xwe kirine digerîne*"

Birêz Ocalan li Îmraliyê di mesaja xwe da gotibû; " *Dewletê herêma Colêmergê ji xwe re wek herêma pîlot bijartiyê, divê hûn bi dîqet bin"* Birêz Karayılan *jî gotibû; Dewlet herêma Colemêrgê wek dijmin nîşan daye"*



Wezîrê hundir B. Atalya duh girîk biçûya Suryê lê neçû. Li dewsa Suryê bi heyeteka giran Parlementerên AKP'ê yên Colemêrgê Abdulmutalîp Ozbek û Rustem Zeydan, Midûrê Giştî yê Polîsan Oguz Kagan Koksal, Musteşarê Wezîrê Karên **Hûndir Osman Guneş**, serokên Daîreya Têkoşîna bi Terorê û Îstîxbaratê yên Midûriyeta Giştî ya Polîsan, hatin Colemêrgê. Li Şemzînan, Gewerê. Lê ji aliyê gelê Şemzînanê ve ji bo bûyara Paynîsê hat şermezar kirin.

-Wezîrê hundir çima li dewsa Suryê çû Colemêrgê?

-Tirsa wan hat xuya kirin. **Eşîreta Jîrkiya** safên xwe guherandin. Ew niha ne dostê Tirka û dewleta Tirk in. Ew niha BDP lî ne. Beşîr Beg ji bo wê hat dilê Jîrkiya bigire. Aman me li herêmê bi tenê cîh ninin. Em ji we rica dikin.

## Ocalan: Divê du protokol pêşkêşê Meclîsê bêne kirin




Rêberê Gelê Kurd Ocalan roja Duşemê bi hevseroka KCD'ê Aysel Tugluk û parêzerên Buroya sedsalê re havdîtin pêk anîbû. Di hevdîtinê de Ocalan bal kişand ser van xalan:

*"Ez encama van hevdîtinan, weke 2 protokolên ku du alî li ser li hev bikin, dinirxînim. Yek jê protokola di warê ewlekariyê de ye, a din jî protokola mafên demokratîk û destûra bingehîn e. Ji bo vê yekê bingeha rewşa qanûnî heye. Bi vî awayî mirov dikare van protokolan piştî hilbijartinê pêşkêşî parlemenê bike."*

## DIVÊ KOMISIYONA DESTÛRA BINGEHÎN Û LÊKOLÎNKIRINA HEQÎQETAN BÊ SAZKIRIN

Ocalan di vê pêvajoyê de girîngiya sazkirina 2 komisyonan jî anî ziman û wiha got:

"Du komîsyon dikarin bên sazkirin; yek jê, komîsyona amadekariya Destûra bingehîn e. Ez vê gavê behsa komisyona heyî ya li parlemenê nakim. Rol û wezîfeya wê cuda ye. Ev komisyona ez behs dikim, piştî nîqaşên li ser destûra bihgehîn a nû, li gorî encamên derketine holê, dikare raporekê amade bike û piştî hilbijartinan pêşkêşî meclîsa nû bike.

A duyemîn; Komîsyona Lêkolînkirina Heqîqetan e. Evê jî bûyerên weke yên Colemêrgê yên kiryar nediyar, Ergenekonê lêkolîn bike, li ser disekine û berpirsiyaran derxe holê. "

## DIVÊ KURD DESTÛRNAMEYA XWE AMADE BIKIN

Ocalan, dema hilbijartinên giştî yên Tirkiyê jî bibîrxist ku li pêşiya me 8 meh hene, û divê ev dem neyê hebakirin. Ocalan xwest Kurd ji niha ve li ser Destûra bingehîn a nû bixebitin û got: "*Li ser Destûrek bihgehîn ya Katalanan xebatek heye. Dikarin xebatên wisa ji xwe re mînak bigrin. Kurd lazime ji niha ve pêşniyarên xwe yên ji bo destûra bingehîn ya nû amade bikin. Ji bo vê yekê lazime bi şev û roj bixebitin, komisyonên xwe saz bikin, çarçoveya Destûra Bihgehîn a xwe çê bikin. Li ser vê mijarê divê amadekariyeke wan a pir xurt hebe*."

## HEVDÎTIN LI SER NAVÊ DEWLETÊ BI MIN RE PÊK TÊN

**Ocalan careke din anî ziman ku li ser navê dewletê bi wî re hevdîtin pêk hatine.**

Rêber Gelê Kurd Ocalan got; kurd dikarin bi CHP'ê re jî hevdîtinan pêk bînin: "Pêvajoya pêş dikeve projeyek dewletê ye, ne tenê ya hikûmetê ye. 8 mehên li pêşiya me gelek girîng in. Ez niha têm ser mijara kesên ku dibêjin 'ji bilî AKP'ê ti alternatîf tineye.' Ev demek e ez CHP'ê dişopînim. Bandora Baykal hê heye, lê bi hatina Kiliçdaroglu re, hin nîşaneyên guhertinê xuya dikin. Ez nizanim ka tê de wê ti guherîn pêk bên an na. Ji ber vê yekê divê bi CHP'ê re danûstendin bên kirin. Tirkiye û dewlet ne tenê ji AKP'ê pêk tê. Raste, AKP'ê di nava dewletê de xwe de xwe bicih kiriye, lê ew ne tevahiya dewletê ye. Hevdîtinên li vir çê dibin li ser navê dewletê ne. Hewce nake kes bitirse, ev projeyeke dewletê ye."

## LÊGERÎNA ME YA BIRATIYÊ STRATEJÎK E EMÊ DEV JI VÊ KEDA HETA NIHA BERNEDIN

Ocalan di hevdîtina xwe de bal kişand ser îdîayên cihêkariyê jî û ev bersiv da wan kesan:"Em di nava yekparebûna Tirkiyê de li çareseriyê digerin, weke ew dibêjin em ne li pê cihêkariyê û veqetînê ne. Têgeha me ya biratiyê û yekîtiyê stratejîk e. Di sazkirina Şaristaniyên li ser van axan tevan de keda me jî heye. Gelek keda bav û kalên me di van de heye. Tê zanîn prototîpa ewil a Kurdan Hurrî ne. Gutî, Mîttanî û Medî bav û kalên me ne. Ji ber vê yekê em nabin cihêkar. Di sazkirina şaristaniyan de, di dîroka 4 hezar salî de keda bav û kalên me heye, em li vê kedê, vê dîrokê xwedî derdikevin. Em nikarin dev ji vê keda ku heta niha kom bûye berdin, emê bernedin jî."

## DIVÊ LI HER TAXÊ YEKÎNEYÊN PERWERDEYA KURDÎ BÊN AVAKIRIN

## TALUKE JI BO HEMÛ KURDAN E, DIVÊ PERGALEKE HEVPAR A PARASTINÊ AVA BIKIN

Ocalan li hemberî talukeyan, bal kişand ser pêwistiya yekitiya netewî û pergala parastina hevpar û wiha got*:"*Heta pirsgirêka li bakur çareser nebe, wê pirsgirêka li başûr jî çareser nebe û wê ti kes ne di bin ewlekariyê de be. Eger başûrî vê fêm bikin wê baş be. Divê ew fêm bikin ku, taluke ji bo hemû kurdan e û gelek mezin e. Ji bo vê ez behsa Konferansa Netewî dikim. Divê pergaleke parastina hevpar a karibe hemû kurdan biparêze were avakirin."

"Ocalan bi bîr xist ku Erdogan ji bo 10 gerîlayên di 6'ê îlonê de li Colemergê hatibûn qetilkirin gotiye, haya wî jê nîne û ev bang li wî kir:"Erdogan nikare bi gotina, haya min jê nîne, artêşê kiriye', xwe rizgar bike. Rast e, berê di navbera AKP û artêşê de nakokî û pevçûn hebûn. Lê belê di dema Buyukanit de pêvajoya lihevkirinê dest pê kir. Bi Başbûg jî dewam kir. Herî dawî jî di civîna YAŞ'ê de, AKP û artêşê bi temamî li hev kir. Ji ber vê armana gotina 'haya min jê nîne, artêşê kiriye' xapandinek e."

BÛYER COLEMÊRGÊ GELEK GIRÎNG E, DIVÊ WERE RONÎKIRIN


HEGEMONYA NÛ JI YA ERGENEKONÊ TALUKETIR E

Îro 30/09-2010 a ye.



Îro çend rojin rayegiştiya Tirkiyeyê û Ewrûpa xwe dayê benda bersiva ku **ji Ocalan û Qandîlê** ji bo pêvajoya bêçalekî bê dirêj bê an na. Îro ew bersiva Ji aliya Karayılan ve hat.

ME LI SER DAXWAZA RÊBER APO PÊVAJO BÊÇALEKIYÊ MEHEKÊ DIRÊJ KIR**.** *"Ger di meha pêşiya me de hewldanên aşitiyê yên bi ewle yên du alî pêş bikevin, wê ji xwe pêvjavo bibe agirbestek mayînde. Berovajiyê wê, wê nirxandinek nû bê kirin". :"Em difikirin ku di pêvajoya heyî de, em ji her demê zêdetir nêzî çareseriyeke mayînde ne. Divê were zanîn ku rola rêbertiya me di dirêjkirina biryara bêçalakiyê de, diyarker e."* Ew nuça wek nûçaflaşşş li hemû medya hat weşandin.




Hevserokê KCD Ahmet Tûrk; Em bi dirêj kirina bêçalekiyê kêfxweş bûn. Lê, *"*Divê êdî refleksên demokratîk bikevin dewrê, aşitî yek alî nabe. Herdu alî jî ji bo aşitiyê nexşeya xwe ya rê bidin ber xwe. Diyalog pêk bên. Aliyê hikumatê jî baweriyê bide. Dewlet jî hinek gavan re amede be. Em ji vê baş dizanin eger çekdarên PKK e hêzên xwe bikşînin dervayî welêt, dengê çeka bê birîn. Lê divê ne yek alî du alî be*'*.

Belê, wezîrê hundir hê bi heyeta eskerî û ewleyê/emniyetê ve li herêma Colêmêrgê. Serokwezîr çû karargaha serleşker Îşik Koşaner,ew ji bûyara agahdar kir, bi Koşaner re du seata hevdîtin pêk anî.

Mijar PKK e û bêçalekî heyeten ji Amerîka, Suryê û Îraqê hatibûn.

Lê di ber wî generalê Amerîkî û wezîrê parastineyî Îraqê jî bi Koşaner re hevdîtin pêk anîn. Mijar PKK e û bêçalekiya PKK e bû. Lê mijarê herî girîng em di gel hev li dijî PKK e kîjan tevdîra werbigirin.

Li rojnamevanê **Radîkalê** yî nêzika eskeriyê Murad Yetkîne; *Dest bi avakirina herêma tempon tê kirin 'DYE piştgiriya werîsê ewlekariyê ya li ser sînor dike."*



Werîsê/şerida ewlekariyê ku wê li ser sînor bê danîn û wê derbasbûna gêrîllayan asteng bikin, Emerîkayê piştgirî daye, jibo pêkanîna wê tenê biyara erêkirinê ya hikûmeta Iraqê ku wê nû bê avakirin maye.

**Murat Yetkîn** di derbarê 'herêma tempon' de nivîsand û diyar kir ku rayedarek yê DYE gotiye; "Sê beşên hevkariya me ya bi Tirikiyeyê re ya li dijî PKK'ê hene: 1- Em di agahiyên di derbarê tevger û faliyetên PKK'ê de didin Serfermandar, 2- Em piştîgirî didin peyama ku Tirkiyeyê dayî Barzanî û jibo peyam baş bê famkirin em hewl didin, 3- Jibo diyaloga ewlekariya 'astengker' ya di navbera Tirkiye û hikûmeta navendî ya Iraqê de pêş bikeve, em alîkarî didin."

Piştî wan heyetên biyan, serokê MIT e Hakan Fîdan jî çû agahiyên xwe yên li Amerîka û li Başûr ji derbarê PKK e da ji wî re ragihandin.



Belê hevalên delal; Kevneserokê Daîreya Kontra terorê yê rêxistina îstîxbarata Tirkiyeyê **MİTê** Mehmet Eymür analîz dike û dibêje; hevdîtina bi Ocalan re di nava îstîxbarata Tirkiyê de kesên ku dixwazin çareserkirina pirsa kurd asteng bikin gelek hene.

Eymür got; "*Bi ya min, di nava rêxistinê de yên ku li dijî hevdîtinan derdikevin û dixwazin sabote bikin hene."*

Eymür got, “*Yên ku dibêjin ‘em hevdîtinan bidomînin’ hene, yên ku dibêjin ‘divê hevdîtin nebe’ hene. Yên ku bêjin ‘em sabote bikin’ jî dê hebin. Li her derê faktora mirovan wekî hev e.*”

Eymür bal kişand li ser îhtîmala ji hêla hêzên navneteweyî ve asteng kirina lêgerînên aştiyê û got, divê hevdîtin bi rêya servîsên veşartî bêne meşandin.




Belê hevalên hêja; avahiya sivila bi navê Seroka Civata Rêvebir a Komeleya Pîşesaz û Karsazên Tirkiyeyê (TUSÎAD)

Ümit Boyner jî li 14/10 an rêviya Başûr e. Wê jî pariyê bi rûn li Başûr dît. Mehekê di ber vê jî jina serok komarê Tirkî ji aliyê JITEM ê ve hatî kuştine bi Semra Ozal bi kurê xwe ve mêwanê Kek Mesût bûn.

Di meha hezîranê da jî **Umut Boner** bi serok **Mesut Berzanî** re hevdîtin pêk anî bû. Umut xanim li pirsa kurdî û perewerda Kurdî jî erênî dinêr e. Divê dewlet li perwerda Kurdî erênî binêr e.

Îro 01/10-2010 a ye.

Belê hevalên hêja; Li Tirkiyeyê nunerên hikumatê di serî da serokwezîr Erdogan, cîgirê **serokwezîr Cemîl Çiçek**, wezîrê hundir **B. Atalay** carana rola polîsê baş û carna jî rola polîsê xirab dileyzin. Meriv demekê bi gotin û axavtinên wan ê baş dikeve nav hêvî û xeyalên mezin û carna jî meriv hursan dibe û mista xwe diguwişê dibêje nehlet be ji te û ji derewe te re we re. Lê ew gotineka me Kurda heye dibêjin

***“ Gotinên Tirka ye wek tirê bizinane, ti kes li qusura wan nanerê”***

Bi rastî jî wiha ye.



Îro sezona vekirina meclîsa Tirkiyê bû. Berî ku meclîs vebibe serokê qanuna bingehî Haşim Kiliç li avahiya xwe axavtin kir got; *" Divê di qanuna bingehî da ew hersê xalê ewil em dikarin bên nerm kirin, divê ew ji me re nebin xelên me sor"*

Lê piştî nîv seata ji gotina xwe paş ve gav avêt. "*Rayegiştî ez şaş fem kirim, armanca min ne ew bû*" **Tir yek!**

Gava ku wî ew axavtina kir serokfermandar û nunerê din ê dewletê ji paya bilind û saziyên sivîl jî hebûn. Axavtina wî ji aliyêhev serokên KCD Ahmet Tûrk û Aysel Tugluk û hevserokên BDP Selhatin Demirtaş û Gulten Kişanak ve jî erênî hat pêşwazî kirin.

Lê ve carê jî dora axavtina serok komar Abdullah Gûl bû.



Di merasima vekirina sala nû ya parlamentoyê de ku bi awazyekî zindî li Mecli TVê hate weşandin, hemû parlamenter, rayedarên leşkerî yên bilind, rayedarên darizê û gelek mêvaên biyanî jî amade bûn.

Gul wiha axivî, "*Ji ber ku me pirsgirêkên xwe yên duh çareser nekiribû, ew pirsgirêk heta roja îro jî mane. Egere em îro jî çareser nekin dê wekî mîrate bimîne ji bo nifşê din. Ji ber wê, divê demokrasiya me hertim pêş bikeve û reform jî berdewam be. "Divê destûra nû bi beşdarbûna hemû aliyan bête çêkirin. Girtina demdirêjî divê neveguhêre cezayê. Pirsgirêka kurd di zemîna demokrasiyê de bête çareserkirin."*

Serok Komar Gûl behsa pirsgirêk kurd jî kir û diyar kir, divê ev pirsgirêk dûrî tundiyê û bi şêwazên demokratîk bê çareserkirin.

Axavtina Gûl jî ji aliyê Kurdan ve erênî hat û pêşwazî kirin.



Belê hevalên hêja; Hevdîtina nunerên dewletê bi Ocalan re him rayegiştiya Tirkiyê û him jî rayeiştiya cîhane kêfxweş kiriye.

Xwediyê xelata Nobelê Serokê Afrika yî olî Desmnd Tuttu kêfxweşiya xwe ji Afrika de ragihand.

Li gor rojnama Taraf: Ku Apo dê azad biaxive........

Eger Ocalan serbest bê berdan, gelê Tirkê Ocalan hê baş fêm bike, ku ew çi dixwaze li ber çi tevne yê, helwesata wî çiye. Mirovekî hatî girtine meriv raman û fikrên wî baş nizane.

**Bêçalakîtî/Operasyon**

Lê operesyonên eskerî li herêma çiyayê Kato û herêma **Xakurkê** didomin. Herêm ji aliya balafirên Tirk ve tê bombe kirin.




Îro danê sibê hêzên ewlekariyê li gelek bajar û bajarokên Kurda avêtê ser avahiyên BDP ê. Bi tenê li Rihayê û 4 bajarokên Rihayê operasyon pêk anîn û di encamê de hevserokên şaxa Partiya BDP ya Rihayê Adîle Fîdan û Îbrahîm Ayhan jî din av de 42 kes hatin binçavkirin. Wan bi nuneritiya KCK ê tewanbar dikine.

Li Şirnexê Endamê Meclisa **Şaredariyê Halît Çakan**, dema ji bo îfade dayînê çû Dozgeriya Komara Şirnexê hate girtin. Bi girtina wî girtiyên li Hêjmara girtiya li Şirnaxê xwe gehşt 8 an.

-Çima hatin girtine?

-Alikarî bi PKK'ê re kirine ji bo wê.

-Pekî hikumat bi nunerê îstîxbaretê ve bi serokê PKK e Ocalan re hevdîtinan pêk nîne?

-Tî ne. Lê we xer e? Li listik û provakasyona digerin

Were ji we re provakasyonek.

**Li Dîlokê teqîn**: Li Dîlokê di dema derbasbûna wesayîta polîsan de teqînek pêk hat, di encam de 2 polîs birîndar bûn.

-Kê kir?

-Elbet nunerê dwleta kur.

Piştî wê teqîne, teqînek ji Çelê/Çukurce hat. Li hewşoyê dibistanê bombe teqîn.

Belê, Serokê BDP li resepsiyona vekirina meclisa Tirk bû, bi serokwezîr re li ser pîya hevdîtin pêk anî. Di wê hevdîtinê da Demîrtaş ji Serokwezir behsa girtina nunerê û hevserokên wan ê li Rihayê û bajarokên wan hatî girtine kir.

-Va çiyê?

Tirka, Farisa û Ereba xwe wek gurên birçî danê benda ku Amerîka hêzên xwe ji Îraqê bikşîne û êrîşa ser Kurdîstana Başûr bikin. Kek Mesût îro du rojin li payetxta Îtalyayê û daxuyanî da **got.** **“***Amerîka ewleyî dayê me ew dê li Kurdîstanê hêzeka xwe ya giran bi cîh bikin***”**



-Rojnamevan Rocca birêz Mesût Berzanî, tu amerîka li herêma we çawa dibînî?

-Em Amerîka wek xelaskarê xwe dibînin. Gava ku Îtalya û Ewrûpa ji dîktetor Musolin xelas bû bîhneka kur kişand. Gava ku bi alîkariya Amerîka Îraq ji dîktator Sadam Hiseyin xelas bû gelên li Îraqê dijîn jî bihneka kur kişandin.

Di çapemeniya biyanî de biryara bêçalaktiyê




- Biryara dirêjkirina bêçalaktiyê ku ji aliyê KCK’ê ve hat dirêjkirin di çapemeniyê de cihek girîng girt. Ajansên navnetewî nûçeyê bi awayê flaş ji aboneyên xwe re ragihandin.

Ajansa Associated Press: bi sergotara “Serhildêrên Kurd li dijî Tirkiyeyê agirbest dirêj kir” belav kir û bal kişand ku Murat Karayılan gotiye ger Tirkiye hinek pêngavan biavêje, wê bêçalaktî bibe agirbestek mayînde. Her wiha di nûçeyê de tê gotin ku Tirkiye berê bersiva tu agirbestên PKK’ê nedaye.

Ajansa Reuters: Nûçeyê bi sergotara “PKK’ê jibo mehek din agirbest ragihand” weşand û diyar kir ku jibo PKK biryara bêçalaktiyê bide, hevdîtinên bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah yên ji aliyê dewleta Tirk ve cesaret daye.

Nûçe cih dide gotina Murat Karayılan ku dibêje; “Ev diyalogên dawî pir girîngin û jibo aşitiyê şans pêşkêş dike” û her wiha bal dikişîne li ser bangên jibo berdweamkirina hevdîtinan yên bi Ocalan re û yên jibo destûrek din ya bingehîn.

Ajansa AFP: AFP jî cihek berfireh da nûçeyê û bal kişand li ser daxwazên PKK’ê yên jibo hikûmeta Tirk.

Rojnameya Express ya Franse: Bi sergorata "PKK’ê agirbestê jibo mehek din jî dirêj kir” belav kir, bal kişand li ser biyara bêçalaktiyê ya ku 13’ê tebaxê hatibû dayîn û cih da daxuyaniyên **Murat Karayılan** yên di derbarê pêkhatina agirbestek mayînde de.

Di çapemeniya Elman û Înglîz de jî cihek girîng girt. Rojnameyên navnetewî nûçeyê spartin ajansa û biyara bêçalaktiyê bi raya giştî re par vekirin.

Der Standart: PKK'ê şansek din da Tirkye yê

Dirêjkirina bêçalaktiyê ya ji aliyê KCK'ê ve, bi **"PKK hêviya bi hikûmetê re dike"**

**Focus**: PKK'ê jibo pêbaweriya ewlekariyê agirbest dirêj kir

Kovara Focus ku yek ji girîngtirîn kovarên Elmanyayê ye û nûçeyên heftane belav dike, dirêjkirina bêçalaktiyê ya ji aliyê KCK'ê ve hatî dayîn şîrove kir. Kovarê bal kişand ku jibo agirbestek mayînde pêk bê "Serhildêrên Kurdan" li benda pêngavan e û got; "Wê mehek din jî di navbera Artêşa Tirk û Milîtanên PKK'ê de çek bêdeng bibin."

Kovara Focus diyar kir ku daxwazên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li ber çavan hatine girtin û bal kişand li ser şert û mercên Serokê Konseya Rêveber Murad Karayılan jibo agirbestek mayînde di daxuyaniyê de rêz kirî. Kovarê bi bîr xist ku PKK'ê ji meha tebaxê û vir ve navber daye çalakiyan û wiha şîrove kir

Îro 02/10-2010 a ye.

Niha dem û dor li provakasyon û sabote kirina pêvajoya bêçalekiyê. Bûyara li Colemêrgê




provaksayon bû. Bûyara Mêrdîn di sala 2009 an da li gundê bîlgê ku 40 zar û zeç, pîr û kal

hatî kuştine provakasyonek bû. LÊ niha dîsa li provakasyona digerîne.

KCK li roja pençşemiyê pêvajoya bêçalekiyê li ser daxwaza birêz Ocalan dirêj kir. Li aynî rojê esker derketin operesyona li Şemzînanê eskera pêla maînê kir

û du esker birîndar bûn. Dora dina rojê li Rihayê û li Şirnaqê operesyonên siyasî destpê kir li çar bajarê Rihayê 42 rêvebir û hevserokên BDP wek nunerê KCK hatin girtin. Li Şirnaqê jî heyşt kes û li Akçelê din av da şaredar û gelek kes hatin girtin.

Serokê BDP birêz Selhattin Demirtaş jî serokwezîr pirsî got; operesyonên li dawiyê me didin guman e. Parêzer û mepûsa DTP berê Aysel Tugluk jî dest nîşan kir ku dewlet di vê warî da ne ciddiyê, em jî helwesta hikumatê bi gumanin.

ev serokê **KCD birêz Ahmet Tûrk** jî îro ew fikar û gumanên xwe anin ziman. Bi van operesyonan dixwazin pêvajoyê sabotê bikin.

### KCD: Eger wiha biçe hûn jibo aştiyê kesekê peyda nakin



- Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) bertek nîşanî operasyona binçavkirinan ya li Rihayê li dijî BDP'ê û saziyên civaki pêk hat da û wiha anî ziman "*Pirsgirêka Kurd bi muxatabên wê û bi diyalogê tê çareserkirin. Eger hûn nûnerên Kurdan wiha binçav bikin. Hûn ji bo aştiyê çi kesî peyda nakin. Li 14 nîsanê jî wiha kirin û bi hezaran hevalên me 18 mehene di girtingehê da ne*."

### Provakasyona duyemîn jî *"Li Çelê teqîn: 2 leşker birîndar"*

HPG`ê bîlançoya şer ya meha Îlonê eşkere kir.

Li gorî bîlanço yê artêşa Tirk **25 operasyon** lidarxistine û di **13 deverande** şewat derxistine. Di pêvajoya bêçalakîtiyê de, gerîllayek dîl ketiye û **13** gerîllayan jî divê mehê de jiyana xwe jidest daye û 20 leşker jî mirine. HPG`ê da diyarkirin ku, rexmî biryara bêçalakîtiyê operasyon didomin û eger êrîşek liser me pêkbê em ê mafê xwe yê parastinê bikar bînin. 6 caran êrîşên hewayî û 41 caran jî bi bombeyan êrîş kirine. 20 leşkerên artêşa Tirk mirine.

Va provakasyon sabotê kirina.

ONLINE EDITION JERUSALEM POST

birêz Murad Karayılan re hevdîtin pêk anî jî şirove dike û dibêje; "Tirkiyê û di serî da serokwezîr Erdogan; *Li dijî lîderên PKK e di amedekariya operesyoneka mezin da ne. Li 18/09 an wezîrê Îranê li Tirkiyê bû. Li ber medya hevdû maçkirin en vala bû. Li ser operesyoneka wekî li Sir Lanka pêk hatî bikine û i çareserkirina wiha*".

Îro 03/10-2010 a ye.

Belê 30 salê ketine dûv tasviyê kirina PKK e li tasviyê nekirin. Bi xwe jî dizanin PKK e




organîzasiyoneka mezine tasviyê nabe. Di sala 2005 an da gava Serokwezir Erdogan bi serok dewletê Amerîka Bush re hevdîtin pêk anî û Bush gotibû PKK e dijminê me jî dijminê wê jî. Gava ku ew piştgiriya ji Amerîka wergirt pêvajoya tasviyê kirine hê jî zêde kirin.

Lê va qirara mehekê Serokwezir, wezîrê hundir û wezîrê dadê ji bi tasviyê kirina PKK e ti dewletên ku serî lêdan neman. Ti ne yarên PKK e serî lênedayî neman. Hinek bezin Suryê, hinek bezin Îran û serokê MÎT e bezî Amerîka, wezîrê dadê bezî Rusya. Hinek bezin Ewrûpa cem serokê **PSK** yî kevn **Kemal Burkay**, serokê **PKDW** berê **Yaşar Kaya.**

Nunerê dewleta Tirk Hewler ji xwe re kirin hela malê. Herkes çû berlingê Kek Mesut û Mam Celal. Em bi biçûyina wan a berlingê Mam Celal û Kek Mesût şa dibin.




Lê îro gelek avahî û nunerê hikumatê û medya Tirk kek Mesût Berzanî gelek dipaesandin.


-Çima?

-Kek Mesût îro sê-çar rojin li Îtalyayê ji deweletên Ewrûpî xwastiye ku ew Tirkiyê bigirin nav xwe, Tirkiyê welatekî Ewrûpî bûye.

Ji bo wê dibêjin Mesût Berzanî mirovekî hiş li serî, mirovekî giran e. Ez vê bêjim ew ê rojekê ji birêz Ocalan bipesînin.

**Hevalên delal**, warin em guh bidin ser rojnamevanê Tirkiyeyî bi nav û deng ka ji bo PKK e çi dibêje;

PKK, Serhildanên Kurd, nasîna rast û dermankirina rast (Cengiz Çandar – Radikal)



Nivîskarê rojnameya Radikalê Cengiz Çandar, di nivîsa xwe ya îro de, li ser pirsa kurd, tevgera PKKê û çareseriya li gorî demê radiweste. Beşek ji nivîsê wiha ye:

*"(...)* Ger mijara PKKê, tenê têkoşîna hemberî yek rêxistinê bûya, pirsgirêk heta niha zû hatibû çareserkirin. Artêşa Tirk, di nava NATOyê de artêşa duyem e û dewleta Tirk jî her tim xwe di nava rêxistinê de bi cih kiriye. Li aliyê dîtir PKK ji hêla Ewropa û DYAyê wek rêxistina terorîst jî hatiye binavkirin. Lê li gel van hemûyan rêxistina ku bi çend çekan û çend hezar kesan pêk tê têkneçû. Ev jî nîşan dide ku divê PKKê bes wek rêxistinekê dîtin nasîna nerast e.

Divê bi awayeke rast bête binavkirin û em bi serhildana kurd re rû bi rû ne û di dîrokê de gelek caran hatiye dîtin û em jê ne xerîb in.

Tenê di dîroka Komarê de behsa 28 serhildanên kurd tê kirin. Hemû bi xwînî hatin pelixandin û lîderên serhildanan hatin bidarvekirin.

PKK ji tevahiya van herê serhildanan Ararat, Şêx saîd û Dersimê hê mezin, hê demdirêj û hê berfireh e. Ferqeke dîtir a vê serhiladanê jî lîderê wê nehatiye kuştin û tevger jî têkneçûye.

Ligel van hemûyan çareserî ne hêsan e. Sebr, dem, îradeya siyasî, wêrekiya siyasî, sebra demokratîk, afirînerî, têgihîştin û gelek taybetmendî bo çereserkirinê dixwaze. Bi bergiriyên ewlehiyê pirsgirêk nayê çareserkirin. PKK ji ber vê agirbesteke mayînde îlan nekir û mehekê dirêj kir. Dema rêbazên nû ye.”

Belê herkes li benda provakasyona ye. Îro BDP yî bi hezaran li kolanên Rihayê bûn ji bo piştgiriya hevalên xwe hatî girtine. Hevserokê KCD Ahmet Tûrk û Sirri Sakik bi girseyeka mezin li Muşê bû. Du eşîretê ku bi salan li hev xeîdî û dijminatiya hev dikirî **Sıritiyan û Şêxani** li hev anîn. Birêz Tûrk tiştên baş dike, heftê borî jî li Mêrdînê bû eşîreta xwe bi eşîreta Temellî ve li hev anî. *“Eger em husamet zik rêşiyên nav xwe bi dawî bikin, em ê hê hêsantir bighejin aşitiya xwe.”*




Belê operesyon û rûreşiyên Tirka ki dijî gerîla didomin. Li Şemêzînan tevgera helîkopteran

Li navçeya Şemêzînan ya Geverê ji danê sibê ve tevgera helîkopteran ranewestiyaye.

Helîkopterên ku ji Geverê tên berê xwe didin sîron Îranê. Tevgera helîkopterê bi tevahiya rojê dom kir.



Belê îro dîsa li Suriyê li hev civiyan, em ê çawa PKK e tasviyê bikin û kîjan tevdîran webigirin. 11 wezîrên tirk li Sûriyeyê ne. Wê Civîna Bilind ya Strajîk ya Hevkariya Tirkiy yê û Sûriyeyê, îro li bajarê Lazkiye yê Sûriyeyê bê lidarxistin. 11 wezîrên tirk beşdarî civînê bibin.

Hayati Yazici, Cevdet Yilmaz, Zafer Çaglayan, Wezîrê Derve Ahmet Davutoglu, Wezîrê Çakçaniyê Enerjî Bakanı Taner Yildiz, Wezîrê Avadanî Mustafa Demir, Wezîrê Parastinê Vecdi Gonul, Wezîrê Navxweyî Beşîr Atalay, Wezîrê Gihandinê Binali Yıldırım, Wezîrê Çandinî Mehdi Eker, Wezîrê Hawirdor û Daristanan Veysel Eroglu. Hat zanîn ku wê di civînê de behsa bendava Dostuk/Kemera ewlekariyê ya ku wê li ser çemê Asî bê avakirin niqaş bikine. Ew dê şawa PKK e tasviyê bikine û li derên PKK e çawa bikine niqaş bikin.

Belê hevalên hêja; avakêrê JITEM e Arif Dogan roja înnê jî li ber dadigehê bû. Berî ez nemirimê divê ez biaxivim. Dîsa wek berê guyên ku li Kurdîstanê kirî û hovitiya Jitemê da da nasandin.

## Ne tenê Bîtlis, 7 efserên wî jî hatin kuştin


Bitlis'in bütün subayları öldürüldü
Anayasa'nın üç maddesi tartışılmalı

Rojnameya Tarafê radigihîne ku ne tenê fermandeyê hêza jendirmeyan **orgeneral Eşref Bitlis**, 7 efserên peyalebilind ên dora wî jî di salên 1990-ê de hatin kuştin; yan suîqesd li wan hatin kirin, yan jî wek di qezayan de miribin çûn. **Hemî jî pêwendiya wan bi pirsa kurd ve hebû**; ew li dijî siyaseta dewletê a pirsa kurdan derdiketin:

1- Eşref Bitlis Orgeneral, fermandeyê hêzên jendirmeyan,çend caran serdana Barzanî kir, 1993 balafira wî hat xistin; gotin motoran qeşa girtiye.

2- Korgeneral Hulusî Sayin, sala 1991-ê bi suîqesdê.

Belê hevalên hêja ez îro ji we re behsa hovitiyeka dina dijmin bikim. Sal 1993 şev nîvê şevê li gund ji esker û kuçikan bêtir ti kes li gund tune. Di **3'yê cotmeha sala 1993**'yan bû. Li Kurdîstanê mirîn bi şev û roj digerî. Kê dengê xwe bilind dikir ew dikuştin. Eskera bi roj xanîyên malên welatparêza bi boyaxa sor dax dikirin. Bi şev jî ew didan şewitandine. Bi vê şiklê 3000 gundê Kurdahatin vala kirin û şewitandin. Di 3 cotmehê da bi şev avêtin ser mala Nasir Ogut li bajaroka Vartînîsê ya Mûşê leşkeran malbata Ogut da ber agir.



Di şewata mala Ogut de Bav Nasir Ogut (43), Dayik Eşref Ogut (43), zaroken wan Sevîm (13), Sevda (12), Şakîr (11), Mehmet Şîrîn (8), Cîhat, Aycan (1-4) Cîhan (1-4) bi saxî hatin şewitandin û jîyana xwe ji dest dan.

Şahidên bûyerê diyar kirin ku leşkeriyê mal daye ber agir û sedema kuştina 9 kesan leşkerî ye. Ji wan kesên di wênê da bi tenê Aysel ji şewatê difiltê.

Di sala 1993'yan de Serdozgeriya Komarê ya Mûşê îdianame şand ji Dadgeha Ewlehiye ya Dewletê ya Amedê (DGM) û îdia kir ku bûyer ji aliyê **PKK**'ê ve pêk hatiye.

Lê keça **Nasir Ogut Aysel Ogut** ku bi tena serê xwe ji mirinê filitî û bû şahidê hovîtiya leşkeriyê, di sala 2003'yan de dîsa serî li Serdozgeriya Komarê ya Mûşê da û xwest dîsa dosya vebe.

**Aysel Ogut** anî ziman ku nîvê şevê bi dengê çekan hişyar bûn. Ogut, der birî ku dema di şibakeyê re nerîn dîtin ku leşker ketine nava gund û leşkeran derdora mala bavê wê dorpêç kirin û piştre agir berdan malê. Li ber çavê hemû gundiyan pêk hat. Nunerê dewletê wê îro bi tundiyê tehdît dikin. Dest navêje dosyayê.

Îro 04/05/-2010 a ye.

Belê hevalên hêja; piştî ku agirbesta li serê vê mehê hat dirêj kirin, min biryar da ku ez westîmê, ez dê ji vir şûnda heftekî carekê ji we şehîdan re namê bivsînim, lê wiha nebû. Operesyona wek berê destpêkir, hevdîtina bi birêz Ocalan re hat asteng kirin. Bi dehan nunerê BDP wek nunerê KCK li li ber deriyê dadigeha kêm nebûn. Lê ez ji nuva vegerîm nivîsên xwe rojnivisk.



Duh li Îzmir û li gelek bajarên Kurdîstanê dîsa gelek zarok hatin binçav kirin û pişt re ji wan sê zarok hatin girtine Ji ber ku ew tevlî boykota perwerda Kurdî bûne. Li gor qanuna bingehî ew meşa ne yasal bûye.

Duh li Stanbolê bi helîkoptera êrîşa ser ciwanên BDP li kirin 16 kes girtin binçava 24 seat in jî di binçava dane. Nunerê KCK bûne!. Lê ew hemû nunerê BDP e bûn.

Di aynî demê li sê bajarên Kurdîstanê Merdîn Şirnak, Elîhê **15** kes girtin binçava û ji wan jî gelek hatin girtin. Di nava wan da 2 jî Cardavan bûn. Çardavana çi kirye? Wan agahî dayê PKK li ya ku operesyon pêk li herêma wan pêk bê ne.

Li Edenê girtin ser mala Zelîha Marangoz dê bi keçika malê ve girtin binçava.

Lê ew çi dikin bila bikin, wan şer wenda kiriye, gelê Kurd hîşyar bûye. Niha cardavanî li welêt sist bûye. agirek bi dilê eskeriyê ketiye, ji qereqol û ji Colemêrgê gelek nuner û rêvebirên dewletê diçen ber linge serokê eşîreta **Jîrkiyan**. Alîkariya me bikin. Dest jî çeka bernedin. Pêwistiya me bi wê heye li vê demê. **Eşîra Jîrkiyan**:




“Êdî em naçin operasyonan” - Rihspiyê eşîra Jîrkiyan Mehmet Adiyaman, ku li Colemêrg û Şirnexê ev 30 salin bê navber bi PKK’ê re şer dikin, diyar kirin ku ewdê êdî li hemberî PKK’ê şer nakin û wiha got: *“Ev 30 salin bê navber em bi PKK’ê re şer dikin. Lê em niha dibînin ku şer ne çarseriye. Ji ber vê jî me biryar girti ku em êdî yek guleyê jî bernedin ciwanên kurd. “Adiyaman ku ji bo çareseriya pirsgirêka kurd Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan wekî navnîşan nîşanda, anî ziman ku bêyî Ocalan pirsgirêk çareser nabe. Ji me ewqas”*



Lê agirê duyemîn jî xarziyê Kamîl Atak bi dilê Tirka xist. Xwarziyê **Kamîl Atak** tevlî refên gerîla bûye. Kamîl Atak niha di girtingehê daye, ji ber gelek dozan bi salan alîkariya dewletê kir û li Cizîrê di dema serok şaredariya xwe da gelek kes kuşt û birîndar kir.



Artêşa Tirk di kemînê de ye! Bi polîs û eskeran ve di dûv provakasyona da ne. Duh li Şirnaqê Guçlş konakê dîsa bombe

avêtin ciyê ku zarok lê dileyzîn û du zarok bi bombe yê wan ên di çopê da birîndar bûn. Yekî ji wan îro jîyana xwe ji dest da.

Lê îro danê nîvro 5 balafirên şer F-16 bi seatan li ser axa Başûr û herêma parastina medya gerîn û keşif kirin. Li gorî zanîn ku ji aliyê **HPG-BÎM** ve hatine dayîn, li gundên Cinezer û Hanye yên Lîcê artêşa Tirk operasyon dayê destpêkirin. Da zanîn ku operasyona din jî ev hefteyeke li herêma Omeriyana Mardînê berdewam dike.

Birêz Karayilan ji bo wê wiha dibêje; "Dixwazine tevgerma dorpêç bikin, me ji çapê da bêxînin yanî mînîmîzê bikin. Ji bo wê rêvebirên dewletê li Ewrûpa, Amerîka û Rojhilta Navîn seferber bûne ku tevgera me tasviyê an mînîmîzme bikin. Hinek daxwazên biçûk bi ber medin bêjin fermo va daxwaze we. Lê ew dixwazin Kurdên di bin kontrola xwe avabikin.




Belê Generalê Teqaut Arîf Dogan îro jî li ber dadigehê bû û gelek agahî dan dadigehê. Got; Mahmut Yildirim/Yeşîl hevalê min bû, hê ez bi wî re car cara hevdîtina bi rêya hevalên xwe bi wî re hevdîtinan pêk tînim. Min cara dawî li Dersimê bi rêya telefon bi wî re hevdîtin pêk anin. Me di nava Jitemê da hertişt bi zanistî di bin siwana Jitemê da pêk anî. Ez Jitemim.

**Belê hevalên hêja**; Tirkiyê ji bo tasviyê kirina PKK e seferber bûye. Rêvebirên Tirk ji ber deriyê hikumata Başûr kêm nabin. Yek diçe yek te. Li gor medya îro dîsa serokê MÎT e/îstîbaretê li Hewlerê bûye.



Kek Mesut berzanî îro çend rojin li Îtalya Roma ye. Duh balyozxana Kurda li Roma vekir. Gelek dost û hevalên me Îtalî li wê resepsiyonê amedê bûn.

Lê rêvebirên Tirk jî li Roma bûn. Bi riya dostên xwe agahî ji hevdîtinên Mesut Berzanî werdigirtin.

Sibê mêvanekî Tirka serokê Natoyê bi eslê xwe Danmarkî Rasmusê heye. Wan gelek cara ji wî mêrxwazî xwastibûn ku ew dengê **Roj tv** bibir, lê bişûnekirin. Îro dîsa ew mêrxwaza li Tirkiyê ye. Serokatiya ÎSAF e ya Nato li Afganîstanê derbasî eskerê Tirka bû.

Duh serdozgerê Danmarkî xwast ku dozger dest bi ser hatin û çûyinên Roj tv de û li dijî




Roj tv doz bê vekirin. Dozgeriyê di belgeyên ku şandî ji dadgehê re û hevpeyvînên Roj Tv û dîmenên şer wekî îspatkirina ku Roj Tv ji bo beşdariya tevlêbûna refên gerîlaya wek organîzayona **PKKê** dixebite îdîa kir, probagan da PKK e dike.  Li 19/10 an doza Roj tv e li Danmark heye.

Belê **Roj tv** ne ku iha  bin zextê dayê, Ji rojak ku vebûye pêva di bin zeta daye. Kî ji Danmark dihat Tiriyeyê dewltê dosya **Roj tv e** dida ber wî. Tirkiyeyê heta niha derbarê Roj TVyê  de 26 dosye şandiye ji Danîmarkayê  re.

Îro 07-08/10-2010 a ye.



Belê hevalên hêja, ez dixwazim îro bi şahdeta Mam Sadik dest bi nivîsa xwe bikim. Bi salan di nava partiyên Kurda da karên siyasî kirin. Lê çavê wî hertim li Qandîlê bû. Her roj gava ku ji xew şîyar dibû, bi heval û malbata xwe re digot; *"Min xewn dît ku ez li Çiyê li cem hevala me. Heval gazî min dikine."* Ew di sala 2000 an da meha Gulanê rojekê wenda dibe û heval û malbata wî nizanin ku ew kuda çûye. Lê wan dizanî ku ew rojekê herê Qandîlê ji ber ku berê wî hertim li wî alî bû. Bi salan di nava partiyê de millîsiyê dike. Her pewir karê wî bû. Şer jî û karê din jî. Lê 3 cotmehê dilê wî disekine ew diçe ser dilovaniya xwe. Navenda Fermandariya HPG'ê da diyar kirin ku, ew *"Welatparêzê Kurd Mam Sadik bi mînet bi bîrtînin û li ber têkoşîna wî rêz digirin"*

Ji bo Mam Sitqî/sadik hem li Herêmên Parastina Medya û hem jî li Kampa Mexmûr toren hat çêkirin. Bi sloganên şehîd namirin, Mam Sadik Mamê me hemûya bû. Em ê wî hertim bi bîr bînin.




Belê hevalên hêja; îro dîsa Kurd li ber dadigehê bû. Rêvebir û endamên BDP ye Îxgdirê bi şarêdarê Îxdirê M.Nurî Guneş ve bûn. 12 kes hatin serbest berdan yên din 14 kes dîsa şandin girtingehê.

Dozgerê Amedê ji kevnê mepûsa DTP Aysel Tugluk re 80 sal ceza xweast. Te li Newrozê û li 8 adarê pesna serokê terorîsta kiriye.

Li rojên pêş me dadigeh mepûsa BDP Emînê Ayna bi darê zorê bîne dadigehê. Leyla Zan ali ber dadigehê bû. Dozger ji we re jî 12 sal ceza xwastin. Xanim Leyla bi dozgerê got; "*Ez ji bo aşitî û çareserkirina vê pirsê amêdemê ku her bedelê bidim*"

Belê mêvanê Tirkiyê serokê Nato Rasmusên duh ji Tirkiyê çû. Lê nizanim bi dilrehetî çû an bi dil şikestî çû. Wî dosya eskera ji bo Afganîstanê da ber wan wan jî dosya Roj tv e da ber wî.



KCKya gotin: Li ser ROJ TV bazirganî tê kirin. KCK'ê di derbarê hewldanên girtina Roj Tv de got; Dewleta Tirk li hemberî girtina Roj TV, tevî şandina leşkeran a Afganistanê, hin bazariyan dike. Roj TV di pêşxistina ziman û çanda kurd, têgihiştina netewî û

pêşxistina yekîtiya rihî de rolek girîng dilîze. Roj tv pêkanînên dij-mirovî yên dewleta tirk raxistine ber çavan.”

DEWLETA TIRK JI BO GIRTINA ROJ TV HER BAZARIYÊ DIKE.

Serokwezîr rêviyê Almanyayê, di bin çengê wî da dosya PKK e û Roj tv û daxwaza,




digel PKK e micedeleka hevbaş bikin heye. Fînansa PKK e bibirin heye. Lê berî ku ew here Almanyayê polîsê Alman duh û îro berbanga sibê, li ber deriyê malên welatparêza bûn. Bi tevir û kulinga derî pencer dişkenandin welatparêz digirtin binçava. Meha di ber vê gava ku wezîrê Almanya yî hundir Thomas de Maizierê hatibû Tirkiyê ji polîsa gelek welatparêz girtin binçava û êrîşa ser saziyên Kurda kirin. Ew buyarên bi vî rengî hertim dibin.

Belê hevalên hêja; roja çarşemê bi birêz Ocalan re hevdîtin pêk nehat bû. Astengî xirab bûna Kosterê bû. Îro jî parêzer hatin Gemlîkê vê carê ji astengî mixelefeta hawayê bû.

Operseyon giran giran dîsa destpê dikin.



Îro li herêma Agiriyê du gerîla pêla maîna eskera kirin. Du gerîla jîyana xwe ji dest dan. Hat ragihandin ku li herêma Bagokê ya Mêrdînê di encama teqîna mayîna ku ji aliyê artêşa Tirk ve hatibû çandin de 2 gêrîllayên HPG’ê jiyana xwe ji dest dan. HPG’ê nasnameya gêrîllayan aşkera kir ***Ahmet Ugur** * **Rêzan Yagmakan.**

Sibê 12 emîn salvegera li dijî serok Ocalan pêk hatiye.

Îro 9/10-2010 cotmeh ê.

12 salan di ber vê va dîmêna hebûn. Îro jî ew dîmêna hene. Li Kurdîstanê li gelek bajaran esnafa dikanên xwe venekirin û li sukê di nava şermezarkirina komployê da bû.



Ew dîmêna jî Amedê hatin  dîmênê li jêr jî ji Kurdîstana Başûr hat. Serkeftin ji we re Amed.



Serfermandarê Iraqê General Babekir Zêbarî: "Hêza Artêşa Iraqê nîne li gel PKK'ê şer bike"




Zêbarî di derbarê serdana Wezîrê Navxweyî yê Tirk Atalay de jî nêrînên xwe anî ziman û diyar kir ku Artêşa Îraqê bi xwe daketiye, teroreke zêde

li Îraqê heye û rewşa Îraqê ne aram û bicih e, kirîza dirustkirina hikûmeta nû heye got; "Di warê siyasî û ewlekarî de ne aram e, loma Artêşa Îraqê ne amade ye tevî şerekî bi vî rengî bibe û eniyeke din a şer li ser xwe veke". Zêbarî diyar kir ku, ti tevgera bi vî awayî bêyî beşdariya Herêma Kurdistanê nayê kirin û got; "Helwesta Serokê Herêma Kurdistanê jî di vî warî de pir eşkere ye ku herdem tekez dike ku ev pirsgirêk bi şer nayê çareserkirin û tenê bi rêya aştiyane û gotûbjên siyasî tê çareserkirin, loma bi baweriya min şerê li dijî PKKê li Herêma Kurdistanê naqewime."

Belê şehîdên delal Ahmet Ugur, Rêzan Yagmakan, Hüseyin Ulaş, îro 11/10-2010 a ye.

LI SER KURDA ÎRAN, ÎRAK, SURYÊ Û TIRKIIYÊ HEVKARIYA BAZARA MEZEPOTAMYA DIFIKIR IN.



Belê hevalên hêja; îro gelek hunermend, rêverbirên Roj tv û bi sedan welatparêzên Kurd mêvanê avahiya PE li Brûkselê bûn.

Bila destên tariyê li ser televizyona me bên kişandin. Kes nikarê televizyona me ji bo berjewendiyê xwe yê siyasî bi kar bîne. Roj tv dengê 40 mîlyon Kurd e. (Doza Roj tv e li 19/10 a ye.)

Belê rast dibêje, Roj tv e dengê çil milyon Kurd ê. Em ê li wî xwedî derkevin. Hevserokê Serokê



BDP birêz Selhatin Demîrtaş ji bo Roj tv e wiha dibêje; "Girtina DTP çi bû, girtina Roj tv e jî ew e. Armanc Sîyasi yê. Lê em Kurd ne bê alternatif in.

Ew di nava gel da gotinek heye dibêjin, "Bi xwe diresê û bi xwe badide" Serokwezîr jî wiha dike.

Hewldanên Serokwezir ji bo aşitî yê me didin fikirandinne, ne hewldanên ciddî ne Divê merive ciddî be li ser vê pirsê.

Pirsa Kurdî li dervayî welêt bi alîkariya Suryê, Îran, Îraqê nayê çareserkirin. Dermanê çareserkirine li Amedê, li meclîsê, mixatab em in û Îmraliyê"

Belê hevalên hêja; Tirk bi welat bi welat digerine. Heftê borî wezîrê derva bi 11 wezîran ve û heyeteka giran li Suryê li bajarê **Lazkiyê** li hev civiyan. Mijar **PKK** e bû.

Rêvebirên tirk li Başûr qampa li dijî PKK e saz kirine. Rêvebirên Tirk hinek danê sibê û hinek danê nîvro li deriyê Mesût Berzanî, Neçîrvan Berzanî û serokwezîr Berhem Salih didine. Alîkariya me bikin. Em PKK e tasviyê bikin yan jî em minîmîze bikin.

Serok komar Abdullah Gûl bi Mam Celal re di têkiliyan pêk tîne.

**Serokwezîr 4** roja di ber vê li Almanya bû û ji hikumata Almanya xwast ku ew li dijî PKK e bi wan re hevkariye bikin û ji wan îstîxbarat xwast.

Îro serokwezîr îro li Sury ê . Mijar PKK e bû.



Serokwezîr Erdogan li Şamê bi serokdewletê Suryê re li ser operesyonên hevbeş li hev hatin û Suryê piştgiriya xwe bi vekirî nîşanî wî da.

*"Em bi Suryê ve mutabakat in hevkariya hev bikin. Mekanîzam bi çar linga li dijî PKK e bi kar bînin"*. Suryê, Îran, Îraq û Tirkiyê. Ew hevkariya xwe jî bi navkir "Bazara Mezepotamya".

Belê, li Kesr-î Şîrîne gura welatê me li hev parva kirin. Îro jî dixwazin li hev parva bikin. Lê vê carê li ber wan PKK e wek kelapolet rawestyayê. Rojnamevan ji serokwezîr dipirsê.

-Birêz Erdogan hûn bi serokdewletê Suryê Beşer Esad ve li ser rêxisina terorîsat PKK eli hev hatin an na?

-Belê em li hev hatin. Em herdu dewlet jî berê de alîgir û piştgirya hev ê hevbeş in. Aliyî dîplomasî û aliyê parastina sînora. Ew hevkarîya me ne hevkariyeka nuh ye.

Daxwaza me "MÎNÎMÎZME KIRINA PKK E YE." Ji bo mijara PKK kirine ez bi seroka Almanya re jî axivîm û wê jî alîkarî da projeya me.

Seat 16:30 nûçeya flaşşş: Serok Barzanî li gel Davutoglu axafî.



Gava ku serokwezîr li Şamê daxuyanî dida çepemeniyê wezîrê dervayî Tirkiye **Ahmet Davutoglû** ji li Suryê bi serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî bi rêya telefonê hevdîtin pêk anîn û agahiyên serokwezîr û serok dewletê Suryê ji re ragihandin.

Li gor medya wan daxwaza xurttirkirina peywendîyên navbera Tirkiye û Herêma Kurdistanê kirin. Herdu alîyan di vê hevpeyivînê de, behsa rewşa Iraqê û peywendîyên

navbera Ankara û Hewlêrê kirine. Lê mijar PKK e bû û hevdîtina serokwezîr bi serok dewletê Suryê re bû.

Cîgirê serokwezîr Neçîrvan Berzanî di hevpeyvina xwe ya kovara Gulan da got;



*“Muxatabê pirsgirêka Kurd PKK ye. Divê guftûgo û diyalog bêne destpêkirin. Divê Tirkiye PKKê li derveyî pirsgirêkê nehêle. Ev dîtineke şaş e. Li derve hiştina PKK'ê ji pêvajoya siyasî ya Tirkiyê, pirsa kurd û Tirkiyê û PKKê çareser nake. Di vî warî de divê PKK jî rola xwe bilîze û siyaseteke wisa bimeşîne ku wek muxateb bê qebûlkirin. Divê em rast bifikirin, ev riya herî kurt ya çareseriyê ye û divê li Tirkiyê gelek kûr û ciddî li vê yekê bête fikirîn û PKK jî divê aqilane nêzîk bibe*

" PIRSGIRÊKA KURD BI

RIYA ŞER ÇARESER NABE. EM AMADE NE ROL BILÎZIN.

**Serokê Îranê Ahmedî Nejad** di berî serokwezîr Erdogan li wan rojên borî li Şamê bû. Mijar li dijî PKK e hevkarî bû.

**Mam Celal li Libya** bi **Ahmedînejad** û serok dewletê Suryê Beşer Sedat re hevdîtin pêk anî. Mijar tasviyê û mînîmîzma PKK e bû.



Sibê li meclîsa Tirk ji bo pirsa Kurd/PKK e civîneka taybetî jî medyar ne vekirî heye. Lê wiha tê xuyakirin ku ew ger li bergerîna rêvebirên Tirka gelek biajoyê.

Sekreterê giştî yê NATOyê Anders Fogh Rasmussen : “*Ez bawer dikimin, bê alîkariya Nato Tirkiye dikare di demeka kin da vê pirsa xwe ya nav xwe di nava aşitiyê da çareser bike, bawariya min bi Tirkiyeyê gelek heye*”.

**Belê hevalên hêja**; Rêvebirên dewleta Tirk li aliyekî welat bi welat digerin alîkarî û piştgirî û hevkariyê li dijî PKK e dixwaz in. Li aliyê din esker seferber bûye li sînorê Kurdîstanê tê bicîh kirin.



Îro 11 rojin li herêma Araratê operesyon hene. Bi rastî li Herêma Kurdistanê alarima ‘êrişan’! heye. Li ser sînorê Başûrê Kurdistanê tevgera hewayî heye. Îro dîsa gerîlayekî bi navê Hüseyin Ulaş şehîdbû.

Belê hevalên hêja, bi qasî 500 Girtiyên Kurdê di sala 1980 an da di girtingeha Amedê de, îşkence û mirin tahm kirî, îro serî li dadê dan ku ew ên ku li ser wan îşkencê, zilm û zordarî kirî divê bên darizandin. Ew bênamusê wê demê ew bûn.



"Di serî da Serfermandarê Giştî Kenan Evren, Serfermandarê Hêzên Bejayî Nûrettîn Ersîn, Serfermandarê Hêzên Hewayî Tahsîn Şahînkaya, Serfermandarê Hêzên Deryayî Nejat Tumer, Serfermandarê Giştî yê Cendermeyan Sedat Celasûn, Fermandarê Akademiyên Şer Bedrettîn Demîrel, Serokê 2. yê Serfermandarê Giştî Alî Haydar Saldik, Serokwezîrê wê demê Bulent Ûlûsû, Orgeneral Kemal Yamak, Sitvan Esat Oktay Yildiran ku piştî şkenceyên li zîndana Amedê kiribû di encama êrîşekê de hatibû kuştin.

Belê hevalên hêja; heftê borî parêzeran bi birêz Ocalan re hevdîtin pêk ne anîbûn. Îro birayê serok Mehmet Ocalan bi birêz Ocalan re hevdîtin pêk anî.

Ocalan: Kurd wê piştgirî nedin aştiyek sexte

- Birayê Ocalan Mehmed Ocalan piştî hevdîtan xwe ya bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re daxuyaniyek da rojnamevanan û got: Ocalan jibo hikumetê û PKK'ê name şandiye. Foto di aşitiyeka sexte de kura lê alîkariya xwe nabe)




Ocalan wiha got: " di hevdîtina me de agirbest hat nîqaş kirin. Da diyar kirin ku, eger di vê pêvajoyê de tune kirina Kurda bê armanc kirin , wê ev aştiyek bi tendurist çênebe. Em di vê mijarê de axivîn. Eger pêvajo di rewaşekî her dû alî demokrasiyek bi tendurist û aştiyane de bin, her wiha mafên Kurdan yên demokratîk bên dayîn wê her kes destekê bide vê pêvajoyê. Di roja duwem ya bêçalektiyê de li Rihayê 24 endamên BDP'ê hatin binçav kirin.

Di nava van de Serokê bajar, rêvebirên sendikayan û serokên wan hebûn. Ji van kesan 8 hatin girtin. Yanî armanc Kurdan hemûyan tunebikin, aştiyek wisan wê bi tendurist nebe. Şensa çêbûna aştiyek wisan pir kême."

Ocalan got: Yanî aştiyek sexte were kirin Kurd wê destek nedin. Wan buyarên dawî ye min didin fikirandin.

Belê şehîdên delal Ahmet Ugur, Rêzan Yagmakan, Hüseyin Ulaş, îro 12/10-2010 a ye.

Belê îro li meclîsa Tikiyeyê civîneka ji rayagiştî veşartî pêk tê.530 mepûsê li hev dicivene.




Mijara vî civîne taybet *“Em destûra tezkera dersînor saleka din dirêj bikin an na?”* Elbet van civînên bi vî rengî ji xapandine bêtîr ne tiştekî din nîn e. Ji sala 2004 an pêva hersal tezkerêdirêj dikin. Di berî ku Amerîka bê Îraqê ew dirêjkirina û dastûr jî pêwîst jî nedidîn. Kîngê dilê xwe dixwastin hîngê diketin Başûr derdiketin. Serokên Kurda Mesût Berzanî û Mam Celal wek merivên bênirx, biçûk, yek serok eşîret didîtin û hewce nedidîtin ku destûrê ji wan werbigirin.

Lê îro li ber wan digerine ku ew alîkariya wan bikin. Bersiva ku ew didin wan wan dîn dike, “*Hûn nikarin PKK e bi vê şiklê tasviyê bikin. Hêza me li dijî PKK e şer bikin jî nîne”*

Tezkerê saleka din hat dirêj kirin.

Lê wexta ku wan dema tezkerê saleka din dirêj kirin. Mepûsê Kurdî Batmanê **Bengî Yildiz** wekî kevirekî li ser wan xîne mesaj da.

***BDP: LI KURDISTANÊ ZIMANÊ YEKEM KURDI YE

***ZIMANÊ DUWEMÎN WÊ TIRKÎ BE

***"Di nava vê sîstemê de Kurd li Kurdistanê, di Kurdistana Xweser de wê zimanê wan weke zimanê yekemîn bi karbînin. Yekemîn zimanê wan yê fermî wê Kurdî be, zimanê wan yê duwemîn jî wê Tirkî be"***



Mepusê AKP. Em ê çawa tezkerê dirêj nekin. Medya wek nûçeyên flaşşş ragihand; Bengî Yildiz jahr axivî. Zimanê Kurdî li herêmê zimanê yekemîn bûye! Sibê jî ê Kurdîstaneka bixwazin.

serokwezîr duh li Suryê bû, ji bo hevkariya li dijî PKK e. Bi serokdewletên Suryê ve gelek danûstandinên bi dizî kirin.

Wî got tu ewîl efûyê jî gerîla re bi derxîne, yê din got tu ewil gav bavêje. Serokdewletê Suryê got, "PKK e yên me ye li çiyê ne hemwelatiyê me ne. Ew bêwalat in. Derîyê me ji wan re vekiriye bila bên".

Lê gava ku serokwezîr hat Tirkiyeyê ew gotinên xwe ye li ber rayagiştî li Surê û li Tirkiyeyê kirî hemû înkar kirin. Zatên wê hetim dikin.

"*Em li ser tu efûya nexebitin û me bahsa ti efûya nekir. Di rojeva me da afû tûnen*."

Birêz Ocalan duh bi birayê xwe re mesaj şandibû. "Kurd wê piştgirî nedin aştiyeka sexte"

Rast dibêje birêz Ocalan; ew sextekar derewinin. Rûreş û bextreş in ji bav û kalên xwe da.




Warin em guh bidin ser rojnamevanê Hurriyet û posta rojnamevanî bi nav û deng M.Alî Birand: Beşek ji nûçeyên li ser PKKê em bi xwe çêdikin

" Em qet xewnan nebînin, PKK bi vî rengî nayê tasviyê kirin. Beşek ji nûçeyên derbarê PKKê de wek medya em bi xwe çêdikin."

Bîrand di nivîsa xwe dibêje, " An yên li desthilatê bi rastî cahil in an jî ev çend sal in henekên xwe bi me dikin. Hêj dibêjin qey PKK'ê dê bi fişarxistina ser derdorê, bê tesfîyekirin. Îddiaya wê çendê tê kirin ku bi fişarxistina ser Barzanî û operasyonên leşkerî dikare encamek bê wergirtin. Ev reftar tê wê maneyê ku henek bi jîriya civakê tê kirin."

Bîrand radigihîne ku ev demek e medyaya Tirkiyeyê tim qala jinavbirina PKKê dike, lê beşek ji van nûçeyan ji aliyê medyayê bi xwe ve tên çêkirin.

Bîrand dide xuyakirin, tiştê hê ciddî û trajîk ew e ku siyasetmedar, polîs û leşkerên Tirkiyeyê jî baweriya xwe bi wê çendê tînin ku PKKê dê bi wî rengî bê tesfîyekirin.

Bîrand derbarê çawaniya PKKê de jî wiha dibêje, "Tîka dikim em êdî rastiyan bibînin û qebûl bikin. PKK, rêxistineke wiha ye ku dikare jêderên darayî bi awayekî baş bikar bîne, li Ewropayê xwe baş rêxistiye, êdî êdî xwe ji terorê dûr dixe û dike bikeve nan siyasetê, niha ji ber sedemên taktîkî carnan terorê bi kar tîne. Em dikarin bêjin dezgeh an jî şîrketeke navdewletî ye, heya bigire em dikarin wek partiyeke siyasî ya navdewletî bi nav bikin. Divê em PKKê li ber çavên xwe biçûk nekin. Rola Ocalan jî li ser rêxistine û li herêmê gelek e.."



Belê hevalên hêja; Kurd li avahiyên xwe û li serokên xwe û li rêvebir û şaredarên xwe xwedî derdikevin. Duh gelek hunermend û welatparêz li ber avahiya PE bûn. “Em destûr nadin ku ekranê Roj tv e tarî bibin.”

Îro piştgirî jinên Cizîra Botan dan. “Em ji bi we re ne”.

Birayê delal Huseyin Ulaş îro 13/10-2010 a ye.

Belê hevalên hêja; Tirk li provakasyonan digerin. 4-5 roja di ber vê li Colemêrgê erebeyên sivîla lê sîwar bûyî qurşûn kirin du kesên sivîl giran birîndar bûn û hê ew di nexweşxanê da ne. Li gor şahîdan buyarê eskera ew gulê baran kirine. Pişt re eskera bi me re gotin hûn hemû PKK lî ne.



Sê rojan di ber vê li Sîlopiyî zarokekî 9 salî di bin panzerê da ma duh jîyana xwe ji dest da. Diya wî zarokî wiha dibêje; "*Du roja di ber vê jî polîsa bi panzera êrîşa ser zarokan kiri. Lê îro kurê min di navbera tekere panzerê da ma*"

Heftê borî çûyina parêzera Îmraliyê ducara asteng kirin. Îro parêzera bi Ocalan re hevdîtin pêk anîn.

Dersimê îro sê-çar rojin operesyon hene. Gava ku parêzer li Îmraliyê bi Ocalan re hevdîtin pêk dianin. Xebera du eskerên ku hatin kuştine hat.

Medya rabû ser pîya. Kanî we got PKK e agirbest îlan kiriye?

HPG/KCK: Karayilan:Tirk amadekariya operasyonan dikin



*“Li her deverê Kurdîstanê li dijî me operesyon hene. Balafir herêmê keşif dikin û herêm bi guleyên giran te gulê kirin”*. Di vê derbarê de Berdevkê PKK-ê Ahmed Denîz got: *‘’Ger ew frokeyên han biçûktirîn bombardimana navçeyê bikin, emê agirbestê bişkînin û bi awayekî dijwar bersivê bidin.Artêşa Tirk li hemberî gerîllayên PKKê amadekariya operasyoneke berfireh dike*.’’

Îro birêz Neçîrvan Berzanî jî daxuyanî da rayegiştî.

Êdî Kurd li dijî hev şer nakin



Di qonaxa em gihîştinê de kurdan li hemberî hev bide şerkirin ew qas ne hêsan e. Kîjan hêza siyasî ya kurd, heke li ser daxwaza hin kesan li hemberî kurdan bikeve nava şerî dê ji aliyê kurdan ve bê lanetkirin.

Warîn em îro jî guh bidin ser rojnamevan M. Alî Birand

Êdî ji PKKê pirtir, kurdên ciwan me ditirsînin (M. Ali Birand – Posta) Mehmet Ali Birand, îro di gotara xwe de, bal kişandiye ser nifşê nû yê Ciwanên kurd û îdia kiriye ku li herêmê nifşeke wisa radibe, ti kes pê nikare, ne polîs, ne dewlet, ne PKK ne jî BDP. Li gorî Birand, ya xeter êdî ne PKK, Ciwanên kurd in.




“(…) *Gelek bala raya giştî nakêşe, lê nifşekî wisa yê ciwanên kurd mezin dibe, êdî kek û bavê wan jî ji wan ditirsin. Xwedan fikrên gelek dijwar in û çavê wan bi ti tiştî nabirre. Em di her xwepêşandanan de van ciwanan li kolanan dibînin, ne polîs ne jî esker pê dikarin. Serî li ber PKKê jî radikin, ku hewce bike, rayedarên partiyê (BDP) jî didin ber kevirbaranê.*”

Birayê delal Huseyin Ulaş îro 14/10-2010 a ye.



Murad Karayilan; "*Em li ser soza xwe ne. Lê dewlet wek berê êrîşa ser me dike, li gunda bi cilên gerîla digere, li gelek deverên Kurdîstanê operesyon hene. Dixwazine me îmha bikin.*

*Duh li Dersimê du esker hatin kuştin. Ew ne bi dilê me bû. Lê gerîla jî jîyana xwe ji dest dide. Li Riha û Stanbolê, Mersîn gelek BDP yî bi suçdariya KCK hatin girtin û tên girtin. Em di hêviyeka wiha da bûn ku BDP bên berdan. Lê tên girtin. Li 18/10 an da li Amedê doza şaredar û rêvebirên BDP heye. Ew hevalan 18 mehene ku di girtingehê da ne. Ma suçê wan hene?*"



***Serokatiya Konseya Rêveber ya KCK'ê***: DI 15 ROJAN DE 22 OPERASYON**.** Pêvajo ber bi cihek xeter ve diçe

KCK'ê diyar kir ku gêrîllayan bi temamî biryara bêçalaktiyê bi cih aniye û got; "Hêzên me bi temamî biryara agirbestê ya ku me weke Tevgera Azadiya Kurdistanê roja 20'ê Îlonê dayî, bi cih anîne. Lê belê rêbazên hêzên dewleta Tirk zorê dide şert û mercên agirbestê. Dîsa uslûbê hikûmeta AKP li dijî Tevgera Azadiya Kurdistanê bikar tîne û kiryarên dîplomasî yên dimeşîne, seknek wisa nîşan dide ku di çareseriya demokratîk ya pirsgirêka Kurd ne samîmî ne."

Birayê delal Huseyin Ulaş îro 15/10-2010 a ye.




Dewlet dixwazê bi polîtika xwe ya sxekariyê û derewa Kurda xapîne. Lê vê carê Kurd nen xapandine. Li dijî dewletê girseyeka PKK e heye, li saziyên xwe li partî û rêvebirên xwe xwedî derdikeve. Duh li Îzmîrê bi sedan kes ji bo girtina **Roj tv** di nava çalekiyan da bûn. Ew piştî giriya Roj tv ê îro li Wan ê bû, bi hezaran daketin kolanan.**"*Roj tv ê dengê me, kes nikare dengê met arî bike*"** Bi sedan li nava gorîstanan li cem şehîdê xwe bûn, quran dixwandin û mewlûd

didan. Bi şehîdên xwe ser bilind dibûn. EM DEST JI VÊ TÊKOŞÎNE BERNADIN! Digotin.

Diya gerîla şehîd Huseyin Ulaş ji Stanbolê da ketibû rê hat ku termê kurê xwe yî li rêya Kurdîstanê şehîd ketî bibîne û wî bi kulîlkên kesk, sor û zer wî binax bike. Lê wê kurê xwe nedî, ji ber ku dewletê ew bi lez û bez bin ax kiribû.

-Husen, Husen Husên husen!!

*Diya te hat. Ka tu li kê derê yî? Diya te qurbana te. Berezman bû. Wiha jî nabe lo! Diya wî û hevalê wî hene. Ew ji aliya dijminê xwe ve tê binaxa kirin. Kurê min, Tu şehîdê pak rewanî....*

Belê dewlet ji aliyekî da rêvebirên BDP berdide û ji aliyekî da jî digirê. 22 rêvebirên BDP yê Mêrdînê di girtingehê da piştî 18 meha îro li ber dadigehê bûn. Ji wan 7 kes hatin berdan, 15 kes dîsa şandin girtingehê. Lê Mersînê 7 kes hatin girtin.

Belê destê Tirka, Ereb û Farisan ji nava Îraqê nakşê. Heft mehenê ku hikumat ava nebûye. Faris dibêjin, ma Kurd di nava hikumatê da bi piranî cîh negirin. Ereb dibêjin ma wezarata derva û wezarata petrol di destê me da be. Tirk dibêjin ma dengê me jî li meclîsa Îraq û Başûr hebe. Birêz Mahmût Osman vê îro rast dike.


Mehmûd Osman: Dest ji çewisandina Kurdan berdin**.**



- Parlementer Mehmûd Osman da diyarkirin ku, bila Serokê Sûryeyê Beşar Esed û Serokê Hikumeta Tirkiyeyê Recep Tayîp Erdogan mafên Kurdan bidinê û destê xwe ji nava kar û barên Îraqê bikişînin.

Mehmûd Osman wiha got: bila Beşar Esed û Erdogan wekhevî û dadweriya li welatên xwe û li gel hemwelatiyên xwe pêkbînin, ne ku dest biavêjin nav kar û barê Îraqê. Bila ew destpêkê aştiyek demokrasiyek bêxin nava welatên xwe.

Mesaja birêz Ocalan: Pêvajoya komploya kesk dest pê kir



- Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan diyar kir ku heta niha Gelê Kurd û PKK bi gelek komployan re rû bi rû mane û got; “"*Em dikarin qonaxên komployên beriya hukumeta niha, wekî qonaxa komployên reş bi nav bikin. Qonaxa komploya niha jî, qonaxa komploya kesk e. Qonaxên komployên reş û komploya kesk ji hev cûda ne. Di demên*

*qonaxên komploya reş de, erka bêsînor ya li her derê kuştina mirovan dabûn Jîtem, konra û îtîrafkaran. Dewlet bi xwe ev erk dabû. Wê demê, Gladîoyaya tirk, girêdayî asta herî jor bû.*"

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di hevdîtina vê hefteyê de pêvajoya bêçalakîtiyê û komployên heta niha nirxandin. Ocalan diyar kir ku ewê heta 31'ê cotmehê bisekine û got, eger heta wê demê bi armanca çareseriyê neçin cem wî, serê wî jî biçe, wê êdî têkildarî ti tiştî nebe.

"Ji bo 31'ê Cotmehê, 15 roj man. Ezê li bendê bim. Eger heta 31'ê Cotmehê bi armanca çareseriyê neyên cem min, êdî serê min jî biçe, ezê têkilî ti tiştî nebim. Ezê bi lîstikên wan nexapim û ti daxuyaniyan nedim. Lê eger bi armanca çareseriyê bên, wê demê ezê jî nêrînên xwe bînim ziman."

## KCK WÊ BIRYARA XWE BI XWE BIDE ŞEREKÎ DI ASTA NAVÎN DE LI BER DERÎ YE

Ocalan destnîşna kir ku wî piştî diyaloga dewletê ya bi wî re behsa 2 protokolan kiribû û wiha got: "Min di nameya xwe de jî, behsa 2 protokolan kiribû. Min ji bo nameya şandibû dewletê û qendîlê jî, hê ti bersiv negirtiye. Em ê heta 31'ê cotmehê bisekinin. Ji wê rojê û pê ve, ez ê xwe ji navberê vekişînim. Êdî wê KCK pêvajoyê bimeşîne. KCK wê bi xwe biryara xwe bide. Va ye şereke di asta navîn de li ber derî ye. Bila parastina xwe ya bi her awayî û parastina esasî bi hêz bikin. Bila tevî gel vê pêvajoya bimeşînin."

Ocalan bi bîr xist ku wî berî demekê dîsa ji navberê vekişiyabû û wiha dewam kir: "Lê hatin cem min. Di sala 2006'an de ji bo aştiyê, ji min alîkarî xwestin. Min jî, li ser vê di sala 2006'an de banga agirbestê kir. Niha baştir fêm dikim, a rast ya sala 2006'an, plana tesfiyeyê bûye. Divê der barê wê demê de lêkolîn werin kirin. Ji wê demê û pê ve, 5 sal in ez li vir hewldanên ji bo aştiyê dimeşînim."

Ocalan, îhtimala girtina televîzyona Roj Tv'yê jî anî ziman û bi bîr xist ku bi bazar û tawizan li ser kurdan gelek lîstin tên meşandin û got, heta niha li hemberî Tevgera Azadiya Kurd 3 komplo pêk hatine û niha komploya 4'mîn tê amadekirin.

## JI BO ÇARESERIYÊ NE AMEDE NE Û DIBE KU ROJ TV'YÊ BIGIRIN

**Ocalan** bal kişand ser nîqaşên kuştina Serok komarê tirk yê berê Tûrgût Ozal û wiha got:"*Roja wê bi min re hevdîtin pêk bihata, Ozal hate kuştin. Yekemîn kesê got 'Ozal hate kuştin' ez bûm. Ew qonax, qonaxeke komployê bû. Kuştina Ozal li hemberî çareseriya pirsgirêka kurd û li hemberî me, komployek bû. Tiştên niha pêk tên, dişibin komploya sala 1925'an.*"




**Ocalan** bi bîr xist ku bi komploya di sala 1925'an de kurd hatine tesfiyekirin û beriya 2'mîn Şerê Cîhanê mirina Mustafa Kemal jî, wekî mirineke bi guman bi nav kir. Ocalan qonaxa komployên li hemberî kurdan pêk hatine jî wiha anîn ziman:

## DI PÊVAJOYA ÇARESERIYÊ DE LI HEMBERÎ ME 4 KOMPLO PÊK HATIN

"Qonaxa komploya yekemîn bi kuştina Ozal destpê kir: Ozal bi awayekî wêrek nêzî pirsgirêka kurd bû. Digot 'ez ê vê pirsgirêkê çareser bikim û divê çareser bikim.' Wê demê Ozal dorpêç kirin. Dijberên çareseriyê, kesên di nava artêşê de çareseriyê dixwazin hemû tesfiye kirin. Eşref Bîtlîs, Bahtiyar Aydin û gelek sûbayên wekî wan ên alîgirî çareseriyê hebûn. Hemû kesên li pêşiya xwe asteng dîtin, kuştin û tesfiye kirin. Di vê mijarê de Talabanî xwedî agahiyên girîng e. Talabanî ji min re digot, 'em û Eşref Bîtlîs di mijara çareseriyê de hemfikir in'."

Ocalan qonaxên komployên din jî wiha anîn ziman:"Qonaxa komploya dûyemîn, di salên 97-98'an de pêk hat. Wê demê Erbakan ji dil bû û kesekî nêzî çareseriyê bû. Erbakan li gorî Kurtulmuş durustur e. Kurtulmuş jî wekî yên din dibêje, 'em ji bilî Ocalan ji bo çareseriyê bi her awayî amade ne'. Ev gotin nîşan dide, ew girêdayî kîjan navendê ye... Di 97-98'an de hem ji aliyê sivîl û hem jî aliyê eskerî ve bi me re ketibûn nava têkiliyê. Lê belê Gladîo pir bi hêz bû.

Qonaxa komploya sêyemîn di salên 2003-2004'an de hate ceribandin. Di vê demê de xwestin bi parçekirina kurdan bi ser bikevin. Lê belê hingê jî bi ser neketin.

Niha jî em bi qonaxa komploya 4'mîn re rû bi rû ne. Ji bo min êdî rewşa Erdogan zelal bûye. Êdî dikarim hin tiştan vekirî bibêjim. Eger bûyera Colemergê ne bûyereke kontra ye û têkiliya wê bi rêxistinê re nîne, ev hin tiştan nîşan dide."

## EM NIHA DI NAV QONAXA KOMPLOYA KESK DE NE

**Ocalan** bal kişand ser ferqa komployên qonaxên berê û yê niha jî wiha anî ziman:"Em dikarin qonaxên komployên beriya hukumeta niha, wekî qonaxa komployên reş bi nav bikin. Qonaxa komploya niha jî, qonaxa komploya kesk e. Qonaxên komployên reş û komploya kesk ji hev cûda ne. Di demên qonaxên komploya reş de, erka bêsînor ya li her derê kuştina mirovan dabûn Jîtem, kontra û îtîrafkaran. Dewlet bi xwe ev erk dabû. Wê demê, Gladîoyaya tirk, girêdayî asta herî jor bû."

Ocalan piştî kuştina Ozal, xurtbûna ekîba Tansû Çîler û Dogan Gureş wekî tiştekî ne tesaduf nirxand û anî ziman ku gladîoyo tirk an jî ergenekon dûre bûne serbixwe.

## BÊAGAHDARIYA ERDOGAN TI KES NEKARE KESEKÎ BIKUJE, XWEDIYÊ FERMANA KOMKUJIYÊN DAWÎ ENQERE YE

**Ocalan** bi bîr xist ku ekîba behskirî li hemberî serokê fermandariya giştî ya wê demê Huseyîn Kivrikoglu jî sûîkastek pêk aniye û li ser qonaxa komploya kesk jî wiha axivî: "Berê Gladîo ev kuştin pêk dianî. Ji bo vê erka tam dabûn Gladîo. Lê belê di qonaxa vê komploya kesk de, wê rêbazên Gladîo/kontra nîne. Di vê pêvajoyê de wekî berê yek bi yek li kolanan û deverên din kuştin wê çê nebe. Êdî rêbazeke nû ya li gorî rewşa nû heye. Êdî her tişt di bin agahdariya Erdogan de pêk tê. Bêagahdariya Erdogan ti kes nikare kesek bikuje û erka ti kesî ya kuştinê nîne. Bûyera Colemergê, bersiveke kuştina meleyekî ya li wir e. Xwediyê biryara kuştina 10 gerîlayan jî, Enqereye. Ekîbek ji Enqerê çûye operasyon pêk aniye. Yê ferman daye, Enqere bi xwe ye. Ekîbek taybet şandine wir, bombeya li wir bi cih kiriye. Ev êdî ji bo min zelal bûye."

***Serokwezîr Erdogan bi gladîo re li hevkir, kontraya kesk ketiye dewrê

***Kurd bi qirkirinên siyasî re rû bir û ne.

***Li hemberî jinan siyaseteka pir bi zanabûn tê meşandin.

Birayê delal Huseyin Ulaş îro 16/10-2010 a ye.

Îro ji gelek deverên dinyayê û Tirkiye yê da ronekbir û saziyên sivîl tên Amedê. Amed sê



roja ji wan re mêvanperweriyê bike. Amed dilê xwe yî bi êş ji wan re veke. Dayikên Şemiyê wan pêşwazî bikin. Êşa di dilê xwe de ji wan re ragihînin. Ew dost û hevalên me ji bo ku doza 151 şaredar û rêvebirên BDP ji aliya dewletê ve 18 mehenê ku hatine girtin bişopînin. Em bi wan re dibêjin hûn bi xêr hatin. Dengê mazluma, dengê êşê, dengê girtingeha Amedê bibhîzin. (foto heyeta swêd Hediyê Gûzel)

Li rojnama Kurda wiha hatiye nivisandin: Siyasetmedarên Ewropî ber bi Amedê ve diherikin

- Doza KCKê ku wê di 18ê Cotmehê de dest bi danişînan bike li ser bala her deverên cîhanê ye tê xuyîn. Ji gelek deverên cîhanê siyasetmedar û gelek saziyên çapemeniyê li Amedê kon vegirtine. Herî zêde jî siyasetmedarên ewropî û çapemeniyta Ewropa niha li Amedê bi cî bûne û hê jî ber bi Amedê ve dikevin rê.

Yek ji heyetên balkêş jî ew e ku heyeta partiya rastgir **FPO** ku partiyeke rastgir a Awustuyayê ye di nava komên ku çûn Amedê de ciyê xwe girtine. Parlementerê **FPO**'yê **Johann Herzog** derbarê çûyîn û dozê de wisa got; " Kêşeya Kurd tenê çepgiran aleqedar nake, ev pirsgirêkeke însanî ye."

Serokê FIDEH ê jî wê dozê bişopîne.




Heyeteke ku ji parêzerên Belçîkî pêk tê gihîşt Amedê. Parêzerên baroya Brukselê, Joke Callewaert, Olivier Stein û Selma Benkhelifa çû serdana ÎHD'ê.

Serokê Federasyona Navneteweyî ya Mafê Mirovan Souhayr Belhassen ji bo şopandina doza KCKê diçe Amedê. **Souhayr Belhassen** wê sibehê ligel delegasyona bi wî re û endamên ÎHDê civîna çapemeniyê li dar bixe.

Heyeta çavderiyê ya herî girseyî ji Almanya bê yê.

Heyeta herî girseyî ji Elmanyayê diçe. Heyeta ku endamên partiya çepgir pêk aniye ew ê ji bilî şopandina dozê gelek sazî û dezgehên din jî ziyaret bike. Gelek endamên şaredariyê, parlementer û şaredar din ava heyetan de heye.

"Me bawer nedikir ku 1500 kes hatiye girtin"

Heyeta rastgir a Awusturyayê FPO balkêş e. Serokê heyetê **Johann Herzog** wisa axifî," Kêşeya Kurd ne tenê çepgir,demokratên sosyal, yan jî partiya keskan aleqedar nake. Pirsgirêk a me hemûyan e. Pêkutiya li ser Kurdan a hemû mirovahiyê ye." Û di berdewamiya axaftina xwe de Herzog wisa got, " Gava ku nû 1500 siyasetmedar hate girtin me bawer nekir. Me bûyer ji çavkaniyên cihê lêkola, ji sedî şêst kesên girtî jê şaredarên hilbijartî bûn û endamên meclîsa şaredariyan bû, gava em vê yekê hîn bûn em bêhtir ferihîn."

Lê gava dostên Kurda dihatin Amedê serokwezîr Erdogan jî îro li Kampa Kizilcehemamê



pesna xwe ya ji bo Kurda da ku wî ji Kurda re çi kiriye û ew û 73 mepûsên xwe yê herêmê ve berpirsiyarê vê pirsê bûne dikir.

PKK e rêxistineka terorîst bûye. Ew terorîsta temsîl dike, gelê min î herêmê. Ew çavê min in.

Pekî wî mêrxwazî çi kiriye ji bo Kurda warin ez ji we re behs bikim.

Rêvebir û serokkomar serokwezîr, 8 salin turê xwe kirine destê xwe dera seferên/ger û dîplomasiya xwe ya dinyayê ketine, hinek dewleta bi îhala, ji hineka dewleta bi techîzatên eskerî û şer ji wan bikirê wan dikşîne aliyê xwe piştgiriya wan werdigirine, gelek dewletê biyan ji bo berjewendiyên xwe piştgirî dan û Kurd wekî terorîst îlan kirine û bi dehan Kurd radestî Trrka kirin. Di serî da Almanya û Amerîka piştgiriya er dan wî û hetanî roja me ya îro jî didin. Her ku çû kê derê Serokên Başûr Mam Celal û Kek Mesût wek yek serok eşîret didan zanin û tenezûl nedikir ku bi wan re bi axive. Lê Îro bûnê kuçikê ber deriyê wan.

Di nava wan heyşt salên li ser desthilatdariyê bi hezaran kes di îşkence û lêdanan re derbas kirine. Bi hezaran avêtine girtingeha û 18 mehenê ku derneketine ber dadigehê nizanine çima tên darizandin. Hê çi dixwazine, berê Kurd diavêtine bîrên asitê, niha di girtingeha dane.

Di şerê 8 salan da bi hezaran Kurd di li deştê û li sînora li ser rêya hatine kuştin.

Çûye kê derê li wê derê gotiyê yek al yek millet, yek dewlet û yek ziman.

Ku zar bin jî zeç bin jî, pir bin û jin bin hemû hedef in. Eger tu bi wan neyî ser fermo welatê me terk bike. Li welatê wî ti pirsa Kurd tune bûye, pirsa terorê hebûye.

Me Trt 6 vekiriye û li Mêrdînê di Universîta Artuklarê da dersên zimanê Kurdî dide.

Wiha bi hezaran. Li Amedê derew kirine, li Washingtonê derew kirine û ji rayegiştî ya cîhanê re derew kirine. Bimbarekî tê bêyî turê derwayî bi paş va ye.

Li ser birêz Ocalan tecrît û polîtikaya psîkolojik ajotine.

Bengî Yildiz mepûsê Rihayê; "Erdogan li dijî Kurdan û BDP'ê şer îlan dike"



"Bi van gotinên Serokwezîr de ew dibînin ku dîsa di serî de şerli dijî partiya me û dijî Kurdan vekirî û bi aşkerayî şer îlan kiriye. Diyar e, Erdogan di pêvajoya hilbijartinê de dê dîsa bi nijadperestiyê êrîşê gelê Kurd û BDP'ê bike."

Belê hevalên hêja; ewledên Kurd li serê çiya û li girtingeha li ber xwe didin. Em hene. Zimanê me heye. Em Kurd in û em ê bi Kurdî parastina xwe bikin.



### *Di doza KCK'ê de wê parastin bi kurdî bê kirin*

- Siyasetmedarên Kurd ên di operasyona 14'ê Nîsana 2009'an di bin navê ‘operasyona KCK’ê’ bi armanca qirkirina siyasî ya li dijî kurdan dest pê kir û berdewam kirin de hatin binçavkirin û girtin, wê ji bo ku balê bikişînin ser qedexeyên li ser zimanê Kurdî û ji bo neqebûlkirina kurdî wekî zimanê perwerdeyê protesto bikin, wê parêznameyên xwe yên nivîskî û devkî bi kurdî ji dadgehê re pêş kêş bikin.

Di rûniştina doza **KCK**'ê ya ku tê de **103** jê girtî bi tevahî **151** siyasetmedarên kurd tên darizandin parastin bi kurdî bên kirin.

Belê hevalên hêja Ebdirehman Huseyîn, Huseyîn Akkuş, Cemîl Nayman, Şukran Gulsun, Huseyin Ulaş îro, 17/10-2010 a ye.

QIRKIRINA GELÊ KURD LI KORÎDORÊN DADIGEHAN DIDOME

Îro hemû mêvanên me ye Ewrûpî ên ku dozê KCK bişopînin hatin Amedê. Ji aliya dayikên




aşitiyê ve, ji aliyê şaredaran û ji aliyê avahiyên sivîl ve ew hatin pêşwazî kirin. Gava ku bawulê xwe li Hotelê bi cîh kirin sekoneka wan a ewil ber avahiya şaredariya mezin ya Amedê û ber avahiya dadigehê bû. Li wê derê Berxwedana Amedê, du emîn destpê kiribû.

Seroka FIDH Belhassen got: "Dadgehkirin divê bi adilane be".

"Divê hemû deriyên dadgehê vekirî bên hiştin. Divê darizandineke adîlane bê kirin. Ger Tirkiye bixwaze derkeve qadên navnetewî divê di mijara demokratî û mafê mirovan de pêngavên cidî bi avêje."

***Kesên ku di operasyonande hatîn girtin û heya niha jî di zindanê dene evin:

Serokşaredarê Êlihê Necdet Atalay, Serokê Şaredariya Navçeya Amed Kayapinarê Zulkuf Karatekîn, Serokşaredarê Navçeya Şirnex Cizîrê Aydin Budak, Serokşaredarê Wêranşara Rihayê Leyla Güven, Serokşaredarê Suruçê Ethem Şahîn, Serokşaredarê Navçeya Qoserê ya Mêrdinînê Ferhan Turk. Kamuran Yuksek, Nadir Yildirim, Mehmet Taş, Unal Ahmet Çelen, Herdem Kizilkaya, Huseyîn Yilmaz, Ramazan Morkoç, Salih Alpdogan, Umran Genç, Mehmet Abbasoglu, Selanîk Oner, Kemal Aktaş, Çîmen Işik, Zohre Bozaci, Mehmet Nîmet Sevîm, Lutfu Dag, Bayram Altun, Alîcan Onlu, Ahmet Bîrsîn, Mehmet Akin, Alî Oruç, Hasan Huseyîn Ebem, Ercan Akyol, Ercan Sezgîn, Temer Tanrikulu, Kutbettîn Kurt, Mehmet Tarî, Hasan Uner, Hasan İraz, Şînasî Tur, Ebru Gunay, Sîracettîn Irmak, Ahmet Makas, Abbas Çelîk, Mazlum Tekdag, Bahrî Çeken, Hasan İinatçi, Rahmî Ozmen, Mukaîl Karakuş, Celal Yoldaş, Ahmet Ertak, Alî Şîmşek, Firat Anli, Huseyîn Kalkan, Nadîr Bîngol, Emrullah Cîn, Gul Cîhan Şîmşek, Huseyîn Bayrak, Haci Erdemîr, Heval Erdemlî, Sebahattîn Dînç, Abdullah Akengîn, Kazim Kurt, Garip Kandemîr, Şeyhmus Bayhan, Cebrahîl Kurt, Yaşar Sari, Ahmet Zîrek, Arslan Ozdemîr, Engîn Kotay,

Roza Erdede, Mehmet Hatîp Dîcle, Kerem Duruk, Leyla Denîz, Nîhayet Taşdemîr, Dîrayet Taşdemîr, Pinar Işik, Esma Guler, Besîme Konca, Fadîle Bayram, Elîf Kaya, Olcay Kanlibaş, Pelguzar Kaygisiz, Pero Dundar, Sara Aktaş, Selma Irmak, Sevî Demîr, Zahîde Besîn, Zeynep Boga, Hacîre Ozdemîr, Takîbe Turgay, Alaattîn Aktaş, Tuncay Korkmaz, Ramazan Debe, Fethî Suvarî, Musa Farîsogullari, Muharrem Erbey, Mahmut Okkan, Nîzamettîn Onar, Zeynel Mat, Abdurrahîm Tanriverdî, Adnan Bayram, İihsan Sevîtek, Mustafa Ocaklik, Osman Ocaklik, Seyîthan Şen û Veysi Akar yên BDP`yî.

Di doza hatî vekirin de , kesên di derbarê wan de biryara girtinê heye lê ne amadene jî evin: Sabrî Ok, Nesrîn Denîz, Nurettîn Demîrtaş, Mustafa Sarikaya, Huseyîn Zorlu, Umît Aydin, Seda Akbaş Can, Ahmet Erden, Fîkrîye Aktaş, Muzeyyen Guneş, Nadîre Nergîz, Ramazan Odemîş, Nesîde Şahîn, Kenan Ayas, Remzî Kartal, Gulabî Dere, Ozlem Tanrikulu, Hamît Arslan, Nazîm Çaglak.

Belê hevalên hêja; Berxwedan li Çiya heye, li deştê heye, li zindana heye. Li gor daxuyaniyên **HPG** Dewleta Tirk bi dewleta Îranê ve di nava hevkariyeka mezin da ne. Di demên pêş me da dibe ku li dijî gerîla operesyonên hevbeş pêk bên. Nûçeyên ku tên guh me bi vî rengî ne. **HPG** ji rayegiştî re ragihand ku ew ê tohla çar gerîla ji wan bistînin.

Îro hevalên me girtin ser Tabura Maden liŞirnaxê. Cemîl Bayik: *“Kes nikarê dengê kurdan qutbike. Em polîsê Danîmark daweta Qandîlê dikin. Bila bên bibînin”* *Em gazî welatperwerê Kurda jî dikin. Du sibê li Danîmark doza Roj tv e heye. Doza Roj tv e ne dozeka ji dorê, li paş vê dozê hêza NATO heye. Bila piştgiriya Roj tv bikin û dawiyê li vê neheqiyê bînin*”



**HPG** nasnama çar gerîlayên di şer de jîyana xwe ji dest dayî eşkerê kirin. hêja Ebdirehman Huseyîn, Huseyîn Akkuş, Cemîl Nayman, Şukran Gulsun.

**Belê hevalên hêja**, îro gelê Kurd lawekî xwe yî din î hêja wenda kir. Wî jî wek her ronekbirê Kurd êş û zindan û penabarî dît. Bi salan ji welatê xwe dûrket û jînan penabariyê tahl tahm kir.

Nivîskarê kurd Torî (Kemal Işik) îşev (18.10.2010) ber bi sibê, seet di 04.00an de, li Stenbolê, wefat kir.



Torî sala 1931-ê li Mêrdîn ji dayik bû. Köy Enstîtusu xwend û bû mamoste. Li ser ziman, dîrok û edebiyata kurdan xebatên wî hene. Piştî 12 .ê îlonê derket derveyî welêt. Di gelek kovaran de nivîsarên wî hatin weşandin. 27 kitêbên wî bi kurdî û tirkî li ser ziman edebiyat û dîrokê hene.

Belê hevalên hêja Ebdirehman Huseyîn, Huseyîn Akkuş, Cemîl Nayman, Şukran Gulsun, Huseyin Ulaş îro, 18/10-2010 a ye.




Du wênê li jêr in çiqas hevdû çiqas pir dişîbînin. Doza yekem di sala 1925 an da li Amedê doza Şêx Saîd bi hevalên wî bû. Piştî dadigehkirineka bi derewa Şêx Saîd bi 45 hevalên wî bi cudaxwaziyê hatin tewanbarkirin û ew darda kirin. Doza îro jî Neviyê wî li Amedê bi cudaxwaziyê 103 şaxsiyet, şaredar, siyasetmederê Kurd tên darizandin.

Li 1925 an hatin darda kirine, di sala 2010 an da ji wan re cezayê muebet tê xwastin. Eger li Tirkiyeyê cezayê dardakirine ranebûya belkî ew jî wek dema 1925 an da bi darda bikirina.

Hûn dibînin di nava 85 salan da di siyasetê Tirkyeyê û qerektera rêvebirên Tirk li ser Kurda qet ti guhertin çê nebûye.

Belê 18 meha di ber vê hinek li malên wan, hinek li karxanê wan û hinek li ser rê ya malê, hinek di erebayên wan da girtin binçava. Lê ti kesî nezanî ew çima hatine girtin û suçê wan çiye. Ew bi çi tê ne tewanbar kirin.

Bi tenê bi wan re gotin; Hûn dê li qereqol bizanin hûn çima hatine binçav kirin. Lê piştî sê roja dest û pîyê wan girê dan, li ber avahiya dadigehê yek û yek kirin rêze, li ber wê germê 6-7 seata dan pandine. Pişt re ew bi nunertiya KCK tewanbar kirin şandin girtingeha Amedê. Ew binçavkirina bi vî rengî li ser nûner û rêvebir, welatparêzên Kurd bi meha ajot. Yanî hemû qadro û liderên BDP hatin girtin. Mepûsên Kurd hatin tehdît kirin, hevserokên DTP ji siyasetê hatin qedexe kirin û mepûsitiya wan ji dest wan hat girtin. Bi vê girtina rêvebirên BDP xwastin ku hêza BDP qels bikin û partiyê belav bikin. Lê bi şunekirin. Kî ji mala xwe de radibû wî/wê wek kelpen pîr digotin bi PKK e bêjin terorîst û navbera xwe PKK e mesafê dexînin.




Piştî 18 meha îro 1o3 ronekbir, siyasetmeder, şaredar û şahsiyetên Kurdê serbilind derdikevin pêşberî dadigehê.

Min duh jî ji we re nivîsandibû ji gelek welatên Ewrûpa parlamenter û mirovên ji berpirsiyariya saziyên mafê mirova berpirsiyar hatibûn Amedê. Îro li dadigehê bûn, doz şopandin. Gelek rojnamevan û nûçevanê bîyan doz şopandin. Bi rastî çavê dinyayê li Amedê bû. Lê Tirk fedî nakin. Ji ber çi xwe fedî bikine. Ji ber qetliyama Ermenî û Ruma fedî bikine. Ji ber 29 qetliyamên ku li ser Kurda kirî fedî bikine! Ji zumla ku li girtingeha Amedê kirî fedî bikine. Rûyê wan bi gu şoştiye. Ew fedî nakin.

Belê hevalên hêja; Di jorî 200 parêzerê Kurd li ber dadigehê amedê bûn ku vê dozê biparêz in. Bi hezaran nûnerê BDP û mepûsên Kurd û welatparêz amedê bûn. “*Em bi we re ne. Doza we doza me ye. Riya we riya me ye.*”

Belê li derva ji beşdar û çavdera pirtir polîsê sivîl, polîsên bi unîform û esker di nava gel da hebûn.

103 BDP/KCK yî li seat **09:30** an da anîn dadigehê, lê doz li seat **11:00** an destpêkir.

Dozger dest bi xwandina navê tewanbara kir.

-Xatip Dîclê.

-Ez wekî berdevkê vê dozê/hevalên xwe, em dê bi Kurdî bi zimanê zikmakî parastina xwe bikin. Birêz dozger ew jî mafê me ye.

-Kîjan Zimanî?




-Kurdî.

-Ma hûn bi Tirkî nizanin?

-Belê em dizanin, lê em dixwazin vî mafê xwe bi kar bînin.

-Dozger, em navber didin vê dozê. Doz li seat 13:30 an destpê bike. Herkes ji salonê derkeve salonê vala bikin.

Seat 13:30 dîsa dest bi dozê hat kirin.

-**Xatip Dîclê**/Mepûsê DEP e. 12 sala di girtingehê da ma.

-Ez li vir im birêz dozger.

- **Necdet Atalay**/şaredarê Elîhê.

-Ez jî li vir im.

-Aydin Budak/Şaredarê Cizîrê.

Ez jî li vir im.




Seat 16:30. Xwandina nava bi dawî bû.

Parêzera serbest bûna mûwekilê xwe xwastin.

-Dozger daxwaza wan red kir.

Binvsînê katîp:bi zimanekî nayê fêm kirin û biyan parêznama xwe hat kirin. Ew zimana ji aliyê dadigehê ve nehatiye fêm kirin. Doz dê sibê dewam bike.

***Medya: Ji realîteya kurd ber bi 'realîteya PKK ê-Rojnamevan Hasan Cemal –Milliyet)



" Gava em li meqamê wî digel Şaredarê Colemêrgê Fadil Bedirhanoglu yê bi ser BDPê ku bi ji sedî 80yê dengan hatiye hilbijartin diaxivîn, wî wiha got:

'Heke ev dewlet hemû riyên Colemêrgê ji rêzan çêke jî bêfêde ye. Heta nasnameya min a kurd û zimanê min ê kurdî înkar bike aştî nayê. Ma gava kolanên ji rêzî cenaze tê re derbas bibin dê bi kêrî çi werin!..."

Van gotinan li hişê xwe qeyd bikin. Çimkî, Bedirhanoglu bi van gotinan 'pirsa kurd' bi kurt û kurmancî vedibêje. Lê hêj hinek vê rastiyê nabînin. Dibêjin, 'bingehê pirsgirêkê nezanî ye, feqîrî ye."

***Li Iraqê jî 'pêşîvekirina kurd' şert e (Erdal Guven – Radikal)

***Doza KCKê dest pê dike (Kurşat Bumîn – Yeni Şafak)

*** Çavê Kurdan û raya giştî ya Ewrûpayê li doza li Amedê ye.


Belê hevalên hêja; Gelê Kurd îro ne tenê li Amedê di nava çalakiyan da bûn. Li Ankarê birek heval û dostên Kurda bi mepûsê Kurd/BDP ve li qonsolosa Danîmarka bûn. Ji bo ku



Roj tv e neyê girtin bi wan re danûstandin pêk anî.

Kurdên li Danmark dijîn, li ber avahiya dadigehê konê piştgirî û şermezar kirina vekirine. "Em destûr nadin ku Roj tve bê girtin"

188 ronekbir, siyasetmeder, dostên gelên bindest, mamostê Zanko, nûnerê YE û Ewrûpayê navdar îlan dan rojnama Danmarka Polîtîka ye da piştgiriya xwe nişan dan.




Belê hevalên hêja; me duh ronekebirê **Kurd Torî** wenda kir. Lê îro gava ku min ji we re ew nivîs û nûçê dinvsandin xebatkar, ronekbire, lêkolînêr, siyasetmederekî Kurdî bi salan xizmeta gelê Kurd kirî **Îsmaîl Goldaş** xatirê xwe ji me xwast çû ser dilovaniya xwe. Birêz Goldaş di nava rêvebiriya **HADEP û DEHAP** e da jî peyvirên giran girtibûn. Ew mêrxwaza bi salan di zîndanan da mabû.

Gelek lêkolînên nivîskarê Kurd Goldaş di rojnameyên **Ozgur Gundem, Welat,** Ozgur Polîtîka, Ozgur Ulke, Demokrasî, Ozgur Bakiş û kovara W de hat weşandin. Di nav xebatên Goldaş de pirtûkên 'Kurdistan Tealî Cemîyetî – 1991 (Civata Berzkirina Kurdistanê) û 'Takriri Sukun Goruşmeleri' – 1998 (Hevdîtinên Pêkanîna Aramiyê) jî hene. Digel dîroka Kurd a serdemên nêzîk û dîroka siyasî ya demên nêzîk a Tirkiyeyê; berhemên wek *"Nînowa û Mayîndayên Wê: Kildaniyên Xrîstiyan ên Kurdistanê', 'Gerek Li Welatên*

*Êzîdiyan ango Şeytanparêzan'*, Lêkolîna Huner û Toreyên Asûriyên Kevn" û *'Surme Xanim'* ji aliyê weşanên Avesta ve dîsa hat weşandin.

Belê ronekbirên delal Torî, Îsmaîl Goldaş îro 19/10-2010 a ye.

"2 doz armanca hevbeş; Birîna dengê Kurdan, şikandina îradeya Kurdan"



Duh li Amdê doza **KCK** hebû. Ew doza îro jî dewam dike. Lê dozeka bi qasî wê pêwist li Ewrûpa bajarê Kopenhagenê jî heye. Îro sê rojin Kurda li ber avahiya dadigeha Amedê û Kopenhagenê konê aşitiye vena ne.

Mêvanê herdu kona jî gelek in.

Li Amedê hewa germê şandayên Ewrûpî wekî li seyrane ne rehet hereket dikin. *"Him ziyaret û him jî ticaret"* Gelê Amedê mêvanên xwe di hembeza xwe de dike mêvan û germ nêzika wan dibe. Bi hezaran welatparêz û xizmên girtiyên KCK li ber avahiya dadigeha bilind in. Şandayên bîyan jî di nava wan da digerin kenokan li wan belav dikin. Lê Kurda zimanê xwe biyan tunen ku derd û êşa dilê xwe ji wan re bêjin. Hineka bi Tirkî, hineka bi Kurdî bi wan re axivin, lê hevdû fêm nakin.

Şandayên bîyan bi çav û dest û mîmîkên xwe bersive didin wan û wan hebez dikin.

-Alîkariya me bikin! Ma va şerê bê sekinandin.....

Belê mêvanê Konê Aşitiyî lê ber dadigeha Kopenhagenê jî min got gelek in. Bi piranî jî Kurdên li Danmark wekî karker dijî ne. Her dayik ji malê xwe da tasek xwarina germ û di turê wê de nanekî derdixîne dide ber çalekvana.



-Bixwin. Hûn îro ji serma da cemidîn. Baran hetanî dev devê sibê dibarî. Hê jî giran giran dibare.

Lê sebra meşvanan nema bû. Ji ber ku ji dozê re seat ma ne. Ji deh deqîqa carekê li seata xwe dinêrin, ka çiqas wext maye ji dozê re ku dest pê bike.

Tirsa wan a herê mezin ew û. Roj tv e bê girtin. Elbet ew di tirsa xwe da mafdar in. Serokê Nato bi eslê xwe Danmarkî Rasmussen heftê borî li Tirkiye yê bû. Ji Tirkiyeyê hêzên mixarîb xwastin ku ew li Afganîstanê şer bikin.

Tirka qerta **Roj tv** e da ber wî. Roj tv bigirin û pişt re bên ji me daxwaza eskera bikin.

Belê hevalên hêja, di ber wê jî gelek cara bûyarê wiha bûn. Med tv e û Medya Tv qurbanê wan polîtkaya bûn. Dozgerê Danmarkî ku Roj tv e gilî  kirî û lê doza girtine vekirî demekê di ber vê li Tirkiye yê bû. Ji bo ku li ser Roj tv e lêkolîna bike. Lê Tirka ew li ser xaliyê sor gerandin û balafir ji wî re tahsîs kirin. Li Hotela Şaraton razandin. Bawulê wî tijî belgeyên sexte kirin ew şandin.

Seat 10:00 li Amed dest bi doza KCK hat kirin.

-Em dixwazin  parastina xwe bi Kurdî bikin.



Seat: 10:15 de dozger ew daxwaza siyasetmederên Kurd, parastina wan a bi Kurdî red kir.

-Hûn bi Tirkî jî dizanin. We di ber wê parastin û îfada xwe bi Tirki dayê.

-Birêz dozger ew mafê me ye ku em bi Kurdî xwe bi zimanê xwe îfade û biparêzin heye. Li gor peymana Lozanê benda 39. Gelên li Tirkiyeyê dijîn dikarin xwe bi zimanê xwe biparêzin û îfade bikin.

-Daxwaza  ji aliyê dadigeh ve hatiye red kirin.

**Seat 10:00** li Ewrûpa. Doza **Roj tv** dest pêkir.

10:15 Serokê Dadgehê biryar da got; “*Jibo desteserkirina hesabên Roj Tv tu delîlek hiqûqî tune ye. Roj tv jî ne saziyeka terorîsta ye*”




**10:16**. Parêzerê Roj Tv ji avahiya dadigeha bilind derket. Bi kêf bû.

Pîroz be! Pîroz be!. Tedbîra li ser hesabe Roj tv e rabû. We qezenç kir. Têkoşîna we qezenç kir. Edeleta Danîmarka adîl qezenç kir. Doz girtina Roj tv ê avêtin sala 2011 an.

Li ber dadigehê govendên serkeftine hatin kişandin. Sloganên “bijî gerîla, bijî têkoşîna gelê Kurd” hatin avêtin. Bi hezaran karkerên Kurd hevdû hembez kirin.

Parêzerê Roj tv ê li ser milê xwe gerandin. “Bijî edelet” **“Em edeleteka wiha li Amedê jî dixwazin”**. Em ji 188 ronekbir, siyasetmeder, rojnamevan û parlamenterê Ewrûpa û yê cîhanê yê navdar re spas dikin ku piştgiriya me kirin. Ew îlana ku wan dayî rojnama Danîmarka bandoreka mezin li ser dadigehê kir.

Belê Amed dikele. Polîs êrîşa ser welatparêze dike. Polîsê sivîl li nêçîra xwe digerin ku wan binçav bikin.

Lê vê carê jî polîsê tirk tundî li ser şandayên bîyan bi kar anîn.

Şandayekî Alman. “Hop hop. Ez ne Kurd im!” Tu nikarî li min tundiyê bikî!

-Ez nikarim ha!?

Bi pînê li şandayekî Alman û Îtalî da.

-Şandayê Îtalî "Êdî bes e" û "Ya basta"!

Îtaliyayê pankarta bi kurdî, tirkî, îngîlîz û îtalî ya "Ji bo hemû kesî azadî" vekirin û dema ku rîngên girtîgehê derbasbûn slogana "Bijî azadî”



Şandaya Alman: "Doza em niha dibînin dozekî polîtîk e. Em vê dadgehê wekî li hemberî gelê kurd zordariyekî nû dibînin. Me dît ku gelê kurd ji bo mafên mirovan têkoşînê didin. Em operasyonên didomin gelek bi guman dibînin. Em dozê wekî bi keyfî dibînin."

Parlamenterê Mûşê yê BDPê Sirri Sakik bi armanca bersivdayîna Serokwezîrê Tirkiyeyê Erdogan got, “Eger ji bo pirsgirêka kurdî çi çareseriyên wî nînin bila demekê neaxive. Gel dê bi xwe ji vê pirsgirêkê re çareseriyekê peyda bike.”




Parlamenterê Mûşê yê BDPê Sirri Sakik jî ji bo gotinên Erdogan got, “Bi uslûbê Erdogan em nikarin pirsgirêkê çareser bikin. Erdogan ji bilî ya xwe, hertiştî red dike. Eger ji bo pirsgirêka kurdî çi çareseriyên wî nînin bila demekê neaxive. Gel dê bi xwe ji vê pirsgirêkê re çareseriyekê peyda bike.”

Dûran Kalkan: Êdî kêr gihiştiye hestî, sebra Kurdan nemaye



Kalkan; Destnîşan kir ku eger Rêberê Gelê Kurd Abdûllah Ocalan 31'ê Cotmehê ji navberê vekişe wê "Aştî pêk neyê" û ev hişyarî kir:"Êdî kêr gihiştiye hestî, sebra Kurdan nemaye.”

Dûran Kalkan da zanîn ku dewlet û hukûmet AKP’yê li gorî sozên hatine dayîn tevnegeriyan e û weha got: "Va ye operasyonên eskerî li her deverê dewam dikine. Serokwezîr bi xwe jî got, amadekirina destûreke nû di rojeva wan de tine ye. Pêşveçûnên di van rojên dawî de aşkera kirin ku dewlet û hukûmet li gorî sozên dabûn tevnagerin."

Kalkan bi bîr xist ku Rêberê Gelê Kurd Ocalan di hevdîtina xwe ya dawî de gotiye, eger hukûmet li ser hîmê çareseriya aştiyane nêzîk nebe û gavên ji dil navêje, ew ê piştî 31'ê Cotmehê ji navberê vekişe..

Kalkan weha axivî:"Bê goman Rêber Apo dikare vekişe. Bila şar neyê fêmkirin. Êdî kêr gihiştiye hestî û sebra Kurdan nemaye. Edî Kurd wê xwe li van lîstikan ranagirin. Hin kes dibêjin eger Ocalan vekişe wê çi biqewime. Ez jî dikarim vê yekê bêjim, eger vekişe wê "Aştî pêk neyê" û çareseriya pirsgirêka Kurd a aştiyane ji rojevê derkeve. Eger aştî pêk neyê jî, encamên çawa wê derkevin holê, ev yek ji aliyê her kesî tê zanîn."




Karayılan, ji bo Rojnama Independent axifî : Serokê Konseya Rêvebir ya KCK’ê Murat Karayılan, li Qendîlê bersiv da pirsen rojnameyê û di derbarê agirbesta demî de careke din bang li dewleta tirk kir û got: ’’Heger tişteke erênî biqewime, em ê jî wê demê agirbestê dirêjtir bikin.’’

Li ser rewşa agirbesta PKK’ê, ku heta dawiya meha Cotmehê wext dabû dewleta tirka, Karayılan weha axifî:’’Ew dema ku ji bo çareseriyeke aşîtixwaz me dayî otorîteyên tirk diqede. Ji bo ku em biryareke nû bidin, hîn15 rojên me hene. Heger di vê navberê de tişteke pozîtîv biqeqime, em ê jî agirbestê dirêjtir bikin. Lê heger gavên konkret neyên avêtin, em ê rewşê binirxînin û ji bo parastina xwe çi pêwîst be em ê wê yekê bikin.’’

Belê hevalên hêja; Piştî axavtina Serokwezira ku partiya BDP destnîşan kirî, li Colemerg û Şirnaxê operesyonên eskerî dest pê kirin. Bi qasî 3000 esker û cardavan li herêma Colemêrgê derketin operesyona. Balafirên şer jî herêm bomba kirin. Li gor îstîxbarata wan birek terorîst li herêmê bûye. Lê ne wiha ye. Destûr ji Serokwezir wergirtin. Avahiya BDP Stanbolê hat moltof kirine.

Lê hev serokê BDP birêz Selhattin Demîrtaş bersiveka li gora bedena wî da.

Xwedê hiş û aqîl bide Serokwezîr Erdogan! Demîrtaş, rexneyên xwe yên li hemberî Erdogan girantir kir û got: Gelo Erdogan ji hiş û mejiyê xwe de winda kiriye. Gelo aqlê xwe xwariye. Ango em li welatekî din dijîn." Demîrtaş, bang li Erdogan kir û xwest ger ku îdîayên der barê BDP'ê de neçespîne îstîfa bike.



"Erdogan di demê dawî de nizane çi dibêje. Bawerim ji mejiyê xwe de amileyat bûye. Di axaftina xwe de partiya me raste rast kir hedef. Her wiha kesên dengê xwe dane partiya me jî kirine hedef. Ev me dixe nava fikaran.

Belê hevalên hêja agir bi derdawê Tirka ketiyê di serî serokwezîr. Îro çend rojin serok hikumata Kurdîstanê birêz Mesût Berzanî li Îtalya bû. Bi gelek der doran re hevdîtin pêk anin û ew vexwandin Kurdîstanê ji bo razan/yatirima.



Lê rêvebirên Tirk gera Mesût Berzanî gav bi gav dişopandin.

Îtalya jî îro biryara xwe ji rayegiştî re da zanin ku ew dê li Hewler konsolosa xwe vekin.

Belê hevalên hêja; îro dîsa lawekî xwe yî ciwan bavê 5 zaroka têkoşer wanda kir. Rasîm Gencer di sala 1993 an da ji aliyê hêzên dewletê ve bi nuneritiya PKK e hatibû girtin. Bi salan di girtingehan da ma. Di sala 1995 an cezayê muebeta li wî birîn. Lê wî gelek cara serî li rêvebiriya girtingehê dabû ew nexweş e. Lê ti kesî ew guhdar nekir. Daxwaza wan ku girtîyên Kurd bimirin.



Lê, Girtingeha Muşê ji girtiyên me re ne bîyane. Şandayên gruba aşitiyê 1999 an a ewila ji Qandîlê hatî jî li girtingeha Muşê girtin. Îsmet Baycan di vê girtingehê weran de jîyana xwe ji dest dabû. Îro jî Rasîm Gencer jîyana xwe ji dest da. Hevalên xwe wî wiha dibêjin;

Girtiyên li Girtîgeha Muşê: Gencer ji ber tunebûna doktoran jîyana xwe ji dest da 09:29 29.10.2010 Girtiyên PAJK û PKK'î yên Girtîgeha Tîpa E ya Muşê, destnîşan kir ku hevalê wan Rasîm Gencer bi qirîza dil jiyana xwe ji dest da, ji ber li girtîgehê bijîşk/doxtor tunebû jiyana xwe ji dest da.

Belê ronekbirên delal Torî, Îsmaîl Goldaş, Rasîm Gencer,  îro 20/10-2010 a ye.




Hûn jî dizanin Kurd di jîyana xwe de qet ti cara şa nebûn, pişta xwe venekirin bi rehetiyekê li mal û li nav zarokên xwe rûneniştin. Ji ber deriyê wan esker, polîs nûnerên Jitemê û polîsê sivîl kêm nebûn. Xizanî û nezanî her daîam para wan bû. Li ser rûyê cîhanê nebûn xwediyê kozikekê jî. Îro hendik bin jî hinek saziyên me hene. Lê ew jî wek stirî di çava dijminan re diçên xar e. Televizyonên Kurda ji roja ku vebûyî pêva bû stirî di çava dewleta Tirka re çû. Hikumata herêma Kurdîstan xewa şeva li dijiminan heram kiriye. Gava ku serokên Başûr Mam Celal û Keke Mesût diçin welatekî bîyan ji bo dîplomasî û têkiliyên bazirganî Tirk, Ereb, Ecem, Faris li wê derê ne. Bi salane dewleta Tirk zextê dide ser dewletên Ewrûpî ku dengê Kurda Med Tv, Medya Tv û Roj tv e bigirin. Med û Medya bi hevakariya Amerîka, bi îhalê mezin, bi bertîla hatin girtin.  Roj tv dest bi weşananên xwe kir. Vê carê jî şaş bûn wî çawa bigirin, ekranên wî çawa reş bikin. Duh biryara dadigeha Danîmarka wek balyozekî li serê dijminên me ket. "*Dest dayina ser hesabên Roj tv ne di cî daye*"




Ew nûça di medya Tirk a de wek flaşşşş ht weşandin; "Ewrûpa dîsa rûyê xwe reş nîşanî me da. Em di wê baweriyê dabûn ku Roj tv e bê girtin. Lê hê jî cesarat dan terorîsta.

Eger Rasmusên serokê Nato ji me eskerên ku li Afganîstanê şer bikin werbigirta Roj tv bihata girtin. Tirkiyeyê eskerên ku şer bikin neşandin Afganîstanê  ji bo wê Roj tv jî nehat girtin.

Belê hevalên hêja; Doza siyasetmederê Kurd KCK li Amedê duh destpêkirî, îro jî dewam kir. Îro jî 104 siyasetmeder wek suçdarên ji dorê bi kelepça anin ber dadigehê. Dîsa li ber dadigehê şandayên bîyan û xizmên girtiya bi sloganan ew pêşwazî kirin.

Îro jî siyasetmedera di parastina Kurdî de îsrar kirin. Dadger navê siyasetmedera yek û yek xwand.



-Xatîp Diclê.../Mepûsê DEP e kevn

-Ez li vir im.

Dadger ser xwe wekî hers bê hêjand.

-Muarem Erbay.../serokê KMM şaxê Amedê



-Ez jî li vir im.

-Ne bi Kurdî. Bi Tirkî hûn bersiv bidine.

-Leyla Gûvên şaredara weranşarê....(Ji Kurdên anadoliye)

-Ez jî li vir im.



-Bi hers. Katîp îdîa name bixwîne! Îro hemû rojê îdîa name hat xwandin. Elbet ne hendike 7500 rûpelin. Kîjanê bixwîne û kîjane nexwîne.

Dadger parêzvana hîşyar kirin. Nêzika bersuça nebin. Bi wan re fizîkî temas nekin.

Seat 17:00 em dê dozê sibê ne du sibê bişopînin.

Gava doz KCK li Amedê pêk dihat Huqûqnasên Ewropayê jî cîvînek pêk anin.

Huqûqnasên Ewropayê: Bila PKK ji lîsteya terorê bê derxistin

Brûksel – Yekitiya Huqûqnasên Ewropayê ya ji bo Demokrasî û Mafên Mirovan (ELDH) û Komeleya Navneteweyî ya Demorasî û Mafên Mirovan (MAF-DAD) ê, daxwaz ji



Ewropa yê kirin, PKKê ji nav lîsteya rêxistinên "terorîsta" de derbixe. Sekreterê Giştî yê ELDHê Thomas Schmidt, Berpirsên MAF-DADê yên Almanyayê Heike Geisweid û Mario Angelelli, rayedarê Sendîkaya Parêzeran a ji bo Demokrasiya Belçîkayê (EDL-AED) Pierre Robert, îro li Brûkselê li ser navên hu qûqnasên 17 welatên Ewropayê, civîneke çapameniyê li dar xistin.

Di daxuyaniya rêxistinên Ewropî de, bal kişandin ser şerê li Tirkiyeyê û hat diyarkirin ku di şer de gelek mirov bûne qurbanî û aboryê jî zirarên mezin dîtiye.

Her wiha rêxistinên Ewropayê biryara xistina PKKê di nav lîsteya rêxistinên terorîst de, "bê wate" zanîn û ji Yekitiya Ewropayê (YE) xwestin, PKKê ji nav rêza rêxistinên terorîst derbixe û di çareseriya pirsgirêka kurd de roleke aktîf bilîze.

Ji aliyekî din, endamê EDL-AEDê Jan Fermon, di civînê de axivî û diyar kir, "lîsteya rêxistinê terorîst" ji zora hêzên rojava hatiye amadekirin. Fermon got, heta dijayetiya li hember diyalog û aştiyê bidome, kurd û Tirkiye jî dê êşên gelek mezin bibînin.
Serokê ELDHê yê Almanyayê Thomas Schmidt jî, wiha axivî, "Hûn niha dibînin encamên lîsteya terorê û doza KCKê. Heke hûn PKKê weke rêxistinek terorîst bibînin, Tirkiye jî dê nûnerên ku bi dengên gel hatine hilbijartin, bigire."

Belê îro jî hevalên me, siyasetmederên me nehatin berda. Du şaredarê din li wê hêjmara



104 an zêde bûn. Du Şaredarê din hatin girtin. Şaredar Lezgîn Bîngol bi hinceta ku di sala 2004 an da axavtinek kiriye hat girtin. Te pesna PKK e kiriye. 10 mehê ceza.

Şaredarê BDP'yî yê navçeya Hezoyê ya bajarê Êlihê Mehmet Reşît Haşîmî bi hinceta propaganda PKK'ê kirî, 7,5 sal lê hat birîn.

-Ma suçê wî çi bûye?

-Mal xiraba tu nizanî çiyê. Şaredar Haşîmî beşdarî xwepêşandana li ber Şaredariya Êlihê bûye û dirûşme berz kiriye. Ji vî suçi girantir suç hene!



Îro du rojin Serok komarê Almanya li Tirkiye yê. Berî ku ew bê Tirkiye yê min bawer dikir û di wê baweriyê da bûm ku. Berî ku ew

bê Tirkiye yê ji bo ku dilê Tirka bikin polîsê Almanê ya êrîşê bibe ser malên welatparêza an saziyên Kurda, yan jî Kurdekî wekî qurban radestî Tirkiyê bike. Ew rûreşiyan gelek cara li welatên Ewrûpa di serî da Almanya pêk tên.

Lê vê carê nebû serok komar kerr çû Tirkiyê ye.

Mesaja wi ya ewil ya Tirkiyeyê ew bû. "*Dewleta Alman di nava hewldanan daye ku fînansa PKK e qut bike. Kar û xebatên me li ser vê hene. Em ji bo mijara terorê cem dostê xwe Tirkin*"

Piştî vê axavtina Serok Komara danê nîvro 50-60 polîsê Alman digel kuçik, panzerên xwe komala Kurdaya Hannowerê dagir kirin û bi qasî 30 kesî girtê binçava.

Alman bi panzera êrîş dagir dike, Tirkiye bi helîkoptera wê dikin.

Elbet ew ne cara yekemîne ku polîsê Alman êrîşê dibe ser sazî û malên Kurda û Kurda digire binçava. Kurd/PKK e yî li Almanya jî wek stirî di çavê polîsê Alman re diçê xar e.

Ew hevkarê hevin. Îro dîsa li paş deriyê girtî bazara Kurda li Ankarê tê kirin. Nizanim kîjan îhalê bê dayin.

***Ji serê salê 2010 pêva polîsê Alman 11 cara girt ser malên welatparêz û saziyên Kurda.

***Di sala 2007-2008 de 10 carî girt ser malên welatparêza. 140 welatparêz hatin binçav kirin.



***Di sala 2009 an da 17 cara girt ser malên welatparêza û 6 welatparêz bi rojan girtin binçava.

Li Tirkiye yê wek nûçeya flaşşş hat weşandin. 'Polîsê Alman derbeyeka giran li PKK e da. Bi qasî 30 PKK e yî hatin binçav kirin.

Di aynî demê da polîsên Tirk jî li bajarê Wanê, Stanbol û Mersînê gelek kes girtin binçava. Li Wanê erebeyên sivîla hatin gulê baran kirin, ew wekî endamên PKK e nîşan dan. PKK yî ya panzera polîsên me gulê baran kirine, polîsekî me birîndar ketiye. Terorîst bi erebeyeka din reviyane. Lê polîsê me w ereba ku pê terorîst reviyayî dîtin.

Vay vay! Çi bibînî hundirê erebe tijî çek û bombe bûye!

KCK ew derew in derxistin. "*Ti têkiliyên me bi wê bûyarê tune. Ew provakasyone*"

**Belê hevalên hêja**; Termê gerîlla Cemîl Nayman/ Tayhan Ûmût ji aliyê deh hezaran ve li Mersînê bi alên KCK/HPG bi posterên Ocalan hat binaxkirin.




Di navbera polîsa xwepêşavanan da pêvçûn derket. Kurda Mersîn kirin qada şer. *'PKK gel e, gel li vir e', 'Bijî Serok Apo', 'Şehîd Namirin', 'Tolhildan tolhildan', 'Em ê derkevin çiyê û hesab bibirsin'.*

Cîgirê Midurê Emnîyeta Mêrsînê Hîkmet Bûlak di 3 cihê xwe de hat kêrkirin. Piştî defîn kirina gerîla Cemîl polîs bi mal bi mal kete 8 kes girtin binçava.

Cemîl ji bajarê Muşê bû. Lê Muşê îro şehîdekî xwe yî din hebû.

Belê hevalên hêja; hevdîtina bi serok Ocalan re dîsa wek berê hat asteng kirin. Rewşa hewa asteng bû.

Belê ronekbirên delal Torî, Îsmaîl Goldaş, Rasîm Gencer, îro 21/10-2010 a ye.

Belê hevalên delal, heyet û şandayê Ewrûpa hêviya xwe ji berdana siyasetmderên Kurd birîn. Giran giran diçin welatê xwe. Sibê heyeta dawî here Îtalya. Dewleta Tirk bi xwandina 7500 rûpel îdîanameê da bi îsrarê. Ew xwandina jî du sê hefta biajo. Bi girtiyên siyasî îşkenca dikin. Li ber avahiya dadigehê konê aşitiyê venaye. Gelek dost û yarên me tên zîyart dikin. "Em li vir in".




Îro PJAK e jî ji bo çareserkirina pirsê dekleresyonek belav kir.

JI PJAK ê 7 XALÊN ÇARESERIYÊ



Partiya Jiyana Azad ya Kurdistanê di beşê çareseriya pirsgirêka kurd li Rojhilatê Kurdistanê de wiha dibêje; "*Em wekî PJAK di çaresriya pirsgirêka kurd bi riyên aştiyane û siyasî de bi israr in. Heger dewlet ber bi vî aliyî ve gavan bavêje, ti wateya şer û pevçûnan namîne. Ragihandina biryara ragirtina çalakiyên eskerî di du salên bûrî de ji*

*aliyê partiya me ve, belgeye herî berbiçav û eşkere ya vê niyeta me ya samîmî ye. Divê Komara Îslamî ya Îranê bizanibe ku PJAK di her derbarê de xwedî hêz e û di rêbazên çareseriya siyasî û demokratîk de bi israr e.*"

## ÇARESERIYA DI NAVA SÎNORÊN ÎRO DE

**1 -** Naskirina pirsgirêka kurd li Îranê bi awayekî fermî û çareseriya pirsgirêkê bi rêbazên demokratîk û bi riya dîyalogê.

**2 -** Ji bo ku di nav kêş û hewayeke siyasî û demokratîk de ber bi çareseriyê gav bêne avêtin, divê zemînê rûniştin û hevdîtinan pêk were.

**3 -** Ji bo ku zemînê diyalog, muzakere û çaresriya siyasî pêşbikeve, divê kêş û hewayek guncavî aram û ji şîdetê dûr ku siyaset bikaribe rola xwe bilîze were afirandin. Her weha divê operasyonên eskerî bêne ragirtin.

**4 -** Ji bo çareseriya pirsgirêkên gelan û ji bo ku di pratîkê de ev ji aliyê siyasî, aborî, bîr û raya azad û di heman demê de îradeya cewherî ya gelan pêk bê, divê hemû ew maf werin garantîkirin û astengiyên heyî bêne rakirin.

**5 -** Naskirina mafê xwebirêxistinkirin û çalakiyên siyasî û demokratîk yê gelan.

**6 -** Gelek ku bê ziman hatibe hiştin, mirov nikare wî wekî gel bi nav bike û nikare jî behsa mafên wî gelî bike. Lewra, ji hemû cewherên xwe yên ferhengî, etnîkî û neteweyî tê qutkirin. Bi fermîkirina zimanên gelan û bi taybetî jî zimanê kurdî, perwerde, pêşxistin û bikaranîna zimanê dayikê di hemû qadan de û di daîreyên dewletî û nedewletî de şertekî serke ye.

**7 -** Ji bo jinavbirina keş û hewaya tirsê û ji bo sazkirina hewayeke demokratîkî û ji bo beşdariyeke azad, azadkirina girityên siyasî û ragiritna qanûna îdamê şeretekî bênîqaş û derengmayî ye.

Belê ronekbirên delal Torî, Îsmaîl Goldaş, Rasîm Gencer, îro 22/10-2010 a ye.

Îro jî gelê Kurd bi hezaran li ber deriyê dadigeh û şaredariyê Amedê kom bibûn û piştgirî dan siyasetmederên xwe.

Li Edenê jî li ber avahiya dadigehê bi sedan welatparêz kom bibûn. Li wir jî doza KCK hebû.




Îro jî dest û pîyê siyasetmederên me girêdabûn anîn ber dadigehê.

Elbet Kurd van rojan tijî heqeret û rûreş ji bîrnakin. Disa wek berê li dadigehê nav hatin xwandin.

-Ez li vir im.

Siyasetmedera dîsa xwastin ku bi zinaê xwe parastina xwe bikin. Parastina xwe bi kurdî kirin. Zimanê me rûmeta me ye gotin.

Li derva jî gel slogan diavêtin."Azadiya siyasemetdarên kurd azadiya gelê kurd e", "Bila siyasetmedarên Kurd neyên darizandin, bila yên ku 4 hezar gundên Kurdan şewitandin bêne darizandin", "Em xweseriya demokratik silav dikin", "Em berxwedana we ya bi rûmet silav dikin", "Azadî jı bo siyasetmedarên demokratîk", "Ji qirkirina siyasî re dawî ji girtiyan re azadî", "Parastina bi Kurd û parastina gel e Kurd e" û "Hûn nikarin kelemçe li zimanê me bixin" vekirin û diruşmên "Ocalan", "Bijî serok Apo" û "PKK gele gel li vir e." qêriyan.

Ji îdîa nameya 7500 rûpelî bi tenê 225 rûpel hatin xwandine. Şandayên Ewrûpa ji ber dozê aciz bûn çûn welatê xwe.

Di danişîna 4'emîn de dîsa ti kes nehat berdan. Danişîn taloxî 25'ê Cotmehê kirin.

Li Amedê cîgira Serokê Koma BDP'ê Ayla Akat Ata, diyar kir ku şertê wan î yekemîn, gava çareseriya pirsgirêkê serbest berdana 1700 siyasetmedarên kurd e.



Belê hevalên hêja; îro roja înê. Li çarşemê parêzerê ji ber mixelefeta hewayê bi serok Ocalan re hevdîtin pêk ne anîbû. Lê ne wiha bû.

Dîsa rovî di serê Tirkan da digerine û kemîna çê dikine. Îro jî parêzer hatin gemlkê ku herin Îmraliyê vê carê jî Keştî xirab e em nikarin herin.

Belê dewleta Tirk li dijî Kurda di nava planên bi qirêj daye. Îro jî bi hezaran esker li sînor bicîh kirin. Li Amedê balafirên şer li hewa vedilîstin. Li seat 13:00 an herêma Zaxo bombe kirin. Di vê bombeyê da gundiyek giran birîndar bûye.




Haber Turk: Baydemir: PKK vê dozê berde jî ez bernadim

-Şaredarê Diyarbekirê Osman Baydemir got, “*Kadroyên siyaseta legal a kurd bi zanebûn di vê rê de ne, ger PKK ji rê vegere jî êdî ez bernadim.*”

Baydemir duh êvarê beşdarî bernameya “Türkiye’nin Nabzı” a Televîzyona Habertürkê bû û nivîskar û rojnamevan Oral Çalışlar jî di nav de pirsên rojnamevan û akademisyenan bersivandin.

**Baydemir got**, doza ku niha bi navê “Doza KCK ê” tê meşandin bi tevahî ser manipulasyonê ye û armanc jî girtina deriyên siyaseta legal e. Baydemir wiha axivî:

*“Serokê Desteya Rêveber a KCKê Murat Karayılan e. Ger ew serokê vê be ez çawa dibim endam. Di doznameya 7 hezar rûpelan de çalekiyekê tundî jî nîn e. Kêrek mêwe jî wek emrazê tundiyê nîn e. Wê demê çima ez bi 39 salan têm darizandin.”*

Baydemir got, “Bi girtina aktorên siyaseta legal, pêşiya siyaseta legal nayê vekirin. Bi şaş nîşandanê, manipule kirinê jî pêşî nayê vekirin.” Baydemir “Operasyona KCKê” jî wek “fiyasko” bi nav kir û wiha axivî:

“Divê gerîlayek, leşkerek û polîsek jî jiyana xwe ji dest nede. Ji ber PKK heye, kes nikare mafên bingehîn ên kurdan nebîne. Siyaseta înkarê ya 80 salan û zext û êşkenceyên 12ê îlonê PKK derxist holê.”

Baydemir got, “*PKK êdî rola xwe lîstiye û êdî dema mîsyona siyaseta legal e. Baweriya min ev e ku, di dawî de PKK dê dakeve, hinek ji wan di nava BDPê û hinek jî di nava CHPê yan jî di nava partiyeke nû de bixebitin. Divê em ji vê nerehet nebin.*”

Îdîayeka di nav rayegiştî de heye tê gotin. Dibêjin; Serokê MÎT e **Hakan Fîdan** demekê di ber vê çûbû Başûr bi gelek kesan re hevdîtin pêk anî bû. Bi birayê **Ocalan Osman** re jî li navçeya Ankawaya Hewlêrê bi Osman Ocalan re hevdîtinek pêk anî ye.

Ji MÎT'ê vexwendin "Were Osman were"



Li gorî îdîaya malpera Lêkolîn ya weke Navenda Lêkolînên Stratejîk a Kurdistanê tê nasîn ku li Başûrê Kurdistanê weşanê dike, dewleta Tirk êdî dixwaze Osamn Ocalan li Tirkiyeyê bibîne.

4 ASTÊN PLANÊ

Li gorî nûçeya malpera Lêkolîn ya bi îmzaya Goran Akrêyî, dewleta Tirk dixwaze bi çar astan vê planê li dijî PKK'ê pêk bîne:

1-Wê jibo rawestandin û anîna PKK'ê zemînek bê avakirin.

2-Wê hewl bidin ku di nava PKK'ê de dijberî û moral xirabkirinê biafirinîn.

3-Li Bakûrê Kurdistanê afirandina pêkhatineke alternatîf ya xeta PKK-BDP'ê.

4-Bi alîkariya hêzên herêmê, lidarxistina operasyonek berfireh li dijî Herêmên Parastinê yên Medyayê.

Belê ronekbirên delal Torî, Îsmaîl Golda, Rasîm Gencer, îro 25/10-2010 a ye.



Îro çend rojin li herêma Dersimê Xozat, Pilemûrîye û Qisle operesyonên eskerî li dijî gerîla hene. Duh gerîla girtin ser qereqol, polîsek birîndar bibûn, li gor çavkaniyên herêmê gerîlayekî jî şehîd ketiye. Lê rast bû. Bawer Kotik birîndar ketibû lê wî bombe li ser xwe teqand. Dîsa jî teslima dijmin nebû. Ew îro ji aliyê hezaran ve hat pêwazî kirin û ji aliyê hezaran ve jî bi sloganên "Şehîd namirin hat defn kirin."

Belê hevalên hêja; Dîsa duh HPG nasnama du birayên k udi sala 1993 an da şehîd ketî ji rayagiştî re dan zanin. Aysel Ozer, Hayretin Ozer.



HPG daxuyanî da ku di şerê Dersimê de 4 tîmên taybetî jî hatine kuştin.

Ji KCK Duran Kalkan daxuyanî da rayagiştî got;

JI KCK Duran Kalkan: 6 XALÊN LIHEVKIRINÊ EŞKERE KIRIN

1-Rewşa rawestandina pêvçûnan divê ji aliyê her du aliyan ve were parastin, û operasyon neyên lidarxistin.



2-Xebatên Destûreke Bingehîn a Nû wê bên destpêkirin.

3-Ji bo çareseriya demokratîk û aştiyane ya pirsgirêka Kurd protokola ewlehiyê wê bê amadekirin..

4-Komîsyona Lêkolînkirina Heqîqetan wê bê sazkirin..

5-Ji bo ku xalên çareseriyê baştir bên bicihanîn, divê şert û mercên Ocalan bên sererastkirin.

6-Kesên bi operasyonên qirkirina siyasî hatine girtin, divê bên berdan û operasyonên qirkirana siyasî bên rawestantin.. Em nunerê dewletê v ali ser şeş xala li hev hatibûn. Me ji bo wê agirbest yekalê îlan kiribê. Lê dewlet li ser soza xwe nasekine. Şertê me yî yekemîn operesyon bên sekinandin. Soza qanuna bingehiya nuh, rewşa serok Ocalan bê başkirin. Hevdîtin bi serok Ocalan re bên domandin. Doza KCK e. Hevalên me bên berdan'**.**

Belê, Îro rûniştina doza KCK pençemîn li Amedê dewam hebû. Îro jî îdîanamê hat xwandin. Dîsa




siyasetmederê Kurd bersiv bi Kurdî dan. Dîsa wek berê navber dan dozê, dozger û dadger bi hev şewîrîn. Em çawa bikin. Îro jî ti kes nehat berdane. Xwandina îdîanamê dê sibê jê biajo.

Pekî ew siyasetmeder, parêzvanên mafê mirova bi çi suçî tên suçdar kirin?

-Bi derew, rûreşî, bextreşî, komplo, telefon guhdar kirin û endematiya KCK/PKK. Yekitî û bihevrebûna dewletê xera dikin", "Rêveberên rêxistinê û endamên wê ne", "alîkariya rêxistinê kirine"

Daxwaza û hêviya Kurda ku bi salane li hêviyê bûn, îro li Qandîlê pêk hat. Gaveka biçûk e, lê bi nirxe. Yekitiya me nîşan dide. Duh li Amedê jî kongra HAK-PAR ê hebû. Gelek şahsiyetên giran li wê kongrê beşdar bibûn. Digel wan BDP jî hatibû vexwandin. Mepûsê BDP Hamît geylanî û Xaticê Çoban jî li wê kongerê hazir bûn. Ji bom e kêfxweşiyê.

Parlamenter ji bo konferansa neteweyî li Qendîlê bûn.



Şanda Yekitiya Parlementerên Kurdistanê, di bin serokatiya Serokê Yekitiya Parlementerên Kurdistanê Nîmet Ebdullah û Alîkara wî Kerîm Behrî Bradost ji aliyê Serokê Konseya Rêveber a KCK'ê Murat Karayilan û Endamê Konseya Serokatiya Rêvebir a KCK'ê hat pêşwazîkirin.

Hat zanîn ku di hevdîtina şanda Yekitiya Parlementerên Kurdistan û rayedarên **KCK'ê** de xebatên jibo yekitiya netewî hatiye nîqaşkirin.

Hat diyarkirin ku hevdîtin jibo xebatên konferansa netewî ya kurdan ku wê pêk bê, pêk hatiye.

Belê şehîdê delal Bawer Kotik, Rasim Gencer, îro 26/10-2010 a ye.

Belê hevalên hêja; duh li seat 22:00 e an i nîvê şevê da cîgirê Serokwezirê hikumata herêma Kurdîstan Neçîrvan Bezanî ji nuşkava hat Tirkiye yê. Înşallah ji xêre re hat. Îro bi Serokwezir û wezîrê derva Ahmet Davutoglu re bi qasî du seata hevdîtin pêk anin. Mijara hatine ne diyare. (Foto Berzanî Erdogan daweta Kurdîstanê kir)



Belê, du roja di ber vê hat diyarkirine ku mepûsa Kurda kevn Aysel Tugluk a du hefta di ber vê wek parêzer çûbû serdana serok Ocalan û bi birêz Ocalan re bi qasî 4-5 seata hevdîtin pêk anî bû. Gava ku ew ji girava Îmraliyê vegerî hat. Bersiv da pirsên çepemeniyê got; "Em ji ya duh hê nêziktira aşitiyê ne." Rayagiştiya Tirkiyê jî raygiştiya Kurda jî bi vê mesaja Aysel Tugluk ê ji cem birêz Ocalan anî kêfxweş bû.



Lê aliyê din dewletê ji operesyonên eskerî û yên sevîl ti kêm nebûn. Li dijî Kurda û siyasetmederê Kurd operesyon hê jî zêdebû kirin. Li Rihayê û Şirnaxê siyasetmeder hatin girtin û bi deh sala cezayê giran lê hatin birîne. **Şaredar Lezgîn Bîngol** 7,5 ceza lê hatin birîn niha di girtingehê daye**.** Şaredarê BDP'yî yê navçeya Hezoyê ya bajarê Êlihê Mehmet Reşît Haşîmî bi deh meha ceza kirin. Ew jî niha digirtingehê daye**. "**Me dipa ku hevalên me bên berdan lê em ê hatin girtin"

Ji bo ku Aysel Tugluk û bi parêzerên din ve careka din herê Îmraliyê serî li dozgeriya Gemlîk Bursayê xistibû. Nunerê hikumatê jî ji vê hevdîtine xebera xwe hebû. Di serî da wezîrê dadê ji vê hevdîtine xeberdar bû. Bersiva Gemlîkê ne erênî bû.

Gotin sibê li behra Marmarayê bahoz heye. Ji bo wê em nikarin herin. Carê berê jî li parêzer û mepûsa Kurda kevn Aysel Tugluk wiha astengiya derxistibûn. Lê wezîrê dadê ji wan re keştiyek kirê kiribû.

Vê carê jî Aysel û hevalên wê ji bo ku agirbesta ku ji aliya PKK e ve hatî îlan kirine û dema wê hetanî 31 cotmeh ê . Xwastin ma dema wê dirêj bibe biçên Îmraliyê.

Ew dê 31 cotmehê careka din serî li dadigehê xînin ji bo çûyine.




Belê, îro jî rûniştina doza **154 KCK** li ya li Amedê dom kir. Îro jî ti kes serbst nehat berdan. Siyasetmederên me bi Kurdî parastina xwe kirin. Rastî êrîşên dozger û dadger hatin.

-Bila bi Tirkî bi axivin. Em ji vî zimanî fêm nakin.

-Birêz dozger tu jê fêm nakî lê em jê fêm dikin. Ew rûreşî û bextreşiyên di dosyayê de ji bo me hatine gotin, hemû derew in.

Li qata 6 an doza KCK hebû. Li qata 5 an jî doza xwarziya birêz Ocalan (Foto ji doza KCK dîsa tahliyê çikmadi)

Ocalan Dîlek Ocalan hebû. Dadê li wê 7 sal, yek mehê ceza birîn.




-Çi bûyê suçê wê?

-Du sala di ber vê li 4 nîsanê gava ku bi hezaran welatparêz ji bo rojbûna birêz Oclan hatine gundê birêz Ocalan Amara, wê wêneyê Ocalan xalê xwe kiriye dest xwe bi mêvana re gotiyê hûn bi xêr hatin, li ser serê me hatin.

**Wekî din çi bû?**



Turk û Tuglukê ji bo îadeya parlamenteriya xwe serî li serokê meclîsê dan. Ji ber ku li Tirkiyeyê qanuna bingehî hatibû guherandin, mafê wan heye dîsa bên ser wazîfa xwe ya mepûsiyê. Mafê wan bê îada kirin. Lê ew Kurd in belkî jî wî mafî dîsa îada wan nekin. Em dê li rojên pêş helwesat dewleta Tirk bibînin.

Belê şehîdê delal Bawer Kotik Yusuf Şahin, Rasim Gencer, îro 27/10-2010 a ye.

Siyasetmedarên kurd di xwe parastina bi kurdî de israr dikin



Belê hevalên hêja; îro jî li Amedê rûniştina doza KCK 7 emîn heye. Îro jî wek berê îdîanamê hat xwandin. Îro jî siyasetmederê Kurd parastina xwe de bi Kurdî îsrar kirin. Dîsa

daxwaza wan paraztina bi Kurdî ji aliyê dozger ve hat red kirin.

Dozger ji wan re 1775 sal ceza dixwaz e. Li salonê 104 girtî 51 ne yên girtî tên darizandin. Li ber dadigehê bi hezaran xismê girtiya hene. Ji zibil pirtir esker û polîsên bi unîform û ên sivîl hene. Polîs û esker bi nava xizmên girtiya ketiye li ser wan rengên kesk, sor û zer top dike. "Ma hûn nizanin. Ew rengana qedexê ne".

Di salona dadigehê de 154 siyasetmederê Kurd henen, bi qasî wan jî polîs, Jandermê jî hene. Her yekî xwe dayê kêleka siyasetmederekî kurd. Destûrê nadin ew li rast û çepê binêrin bi zar û zeç, jin dê û bavê xwe silav bikin.

Qedexe bûye.

Heyetên biyan û parêzvan. Rojnamevan bi vê helwesata dadigehê kenin.

Dozger. **"Hûn bi çi dikenin. Ez ê we ji hundirê salonê bi derxînim ha!!"**

Katiba dozger dest bi nav xwandin îdîanamê kir.

-Cebraîl Kurt.

-Ez li vir im.

Dozger di bin çavan re li wî nêrî.

-Bixwêne keça min.....

Osman Baydemîr.

-Ez jî liv im.

-Firat....

-Nexweş e nexweş...

Belê hevalên hêja; Gava ku li hundirê dadigehê siyasetmederê Kurd dihatin darzandin. Di ber avahiya dadigeh re jî bi dehan tanq, top û wasaîtên zirh derbas dibûn û pişt wan jî esker bi marşa Yûzûncî yil ramp ramp,"eskerê herî mezin eskerê me ne" derbas bûn. Li Colemêrgê ji wesaîtên polisa polisên bi maskê li kolanan numaîş dikirin. Bi wan helwestê xwe çav tirsandine dide Kurda. Di ber wê jî gelek cara wiha bû.

Berî dadigehê duh şaredarê Amedê birêz Osman Baydemir bi rojnama Fransa nav û deng Franse L'Humanite re roportaj da got: "Em parlementoya herêmî dixwazin".

- Şaredarê Amedê Osman Baydemir nerazîbûnek tund nîşanî sucdarkirina bi 'terorîzmê'



da û got; "Ger daxwaza min ya jibo çand, nasmame û zimanê min suc be, belê ez sucdarim"Baydemir diyar kir ku ew ne dijî Meclîsa Tirk (TBMM) lê meclîsek herêmî dixwazin.

Şaredarê Amedê yê ku ew jî ji Doza KCK'ê di nava hilbijartî û parêzvanên mafê mirovan yên kurd de tê darezandin, hevpeyvînek bi rojnameya **Franse** L'Humanite re kir. Medya Tirk dîsa wek berê got; Osman Tewş diaxivêe.

Em bên ser doza KCK.

Rojnamevan Ece Temelkural ji mirovên li ber dadigehê kom bûyî dipirsê, meriv an xizmên



we jî teva wan girtiyan hene?

-Belê hene. Ew hemû meriv û xizmên me ne.

-Belê rast dibêje, ew ewledê bedana wanin.

Ece xanim wiha dewam dike. Dewletê li Amedê bi tenê razayên xwe avahiyên qereqol, dadigeh girtingeh in. Ne dibistanin, ne jî zanko ne. Gelê Kurd di wan avahiyan de tê darizandin. Em jî li wan temaşê dikin.

Ew doza dozeka giran e. Lê ne heqî yê li dozê dibin, ji dozê girantir in.

Katibên dadê îdîa name dixwînin. Lê ti kes wê guhdar nake. Herkes di xew ve diçe. Dozger û dadger jî bawûşkê kur dikşînin. Ew dizanin ku li hundirê dadigehê şanoyek dileyze. Lê çi bikin. Li benda 31 cotmehê ne. Ka li 31 cotmehê PKK e pêvajoya agirbestê dirêj bike an na.

Girtiya 6 seata di ber seata derbikevin ber dadigehê tînin û 30 kesî ji wan dikin odeye 6 kesa. Ew bi kelepça bêav û nan 14 seata dipên. Ji ber ku wasaitên ku girtiya dibin û tînin kêm in. Rîngek/wasaitek çar pênç cara diçê û tê. Yanî li Kurda û temsîlvanê Kurda îşkenceyên giran tên kirin.

Parêzvan Sezgîn Tanrikulu jî dibêje; " *Dewlet li vir ketiye hewldanên ku avahiyên wek qereqol, girtingeha, nizamiyê ava bike. Niha em li bendene kîngê bên me bibin û di wan avahiyan da bidarzînin. Encama dozê hema hema eşkerê bû. Televizyona dewletê Trt duh siyasetmederê Kurd wek suçdarê adî nirxandin got; "Doza mirovên ku Tirkiyê di xwîne de vetisandî". Elbet ew gotina ne gotina Trt e tenê. Ew gotina ji jor bi talîmata hatine.*"



Parêzvanê mafê mirova yî Parisê Martin Pradel: “*Li Amedê gelê Kurdî ku aşitiyê dixwaze li ser navê KCK tê darizandin. Li vê dozê gelê kurd tê darizandin. Mafê mirova tê bin pê kirin. Seroka* ***FIDEHÊ Belhassen*** *helnenan hundirê salonê. Divê YE wan ne heqiyan bibîne.* ***Gelek tê darizandin***”

Birêz Karayilan îra daxuyanî da got; “Wê Kurd dadgeha xwe bi xwe ava bikin!”



- Dîwana Dada Bilind a KCK’ê di civîna lidarxist de biryarek dîrokî da. Dîwanê biryara “Li şûna dadgehên saziyên dagirker û înkarkeran, em ê dadgeha xwe ya demokratîk ava bikin. Dîwana Dadê ya KCK’ê tawanên (sûcên) di şerê 30 salan de hatî meşandin xist nava belgeyek û biryar da ku wan belgeyan bibin hiquqa

Dîwana Dada Bilind a Koma Civakên Kurdistanê (KCK) di navbera 17 û 21’ên Cotmehê de bi tevlîbûna endam, sazî û nûnerên KCK’ê civîn pêk anîn. Di civîna ku bi şîara ‘Gelê Kurdistanê Dê Dada Xwe Ya Azad, Demokratîk û Civakî Pêk Bîne’ de biryarên dîrokî hatin wergirtin. Em ê rojekê wan neyarê gelê Kurd li wê dadigehê bi darzînin.”

Belê hevalên hêja; îro jî operesyonên siyasî û eskerî li Kurdîstanê hebûn.

Li çiyayê Kato bi qasî 1500 esker derketibûn operesyona. Li herêma Şirnaq û Colemêrgê dengê topa digiheşt nava bajer. Balafirên şer li ser herêm nizm difirin. Piştî balafira vê carê Helîkopter fir in. Herêm wekî Filîstin- GAZZ E bibû.

Li Sînopê wasaîteka eskerî hat gulê baran kirin. Du esker birînda ketin. Piştî ku bûyar hat bîstin balafir, helîkopter û bi sedan esker ketin duv çalekvana.

**Li Stenbol û Wanê 6 kes hatin binçavkirin

**Li Colemêrgê 6 kesên din hatin binçavkirin

**Li Mêrsînê 2 li Colemêrgê kesek hatin binçavkirin.

Cîgirê Şaredarê Tatwanê Çetîn Yilmaz hat girtin. Deh mehê cezayî wî hebûn.

-Çi kiribû wî?

Bi hinceta ‘propagandaya rêxistina PKK kiriye hatiye girtin.

Belê hevalên hêja îro Kurd/BDP yî mêvanê Karsazê bûn. Tusiad:

Seroka Karsazê Umut Boyner: Divê benda hilbijartinê teqez bê guhertin. Divê kurd di parlamentoyê de hebin



- Hevserokên BDP'ê Gultan Kişanak û Selhedîn Demîrtaş di çarçovaya gera rêxistinên civakî ên sivîl ên ji bo destûra bingehîn ya nû de çûn serdana TUSÎAD'ê. Piştî serdanê Seroka TUSÎAD'ê Umît Boyner, diyar kir ku pirsgirêka Tirkiyeyê ya herî girîng pirsgirêka kurd e û wiha got: "Di pêvajoya destûra bingehîna nû divê nasname, azadî û cudayiya hêzan bê nîqaşkirin. Ya girîng ew ku em dê çawa mutabakatê pêkbînin. Di vê xalê de me dît ku em û BDP wekî hev difirkirin." Herwiha Boyner diyar kir ku "Divê benda hilbijartinê teqez bê guhertin."

Belê di ser Tirkiyê re Neçîrvan Berzanî derbas bû. Pisporê Başpr Îlknur Çelik wiha dibêje.

-Birêz Îlknur têkiliyên te bi Kurdên Başûr re heye. Neçîrvan Berzanî ji bo çi hat Tirkiyeyê?

Kenekî sivik.

-Rojekê di ber hatina Neçîravan Berzanî wezîrê me yî derva Ahmet Davutoglu bi serokê herêmê Mesût Berzanî re bi rêya telefonê hevdîtinek pêk anî.

-Çi axivin?

-Rewşa Kerkûkê, rewşa hikumata Îraqê ku 6 mehenê saz nebûye. Rewşa Îranê heye. Ji bo wê Mesût Berzanî Neçirvan Berzanî bil ez û bez şand Tirkiyê ye. Tirkiyê jî ji vê hatina Berzanî Memnun bû û daxwazên xwe û polîtîka xwe ya herêmê ragihand Mesût Berzanî.

-Îro MGK ji li hev civiyan. Ew civîna 6 seata dewam kir.

-Mijar çi bû?

Dîsa kenekî sivik. Hûn jî wê ji min baştir dizanin.

-PKK e bû.Têkoşîna dijî PKK'ê dê bi biryar bidome bû. Dirêjkirina agirbestê bû. Hatina Neçîrvan Berzanî bû. Xalên pirtûka sor bûn. Ji dewltên YE xwastin ku bi PKK e re alîkariya lojistik nekin. Doza KCK bû. Opersyonên li Başûr bên kirine bû. Rojev tijî bû.

-Tu bawer dikî li herêmê Tirkiyê operesyona pêk bîne?

-Wiha tê xuya kirin.

Belê şehîdê delal Bawer Kotik Yusuf Şahîn, Rasim Gencer,  îro 28/10-2010 a ye.

Doza KCK ê siyasetmederê Kurd li Amedê pêk tê navber hat dayin. Ji bo ku sibê cejna Komara Tirkiye yê. Ez bi wê re dibêjim cejna qirkirina gelên li Tirkiyeyê dijîn, jenosîd ê, talan e.



Li alaniya heyetên ku hatî Amedê doza KCK şopandî didome. Ji heyeta siyasetvanê Fransî Samouelian li Parîsê çepemenî bi darxist got; *“Li Tirkiyeyê wahşet heye. Kurda wek dema Musolîn didine tên dadigeh kirin. Min ti cara dîmenên wiha nedin. Ez bi wan dîmenan gelek xemgîn bûm. Siyasetmederê Kurd hatine kelepçê kirin. Li Amedê orfî îdarê heye. Polîs di dûv me qul bi qul digerîn. Ew erjengiya ku min li Amedê li dijî siyasetmederê Kurda dîtî ez bi girî kirim. Dinya li Kurda bûye temaşevan.”*

Belê hevalên hêja; îro Cizîriya Botan lawekî xwe yî hêja bi tilîlî û slogana defin kirin. Termê wî îro 50 roje li nexweşxana Meletye yê. Dewletê dest dabû ser wî. Lê Kurd jî 50 rojin li ber nexweşxanê ne di nobetê dane ku termê Yusuf werbigirin. Îro ji aliya 15 hezaran ve li Cizîra Botan bi sloganên "Ey şehîd xwîna te li erdê namîne", "Şehît Namirin", "PKK gele, gel li vire", "Ey şehîd riya te riya me ye", "Kujêr Erdogan", "Tolhildan" û "Bijî Serok Apo" hat pêşwazî kirin û li kêleka **Mepûsê Kurd Orhan Dogan** bin ax kirin.



De ware bi van bêbavan re aşitiyê bike, destê xwe pag dirêja van hovana bike. **HPG** bilançoya cotmehê ji rayegiştî re ragihand. **Di mehekê de 30 operasyon, 27 topbaran**

Li gorî daxuyaniya Navenda Ragihandin û Çapemeniya HPG’ê artêşa Tirk di mehek de 30 operasyon li darxist û 27 caran herêmên di bin kontrola gêrîllayan de topbaran kir. Her wiha helîkopterên Kobra 4 caran bombaran kirin, li Colmêrgê jî êrişek hewayî pêk hat. Carekê jî li ser Zapê êrişa tacîz pêk hat. Di pevçûnan de 7 gêrîllayan jiyana xwe ji dest dan û 7 leşkerên Tirk jî mirin.

HPG’ê ragihand ku çeke ferdî ya HK-33 hatiye desteserkirin, û 2 çeperên ‘dijmin’ ji holê hatine rakirin.

Li rexmê operasyonên berfireh û kemîn danînên ji aliyê artêşa Tirk ve, gêrîllayên HPG’ê ji pozusyona xwe ya bêçalaktiyê tu pêngav paşde neavêtiye.

Di meha îlonê de jî 24 operasyon, 6 êrişên hewayî û 41 topbaran ji aliyê artêşa Tirk ve pêk hatin. Di encama pevçûnan de 13 gêrîlla jiyana xwe ji dest dabûn û 20 leşker hatibûn kuştin.

Duh li Brukselê civneka Di Parlamentoya Parlamenteran a Konseya Ewropayê (PPKE) hebû. Hendik be jî lê piştî 12 sala dengekî nizm ji wan derket. Li wê civînê parlamnerê Tirk û Kurd jî hebûn.



-PPKEyê xwest agirbest çê bibe û Ocalan li Tirkiyeê siyasetê bike.Di Parlamentoya Parlamenteran a Konseya Ewropayê (PPKE) de 28 endaman, xwest ku bo agirbesta PKKê komisyoneke çavdêriyê bête danîn û ji bo Ocalan jî riya siyasetê were vekirin.

Ji bo çareseriya pirsa kurd a li Tirkiyeyê ji PPKEyê re pêşniyarnameyek hate pêşkêşkirin.

Parlamentera BDPê ya Îdirê Perwîn Buldan, piştgiriya pêşniyarnameyê kir û got, "Diviya agirbest bi dualî be û ji bo hemû girtiyan efûya giştî bê ragihandin."

Parlamenterên MHPê Tuğrul Türkeş û Ertuğrul Kumcuoğlu jî, îro li parlamentoyê bi daxuyaniyekê bang li Serokwezîr Recep Tayyîp Erdogan kirin ku nehêle pêşniyarname bête Desteya Giştî Konseya Ewropayê û xwestin rayedar bikevin nav liv û tevgerê.

Belê şehîdê delal Bawer Kotik Yusuf Şahîn, Rasim Gencer, îro 29/10-2010 a ye.

Belê hevalên hêja; îro cejna Tirkiyeyê qirkirina gelên di nav xwe de dijî ye. Hê jî ew




qirkirina hetanî roja me îro didomê. Ji avakirina Komarê pêva hê jî Kurda û gelên din ê wek Ermeniya me tên qikirin.

Heftê borî hat ragihand ku di kuştina Hrant Dînk da gelek rêvebirên îstîbaretê heya xwe ji kuştina wî hebûne. Duh xaniyên wî yê li Meletyê hatin talan kirin.

Kurd li ber mehkemeyan tên darizandi. Ji bo Mehdî Tanrikûlû gotiyê 'Tevgera Azadîxwaz a Kurd' 2 sal ceza li hatin birîn.

(Wênê: Mirovekî Qazî di rewresîma Komarê da qirawateka bi alê Tirka diyarî şaredarê Amedê birêz Osman Baydemir kir)

Îro dîsa gelek deverên Kurdîstanê wek Zap û Haftanin hatin bombe kirin.

Bilançoya agirbestê ji aliyê HPG ve ji rayegiştî re hat ragihandin.

Fermo bixwînin:

Bîlonçoya agirbestê: 80 operasyon, 900 binçavî



- Li himber agirbesta KCK'ê ya 13 Tebaxê îlan kirî; artêşa Tirk bi operasyonan bersîv da; hikûmeta AKP'ê jî bi polîsan ku girêdayê hikûmetê ne, dest bi binçavkirin û destgîrkirinan kir. Hikûmeta ku daxwazên aliyê Kurd red dike, ji bo berdewamiya agirbestê ti gaveke berbiçav û şênber neavêt. Di pêvajoya agirbestê de 80 operasyonên bejahî, 125 êrîşên topbaranî pêk hatin; 29 gerîllayan jiyana xwe ji dest dan, nêzî 900 kesî hatin binçavkirin.

Agirbesta ku KCK'ê di 13'ê Cotmehê de îlan kir û di 30'ê Îlonê de dirêj kir, di 31'ê Cotmehê de bi dawî dibe. Li ser gerîllayên ku di pêgeha (pozîsyona) bêçalakiyê de ne; artêşa Tirk bê navber operasyonan pêk tîne û li çolter û bejahiyan derdikeve nêçîra gerîllayan. Li bajaran jî polîsên ku girêdayê hikûmetê ne, binçavkirin û destgîrkirinan didomîne.

**Daxwaza aliyê Kurda hatin red kirin.

**80 Operesyonên bejahî, 125 êrîşên topbaranî

Ji îlana agirbesta KCK'ê ya 13'yê Tebaxê û vir ve herî kêm 80 operasyonên bejahî hatin lidarxistin. Li gor van daneyên han di navbera 13-31'ê Tebaxê de 26 operasyon (ku tevaya meha Tebaxê 47 operasyon hatine lidarxistin), di meha Îlonê de 24 operasyon, di meha Cotmehê de jî herî kêm 30 operasyon hatine lidarxistin. Di encama van operasyonên pêvajoya agirbestê de di Tebaxê de de 9, di Îlonê de 13, di Cotmehê de jî herî kêm 7 gerîllayan; bi giştî 29 gerîllayan jiyana xwe ji dest dane.

Digel operasyonên bejahî gelek êrîşên hewayî, topbaran, bombebarana balafiran û firînên tacîzî pêk hatin. Di meha Tebaxê de ji aliyê artêşa Tirk ve 57 êrîşên topbaranî pêk hatin, di Îlonê de 6 êrîşên hewayî û 41 êrîşên topbaranî, di Cotmehê de 27 êrîşên topbaranî û 4 caran jî bordûmana (bombebarana) balafiran pêk hatin. Di maweya agirbest û bêçalakiyê de herî kêm 125 caran êrîşên topbaranî pêk hatin.

**Li Colemêrgê 9 sivîl hatin kuştin. Li heftanînê sivîlek hat birîndar kirin.

**Li 86ciha şewata Daristana

**Nêzî 900kes hatin binçav kirin.

**Di hat û çûyina Dîplomsiyê de pêşketinên girîng.

Li ser biryar û fermana Dozgeriya Danîmarkê di 30'yê Tebaxê de hesabên bankayan ên ROJ TV hatin cemidandin. Piştî rojekê, di 31'ê Tebaxê de, parêzerên ROJ TV'yê ev biryara hanê îtîraz kirin. Heman rojê, di 31'ê Tebaxê di çarçoveya lêpirsîna ji 2005'an vir ve li ser ROJ TV'yê tê rêvebirin de derheqê ROJ TV'yê de bi fermî doz hat vekirin. Piştre dozgerê Kopenhagê xwest ku bila dest deynin ser ROJ TV'yê.

*Di 3'yê Îlonê de Serfermandarê (Serkanê) Giştî yê Dewletên Yekbûyî yê Amerîka (DYA) Oramîral Mike Mullen di çarçoveya serdana Enqereyê de bi Serfermandarê Giştî yê Tirk Orgeneral Işık Koşaner re, li Biryargeha Serfermandariya Giştî, hevdîtinek pêk anî.

*Di 16’ê Îlonê de li gundê Peyanîsê ya bajarê Colemêrgê bi mayînên kontrolkirî êrîş li ser mînîbusek (pas) pêk hat, di encamê de 9 kesên sivîl jiyana xwe ji dest dan.

*Di 26’ê Îlonê de li Başûrê Kurdistanê Wezîrê Karûbarên Navxwe yê Tirkiyeyê Beşîr Atalay, Serokê Herêma Kurdistanê ya Federal Mesûd Barzanî û Serokwezîrê Herêmê Berhem Ehmed Salih li hev civiyan. Barzanîn daxwaz kir ku biryara agibest û bêçalakiya PKK’ê bidome.

*Di 28’ê Îlonê de Serfermandarê Hêzên Amerîka yên Iraqê Orgeneral Lloyd Austin; ji bo hevdîtinên têkoşîna dijî PKK’ê bi balafirekê (teyare) taybet gihişt Enqereyê.

*Rojek piştî dirêjkirina biryara bêçalakiyê ya 30’ê Îlonê, di 1’ê Cotmehê de, li Rihayê (Ûrfa) di bin navê operasyona KCK’ê de 42 kes hatine binçavkirin, ji vana herî kêm 10 kes hatin destgîrkirin.

*Di 30’yê Îlonê de Serfermandarê Giştî yê Iraqê yê Kurd Babekîr Zêbarî diyar kir ku bê erêkirina Herêma Kurdistanê, li dijî PKK’ê di navbera Iraq û Tirkiyeyê peymanek nayê îmzekirin.

*Rojek berê dirêjkirina agirbesta KCK’ê ya 30’yê Îlonê, roja 29’ê Îlonê Wezîrê Karûbarên Navxwe yê Tirkiyeyê dest bi serdan û gera xwe ya Şirnex-Colemêrgê kir. Atalay diyar kiribû ku hemû polîtîkayên ewlehiyên di berçav re derbas kirine û plana herêmeke tampon li ser sînorê Tirkiye û Iraqê li ser masê ye. Atalaya di vî warî de wiha pêde çûbû: “Ev hemû xebatên me beşeke stratejiya me ya berfireh û mezin e.” Çend roj pêş vê serdanê, Serokwezîrê Tirk R.T. Erdogan gotibû: “Em ê ji bo Şirnex û Colemêrgê xebatek taybet bidin destpêkirin.”

*Rawêjkarê (Musteşarê) MÎT’ê Hîkmet Fîdan li Başûrê Kurdistanê, di hefteya destpêkê ya Cotmehê de, hat îdîakirin ku bi Taxa (semta) Ankawa ya Hewlêrê li avahiya MÎT’ê bi Osman Ocalan re hevdîtinek pêk anîye. Osmanê ku dewlet dixwaze ji paşnavê wî sûd wergire; tê îdîakirin ku dewleta Tirk dixwaze wî bîne serê pêkhateyek karma (ji hemû aliyan pêkhatî) wê dijî PKK’ê be.

*Di 7’ê Cotmehê de Serokwezîrê Tirk R.T.Erdogan bi Rawêjkarê MÎT’ê Hakan Fîdan re hevdîtinek pêk anî. Erdogan di çarçoveya hevdîtinên asayî de bi Fîdan re li Xaniyê Fermî yê Serokweziriyê, civiya.

*Di 7’ê Cotmehê de Sekreterê Giştî yê Natoyê Anders Fogh Rasmussen ê Danîmarkî ji hin danûstandinan serdana Enqereyê kir.

*Di 9’ê Cotmehê Serokwezîrê Tirk Erdogan û hevpîşeyî wî ya Alman Angela Merkel li hev civiya. Erdogan ji Serokwezîra Almanyayê Merkel dawaza piştgiriya rawestandina xebatên PKK’ê kir.

*Wezîrê Karûbarê Derve yê Frensayê Bernard Kouchner di navbera 11-12’ê Cotmehê de serdana Tirkiyeyê kir û peyama li dijî PKK’ê têkoşîna hevbeş da.

*Di 11’ê Cotmehê de R.T.Erdogan serdana Sûriyeyê kir. Pêş serdanê, Erdogan li balafirgehê daxwiyaniyekê da û got ku hewl didin di têkoşîna dijî PKK’ê de destek û piştgiriya hêzên derve bînin asta herî kêm (mînîmîze bikin).

*Di 12’ê Cotmehê de Wezîrê Karûbarê Derve yê Tirkiyeyê Ahmet Davûtoglû bi Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî re peywendiyeke telefonî pêk anî.

*Di 18’ê Cotmehê de doza ‘KCK’ê ya ji 152 kesan jê 104 girtî ya siyasetmedarên Kurd û parêzvanên mafê mirovan ku li 6. Dadgeha Sezaya Giran a Amedê tê dîtin, dest pê kir û ji aliyê civata dadgeha Tirk ve parastina bi zimanê Kurdî hat red kirin.

*Di 19’ê Cotmehê de Serokkomarê Almanyayê Christian Wulff, ji bo 4 rojan serdana Tirkiyeyê kir.

*Di 20'ê Cotmehê de Wezîrê Karûbarê Derve yê Tirkiyeyê Ahmet Davûloglû û Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî têkiliyek telefonî pêk anî.

*Di 20'ê Cotmehê de polîsê Alman li Hannoverê di ser Mala Gel a Kurdan ve girt û 4 kes binçav kirin. Ev serdegirtin piştî serdana Erdogan a Almanyayê û di dema hevdîtinên Serokkomarê Almanyayê de pêk hat.

*Di 25'ê Cotmehê de Cîgirê Serokê PDK'ê Nêçîrvan Barzanî serdan Enqereyê kir û bi Serokwezîrê Tirk R.T. Erdogan re hevdîtin pêk anî.

Belê hevalên hêja; îro du rojin dewleta Tirk bi roportaja birêz Karayilan bi rojnama Radikalê bi Ertugrul Mavî re kirî, herkes li gor xwe şîrove dike. Lê derewên bi boç dikin.



Aliyê hikumat dibêje; "**Şepqê daket serê keçel hat xuya kirin**" PKK e terorîst Karayilan li xwe mikur hat ku wan mirovên sivîl kuştine û ji wan lê borîna xwe dixaze. Dewlet bi terorîstan re rûnanê. Me w di civîna MGK da jî anîbû ziman.

**Warin em ji devê birêz karayilan bibhîzin ka çi gotiye**.

Ji bilî hevdîtinên Îmraliyê tiştek din nebû

- Di serê mijarên ku van rojan li Tirkiye û Kurdistanê herî bêhtir têne nîqaşkirin de, hevpeyvîna rojnameya Tirk Radîkal ya bi Serokê Konseya Rêvebir ya KCK'ê Mûrat Karayilan re tê.

Di beşê duyem yê hevpeyvînê de Karayilan helwesta Amerîka, YE û Îsraîlê ya li hember PKK'ê û rewşa Îran û PJAK'ê jî nirxand.

Karayilan bersiva nûçeyên ku dibêjin "hukûmetê bi PKK'ê re bazarî kir" jî da.

Serokê Konseya Birêvebir ya KCKê Mûrat Karayilan di beşa îro ya hevpeyvînê de bersiva pirsa "Çima Amerîka çareserkirina pirsgirêka Kurd naxwaze" da.

Li gor Karayilan, yê ku pirsgirêk afirandiye û dixwaze bêyî ku were çareserkirin dewam bike jî Amerîka bixwe ye.

Di vê derbarê de Karayilan got: “Yekane sedema vê jî ew e; Amerîka dizane, heger pirsgirêk çareser bibe, wê êdî pêdiviya gelên herêmê bi wan nemîne.”

Karayilan diyarkir ku tevî vê jî, di navbera salên 2003 û 2004ê de, bi Amerîkayê re hin hevdîtinên wan çêbûne, lê ti caran ev têkilî wernegeriyane têkiliyên siyasî.

Serokê Konseya Birêvebir ya KCKê Mûrat Karayilan bibîrxist ku di hin hevdîtinên rojnamevanî de dîtinên wî yên di derbarê Îsraîlê de berovajî hatine ragihandin û di vê derbarê de weha got: "Ti têkiliyên me wekî ku hate gotin bi Îsraîlê re ti caran çênebûn. Di hin demên cuda de ji Îsraîlê du rojnamevan hatin. Dibe ku Îsraîl dixwaze helwesta me fam bike. Heger Îsraîl bixwaze bi me re têkiliyan çê bike, em dê di çarçoveya prensîbên xwe de nêzîk bibin."

Di derbarê mijara bazariya bi hukûmetê re jî Karayilan weha axivî: “Ji bilî hevdîtinên li Îmralî ti hevdîtinên din çê nebûn. Eger bûbe jî, ji yên li Îmraliyê paşdetir in. Tevahiya hevdîtinên pêk hatin, ne rasterast bûn. Hukûmet xwe ji van hevdîtinan dûr dixe. Ya esas hevdîtinên ku wê li Îmraliyê pêk werin in. Heta niha jî lihevhatinek tineye. Em di pêvajoya diyalogê de ne. Eger lihevhatin pêk were, divê xal werin destnîşankirin. Ji xwe ne diyar e jî ka wê ev hevdîtin dewam bikin yan na.”

Karayilan di hevpeyvînê de, îhtîmal neda wê ku di navbera Kurdan de şer derkeve û got, partiyên din yên Kurd jî, deftera şerê navxweyî êdî girtine.

## "Divê Îran Îradeya Kurda qabul bike"

Karayilan her weha di derbarê têkiliyên wan yên bi PJAKê re û helwesta Îranê ya ya li hember tevgeran wan di demên dawî de jî daxuyaniyên girîng dan...

Karayilan got, heger Îran zext û operasyonên xwe rawestîne, divê têkoşîna çekdarî ne di rojevê de be.

Li gor Karayilan, Îsraîl ji bo ku bikaribe di çarçoveya siyasetên xwe yên li dijî Îranê de Tirkiye bikarbîne, siyasetek ku hesasiyetên Tirkiyeyê li ber çavan digre birêve dibe û di derbarê Îranê de jî ev gotin:

"Rast e ku li Îranê rejîm, Kurdan bi temamî red nake, lê îradeya wan jî qebûl nake. Tişta ku Îran pêknayîne jî ev e. Di rastiyê de wekî PKK, li hember Îranê ti helwestek me ya taybet nîne. Em şer û pevçûna navbera PJAK û Îranê jî rast nabînin. Bi taybetî jî di demekê de ku Îran di bin dorpêçekê de ye, em gelek rast nabînin ku Kurd têkoşîna çekdarî pêşbixin."

Li ser pirsa di biwara (warê) têkiliyên PJAK û PKKê de jî Karayilan got: "PJAK rêxistineke ku ji aliyê ciwanên ji Rojhilatê Kurdistanê ve hatiye avakirin. Raste ku ew jî Apocîtiyê ji xwe re esas digirin, lê PKK û PJAK du rêxistinên cuda ne. Piştî avabûna PJAK'ê, di navbera salên 2005 û 2006ê de Amerîka bi wan re têkilî danî. Di civîneke 6 saetî de ku li Kerkûkê pêkhat, Amerîka ji PJAKê xwest ku ew têkiliyên xwe yên bi me re bibire. Îranê jî, ji me xwest ku em jî têkiliyên xwe yên bi PJAKê re qutbikin. Lê ne me û ne jî wan ew daxwaz nepejirandin. Lewma Amerîka biryarek balkêş da û tevî ku ti aboriya PJAKê li Amerîkayê nebû jî, biryara desteserkirina hemû aboriya PJAK'ê li Amerîkayê da. Navbera me û Îranê jî piştî vê êdî xera bû."




Karayilan wiha jî rewşa şerê di navbera PJAK û Îranê de nirxand: "Heger Îran zext û operasyonên xwe rawestîne, divê têkoşîna çekdarî ne di rojevê de be. Di civîna Kongreya Gel de jî ev mijar hate rojevê. PJAK wê demê got: Îran siyaseta zext û şîdetê û operasyonên xwe li hember me dewam dike. Kongra-Gel giringiyê dide xweparastina rewa, lê ji derveyî wê, dixwaze ku PJAK xebatên siyasî bêhtir derxe pêş."

Belê şehîdê delal Bawer Kotik Yusuf Şahîn, Rasim Gencer, îro 30/10-2010 a ye.



Îro hetanî danê nîvro rewşa Kurda baş bû. Ne balafir û ne jî helîkopter firî ku herêma Kurda bombe baran bikin. Ez bi vê rehet û kêfxweş bûm. Ji ber ku her roj gund û sînor, herêma parastina medya tê bombe baran kirin. Ew kêfxwaşî û rehetiya min di qirika min da ma. Piştî nîvro dest bi kuştin û talankirin, girtina Kurda hat kirin. Ji Diyala xeber hat ku êrîşa ser Kurdên Feylî hatiyê kirin. 30 kes miriye û 68 kes giran birîndar bûne. Elbet ew listikê dijminê me li ser kurda ne. Ma li herêma Kurda jî di nava kaos ê dabin. Rehetiya Kurda di çavê çar dewletan re diçê xar e. Nabe ku li herêma Erba pêvçûn hene û herêma Kurda rehetî hebe. Van qetliyam hovitiyên wiha ne cara yekemê ku li dijî Kurdê Feylî pêk tê. Gelek cara pêk hat. J aliya Erebê sunnî da, ji aliya Farisa şîa da gelek cara maruza qetliyamên wiha hatin. Di sala 2007 an da jî êrîşeka bi vî rengî pêk hat 16 Kurdê Feylî jîyana xwe ji dest da.



Duh 29 mehê bû. Li Tirkiye yê cejna komara qirkirina gela bû. Ew cejna li Başûr jî bi resepsiyonek hat pîroz kirin. Lê vê carê mêvanekî wê cejnê, Aleka ku 87 salin li Tirkiye yê qedexê jî li hundirê salonê hebû. Ala Kurda, mêvan Kek Mesût Berzanî û rêvebiriya wî bû. Gotineka me Kurda heye dibêjin; “Warin rê!” (Wênê serokê balyozxana Tirkiyê yî li Hewlerê).

Ji Îranê xeber hat li nêzika sînorê Ranya hêzên Îranê 5 qaçaxçiyê Kurd kuştine. Barê wan du tenekê mazot bûne!. Ji bo ku bên Tirkiye yê wan bifroş in û ji zar û zeçê xwe re cilên zivistanê bikirin.

Ji Suryê jî xeberên girtina deh Kurda hat.

Lê wan dewletê serxwar van hovitiyan dibin, Lê dewleta Tirk jî wan dimîne!. Li Stanbolê deh kes hatin binçav kirin. Li Colemêrgê 4 kes hatin girtin. Danê nîvro hêzên Îranê herêm bombe baran kirin û danê êvarê Tirka herêma Zap û Haftanîne bombe baran kirin.


Belê ji agirbestê re rojek maye. Îro mepûsa Kurda ku mepûsiya wê ji dest wê hatî girtin **Aysel Tûgluk** serî li dozgeriya Gemlîk/Bursayê da ji bi roja duşemiyê bi serok Ocalan re hevdîtina pêk bîne û rewşa agirbestê bi wî re niqaş bike. Hê bersiv nehatiye dayin.

PKK: Em li hêviya helwesta Ocalan in.




Rêvebirê PKK ji paya bilind Hemo, bal kişand ser gotinên Ocalan ku di hevdîtina digel parêzerên xwe de li zîndana Îmraliyê gotibû, "heke heta 31ê cotmehê ji bo çareseriyê gav neyên avêtin, dê xwe paşde vekişîne" û diyar kir, ji ber wê, em li hêviya helwesta Ocalan in. Em ji ser serokê xwe derbas nabin. Ji bom e xeta sor e.

Medya: Cengiz Çandar; îro di gotara xwe de, bal kişandiye ku sibê dema biryara "bêçalaktiya" PKKê bi dawî dibe û pirsiye ka diviya mirov çawa Murat Karayilan fêm bike û pê re jî, girîngiya van du rojan der biriye.



Kurteyek ji gotara nivîskar weha ye: "(…) Sibê dema agibesta yekalî ya PKKê, ku ew jê re "bêçalaktî" dibêje, diqede. Gelo dê çi çêbe? Gelo dîsa dê dora bêdengkirina çekan bê?

Bersiva vê, li Îmraliyê di gel Abdullah Ocalan e. Her weha heke hûn tiştên Murat Karayilan li Qendîlê ji Ertugrul Mavioglu re vegotine, rêzik bi rêzik bixwînin, karakterîstîka dema pêş me hûn ê fêm bikin. Helbet, diviya mirov xwedî rêbernameyeke wisa be ka dê "diviya mirov çawa" peyamên Murat Karayilan bixwîne. Bersiva vê jî gelek hêsan e: Diviya mirov wekç ku Cemîl Çîçek dixwîne nexwîne."

Belê şehîdê delal Bawer Kotik Yusuf Şahîn, Rasim Gencer, îro 31/10-2010 a ye.

Ji agirbesta ku ji aliyê PKK e ve hatanî 31 Cotmehê hatî îlan kirine re ne roj, seat ma ne..




Hê jî ji bo çareserkirina pirsa Kurd ti dengê erênî ji aliyê hikumatê ve nehatine avêtin. Dem diqede, hêvî kêm dibin; Dewleta Tirk heta niha gavekî biçûk jî neavêtiye! Wek diyalog an berdana şaredar û siyasetmederê Kurdê ku 18 mehenê li bajarên curbe cur tên darizandin. Hê li wan girtiyan girtî zêde dibin.

Hê jî serokwezîr dibêje; "Zivistanê PKK e nikarê çalekiya pêk bîne" Serokê BDP Selattin Demîrtaş got; "ez Serokwezir şermezar dikim PKK e teşvika şer û çalekiya dike".

Belê, duh mepûsa Kurda kevn **Aysel Tuglûk** wek parêzerê birêz Ocalan serî li dozgeriya Gemlîkê xisti ji bo hevdîtinan bi birêz Ocalan re pêk bîne. Bersiv hê ji rayegiştî re nehatiye ragihandin ku hevdîtin pêk bê an na. Li mimkune ku sibê hevdîtin pêk be. Eger nunerê îstîxbarat û eskeriyê ti astengiyên din li ber Aysel û parêzerên din dernexistin.

Ji bo ku agibest îhlal nebe, PKK e û BDP gelek cara derdor hîşyar kirin ku ji provakasyonan dûr bisekin. Birêz Ocalan ji Îmraliyê da xeber şandbû ku "Divê sivîl bên parastin"

Duh roportaja birêz Murad Karayilana bi rojnamevan Ertûgrûl Mavî re bi dawî bibû. Wê roportajê gelek derûdor aciz kirin. Di serî da cîgirê serokwezîr Cemîl Çiçek aciz kiribû û dest bi rûreşiya kir. Birêz Karayilan jî di roportaja xwe de destnîşan kir ku "Ew û hevalên wan ê li dijî sivîla bi diqet bin û me hevalê xwe wiha hîşyar kirine. Divê sivîl bên parastin."

Berî ku roportaj li rojnama Radikal bê weşandin li **Sînopê** panzera polîsa hat gulê baran kirin du polîs birînda bûn.

Îro li seat 11 an li taxa Taksîmê bombeyeka zîndî hat teqandin. Du polîs giran birîndar bûn û gelek polîs jî sivik birîndar bibûn. Lê 15 mirovên sîvîl jî sivik birîndar hebûn di nava wan birîndarên sivik da.

Gava ku medya ew nûçeya bihst, hemûya projektorên xwe zivirandin ser PKK e. Rojnamevanên ne yar û dijminatiya PKK e dikin hema ketin ser karê xwe. Lê wiha nebû. **CNN international** wek nûçeya flaş ji xwendevan û guhdarên ragihan.

Berpirseke PKKê, di hevpeyvîneke de digel kanala CNN International, diyar kir, derbarê teqîna Stenbolê de tu agahiên PKK e nîne.

Wî berpirsî wiha axivî, "Tu agahiyeke me derbarê teqîna Taksîmê de nîne" û bibîr xist ku 31ê cotmehê dawiya agirbesta yekalî ya PKKê ye.




Bepirsê PKKê, gotinên Serokê Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê (KCK) Murat Karayilan, digel rojnameya Radikalê ku gotibû, "Em êdî, mirovên sivîl nakin hedefa çalakiyan" bibîr xist û da zanîn, ew çalakiyên ku zirarê bide sivîlan, pêk naynin.

Lê dîsa jî medya Tirkiye yê û neyarê PKK e û Kurda bi vê nûçê îqna nebûn. Ew dohla û ew benîştê genî hetanî seat 22:00 şeva çûn.



Misteşarê MÎT e yi kevn Cawat Oneş çalaki şîrove kir: "*Divê em hema hertiştî nexînin stûyê PKK e. Ez axavtina serokê KCK Murad Karayilan ciddî dibînim. Rêxistinên din jî hene*" .

Lê dema çalekiya bombe yî gelek balkêş ê. Di sala 1996 an li 29 cotmehê Zîlanê xwe li Dersimê teqandibû. Bi baweriya min wan jî xwastin ku vê bûyarê li 29 cotmehê bikin. Lê li Tirkiy yê bahoz hebû, mersîmên komara pêk nehatin. Merasîmên Komarê li Stanbolê pêş vehat xistin li 31 mehê kirin. Lê va ne cara yekemîne ku li Taxa Taksîmê çalekiyên bombeyî zindî pêk tên Di 27 adara 1999 an da(Meral Mamyak) û di 10 îlonê 2001 an da jî bombeyên zindî teqîn.

Derdorên di şer da îsra dikin ji roportaja Karayilan aciz bûn. Ji hatina **Neçîrvan Berzaniya** Tirkiye yê aciz bûn. Ji beşdar bûna serok **Mesût Berzanî** ya tevlî resepsiyona cejna Komara Tirka ku li Hewlerê bûyî aciz bûn.

Ji helwesata PKK e ya ku bi sebir agirbest îhlal nekirî aciz bûn.




Lê hertim wiha bûye. Gava ku pirsa Kurd bê çareser kirine provakasyonek pêk hatiye.

Di sala 1993 an da gava ku serok komar Ozal bi Ocalan re hedîtina pêk bîne, hat kuştin. (Wênê Ozal: Herin bi wî dînîkî re bêjin ma demê bide me)

Di aynî salê de 1993 an da li Bingolê 33 esker ji aliyê Şemdîn ve hatin kuştin.

Di sala 1990 an da li dijî birêz Ocalan gelek çalekiyê întîxarî û bombeyî pêk anin.



Belê hevalên hêja; Îro Amed bi dengê jinên BDP ye hîşyar bûn. Li bajêr ewqas jin hebûn qet pirs neke. Tê bigota roja jina ye. Bi hezaran ji çar aliyê Kurdîstanê û ji Ewrûpa mêvanê wan ê jin hebûn. Îro 1'emîn Kongreya Giştî ya Meclîsa Jinan a li Amedê destpêkir.

Hevseroka KCD'ê Aysel Tugluk, Seroka Giştî ya SES'ê Bedriye Yorgun û Parezera Rêberê Gelê Kurd **Abdullah Ocalan Xetîce Korkut** jî amade bûn. Parlementera BDP'ê ya Şirnexê Sevahîr Bayindir û Feleknaz Uca ku beşdarî kongreyê nebûn peyam şandin. Li derveyê salonê jî Hewldana 78'an ji bo Girtîgeha Amedê bibe muze standa îmzeyan vekirin.



Hevseroka BDP'ê Gultan Kişanak, axaftina vekirinê kir û diyar kir ku çiqas jin bi rêxistin bibin wê polîtîkayên tesfiyekirina hêza kurdan vala derxin. Kişanak, anî ziman ku li dijî gelê kurd polîtîkayên komkujiyê tê meşandin û wiha got: "*Em bi komkujiyekê re rû bi rû ne. Bi taybetî li dijî jinan tacîz, tecawiz, tundî kuştin û binpêkirina mafan her ku diçe zêde dibe. Bi taybetî komkujiyê li ser jinan dide meşandin. Naxwazin li hemberî van polîtîkayan xwe bi rêxistin bikin. Bi taybetî li dijî jinên bi rêxistin êrîş, girtin û binçavkirin pêş dikeve.*"

**LEYLA ZANA:** ALIYÊ KURD ŞER RADIWESTÎNE

Piştre Parlementera DEP'ê ya berê Leyla Zana dest bi axavtina xwe kir.




Zana, destnişan kir ku divê dewlet bi awayekî lezgînî ji kurdan re jestekê bike û xwest ku ji bo kurdan 2 gavên girîng bi avêje û wiha got: "Bêçalaktî îro bidawî dibe. Hevî dikim ku dewlet dê îro jestê bike 2 gavan pavêje. Ji van yek bendava hilbijartinê bînin xwarê ya din jî ji bo demokrasî bi jî biryaran ji destê serokên partiyan bê girtin e."

JI ZANA BO ERDOGAN: TU NIKARÎ KURDAN BIXAPÎN, TU WÊ BIXAPÎ

Zana bang li serokwezîr jî kir û xwest ku **serokwezîr** dest ji xapandina kurdan berde. Zana, daxuyand ku kesên heta niha kurd xwapandin xwe xapandine . Zana, bal kişand ser daxuyaniya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a "*Ger dewlet heta 31'ê cotmehê gav neavêje ez dê xwe paşve bikşînim*" û wiha got: "*Na em naxwazin xwe paşve bikşîne. Hemû jinên kurd bi salane li qadan dibêje PKK gele gel li vir e û dibêjin tu serokê me yî. Hemû tiştên hûn dibêjin ji me re hevî ne. Her çiqas şert giran jî bin ev gel ji mirinê re raziye lê ji hûn xwe paşve bikşînin razî nin in. Divê ev dewleta gavê pavêje*."

Belê şehîdê delal Bawer Kotik Yusuf Şahîn, Rasim Gencer, îro 01/11-2010 a ye.



Belê jin li ser pîya ne. Duh kongra xwe li Amedê bi 8 hezara pêk anin. Îro jî di amedekariya meşa dirêja ji Colemergê hetanî Îstabolê dikine. Ji wan jinan yek Aysel Tugluk îro li ser rîya Îmrliyê ye. Ji wan jina îro bi hezaran li ber dadigeha Amedê û Wan ê di nobeta aşitiyê da ne. Belê birêz Ocalan gotibû; Jin pêşe roj e. Jin jîyane. Jin dayika. Jin bermaliyê. Jin diya zaroka ye. Li cem min ciyê jinê pir giran e. Ti cara l imin rûreşî nekirin. Em ji wan jinan re spas dikin.

Mepûsa DEP e berê **Leyla Zana** dibêje; 'Dewlet û hikûmet ji aqilê jinên kurd ditirse' Ez dibêjim him jî pir. **Z**îlan, Leyla Kaplan, Guler Otaş, Bermal, Berîtan, Eva Juhnkê û bi hezaran yên din berhemên vê têkoşînê ne..

(Wênê: Duh Amed bû şahîdê vî dîmenê xweşik)

Belê hevalên hêja; çavê rayegiştî ya Tirkiye yê û cîhanê li rîya Îmraliyê. Aysel Tugluk bi sê parêzeran ve bi keştiyeka ji aliyê wezîrê edeletê ve hatî kirê kirin li seat 09:30 çûn Îmraliyê cem birêz Ocalan. Li gor hinek çavkaniya wê bi gelek derdoran re hevdîtin pêk anîye û ji birêz Ocalan re nameyek jî digel xwe birîye. Li gor medya li seat 15:00 an Helîkopterek jî çûyê Îmraliyê û di wê helîkopterê da nunerê eskerî û MÎT e jî hebûne.

Li Gemlîkê bi dehan rojnamevan û nûçêvan li benda hatine Aysel Tuglukê ne.

Seat: 18:30 Tugluk ji giravê veger.

Tugluk ragihand got: Pêvajo ji diyalogê derbasî muzakereyan bûye.



- Hevseroka KCD'ê Aysel Tugluk çûbû girava Îmralî û li wir bi birêz Abdullah Ocalan re hevdîtin pêkanî û da diyarkir ku, hevdîtin di navbera Ocalan û dewletê de berdewam dikine. Herwiha Tugluk da zanîn ku, Ocalan got: *"Êdî pêvajo ji diyalogê derbazî muzakereyan bûye".*

Tugluk di derbarê hevdîtinê de zanînê wiha dan: "Bi rayedarên dewletê re hevdîtinên cidî û girîng pêkanîne û pêvajo ji diyalogê derbazî muzakereyan bûye. Herwiha da diyarkirin ku, bi vê ve girêdayî pêşketinên erênî çêdibin û ji xwe xwesteka dewletê ya ji çareserî û aştiyê heye lêbelê yê pêşiya vê pêvajoyê dibe asteng siyaste.

Anî ziman ku, jibo ev pêvajo bizivire pêvajoyek çareseriyê di vê mijarê de AKP, CHP û MHP'ê berpirsyariyên xwe ne anîn cih. Partiyên siyasî bêhtirî xwe jibo berjewendî û hesabên siyaset kirin û ev yek jî ziyanek mezin da Tirkiyeyê.

Ocalan balkişand ku, ez alîgirê bi hev re jiyan kirinê me, çareserî bi çi awayî li nav dewletên cûda nîne, çareserî di modela bi hev re jiyan kirinê deye.

Tugluk da diyarkirine ku, di derbarê êrîşa duh li qada Taksîmê jî rûdayî Ocalan peyamên girîng dan.

Tugluk got, Ocalan da zanîn ku, pêwîste bûyera Taksîmê, teqîna mayînê ya li Colemêrgê, li rexmî bêçalekiyê kuştina 9 gêrîllayan ev hemû bûyer di nav hev de bên destgirtin û bi destê kê hatine kirin bên zelal kirin, ev mijarane jiyanî ne



Lê hê **Aysel Tugluk** nehatiye ji KCK birêz Karayilan biryara dirêjkirina pêvajoya aşitiyê bi heft meha, yanî hetanî hilbijartinên Tirkiye yê ku li meha hazîranê bên kirin.

KCK ê bi zimanekî tûj gotin *“Ti têkliya me bi buyara Taksîmê re nîne.” Ew provaksayon e. Em şermezar dikin”*

## JI BO AŞTIYEK 5 GAVÊ MAYÎNDE JI RAYAGIŞTÎ RE DA ZANIN

Ji bo mayîndebûna pêvajoyê û ji bo bi rastî pêvajo veguhere çareseriya demokratîk û aştiyane; di daxwiyaniyên me da xwiyandibû de gavên ku dibê dewlet biavêjin, me dest nîşan kiribûn. Ev gavên han;

**1-** Rawestandina operasyonên leşkerî û siyasî,

**2-** Serbestberdana siyasetmedarên Kurd ku bi awayekê neheq hatine destgîrkirin.

**3-** Ji bo Rêber APO bi awayekî lebat (aktîf) beşdarî pêvajoyê bibe divê rê pêşiya Wî bê vekirin û diyalogên tê rêvebirin divê vebiguheze asta muzakereyan,

**4-** Ji bo pêşketina pêvajoyê, sazkirina komîsyonên makezagonê û lêkolînên heqîqetan,

**5-** Rakirina bendava hilbijartinê ya ji sedî 10 ku ti derê dinyayê tune ye.

Ew provakasyona li Taksîmê ji aliya serokê KCD Ahmet Tûrk ve jî wek provaksyon hat




dîtin û xemgîniya xwe ji rayagiştî re ragihand.

Wezîra dervaya Amerîka Hillery Clînton ev bûyara li Taksîmê şermezar kir.

Belê hevalên hêja; Pêvajoya dirêjkirina agirbestê li Tirkiye yê wek nûça daqîqa dawî hat dayin.

Gava ku KCK agahî didan çepemeniyê 4 balafirên şer F-16 an jî di ser Colemergê re bi deng firîn û derbasî herêma Heftaninê bûn. Di dûv balafira vê carê jî helîkopter firîyan. Li gor nûçeyên êvarê tanq jî ketine rê ber herêma Şirnaqê diçên.

Balafirên şer gava ku ji Başûr vegerîn vêcarê jî li ser herêma Taksîmê firîyan. Em li vir in. (Foto Armanca teqîne provakasyon e)

Biryara bêçalaktiyê di çapemeniya biyanî de deng veda.

- Daxuyaniyên KCK'ê yên derbarê dirêjkirina bêçalaktî û çalakiya li Taksîmê de dengek mezin veda. Piraniya ajansên nûçeyan yên cîhanê, bi awayê nûçeya flaş belav kirin û kirin manşet.



REUTERS: "Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) hemû berpirsyariya çalakiya duh li Taksîmê pêk hat û têde 32 kes birîndar bû red kir û agribestê heta hilbijartinên sala 2011 yên Tirkiyeyê dirêj kir.

AFP: AFP jî diyar kir ku PKK diyar kiriye ku tu têkiliya wan bi çalakiya Taksîmê re tune ye û biryara bêçalaktiya PKK ji aboneyê xwe re ragihand. Her wiha cih da madeyên KCK'ê rêz kirî.

AP: Associated Press jî nûçeyê bi awayê; "PKK'ê heta sala tê agirbest îlan kir, lê da diyarkirin ger êriş li ser wê pêk bên wê xwe biparêzin.

ANP:Ajansa Nûçeyan a Hollandayê jî nûçeyê bi sernûçeya "PKK agirbest dirêj kir" da. ANP nûçeya xwe ku dispart Ajansa Nûçeyan a Firat (ANF), bi bîr xist ku PKK'ê 13'ê tebaxê heta 20'ê îlonê agirbest îlan kiribû û piştî wê jî mehek din dirêj kiribû.

BBC: Dezgeha Çapemeniya Înglîz, BBC jî biryara bêçalaktiyê bi sernûçeya "PKK biryara bêçalaktî dirêj kir û got tu têkiliya me bi çalakiya Taksîmê re tune ye" ragihand.

## ÇAPEMENIYA FRENSÎ: PKK AGIRBEST DIRÊJ KIR

LE MONDE: Sernûçeya "PKK ragihand ku tu têkiliya wana bi çalakiya Stenbolê re nîne û biryara bêçalaktiyê heta hilbijartinên giştî yên sala 2011 dirêj kir" bi kar anî.

LIBERATION: Di malpera xwe ya înternetê de diyar kir ku PKK'ê agirbest dirêj kir. Rojnameyê nûçeyê spart ANF'ê û diyar kir ku PKK gotiye tu têkiliya wana bi çalakiya Taksîmê re nine.

LE PARISIEN A FRENSÎ: Diyar kir ku PKK ragihand ku tu têkiliya wana bi çalakiya Taksîmê re tune ye û agirbestê dirêj kir. Her wiha cih da daxuyaniyê rayedarên Tirk yên derbarê nûçeyê de û dengvedana wê ya di çapemeniya tirk de.

Kovara Frensî ya xwedî trajek mezin Nouvel Observateur jî di malpera xwe ya înternetê de cih da biryara bêçalaktiyê ya PKK'ê. Di nûçeya kovarê de hat gotin "Serhildêrên Kurd heta hilbijartina sala 2010 bêçalaktiyê dirêj kir."

## ÇAPEMENIYA ELMAN

ARD: Desgeha weşana Elman ARD jî cih da dirêjkirina bêçalaktiyê û çalakiya xwekujî ya duh li Stenbolê pêk hat. Di nûçeya xwe da diyarkirin ku li gorî daxuyaniya di ANF'ê de hatî weşandin PKK'ê biryara bêçalaktiyê heta sala 2011 dirêj kir û diyar kir ku tu têkiliya wê bi çalakiya Taksîmê re nine.

Belê îro dîsa doza siyasetmederê Kurdê ku ji doza KCK ê tên darizandin li Amed û Wan ê li ber dadigehê bûn. Rûniştina doza Amedê ya 8 emîn bû. Ya Wanê a yekem bû.Li Wanê 17 siyasetmederê Kurd wek"**Endamên rêxistinê ne**" tên darezandine.

Îro dîsa îdîanamê hat xwandin. Îro dîsa siyasetmederê Kurd parastina xwe di zimanê Kurdî da îsrar kirin.

-Osaman Baydemîr.

-Ez li vir im.

-Bi Tirkî bi tirkî....

-Firat Anlî.



-Ez jî li vir im.

Elektirîk hatin birîne. Polîs û eskera dor avahiya dadigehê dorpêç kirin. Her eskerek kete kêleka girtiyekî. Bi seat ew tevlihevbûna bû. Piştî seatan elektirik dîsa pêket in. Yanî şano hey eli Amedê. Gava ku lidadigeha Amedê wan bûyaran pêk dihatin. Dozgerê Ergenekonê li Sîlîvriyê dosya KCK ya xwast.

Lê li Wan ê jî aynî ew dîmen hebûn.

Lê di aynî seatan de berendamê **DTP/BDP** ê şaredarê Mersîne, Parêzer Elî Bozan hat girtin.

- Serokê Rêxistina DTP/BDP'a Mêrsînê yê berê Parêzer Elî Bozan, 6 sal û 3 meh cezayê bi suçdariya "**Endamê Rêxistinê ye**" hat girtin.

Belê şehîdê delal Bawer Kotik Yusuf Şahîn, Rasim Gencer, îro 02/11-2010 a ye.

Li meha di ber vê li Tirkiye yê referandum pêk hatibû. Serokwezîr 40-50 rojq gund bi gund bajar bi bajar gerî ji gel re derew kirin. Em dê ji xalên qanuna bingehî 26-32 xala biguherin, azadî û demokrasî bê Tirkiye yê, ma serê Ti kesî ne êş ê. Gelek Kurdên me ronek bir jî baweriya xwe bi gotinên wî ye tijî derew anîn. Ji qanuna bingehî re "**Ne bes e lê erê**". Bi tenê PKK/BDP li ya bi wan û wî baweriya xwe ne anî bûn. Ji ber ku dizanin ew derewa dikin. Serokwezîr Erdogan marek ser sor e. Her dem dikara bi meriva dade.

Digot ma hûn dixwazin mirovên ku ji Ewrûpa bên an herin Ewrûpa rastî astengiyan nen?

-Belê………….

-Ez jî dixwazim, hîngê divê bi vê referandumê re bêjin erê.

Hinek Ronekbirên me Kurdê li Ewrûpa dijîn piştgirya wî kirin Ji merivê xwe re namê şandin ku li referandumê bêjin er ê.

Lê, ji wê qanuna bungehiya hatî guherandine 565 kesa jê suîd wergirt. Ew jî hinek diz bûn û hinek jî olperestê AKP bûn. Ne xwediyê Kurdîstan post û kevn avakêrê partiya DEP e serokê PKDW Kekê Yaşar Kaya bû û nej î serokê Komkareyî kevn Kemal Burkay bû.

Belê, sê roja di ber vê mepûsê **Şirnaqê Hasîp Kaplan** ji bo îada kirina statuya mepûsên Kurd û **hevserokên DTP ê Ahmet Tûrk û Aysel Tugluk** ku mepûsiya wan ji dest wan hatî girtine serî li serokê Meclîsê xistibû.



Min sê roja di ber vê gotibû ew Kurd in, ti mafê wan ji nûva nayê îada kirin. Belkê xwandevan bi min kenî bû. Îro serok meclîsê derket pêşberî raya giştî got; **TIŞTEK KU EW BIKIN NÎNE**

*Serokê TBMM Mehmet Ali Şahin, wiha bersiv da serlêdana jibo parlementeriya Turk û Tugluk; "Ne TBMM û ne jî Serokatiya TBMM nikare biryar bide, tiştek ku em bikaribin jibo daxwaza we bikin tune ye."*

Belê hevalên hêja; hevserokên KCD Ahmet Tûrk û Aysel Tugluk buyara teqînê li Taksimê bûyî şermezar kirin. Dewlet ji wan bawer nake.

-Na gotin PKK e kir.

Hevserokên BDP Selhattin Demîrtaş û Gulten Kişanak dibêjin em bûyarê şermezar dikin.

Ji wan jî bawer nakirinn. Hûn jî şaxekî ji PKK e ne.

KNK şermezar kir PKK e nekir.

-Na. PKK e kir.

KCK dibêje me nekir û heya me ji ti bûyarên wiha nîne.

-Na, PKK e û we kir. Hêza PKK e qels bûye, ji bo ku dengê xwe bilind bikin û tevlihevbûna nav xwe stabile bikin, PKK/KCK serî li çalekiyeka wiha xistiyê.

Li gor hinek çavkaniya PKK hêza xwe hatiye dawiyê, di nava PKK e de grubên ku li dijî Karayilan hebûne wan serî li dijî Karayilan rakirine. Wê grubê ew çalekiya Taksîmê kiriye.

Ji Îmraliyê birêz Ocalan ragihand ku "*ez wê rûreşiyê şermezar dikim. Bila komîsyonên aqilmed vê çalekiyê bikolin, ka kî li paş vê çalekiyê heye. Ne tenê vê çalekiyê. Çalekiya li Colemêrgê pêk hatî û neh sivîla jîyana xwe ji dest dayî, neh gerîlayên li Colemêrgê bi şikleka hov hatî kuştine jî li ser lêkolîn bên kirin. Ez dîsa gazî hevalan dikim ji çalekiyên li dijî sivîla tên xwe dur bigirin*"

Belê hevalên hêja; alaniya direêj kirina bêçalekitiya PKK e hîm li Tirkiye yê û him jî li dervayî Tirkiye yê alaniyê baş dan. Piştgiriya herî mezin ji rêvebiriya Başûr Kek Mesût û serokê meclîsê Fuat Huseyin hat. Ronek birên Başûr jî piştgirya vê pêvajoyê kirin.

Ji Ewrûpa jî dengên piştgiriyê hatin. Îro du rojin parlementerê Ewrûpî li Stanbolê ne û rewşa Tirkiye yê YE niqaş dikin. Wan jî reaksiyonên erênî dan.

**Cohn Bendît**: “Agirbest pêşveçûneke baş bû niha dora muzakereyê ye”

Hevserokê Koma Keskan a Parlamentoya Ewrûpa Danîel Cohn-Bendît, biryara KCKê ya dirêjkirina agirbestê heta piştî hilbijartinên giştî ya 2011ê, wek "*pêşveçûneke baş*" nirxand. Cohn-Bendît, diyar kir ku êdî divê ji pêvajoya diyalogê derbasî pêvajoya muzakereyê bê kirin. Navbirî ji bo vê mijarê jî hevdîtinên ÎRA-Îngîltera wek mînak nîşan dan û pêşniyara "*Xweseriya çandê û wekheviya tam*" kir.

**Hevserokê** Komîsyona Parlamentoya Karma ya Yekîtiya Ewrûpa û Tirkiyê Joost Lagendîjk ên ku ji bo konferansekê hat Stenbolê derbarê pirsgirêka Kurd nêrînên xwe pêşan dan.

'Bila berê xwe bidin mînaka ÎRA-Îngîltere'

**Cohn-Bendît**, biryara KCKê ya agirbestê wek "pêşveçûneke baş" nirxand û diyar kir ku divê ji bo çareseriyê êdî çek neyên bikaranîn. Navbirî destnîşan kir ku erkên gelek mezin dikevin ser milê herdû aliyan û dê ji bo çareseriyê bi awayekî lezgîn pêvajoya diyalogê xilas bikin û dest bi pêvajoya muzakereyê bikin û got: "Çi bibe bila bibe divê pêvajoya muzakereyê bidome û ji bo ku ev pêvajo bidome vîneke bi hêz nîşan bidin. Divê di vê mijarê de, mînaka ÎRA-Îngîltera baş bê lêkolînkirin."

Navbirî wiha axifî: "Dema ku mirov berê xwe dide Bakurê Îrlanda, ÎRAyê muzakere didomandin û komek ji ÎRAyê veqetiya çalakiyên xwe berdewam kirin. Lê kesên hevdîtinên aştiyê dikirin hevdîtin neqetandin. Divê ev hevdîtinên girîng berdewam bikin.

Komeke wisa ya veqetiyayî dibe ku çalakiyan berdewam bike lê divê tu caran hevdîtinên aştiyê neyên astengkirin."

## Çapemeniya Ewropa: PKK'ê îsrara xwe ya aşitiyê îspat kir




- Dirêjkirina biryara bêçalaktiyê ya ji aliyê Konseya Rêveberiya KCK'ê ve di çapemeniya biyanî de deng veda. Çapemeniya Ewrûpa bal kişand ku li gel daxuyaniya Taksîmê, biryara bêçalaktiyê watedartir bû û got; "PKK'ê israra xwe ya di aşitiyê de careke din îsbat kir, dîsa şansek din da hikûmetê".

Mijara ka wê Konseya Rêvebir a KCK'ê biryara agirbestê dirêjbike an neke, ji aliyê çapemeniya Ewropa yê ji nêz ve dihate şopandin. Doh piştî nîvro biryara 8 mehan dirêjkirina bêçalakitiyê û daxuyaniya PKK'ê ya dibêje "tu pêwendiyek me bi çalakiya Taksîmê re nîne", di rojname û ajansên Elman, Awusturya û Swîsrê de bi berferehî cîh girt.

ELMANYA: Rojnameya Tageszeitung ku xwedî tîrajek mezin e dide zanîn ku bi teqîna bombeya Stembolê bala rayagiştî vegeriyaye ser pêvajoya bêçalakitiyê. Rojnameyê balkêşand ku PKK'ê bi herdu daxuyaniyan rayagiştî rehetkiriye û ev ifade bikaranî: "Tevgera Gerillayên Kurd PKK bi negirtina ser xwe ya teqînê pêşdaraziyên ser xwe jî hilweşand.

Rojnameya Tageszeitung şertên PKK'ê yên ji bo aşitiyê bi berferhî ragehand xwendevanên xwe. Govara nuçeyan a heftane Spiegel jî ev ifade bikaranî: "piştî êrîşa Taksîmê yekser PKK hate suçdarkirin. Lê belê PKK'ê bi daxuyaniyekî fermî şûphetên ser xwe ji holê rakir."

SWÎSRE: Rojname û ajansên nûçeyan balkêşandin ser herdu daxuyaniyên KCK'ê.

**Rojnameya Zürcher Unterländer** nûçe bi berferehî weşand û got: "milîtanên Kurd maweya agirbesê heya havîna 2011 an dirêjkirin û daxuyandin ku ti eleqeya wan bi êrîşa întîxarî ya Stembolê re nîne, bi vî awayî bala rayagiştî cardin vegeriya herêmê". Rojnameyê şiroveyek wiha kir: "jixwe biqasê ti deman de nebûye di vê demê de ji bo bi dawîkirina pevçûna hewldan tên kirin."

Rojnameya Neue Zürcher Zeitung jî got: "Milîtanên Kurd êrîşa li Stembolê negirtin serxwe." Rojnameyê balkêşande ser daxwuyaniyên R. Teyîp Erdogan ên ku yekser piştî teqînê welatên Ewropayê tawambar dike. Rojnamê nivîsand ku beriya daxuyaniya PKK'ê ya ku dibêje em sivîlan nakin hedef Erdoxan qelabalixîkir, lê wezîrê karê navxweyî Beşîr Atalay di mijara PKK'ê de bi mesafebûye."

AWUSTURYA: Çapemeniya Awusturyayê cîhek berfereh da daxuyaniyên KCK û wiha got: ji bo pêkhatina aşitiya Kurd gavê herî giring hate avêtin." Nachrichten.at ku ajansa nûçeyan a herî zêde tê şopandine ev sernivîs bikaranî; "PKK'ê agirbest heya havîna sala bê dirêjkir." Ajansê biryara bêçalakiyê jî wiha şirovekir: "ji bo bi dawîbûna pevçûnan niha hewldanên pir bihêz hene."

Rojnamavana Hûrriyet ê: Asli Aydintaşbaş, îro di nivîsa xwe de, li ser trafîka li pişt agirbestê rawestiyaye û mijar bi berfirehî nirxandiye.

Li Tirkiye yê ronekbira û avahiyên sivîl piştgirî dan vê pêvajoye. Bi tenê rêxistina MHP li dijî vê pêvajoyê derketin.

Çepemeniya Tirkiyê Rojnamavana Hûrriyetê: Asli Aydintaşb:



"- Nameya Ocalan ji Îmralî ji bo Karayilan şandî ew qas girîng bû, dewletê ji parêzeran re nehişt, bi destê xwe radestî rayedarên PKKê yên li Ewropayê kir.

2- PKKê heta niha gelek caran agirbest ragihand. Du wateyên dirêjkirina agirbestê ya heta hilbijartina 2011ê hene: Pêvajoya daketina ji çiyê ya PKKê dê dîsa dest pê bike û cihê Ocalan dê di nav Tevgera Kurd de gelekî xurttir be. Bi vê pêvajoyê re PKKê dê hêzên xwe yên çekdar vekişîne derveyî sînorên Tirkiyeyê."

- Prof. Ergil: Dikarin Ocalan di malekê de bigrin

Zanyarê Siyasetê Prof. Dr. Doğu Ergil jî xwest ku ji bo bersivdayîna biryara agirbestê şaredarên ku ji doza **KCK**'ê girtî ne û girtiyên **KCK**'ê ku derbarê wan de delîlên saxlem



tune ne, serbest bêne berdan û bendava hilbijartinê ya ji sedî 10 bê daxistin. Ergil, destnîşan kir ku ger pêvajo berdewam bike dikarin Ocalan li çewlikeke Diyarbekirê di malekê de bigrin û ev tişt gotin:

"Dikarin Ocalan di çewlikeke li Diyarbekirê de bigrin. Ocalan dikare di wê çewlikeke wiha de serbest bigere û mirov bêne serdana wî. Bi vî awayî dê îzolasyon ji holê rabe. Lê encax PKK aşkera bike ku dema çekdarî qediyaye û çekên xwe li gorî isûlê terk bikin, ev yek dikare pêk bê. Derbarê perwerdehiya zikmakî de jî divê biryar bê girtin."

Diyarbekir (AKnews) – Serokê Odeya Bazirganî û Pîşesaziyê ya Diyarbekirê (DTSO)

Galîp Ensarioğlu, dirêjkirina agirbesta KCK'ê weke jest bi nav kir û diyar kir ku îcar dora



"jestê" ya hikûmetê ye. Nivîskar Altan Tan jî ji hikûmetê xwest bi lezgînî gavan bavjê.

Ensarioğlu ku li ser agirbesta **KCK**'ê ji AKnews'ê re axivî, kêfxweşiya xwe ya ji biryarê anî zimên û xwest ku di vê pêvajoyê de hawirdoreke jidil û diyalogê bê çêkirin. Ensarioğlu, wiha got: "

"Tiştê rast jî ev bû. Ne mimkûn bû ku heta hilbijartinan hin tiştên girîng bêne kirin. Mirov agirbesta PKK'ê ku dê heta hilbijartinan bidome û şansek bide aştiyê, weke jestek binirxîne."

Ensarioğlu, da zanîn ku ji bo bipêşxistina pêvajoyê divê hin jest bêne kirin û destnîşan kir ku divê hikûmet û dewlet jî gavên ku tên maneya jestê bavêje. Ensarioğlu, xwest ku hikûmet derbarê çareserkirina pirsgirêka kurd de jidiliya xwe û bibiryariya xwe tim bîne zimên û wiha axivî:

"Divê dadgeh jî girtiyên ji doza KCK'ê têne darizandin û siyasetmedarên ku hatine hilbijartin serbest berde. Divê hikûmet di vî warî de hin sererastkirinan çêbike."

**Belê hevalên hêja**; îro ji doza siyasetmederê Kurdê bi doz KCK tên darizandine li Amedê dewam kir. Dîsa




wek berê bi girti û rêvebirên me siyasî îşkence giran hatin kirin. 14 seta ew bi kelepça dan pandine. Dîsa wek berê li ber wê germê bênan û av cîhşt in. Dîsa îdîa name hat xwandin.

-Huseyin Kalkan/Şaredarê Elîhê yî kevn

-Ez li vir im.

-Zulkuf Kartekin/Şarerdarê Kayapinarê

-Ez jî li vir im.

Dozger emir da Katib, nava zû bixwîne û derbasî xwandina îdîanamê bibe.

Li seat 17:00 an dawî li xwandina îdîanamê hat.

Parêzera daxwaza serbest berdan kir. Eger serbest nen berdane jî divê doza wan li derva bê şopandin.

Daxwaz hat red kirin.

Sibê dîsa doz heye. Belkê hinek sibê bên berdan.

Doza siyasetmederê Kurdê li Wan ê jî hebû ew doza 3 meha paşve hat xistin. Ji ber ku bersuça/siyasetmederên Kurd xwastine ku xwe li dadigehê bi Kurdî biparêz in.

-Dozger bi zimanekî bîyanî ku em jê fêm nakin îfadê hatiye dayin. 2011 .01 25

Li dadigeha bilind ne tenê doza KCK hebû.

Doza Aydin Budak serokê şaredariya Cizîrê û serokê şaredariya Elîhê niha di girtingehê dane jî hebû. Dozger ji Aydin Budak re 20 sal ceza xwastin.

-Çi kiriye wî mêrxwazî?

Di sala 2009 an da gava niştecîhê Cizîrê li dijî polîs û nunerê dewletê meş pêk anîne. Aydin gazî Cizîriya kirye kiriye ew ti teşqelê dernexînin. Lê wî ew gaziya xwe bi Kurdî kiriye.

Dadgeha Esliye Ceza ya **Misircê**, bi hinceta bi kurdî axiviye 5 sal cezayê girtîgehê dan Şaredarê Êlihê Nejdet Atalay.

Aysel Tugluk got; “DIBE ROJÊN PÊŞ ME EM BIÇIN QENDÎLÊ JÎ”

Hevserokê BDP Demîrtaş: Divê her kes piştgirî bide biryara KCK'ê

Serok kmar Abdullah Gul: Bila agirbest mayînde be

Serokomarê Tirkiyeyê Abdullah Gul, derbarê biryara “bêçalaktiya” PKKê de got, “Hêvîdar im êek bêne danîn, agirbest bêdem û mayinde be.”

**ÎHD** KMM: Divê AKP vê fersendê ji dest bernede

Şehîdê delal Xalît Suleyman, Vedat Acar/Dewreş îro 03/11-2010 a ye.

Ez dixwaz îro bi gotineka ronekbir û rojnamevanê Hûrriyetê Yilmaz Ozdîl ê muhafazakar



dest bi nivîsa xwe bikim. "*Kî çi dibêje bila ma bêje, PKK e/Ocalan daxwazên xwe bi lêxistin û ser hişkiyê ji dest me digire. Newroz qet ti cara li welatê me nedihat pîroz kirin. Bi lêxistine bûn xwedana Newroz ê. Niha perewerda ziman dixwazine, berdana Ocalan dixwazin. Wê jî bi lêxistina ê bibin xwedan. Karayilan ji bo agirbestê 5 şert dane ber hikumat. Ji sedî sed yê bibin xwedî wan mafan. Polîsê Alman dibêje rêxistineka pir serhişk e*"

**Yilmaz Ozdîl** PKK e baş tahlî kiriye û dike PKK e jî baş nasdike. Xweskek hemû Kurd jî PKK e wekî Yilmaz Ozdîlê muhafazakar nas bikin.

Belê hevalên hêja; îro jî doza siyasetmederê Kurd li Amedê hebû. Rûniştina 10 emîn bû. Dîsa Kurda di parastina Kurdî de bi Îsra in.

-Bayram Altun/cîgirê DTP yî berê.

-Li vir im.

-Parastina xwe bike.

-Nunerê dadigehê hêja. Bi salanê ku zimanê me qedexeye û li ser zimanê me pestên giran hene. Ez dixwazim parastina xwe bi zimanê dayika xwe bikim.

-Dozger ji dest vî mikrofan bigirin.

Polîs û esker hema bezin mîkrofan ji dest birêz Bayram Altûn girtin.

-Eger hûn bi Tirkî parastina xwe nekin. Ez ê dozê bavêjim rojên pêş me. Ez niha naverber Didim dozê ji bo şewirandine.

**Xatip Dîclê**, em parastina xwe bi Kurdî bikin. Ma vê herkes wiha bizane.

Belê alaniya KCK biryara bêçalkiyê dayî didome. Ji Ewrûpa dengên baş tê. Îro li medya hat ragihandin ku hevdîtina Aysel Tugluka bi Ocalan re çar Seata ajoiye.

Belê li gor medya û şîroveyên ronekbiran, ji bo hevdîtina nunerê dewletê bi Ocalan re ewil li 16 îlonê 3 seat 15 deqîqa pêk hatiye.

Gava ku li Îmraliyê ew hevdîtinan pêk dihat li Colemerêgê maîn teqî 9 gundî ya jîyana xwe ji dest da. Medya bi direktifa esker û aşitînexwaza berê xwe berve PKK e kirin. Gelek

rûreşî û bextreşî û derew li PKK e kirin. Rojnamevanê bi unîforma bezin Colemêrgê nuçeyên derewa behre kirin. Lê ti kesî bi wan bawer nekir.

Pişt 16 îlonê hevdîtinên bi Ocalan re hatin qurt kirin.

Hevdîtina duyem jî li **25 îlonê** berê ku parêzer Aysel Tugluk here serdana birêz Ocalan pêk hatiye. Ew hevdîtina dewletê bi Ocalan re jî 45 deqîqa ajotiyê.

Lê vê carê li 31 cotmehê li Taksim/Îstanbolê bombe zindî di nava polîsan da hat teqandin, 15 polîs û gelek însanê sivîl birîndar bû. Li 1 cotmehê hevdîtina Aysel Tuglukê bi Ocalan re pek hat. Ew hevdîtina 4 seata dewam kiriye. Ocalan destnîşan kir ku, em jê pêvajoya diyalogê derbasê mûzekera bûn.

Ew hev dîtinê dewletê bi Ocaln re ji aliyê serok wazîr ve jî bi serê ziman har rast kirin.

**Medya:** *"Erdogan muzakareya bi Ocalan re piştrast kir" " Saziyên dewletê wê hevdîtinên bi vî awayî bike, ev yek berê jî çêdibûn."*

Belê **hevserokên BDP e Gultan Kişanak û Selahattîn Demîrtaş** ji bo vekirina nuneritiya/buroya BDP vekn çûn Hewlerê. Ji aliya Hewlerliyan ve germ hatin pêşwazî kirin. Ew dê bi der dorên hikumatê serok Berzanî re jî hevdîtinan pêk bînin.



Medya û Şîroveyên rojnamevanên Tirk Oral Çalişlar – Radikal

Ocalan gotiye, "Ez dikarim PKKê ji çiyê daxim deştê."

“Tugluk, dibêje Ocalan ji bo domandina biryara ‘**bêçalaktiyê**’ gelekî ji dil e. Ocalan gotiye, agirbestên 8 salên borî bûye qurbanî şerê navbera partiyan û daye zanîn ku ji bo iha çareseriyke mayînde peyda bibe û PKK ji çek were kirin, diviya hewldaneke bi ser partiyan re were dayîn. Ocalan, bi bîr xistiye, heke hewldaneke wisa çêbe ew ê jî ji bo bêçekkirin û daxistina PKKê ya ji çiyê her tiştê dikeve ser milê xwe pêk bîne. Tugluk, dibêje ku ew bi ‘xweşbînî’ ji Îmraliyê vegeriyaye.”

Destê xwe ji tetîkê bikêşe, şer neke bi axive! (Hasan Cemal – Milliyet)

“(...) Rojnameya Radîkalê duuhî kampanyayeke nû da destpêkirin: Şer neke baxive! Sloganeke rast e. Êdî diviya çek li çiyê bêdeng bibin. Têra xwe êş hatin kişandin, xwîn û rondik hatin rijandin. Niha dema li hev rûniştin û diyalogê ye... Tu çareya me ya dîtir nîne.Ji ber vê yekê jî, dirêjkirina agirbestê ya heta piştî hilbijartinê a bi hevkariya Îmralî û Qendîlê pêşketineke erênî ye. Dem dema hindê ye ku beramber tilî ji ser tetîkê bêne kişandin. Ne mayin ne operasyon!”

Spasiya Turk û Tuglukê bikin (Ergun Babahan –Star)

“ Bêyî ku sûcekî wî hebe, tenê ji ber ku kurd e, ew avêtin zindanê û her cure îşkence lê hate kirin. Wisa, gava ji zindanê derketî jî di ber xewan re gelek caran marş xwendin. Xwestin rûmeta wî bişikênin. Ne bes bû. Kete parlamentoyê, bû dengê mesilhetê lê me bi guhê wî girt û ew avêt derve. Bi guhartina Destûrê dîsa mafê parlamenterîyê bi dest xist, serlêdana vê jî kir. Lê tu kesî paxav pê nekir. Lê vana hemûyan jî ew ji riya wî ya rast venegerand. Heke hemû Tirkiye îro kêfa agirbesta heta hilbijartinê dike, xwêya wî jî di vê girarê de heye. Ez behsa Ahmet begê ku paşnavê wî Turk ew bi xwe Kurd dikim.”

Birayê delal Xalît Suleyman îro 04/11-2010 a ye.

Piştî bêçalekiyê Kurda duh dîsa lawekî xwe yî hêja Dîlşad Kobani - Xalit Süleyman şehîd da. Îro sê rojin Xakurk û Zap tê bombe kirin. Îro jî balafirên Tirka yê şer Haftanin bombe kirin û gelek cara li ser herêmê firîyan û teftîş kirin. Kanî bêçalekî?



Belê hevalên hêja; Mepûsên Kurd ji bo vekirina buroya BDP li Hewlerê ne. Ji aliya gelek şahsiyetê bilind ve germ hatin pêşwazî kirin.

"Hûn bi xêr û xweşî hatine ser axa bav û kalên xwe"

Spas spas.......

Lê li gor nûçeyên Tirkiye yê ew ji bo ku PKK e hêzên xwe bikşîne herêma Kurdîstanê/Başûr çûne Hewlerê, Kek Mesût re ji bo wê danûstandinan pêk bînin. Lê ne wiha ye. E ew daxwaza Tirka yê. PKK e hêzên xwe ji sînor û Zapê bikşîne. Ew jî dest û pîyê xwe bakin Kurda bikujin û di girtingehan kin.

Ji erda wan PKK e hêzeka jî dorê dayê. Ew gotineka me heye dibêjin"**Warin sêva warin sêva**" Lê ti mirovên wiha ser sivik di nava PKK e de tunen.

Belê çalekiya Taksîmê bombeya zindî rêxistina TAK e girt ser xwe. "Me kir"

- Rêxistina bi navê Teyrên Bazên Azadiya Kurdistanê (TAK) çalakiya 31'ê Cotmehê li Stenbolê pêk hat, di encama wê de 15 polîs, 32 birîndar bûn, girt ser xwe.



TAK'ê bi daxuyaniya di malpera xwe ya înternetê weşandî de çalakiya Taksîmê girt ser xwe. Di daxuyaniya bi îmzeya berdevkê çapemeniya TAK'ê Dogan Baz de wiha tê gotin; "***Em weke TAK'ê çalakiya li dijî polîsên dewleta faşîsta Tirk pêk hatî digirin ser xwe***."

Li gorî daxuyaniyê kesê bi navê Vedat Acar (Derwêş) ku endamê TAK'ê ye çalakiyê bi însiyatîfa xwe kiriye û got; "***li hemberî vê êriş û girtinên li ser gelê Kurd, hevalê me yê milîtan Derwêş vê çalakiyê bi însiyatîfa xwe kiriye.***"

KCK'ê banga "dawî li çalakiyan bîne' li TAK'ê kir"

- Serokatiya Konseya Rêveber ya KCK'ê çalakî û kesên biryara çalakiya Taksîmê dane şermezar kir û û got; "*Em bang li rêxistina TAK'ê di dikin ku di carekê dest ji çalakiyên xizmeta tekoşîna azadiya gelê me nake, berde*"




Serokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê carek din bal kişand ku tu têkiliya wana bi çalakiya li Taksîmê pêk hatî û tê de 15 jê polîs, 32 kes birîndar bûyî re nîne. KCK'ê di daxuyaniya xwe de êrişê şermezar kir û ji TAK'ê xwest ku dawî li çalakiyan bîne.

Belê li Amedê mirovatî tê darizandin. Lê ne bi şikleka mirovatî bi şikleka hovitî û di bin îşkence giran da siyasetmederên Kurd tên darizandin. Bi şehsiya wan wan dileyzîn.

Îro dîsa di parastina Kurdî da îsrar kirin.

-Bayram Altûn.

-Ez li vir im.

-Na. bi Tirkî tu bêjî.

-Birêz serokê dadigehê Kurdî zimanê min î zikmakî yê. Ez dixwazim bi wî zimanî parastina xwe bikim.

-Tu nikarî. Tu bi Tirkî jî dizanî.

-Belê ez bi Înglîzî jî dizanim.

-Eger tu wiha îsrar bikî ez ê te ji salonê bavêjim. Dengê mîkrofan hat birîn.

Katîb binvsîne. Bersuç bi zimanekî nayê zanin axivî!

**Siyasetmedar Ramazan Morkoç**, nerazîbûna xwe nîşan da û got "Hûn nikarin bêjin Kurdî zimanê nayê zanîn e". Piştî niqaşê heyetê ferman da leşkeran û xwest Morkoç derxin derveyê salonê. Siyasetmedarên din jî bi çepikan piştgirî dan Morkoç û helwesta heyetê şermezar kirin. Girtiyên din jî dan zanîn ku helwesta heyetê ne rast e. Pişt re heyetê ferman da leşkeran û xwest hemû siyasetmedaran derxe derve.

Hevserokê KCD'ê Ehmed Turk ji bo şopandina Doza KCK'ê hatibû Amedê daxuyaniyek da.

" Zimanek, Nasnameyek hatiyê girtin"




Turk diyar kir ku hîn polîtîkaya înkarê berdewam dike û got; "Bi rastî em dikarin bêjin, îro nasnameyek û zimanek girtî ye. Zimanek ku 20 milyon pê diaxivin û ji aliyê hemû cîhanê ve hatiye qebûlkirin, ger îro weke zimanê nayê famkirin tê binavkirn, ev yek nîşan dide ku polîtîkaya înkarê ya li ser Kurdan berdewam dike. Dema em li peymanên navnetewî û yasan dinêrin, mirov li rastî tiştek wiha nayê. Lê li vê derê nêzîkbûnek siyasî heye. Ne nêzîkbûnek hiqûqî ye."

Sibê ji bo şermezar kirina dozê li Amedê meşa mezin heye

Birayê delal Xalît Suleyman, Vedat Acar/Dewreş îro 05/11-2010 a ye.

Îro Amedê bi dengê slogana “Dîren Diyarbakir dîren!” ji xew hîşyar bû. Li parka Koşuyolê



bi deh hezaran kom bûn û bi strana “Oramê bilindê” ber ve avahiya dadigeha bilind ku hevalên wan lê tên darizandine bez in. Li kolanên Amedê bi hezaran jî polîs hebûn, ew dişopandin li nêçira xwe digerîn, kak ê bidin binçava. Li ti kesî ew guhdar nedikirin û ti kes ji zumla wan neditirsî. Ew bi tirsê hatibun sirandine “*Zimanê me rûmeta me ye” “Dadigeha ku zimanê min nas nake, em jî wê dadigeha nasnakin.*”

Li seat 09:00 an girtiyên me siyasî ji bo darizandina 12 an anîn dadigehê. Lê wan jî fêm kiribû ku îro li Amedê piştgiryek heye.




Lê dadigehê ew hetanî seat 11 an dan payine.

Li benda bersiva bûn. Bersiv li seat 11 an hat. Di dilê wan da tirs hebû. Dengê zimanê me rûmeta me ye dihat guhên dozger û dadgera. Dozê li seat 11 an dest pê kir. Li derva polîs bi qaza biber û ava sar êrîşa ser meşvanan kir. Cîwanan ew kevir kirin û zarokê agir bi quna wan xisti. Dayika bi tilîlîyên xwe ew şermezar kirin. Parka Koşuyolê bû qada şer. Pişt re polîs gelek kes girtin binçava. Li herêma Şirneqê dengê topa dihat guhên Şirnaqiya.

Gava ku polîs ew girtin binçava slogana şehît nemirin, Kek Vedat Acar em bi te re ne.

Dewreş li 31 cotmehê xwe li Taksimê di dilê dijmin da wek bombeya zindî teqîbû. Nunerê TAK e bû.

Lê guyekî Tirka jî li Herwlerê bû. Hevserokên BDP bi kek Mesût Berzanî re hevdîtin pêk dianîn. Lê ew bi vê hevdîtine kêfxweş bûn. Hêza wan ji ya duh hê girantir nêzika hev dibû. Biratî hê baş dibû.

Lê şerê herî mezin li salona dadigeha Amedê bû.

Dozger Katîb nava bixwîne....

**-Xatip Diclê**.....

-Ez li vir im.

Dozger mirûzê xwe tahl kir.

-Bixwîne....

**-Firat Anli**

-Ez jî li vir im.

Dozger serê xwe hêjand...

-Bixwîn e...

-Mehmet Abbasoglu/ serokê DEHAP yî kevn. Di sala 2004 an da ji neh meha ketibû girtingehê.

-Ew nexweş e.

Belê rastê ew nexweş e. Bi nexweşiya penceşerê ketiye. Nikare bê dadigehê. Lê dîsa jî wîji girtingehên xwe yên genî bernadin. (Wênê Abbasoglu)



-Dadger, ez dozê davêjin heftê pêş me. 08/11an. Bi zimanekî em jê fêm nakin parastin tê kirin.

Ew helwesta dadger ji aliyê guhdar û parêzvanan ve hat şermezar kir.

-Birêz dadger. Li Trt 6 ew zimanê 24 seta tê axavtin. Kanal jî Kanala dewlet ê.

Jinên me dayikên me jî pankart bi stûyê xwe de kiribûn. “Em jî li vir in”.




Em ê dadieghê xwe bi xwe ava bikin.

Lê derva şer heye. Meşvan hatin ber avahiya dadigeha bilind. Dengê wan moraleka mezin da s iyasetmederên me. “Em bi we re ne.”

Dîsa bi çi zahmet û zulmê ew birîn dadigehê.

Belê hevalên hêja, termê **Vedat Acar/Dewreşê** çalekvan îro bi balafirê şandin **Wan/Gurpinarê**. Bîrayê wî êrîşa ser rojnamevanan kir. “***Em dest ji vê dozê bernadin. Hetanî deh roja kurekî min çê bibe. Min di dilê xwe de digot ez ê navê wî bi Aşitî kim. Lê ez ê niha navê wî bi Dewreş kim***” (Wênê Diya Dewreş û biryayê wî)



Belê hevalên hêje, ew gotin û nifireka me ya Kurda heye dibêji; Hey mêro hûn bi pistê hev kevin an di xwîna hev kevin. Li nûçeyên ji herêmê tên di navber eskerên Îran û Tirkiyê de pêvçûn derketiye heft eskerê Îranê hatine kuştin.

Lê ew şiqas dibîn dijminî hev û ew qas jî nêzika hev in. Îro di navber Suryê û Tirkiyê da payman hatin îmze kirin.

Enqere û Şamê li ser girtiyên PKKê li hev kirin.

Piştî ger û geşta wezîrên tirk ya Sûriyeyê û Civîna Bilind ya Strajîk ya Hevkariya Tirkiye û Sûriyeyê ku mijara wê ya bingehîn PKK bû, rayedarên tirk daxuyaniyên ku “Me bi Sûriyeyê re li hev kiriye” dan. Ev daxuyanî ji aliyê Serokwezîrê Tirk Recep Tayîp Erdogan ve jî hatibû piştrastkirin.




Bi qasî 50 alîgirên Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) ku partiyek siyasî ye û bi awayeke demokratîk jibo mafên Kurdên Başûrê Rojavayê Kurdistan û Sûriyeyê têdikoşe, hatibûn girtin. Wê doza van 50 alîgirên PYD’ê di roja 14’ê cotmehê de pêk bihata, lê Dadwerê Leşkerî ya Helebê da diyarkirin ku wê doz di roja 11’ê Mijdarê de pêk bê. Ew di demeka nêz da girtiyên PKK e bi hev re mubadelê bikin.



Belê dixwazine dîsa li ser postê Kurda û serokê Kurda birêz Ocalan siyaseta xwe pêk bînine. Di sala 1999 an da gava ku birêz Ocalan hat girtine partiya MHP bi dengê nijadperesta piştî 40 salî hat ser dest hildariye û kete meclîsê. Lê di hilbijartina sala 2002 an da nikarin ku di meclîsê kevin. Lê îro dîsa rewşa wan xirab bûye, dibe ku dîsa nekevin meclîsê. Îro generalên ku birêz Ocalan ji Kenyayê anî Korgeneral Engin Alan, nijadperetê Tirkiyeyî herî mezin Umut Ozdag, Sadî Somuncu re hevdîtin pêk anî. Bi dozgerê ku birêz Ocalan darizandî re jî hevdîtin pêk anî. Dixwazine wan wek metaryal bi kar bîne.

Birayê delal Xalît Suleyman, Vedat Acar/Dewreş îro 05/11-2010 a ye.

**Cara ewilê ji devê rêvebirekî Tirkî ji payabilind gotineka rast derdikeve. Waliyê Mêrdînê" Li vê derê pirsa nasnameyê heye. Ez 12 salin li herêmê wek walî kar dikim. Ciwanên vir ne ji ber xizanî û aboriyê diçên çiya. Ji ber nasnama xwe diçin çiya. Eger ji ber xizanî û aboriyê bûye ciwanên Yozgatê jî ê biçûyana çiya. Li vir pirsa nasnamê heye"

Lê ealî wiha dibêje; warin em guh bidin ser gotinên serok komar û waliyê Amedê ka ew çi dibêjin;

**Serok komar: "Eger bersuçê KCK bi zimanê Tirkî nizanine dibe ku bi Kurdî parastina xwe bikin. Lê hemû bi Tirkî dizanin. Ew dixwazine reklama/probagandê biki . Dadigeha biryara rast bidin."

**Waliyê Amedê: "*Kurdî li dijî zagonê ye*". Walîtiya Amedê serlêdana Meclîsa Giştî ya Bajarê Amedê ya ji bo navê gundan bi kurdî û tirkî bê nivîsandin, bi hinceta li diji zagonan e red kir. Li gorî Walî Mustafa Toprak, ji ber meclîsê lewha navê 91 gundan bi kurdî û tirkî daliqandiye sûc kiriye.

**21 kesên ku gotine "Ocalan vînaîrada me ya siyasî"ye 21 sal ceza.

- Sala 2006'an li navçeya Mûşê Gimgimê bi hinceta ku îmze avêtine binê kampanyaya "***Birêz Abdullah Ocalan vîna me ya siyasiye***" doz li 21 kesan hatibû vekirin û jibo 21 kesan 21 sal ceza dan.

**Belê hevalên hêje; ez ji we re îro behsa dîplomasiya Kurdîstana Başûr di 3-4 eojan de çi qewiyê û diqewîmê bikim.



Li 4/11 e mehê heyeta BDP di bin serokatiya hevserokên BDP Selhatin Demîrtaş de çûn Başûr û bi Kek Mesût re hevdîtin pêk anîn û ew hevdîtina gelek baş derbas bibû.

Kek Mesût dest nîşan kir got; Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî jî diyarkir ku ew ji vê pêvajoyê razî ne û got; *"Em di wê baweriyê de ne pirsgirêka Kurd ê bi riyên aştiyane û diyalogan bê çareserkirin. Ji bo vê, tişta ku bikeve ser milê me em ê bikin"*. Di demeka kin da konferansa Kurda li hev bicivên û buroya BDP ê jî di demeka kin de vebibe.

Piştî bi hevdîtina bi hevserokên BDP e re vê carê jî bi rêya telefon bi rêvebir û şewirmendê



Amerîka Biden re hev dîtin pêk anî. Mijar pirsa Kurdî û avakirina hikumata Îraqê ku 8 mehene li hev nehati ne. Barzanî û Biden pêşketinên dawî gotûbêj kirin.

**Li 04/11 an jî birêz Mesût Berzanî bi serok dewletê Amerîka re bi rêya telefonê hevdîtinek pêk anî. Mijar pêşketinên dawî gotûbêj kirin. Elbet pirsa Kurda û agirbesta ji aliya PKK e ve hatî îlan kirin. Duh jî serok komarê Îraqê Mam Celal hat Hewlerê.

Îro jî wezrê dervayî Tirkiye yê xwe gihand Hewlerê. Wî jî pêşketinên dawî bi Kek Mesût



re gotûbêj kir û hevdîtina kek Mesût a bi BDP li yan re ji wî guhdar kir. Bi qasî sê seata hevdîtin pêk hat û pişt re çû Bexdayê cem Serokwezir Malîkî.

Belê şehîdê delal Vedat Acar îro 08/11-2010 a ye.

Bajarê Amedê li berxwe dide *"zimanê me rûmeta me ye. Yên ku zimanê me nasnekn em jî dadigeha wan nas nakin"* **Sîlopî û Wanîya** dengê xwe bilind kirin "em li cem Amediya ne" Gewer di îsyanê daye. "Doza wan doza me ye." Piştgiriya Amedîya kirin, lê dengê Sêrt û Mêrdînê jî dihat gukê wan.

Belê, îro nobeta aşitîyê derbasî Colemêrgiyan dibe.




Li seat 09:00 an bi sê otobûs ji Colemêrgê bi dengê qorna/kilaksiyona ketin Amed ê. Bi carekê re ber avahiya şaredariyê Amedê bi cilû bergên Colemêrgiya, bi rengên Kurda hatin xemîland in.

Li seat 09:30 an siyasetmederê Kurd ji bo darizandina 12 emîn anîn dadigehê. Tilîlîya dayikên Kurd siyasetmederê me kêfxweş kirin. *"Zimenê me rûmeta me ye"* Îşaretê serkeftine hatin kirin. "Em ê li berxwe bidin".

Li derva ji bo ku dozê biparêzin bi qasî 90 parêzer hene. Serokê baroya

Amedê M.Emîn Aktar û parêzerê Amedê bi nav û deng Sezgîn Tanrîkulu jinên Kurd silav kirin û kete avahiya dadigehê. Dostê gelê Kurd parêzer **Baskin Oran** jî li dadigehê amedê bû.



Seat li 10:35 dozê dest pêkir.

-Xatip Diclê......

-Em li vir in.

-Selma Îrmak....

-Em jî li vir in.

Dengê mîkrofon hat birîne.

*"Eger hûn wisa dewam bikin, em nikarin dadigehê pêşve bibin. Ji wî zimanî nunerê dadigeh fêm nakine. Parastina xwe bi Tirkî divê hûn bikin."*

Selma Îrmak.....

*"Birêz serokê dadigehê, di ber wê jî li vê dadigehê dozên bi vî rengî bi rêya tercûmana pêk hatine yek ji wan parêzer .........Kormaz e. Em Kurd in dixwazin bi zimanê xwe parastina xwe bikin."*

**Seat 10:43** e.

-Ez vê dozê dişînîm daîra 4 emîn dadigeha giran, ew dê biryara vê doze bidin. Divê herkes hundirê salonê terk bike.

Guhdaran, parezeran çepik lê hev dan. Doz di 8 deqîqan da bi dawî bû.

Parêzer **Baskin Oran** kete navberê

-Birêz serokê dadigehê Hûn şaş dikin.



-Tu nikarî aqil bidî me. Ez dozê davêjim 11/11 an....

Lê gava ku ew doza li Amedê pêk dihat. Doza lewheyên/tabeleyên Kurdî ji aliyê şaredariyê ve bi Kurdî hatibû nivîsandine jî li dadigeha Daniştayê hebû. Daniştayê jî wek dadigeha Amedê bîryara xwe da. Kurdî nivîsandin ne li gor qanuna ma ya bingehî bûye. Em wê dozê red dikin. Divê ew lewhê/tabelên bi kurdî hemû bên berhev kirin.

Belê hevalên hêja; mîlletê Kurd di jîyana xwe de ti cara xelatê aşitiyê wernegirtin. Ji ber ku her tim bi xwe di nava şer dabûne. Di sala 1991 **Leyla Zana** xelata **Sakarov** wergirtibû. Îro jî serokê hikumata herêma Kurdîstanê Kek Mesût Berzanî ji ber hewldanên xwe ye aşitiyê Xelata Natoya aşitiyê werbigire.

Belê şehîdê delal Vedat Acar îro 10/11-2010 a ye.

Îro roja çareşem e. Parêzera îro jî nikarin herin Îmraliyê. Dîsa wek berê astengiya hawa yê bû. Belê sibê an du sibê herin serdana birêz Ocalan.




Îro dîsa serdana parastina Kurdî ya li dadigeha bilinda 4 emîn hat red kirin.

Dewleta Tirk di qedexebûna zimanê Kurdî da îsrar dike. Lê Kurd jî di hebûna wî zimanî û wî gelî da îsrar dike. "Em hene" Mepûsê Kurd Begî Yildiz li Meclîsê bi Kurdî axivî û serok meclîsê ew bi zimanekî tûj rexne û hîşyar kir. "Zimanê meclîsê Tirkiyê."

Belê hevalên hêje; Polîsê Alman Daîreya Krîmînal ê duh got: "Kurd ewlekariyê tehdît nakin"




Karl-Heinz Ruff derbarê Kurdan de daxuyaniyek balkêş da. Ruff diyar kir ku '*Kurd ji bo ewlekariyê ne tehdît in'* û got; '*PKK xwepêşandanên protestoyî yên aşitiyane li dar dixe. Em pêvajoya çareseriyê ya li Tirkiyeyê ji nêz ve dişopînin*."

Li aliyê din dewleta Tirk xwe gihandiye wan, Rojname ambelma KCK bi kar tîne. ji bo wê li rojên pêş me li **rojnama Polîtîkayê** doz bê vekirin Wê amblema KCK bi kar aniyê.

Karayilan ji bo şehîd Vedat Acar/dewreş got. "VEDAT ACAR/DEWREŞ MIROVEKÎ FEDAKAR, MEZIN Û RÊZDER E"



De got ti rexneyên wan li şexsê Vedat Acarê ko teqîna li meydana Taksîmê pêk anî nîne û got Vedat Acar mirovekî fedakar, mezin û rêzdar e.

Murat Karayilanî got rêxistina TAK-ê pêrsgira rêberê PKK-ê Abdullah Ocalanî ye lê belê ji PKK-ê û KCK-ê serbixwe ye û got berpirsên TAK-ê di demeka xelet de biryara vê kiryarê dane lê belê ti rexneyên wan li şexsê Vedat Acarî nînin û got:

Di eslê xwe de rexneya me ne li Vedat Acarê ko ev kiryar binecih kiriye û xudanê helwêsteka fedaiyane ye. Ew çalakvanek e, wî wekî mîlîtan û fedaiyekî wezîfeya xwe

kiriye. Mirovekê ko ji bo baweriyên xwe hewqasê semîmî be ko xwe jiyana xwe feda bike ne mirovekê biçûk e, ew mirovekê mezin û rêzdar e. Her kî be dema ko yek ji bo baweriyên xwe bigihî astekê ko jiyana xwe feda bike hingê ew gehiştiye asteka rêzdar. Lewra ti gotina me ji vê helwêsta fedaiyane re nîne, em rêzê jê re digirin. Divêt hemî xelkê me jî wiha nêzîkî vê meseleyê bibe. Lê belê yên ko biryara kiryarê dane proses baş teqîb nekirine, zeman û mekan baş tesbît nekirine û bi vê kiryara xwe rêxistina azadiyê xistine rewşeka teng de.

Belê şehîdê delal Vedat Acar/Dewreş îro 11/11-2010 a ye.



Amed dikele. Îro dîsa bi hezaran bezin û piştgirî dan siyasetmedrê xwe. *“zimanê me rûmeta me ye.” “Va der Kurdîstanê”, “em ê li deverê bi Kurdî bi axivin”*

Lê 80 klm dûrî wan bi hezara Batmaniya piştgiriya çalekvanên Amedê dikir li ber şaredariya Batmanê ji ber ku şaredarê wan jî di girtingehê dabû. *“Em jî li cem we ne. Hûn ne bi tenê ne. Doza we doza me ye”*

Doza siyasetmederên me KCK di rûniştina xwe ya 14 an daye. Sê heftenê ku bi siyasetmederê me îşkencê giran dikine.

Wan di bin şert û mercên giran da dibîne û tînine dadigehê.

Dîsa serokê dadigehê navê siyasetmedera xwandin.

Xatip Dîclê....

-Em li vir in....

Bi vê gotinê serokê dadigehê dîn bû. Wekî kulmekê li serî wî xînî gêj bû.

**Serokê Dadgehê Menderes Yilmaz** ji girtiyên/siyasetmedê Kurd xwast ku kesên bixwazin bi Tirkî parastina xwe bikin bila mafê axaftinê werbigrin. Lê siyasetmedarên Kurd ev daxwaz wî redkirin.

Dengê li derva tê guhê wan.

*"PKK gele gel li vire", "Zimane Kurdi zimane me ye", "Zimane Kurdî hebûna me ye", "Kîne em Kurdin em", "Zext me bêzar nakin", "Ocalan", "Em KCK'î ne", "Amed ranekeve xwedî li vîna xwe derkeve" û "Bê ziman jiyan nabe"* berz kirin. Di meşê de posterên birêz Abdullah Ocalan û alên **PKK**'ê hatin vekirin. Balafir di ser Amedê re nizm difirin, Li sukê esker bi marşa "en bûyûk asker bizim asker" "Eskerî herî mezin eskerê Tirk e"




Di rûniştina danê nîvro de hevserokên BDP'ê Selahattîn Demîrtaş, Gultan Kişanak û parlementerên BDP'ê Pervîn Buldan, Emîne Ayna, Bengî Yildiz, Ayla Akat Ata, Fatma Kurtulan û bi dehan parêzer jî beşdarî dozê bûn wek guhdar û çavder. Piştî danê nîvro parêzeran mafê axaftinê girt û ji heyetê xwast siyasetmedar serbest bên berdan.

Dadgehê ev daxwaza parêzeran ya serbestberdana girtiyên siyasî red kir.

Hevserokê BDP Selhattin Demîrtaş xitaba hezaran kir got: "*Em ê li her qadê Kurdî bi axivin"* Li dadigehê, li dibistanê, li nexweşxanê. Dibêjin li mala xwe, kolanan bi kurdî bi axivin lê li qada cemaweriyê ne axivin" Demîrtaş, anî ziman ku ev yek heqereta li kurdiye. 80 salê înkar û îmha li ser zimanê me heye. 30 salî di ber vê jî li girtingeha Amedê destûr




nedidan ku bi Kurdî bê axavtin. Îro jî nadin. Zîhniyeta dagirkeraan nayê guhertin.

Lê li wê demê, li hemberî dagirkera Mazluman, Xeyriyan û Kemalan bi berxwedana xwe navên xwe li dîrokê bi tîpên zêrîn dan nivîsandin. Siyasetmederê me jî navê xwe bi tîpên zerînî li Birca Amedê binsînin.

Doza siyasetmederê Kurd avêtin 13/01 2011 an.

- Hevserokên KCD Ahmet Turk û Aysel Tugluk, gotina 'Kurdî zimanê nayê zanîn' weke êrîşa li dijî gelê Kurd binav kirin.



Hevserokên KCD Ahmet Turk û Aysel Tugluk li dijî vê helwesta qedexekirine, bang li gel Kurd kir da ku Kurdî li her qadê serdest bi Kurdî biaxivin. "Em hene û em ê hertim jî hebin". Dibêjin em wî zimanê fêm nakin. Ne hewceyê ew fêm bikin. Em 40 mîlyon wî zimanî fêm dikin. "Zimanê me rûmeta me ye". Îro rûmeta met ê darizandin. Em gazî deewletê dikin, bila dest ji wan rûreşiyên xwe berdin. ji bo aştiya Tirkiyê ya mayînde 8 mehên li pêş me hene, divê ew baş bê nirxandin.

Belê hevalên hêja; Îro sê rojin jinên Colemêrgê li ser rîya Ankarê ne. Îro ji aliyê polîsên Rihayê vê meşa wan hat asteng kirin. Bi qasî 40 jin ji wan hat binçav kirin. Bi sedan jinên din li ber avahiya emniyetê di nava çalekiyan da ne.




Polîsê Amedê jî jinên Colemêrgê ku nobeta aşitiyê sê roja di ber vê wergirtî girtin binçava.

*"Siyasetmedarên Kurd rumeta me ne", "Dest nede vîna min ya siyasî, siyasetmedarên Kurd serbest berdin" û "Em Xweseriya Demokratik silav dikin" vekirin.*




Belê, piştî 8 meha bi hewldan û piştgiriya dewletên cîranê Îraqê wek Îran, Îrak û Tirkiye yê hikumata Îraqê hat ava kirin. Serok dewlet **Celal Telabanî** û serokwezîr **Malîkî** hat bijartin. Tirkiyê bi Suîdî ve gelek li ber xwe dan ku Mam Celal nayê hilbijartin. Lê wiha nebû. Ji vê polîtîkê Îran bi qezenç derket. Fraksiyona Şîya serokwezîrî wergirtin.

Li hinek çavkaniya serok dewletê Amerîka ji Kek Mesût re spasiya xwe kiriye û Kek Mesût mêvanetiyeka giran ji nunerê hikumata Îraqê re kiriye.

Medya: Obama sipasî Barzanî kir

Barzanî: Min sê rojên di jiyana xwe de herî zehmet jiyan kirin

Kek Mesûd Barzanî serokê herêma Kurdistanê li Bexdayê pêşwazî li James Jeffrey balyozê Amerîka yê li Iraqê kir.

Di hevdîtinekê de balyozê Amerîkayê silavên taybetiyên Barak Obama serokê Dewletên Yekirtiyên Amerîkayê gihandin serok Barzanî û got ku serok Obama û îdareya Amerîkayê gelek kêfxweş in ku di çarçoveyê destpêşxeriya serok Barzanî de kirîza siyasiya pêkanîna hikûmeta nû ya Îraqa federalî bidawî hat û hemû hêz û aliyên siyasiyên îraqî, ji bona pêkanîna hikûmeteke hevbeşa niştimanî gihiştin rêkeftinekê.

Belê şehîdê delal Vedat Acar/Dewreş îro 13/11-2010 a ye.

Ne yî kal bû, ne jî westiya bû ku dest ji eşqa xwe ya welêt berde. Hezkirê zimanê Kurdî û



Kultura Kurdî bû. Wî carna ji bo ku Rojnama Rîya tezê jîyana xwe bidomîne li ber deriyê wezarat kultura Erîvanê bû, carna li ber deriyê Moskovayê bû. Carna dengê xwe bilind dikir gazî Kurdên li Ewrûpa dikir bila alîkariya me bikin ma jîyana Rîya Teze bidom. Rojnama Rîya Tezê rojnameyeka temen dirêj e. Arşiva Kurda li Erîvan ê.

Wî mêrxwazî nobeta xwe ya Rîya Tezî li 11/11 an li Erîvanê di 62 saliya xwe berpirsyariya xwe radestî hevalekî xwe yî din kir. Grîşayê Memê. Rojnama Rîya Tezê sêwî ma.

Berpirsyarê rojnameya ”Rya teze” wefat kir.

Grîşayê Memê weke 35 salan di rêdaksyona rojnameyê da kar kir, ji wergervanyê gihîşte heta berpirsyarê rojnameyê. Piştî wefata wî rewşa rojnameya xwedî dîroka dewlemend kete ber xetereke nû. Ew bûn xebatkarên Rojnama Rîya Teze: Babayê Keleş, Hesenê Qeşeng, Keremê Seyad, Eskerê Boyîk, Kinyazê Îbrahîm, Kinyazê Hemîd, Rizganê Cango, Prîskê Mihoyî, Têmûrê Xelîl, Cemalê Huseyn, Sîabendê Xudo, Hesenê Ûso, Rizganê Simo. Em ji wî û ji wan hemûya re spas dikin.

Belê hevalên hêja; li roja çarşemê parêzerên birêz Ocalan nikarin bi birêz Ocalan re hevdîtinan pêk bînin. Li roja înê hevdîtina hefteyî pêk hat.

Alaniya doza siyasetmederên me k udu meha hatî dirêj kirine ji aliya KCK e ve hat şermezar kirin.

Birêz Karayilan wiha got; KCK: Divê xweserî di aliyê ziman de bikeve jiyanê



Serokatiya konseya rêveber ê KCKê destnîşan kir ku siyasetmedarên Kurd wekî rehîneyan tên girtin û taloqkirina 2 mehan a dozê wê vê şerma Tirkiyeyê negre. KCK wê ji bo kurdî banga pêkanîna zimên a di nava ziman û çand a xweseriya demeokratîk kir.

“ Zimanê nayê zanîn” û heqartet lê kiriye. Ev helwesta dadgehê ne ya wê bi xwe ye her wisa ya dewleta Tirk û sîstemê bi xwe ye. Helwesta dadigehê sexte yê. Em wê dadigehê şermezar dikin.

Operesyon qismî hatine rawestandin. Yanî ne ji bo ku Tirk li ser soza xwe ne. Zivistanê û ne razîbûnek di nava rayagiştî û eskeran da heye.

Li Manîsayê 3 şagirdê dibistana serekê ji bo ku slogana “bijî Apo” avêtine polîs ew girtin binçava.

Rûreşiyên Tirkayê li dijî Kurda pêk hatî îro yeka din lê zêde bû.

“Di 1994-ê de yên ku 4 mamoste kuştî, ne PKK bûn, ew nunerê JITEM bûn”. Xwediyê vê gotine û li xwe mikûr hatine serokê Cardavanê Dêrîkê Bedran



Akdag bû. Li dadigeha Amedê: Wê rojê mudurê xwendegeha gundê Başakê M.Zeki Öduk, mamosteyên wê xwendegehê Ali Yildiz, Mahmut çatalkaya û Erol Erçan li devera Pinardere ji otomobîlê hatin derxistin û gulebarankirin. Her çhar jî hatin kuştin, weka ku PKK-ê ew kuştibin. Wê rojê wezîrê devletê ê hukumetê ê wê wextê **Esat Kiratlioglu** li deverê digeriya, ji bo tesîr li siyaseta hukumetê bê kirin ew mamoste hatin kuştin.



**Bedran Akdag** ragihand ku Fermandeyê Alaya Jendirman Albay Ridvan Özden li dijî vê bû, civînek bi wan re kir ku çhima mamoste kuştin, îtîrafkarên JITEM-î xeber ji albay re dan û çûn. Çimkî Albay Hasan Atilla Ugur ê ku niha girtiyê Doza Ergenekonê ye li pişt wan bû, ew efserê JITEM-ê bû.

Cerdevan Bedran Akdag herwiha eşkere kir ku carekê jî vê Tîmê bi îstîxbaratekê tespît kir ku li dora gundê Ormancika ser bi Stewrê vePKK-yî hene, bi wan re ket şer; 6 kuştî û 11 jî sax ji gerîlayan bidestixtin. Vê tîmê ew her 11 gerîllayên saxgirtî gullebarankirin û kuştin. Albay Ridvan Özdan bi tevî cerdevanên xwe hat keşfa buyerê ser kuştiyan, li wir gulleyek bera paçhika hustuyê wî dan ew kuştin û weka ku di şer de hatibe kuştin îlan kirin.

Li gor Bedran Akdag Albay Ridvan Özden ji bo ku li dijî bêserûberiya JITEM-iyan bû hat kuştin

**Ocalan**: *Pêwîste Destûra Xweseriya Demokratîk bê amadekirin*

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan roja înê bi parêzerên xwe re hevdîtina heftane ya asayî




pêkanî û di derbarê doza qirkirina siyasî û çareserkirina pirsgirêka kurd de nirxandinên girîng kirin.

Ocalan ku dadgehkirina li Amedê wekî "siyaseta rizandinê" binavkir, behsa parastina bi kurdî jî kir. Rêberê gelê Kurd bersiv jî da derdorên ku israra di parastina bi kurdî de wekî înadê binavdikin û got: "Zimanê dayikê rûmeta mirovane, israra tê de, israra parastina rûmet û hebûnê ye".

YÊN KU JI DOZA KCK'ê TÊN DAREZANDIN DI REWŞA REHÎNAN DENE

Ocalan diyarkir ku muameleya rehînan bi girtiyan re tê kirin û got, di heman demê de ev siyaseteke rizandin û tasfîyekirinê ye û weha dewam kir: 'Beriya niha qetil dikirin , lê niha wan dirizînin. Buyera Vedat Aydin tê zanîn. Vedat qetilkirin û niha jî hewildidin Xatîp Dîcle di girtîgehê de birizînin û wî bi vî awayî tasfîye bikin. Ez Xatîp nas dikim, ne mirovekî ku têkiliya wî bi çekan re hebê ye. Tiştên ew dike û dibêje, bi temamî di çarçoveya azadiya ramanê de ne. Qetilkriina Vedat Aydin li derve û rizandina Xatîp Dîcle di girtîgehê de heman tişt û encamên heman siyasetê ne.'

Ocalan bal kişand ser wê ku, heta xeteriya vê siyasetê neyê dîtin, helwestek rast li hember wê jî nikare derkeve û nirxandinên ku israra parastina bi kurdî wekî "înadê" binavdikin jî rexne kirin.

"Zimanê dayîkê rûmeta mirovane, israra bi vê mebestê, israra parastina rûmetê ye. Ev tê wateya man û nemanê, mijareke jiyanî ye."

Ocalan ku ev rewş şiband mînaka windakirina kerê Xoce Nisredîn got: 'Pêşî, kerê Xoce Nisredîn ji ber dihilînin û windadikin. Dûre, qaşo jê re jî dibînin û tînin. Dibêjin Xoce ma tu kêfxweşbûyî? Rewşa siyasetvanên Kurd yê girtî jî wekî vê ye. Bi neheqî û bi awayekî bêhiqûqî binçavkirin û rehîn girtin. Niha jî dixwazin wan teslîm bigirin û yên teslîmbûyî berdin. Vê yekê jî wê wekî tiştek erênî nîşan bidin û li bendê bin ku Kurd pê keyfxweş bibin."

## POZÎSYONA HÊZÊN ÇEKDARÎ XELET ŞÎROVE DIKIN

"Dibêjin hêzên çekdarî dema xwe tijê kirine, lê ma AKPê wê dev ji te berde? Hem perê wan, hem derfetên wan, hem jî hêzên wan hene. Lê ma çî te heye? Ev wê te dakurtînin. Hun çawa vê nabînin? Ma hunê karibin weke niha rehet siyasetê bikin, ma devlet wê bihêle ku tu bijî, ma di berdela çi de hun dibêjin bila çek werin danîn?"

## JIBO ÇARESERIYÊ KOMÎSYONA HEQÎQETÊ ŞERTE

## ÇI KES TENÊ BI SERÊ XWE NIKARE VÊ PIRSGIRÊKÊ ÇARESER BIKE

"Vê pirsgirêkê ne hukûmet, ne leşker, ne MÎT, ne jî polîs bi tenê nikarin çareser bikin. Eger biryara meclîsê nebe, wê pir zehmet be. Ya girîng ewe ku bi pêşengiya meclîsê û bi tevlîbûna gelek derdorên cuda komîsyon were sazkirin. Çima ez dibêjim komîsyon? Ji ber ku mijarek ku rasterast nakeve rojeva civîna giştî ya Meclîsê ye. Ji bo mijarek were ber destê meclîsê, divê pêşî li komîsyonên meclîsê were goftûgokirin û nirxandin."

## DESTÛRA BINGEHÎN YA XWESERIYA DEMOKRATÎK

## PÊWÎSTE KCK BI LEZ RÊXISTINÊN XWE TEMAM BIKE

'Di dîroka 150 salên li ser van xakan, we bi siyasetên xwe rê li ber komkujiya 4 gelan vekir. We azadiya gelan ji bo berjewendiyên xwe yên aborî û çendek rantê kire qurban. Bi sîstema serdest ya Trikiyê li hev kir. ev siyasetên neçareseriyê bûn. Di vê yekê de berpirsiyariya ewrupayê heye, divê hûn bi vê rabirduya xwe re rûbirû bin, eger ne wiha be hûn ê nikaribin li hember dîrokê hesab bidin û ji berpirsiyariya van komkujiyan rizgar bibin.'

Belê kekê delal Dewreş û Ahmet Kaya îro 16/11-2010 a ye.




Cejna we pîroz be. Em we ti cara ji bîr nakin. Em ê we û şehîdên me dî hertim bi bîr bînin. Îro gelê Kurd bi hurik û çûçikên xwe ve li ziyareta gorîstanan bûn. Gorên wê av dikirin û bi kulîlkên rengînî dixemlandin. Bi we serbilind bûn. Lê dayik dil zîz bûn ji ber ku ewledên xwe di bin wê axê sar dabûn.

Bava reşên xwe destê xwe li ber xwe girênedabûn. Bi îşaretê serkeftine pêçiyên wan li hewa bûn. "Şehîd namirin"

Îro cejna Qurban ê. Du rojan di ber vê li Îranê du mirovên Kurd di Girtîgeha Turbetîcamê Abdulhaluk Behmer (37) û Abdullah Behmer Kurd hatin bi darda kirin. Li gor nûçeyên hatî du kesên dî hatine dardakirin.




-Çi bûye suçê wan?

Narkotîk firotin e. Elbet derew in. Ji ber ku ew Kurd bûn. Wan bac dayê rêxistina Kurda.

Li sînor 2 kes wek kaçaxçî hatin înfaz kirin.

Îro dê û bavên wan kesên ku hatî darda kirine li ber deriyê rêvebirîyên Îranê bûn ku termê zarokên xwe werbigirin. Lê termê wan nedane wan. Gotin divê ewil hûn perê bendên ku me ew pê dardakiri bidin, pişt re termê wan em ê bidin. Berî ku ji wan mirovên Kurd bên dardakirin ji xwişka xwe ya li Colemêrgê re telefon dike. *"Yade ê min î şev bi darda kin, heqê xwe li min helal bikin". Xwişka xwe dibêje; "Hawara me ti kesî nebhist"*

Lê çiqas pêvajoya bêçaleiyê li Tirkiye yê heye jî Tirk jî vala nesekinin carcara diçên sînor Obus diavêjin û carcara jî di ser Başûr re bi balafira nizm difirîn belevok belav dikin, gazî gerîla dikin, bên teslim bibin, em ê we efû bikin.

Esker duh li kolanên Amedê bi marşa "en bûyûk tûrk bîzîm asker" Eskerê herî mezin eskerê me ye" bezîn. Lê tikesî fêm nekir ku çima bezin!

Belê, li Parîsê civîna Sosyalist enternasyolist heye. Mêvanê wê civînê Mam Celal û hevserokên partiya BDP Selhattin Demîrtaş û Gulten Kişanak bûn.




Birêz Selhattin Demîrtaş Tirkiyê bi sosyalist enternastonalîstê gilî kir. 1700 siyasetmederê me bêsuç 18 mehene di girtingehê da ne. Doza ku li ser wan hatî vekirine jî wek şano bû.

Mam Celal îro hevserokê BDP Selhatin Demîrtaş û hevalên wê vexwandin firavûnê. Mesajên girîng dan *“Em ê konferansa Kurd li bihara pêş me bicivînin.” “Buroya BDP jî di demeka kin da vebibe.”*

**Belê hevalên delal**; dijminên me gava ku pirs bû pirsa Kurd li kê derê bin li wê derê li hev tên û peymanan digel hev çêdikin. Carcara sînora bile diguher in. Di sala 1925-26 an da li şerê Araratê li ser daxwaza Tirkiye yê sînorên Kurdîstanê Îranê 20-25 klm hatin guherandin. Îro dîsa bûyarekî wiha di rojê ve da ye. Tirkiyê ji dewlet Îraqê dixwaze ku ew 30-40 klm sînorê xwe bigherînin. Ew ê hîngê baş dikarin li dijî PKK e bi rehetî tevbiger in.

Lê asteng Mam Celal e. Serokatiya Mam Celal wek serok dewletê Îraqê stirî di çavê Tirk, Ereb û Farisan re diçê xar e. Suîdî hemû derfetên xwe kiribûn rê ku ma Mam Celal nebe serok komarê Îraq ê. Lê bi şunekir. Li heftê borî dîsa Tirkiyê, Îran û Suîdî, Misir ketine hewldanên mezin dîplomasiyê gelek giran pêk anîn, bi YE û bi DYA û serok dewletê Amerîka Obama re ku ma Mam Celal wek serok komar careka dî neyê hilbijartin.

Birêz Mesût Berzanî sê-çar roja di berve gotibû min di jîyana xwe de qet ticara nedît ku li ser Kurda ewqas pest giran hene. Ji aliyekî da Amerîka, ji aliyekî da Tirkiyê digel Suîd û ji aliyekî Îran bi Şîan pest dabûn ser rêvebiriya Amerîka ku Mam Celal nebe serok komarê Îraqê û serok komarî ya Îraqê nekeve dest Kurdekî.




Li dawiyê rêvebiriya Amerîka jî xwe avêtibû aliyê wan hêzan. *“Tirkiyê bi rûyê xwe ketibû”*. Lê bi serneketin. Me qezenç kir.

Belê sibê li Brukselê konferansa Kurda heft emîn dest pê dike. Ew konferansê bi vî rengê heft salin didomin lê ti tişt nabe û bandora xwe gelek kêm e. Lê ez ê mêvanê wê konferansê sibê bi we bidim nasandine.




**Belê hevalên hêja**, îro deh emîn salvegera hunermendê hêja birêz Ahmet Kaya/Kurd Ehmed ji nav me barkiriye. Lê Kurda ew ti cara ji bîr nekir. Bi stranên wî û bi navê wî yî hêja ew hertim bi bîr anîn.

Lê îro çend rojin di medya Tirk da mijara birêz Ahmet Kaya tê niqaş kirin. Me çewt kir! Ahmet Kaya nrecudaxwaz bû. Me ew wekî dijmin îlan kir. Îro gelek televizyonan da stranên wî hatin stirandin. Hetanî niha stranên wî qedexe bûn. Sibê mêvanê Kek Ahmet, Yilmaz Gûney û Qasim Milo hene.

Belê kekê delal Dewreş û Ahmet Kaya îro 17/11-2010 a ye.

Duh siyasetmederê Kurd li Parîsê bûn, bi gelek şahsiyetê bilin de re wek serokê Partiya PASOK e Papandiro, srok dewletê Îraqê Mam Celal û nunerên parlemena Ewrûpa yê re hevdîtinên girîng pêk anîn.

Hevserokê BDP Birêz Selhattin Demîrtaş Tirkiyê bi sosyalîst enternasyonalîstê gilî kir. 1700-1800 hevalên me 18 mehene di girtingehê da bi suçên ne rast hatine girtin. Meha borî piştî 18 meha ew derxistin pêşberî dadigehê. Sê hefta bi wan îşkêncen giran hatin kirin. Birçî birîn û tî anîn ew dramam 3 hefta dewam kir. Destê wan kelepçê lêxistibûn. Ew helwesta dewletê li dijî siyasetmederê me gelê me ji kur ve xemgîn dikir.



Piştî civîna Sosyalîst enternasyonalîstê heyeta BDP bi girseyeka mezin hatin serdana gora Qasim Milo serokê KDP e Komala, Hunermendên me hêja Ahmet Kaya û Yilmaz Gûney.

Lê gava ku ew hatin serdana siyasetmeder û hunermêndên me.

Serokê CHP bi eslê xwe yî Kurd Kemal Kiliçdaroglu bi heyeta xwe ve ew jî li ser gora Yilmaz Gûney û Ahmet Kaya bûn. Ew cara yekemîne ku herdu hunermend ji aliyê partiyeka an rêvebirekî Tirkiye î bilind ve tên zîyaret kirin.

Belê li niha liTirkiye yê niqaş li ser birêz ahmat Kaya dibin. Ewên ku duh dijminatî dikirî îro poşman bûne. Ew rûreşiya li dijî birêz Kaya pêk hatî çewt bûye.

Wekî min gotî; li alema Îslam cejne. Cejna qurbanê. Partiya CHP cara yekemîne tê serdana partiya BDP e. Di ber wê gelek dijminatiya partiyên Kurda dikir.

Piştî ziyareta gora hunermed û siyasetmederên me digel heyeta xwe hatin Brukselê.



Îro li Brûkselê konferansa Kurdaya 7 emîn destpêdike.

Mêvanê vê konferansê hêja hene. Ji Tirkiye yê nivskarê bi eslê xwe Kurd Yaşa Kemal, nivîskarê komînîst Vedat Tûrkalî, rojnamevan Cengîz Çandar, Rûşên Çakir ji YE û ji Afrîka mêvanê vê konferansê hene.

Desmod Tutu Rahîbê Afrîqaya Başûr û xwediyê Xelata Nobel a Aştiyê, mesaj Bi rêya VIDOFOn ê şand û ew mesaja hat xwandin.

Desmond Tutu û Zana: *"Bila Ocalan serbest bê berdan"*

## TUTU: DEMÊN MIN BI DUAYÊN JI BO DINYAYÊ DERBAS DIBE



Ji Afrîkaya Başûr ji Koma Çalak a Mafê Mirovên Kurd a Weqfa Desmonda Tûtû Mathew Errol Esau peyama Tûtû vîdeoyî anî. Tûtû di peyama xwe de bi gotina 'ez teqawit bûm' dest bi axavtinê kir.

Peyama Tûtû ya vîdeoyî wiha didome: "Êdî ez demên xwe zêdetir bi duayên ji bo dinyayê diborînim. Ez ji dil piştgiriya xebatên komîsyonê dikim. Li Tirkiyeyê ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd a mayînde piştgirî didim endamiya Tirkiyeyê ya ji bo YE'yê. Em wek Koma Çalak a Mafê Mirovên Kurd xebatên bi we re dê bidomînin. Ji bo gelê Kurd axa ku li ser jê dayîk bûye, bigihêje mafê xwe çi ji destê me tên em ê bikin.

Li gor nûçeyên dema nêzîk li Tirkiyeyê vîneke hey e; hikûmeta Erdogan vîneke dest nîşan dike ji bo hevdîtinên bi Ocalan re. Min Erdogan re nivîsan em piştgirî tiştên bi vî rengî.

Li gor çavdêriyên me di kiryarên leşkerî yên artêşa Tirk de li ser gerîllayên PKK'ê zêdebûnekê berçav dikevin. Banga min ew e ku hikûmeta Tirk dest ji çalakiyên leşkerî berde."

Tûtû bal kişand ser bêçalakîtiya PKK'ê û ji bo çareseriyê xwest ku divê êdî bi Ocalan re rûnin û dest bi gotûbêjan bikin. Tûtû got: "Ji bo Tirkiyeyê senaryoyekê derbareyê dahatûya wê de, dikare serbestberdana Ocalan be."

## ESAU: DIVÊ OCALAN BÊŞERTÛMERC SERBEST BÊ BERDAN

Piştî peyama Tûtû Mathew Errol Esau wiha axivî: "Em wek Koma Çalak ya Mafên Mirovên Kurd û wek komek li Afrîkaya Başûr bi cîh bûyî, em piştgiriya derbirînên (bilêvkirinên) Tûtû dikin. Ji bo aştiyê û pêşdeçûnê pêwîstî bi belên û sozên cidî hene. Em diyaloga bi Ocalan re tê kirin han didin û piştgirî didin vê yekê. Em hikûmeta Tirk vedixwîne ku bi bêşertûmerc Ocalan serbest berbide. Ev şerta me ya helmeta (kampanyaya) mîlyonek îmza ye ku me di 21'ê Adarê de dabû destpêkirin."

Ji Îranê xwediyê Xelata Nobel a Aştiyê Şîrîn Êbadî mesaja hebû;


## ŞÎRÎN ABADÎ: DIVÊ CÛDATÎ BÊ RAKIRIN



Parêzvana mafê mirovan Şîrîn Abadî, peyamek ji konferansê re rê kir û diyar kir ku piştgiriya li Tirkiyeyê çalakiyên mafê mirovan yên aştiyane dike; divê Tirkiye di serî de cûdatiyên li ser Kurdan pêk tîne, hemû cûdatiyan ji holê rabike.

## DIVÊ CÛDATÎ LI TIRKYE YÊ BÊ RAKIRIN

Nivîsakarê Tirk Vedat Tûrkalî: Mesaja xwe bi rêya Vidofon hat xwandin:



Nivîskar Vedat Turkalî jî bi peyameke vîdeofon ji bo konferansa şandibû. Di peyama xwe de Turkalî diyar kir ku heta pirsgirêka Kurd çareser nebe, tu pirsgirêkek çareser nabe. Turkalî di peyamê de wiha pêde çû: "*Em bi salan di van waran de hatin tawanbarkirin, ji ber ku em li beramber van pirsgirêkan hestyar bûn. Îro êdî bûyeran giraniya xwe danî. Di serî de jî çewtiyeke bingehîn hate kirin, gotin ev tevgereke terorîstî ye*."

## Siyasetmera me xwediyê Xelata Sakharov Leyla Zana: DIVÊ OCALAN Û CIVAKÊ BIGIHÎNIN HEV




Yek axavtinera vekirina konferansê Leyla Zana diyar kir ku gelê Kurd di lêgerîna maf, dad û azadiyê de ji bo çareseriyê derketina vîneke demokratîk û aştiyane bi şadî û kamiraniyekê mezin pêşwazî dikin û divê bêçalakîtiya PKK'ê wek keys û firsendeke mezin bê nirxandin û wiha nêz bibin.

Zana dest nîşankir ku nabe ku hemû tişt ji bo paş (pişt) hilbijartinan bên taloxkirin û wiha pêde çû: "Taloxkirin, dikare bibe sedema hin çalakiyên provaktîv û heman demê pêbaweriyê şêlû dike û ji holê radike. Herwiha ji bo zimanê Kurdî di qadên gelemperî de bê bikaranîn, divê rêkûpêkkirinên zagonî bên kirin û pêwîst e bendava hilbijartinê ya heyî bê hilweşandin û rakirin." (Foto parastina Leyla Zana Kurda sê serokê hene)

## WESTRHEİM: DIVÊ GOTIN VEGUHEZIN ÇALAKIYÊN KIRYARÎ

Yek ji axavtinera vekirina konferansa di demjimêr 15:00'an de li Parlamentoya Ewrûpayê



vebûye, Seroka EUTCC'yê Kariane Westrheim diyar kir ku piştgirî didin tevlîbûna Tirkiyeyê ya YE'yê û wiha pêde çû:

"Li gor me çareseriya pirsgirêka Kurd bi nûnerên rewa yên gelê Kurd re gengaz e. Ji bo avakirina aştiyê, divê hemû aliyên peywendîdar bi wêrekiya siyasî derbikevin pêş. Rayedarên Tirk gelek soz û belên dan. Niha dem dema veguhestina gotinê ye ji bo çalakiyan."

Westrheim dest nîşan kir ku pêwîst e gavên şênber ji niha ve bên avêtin, nabe ku heta hilbijartinên giştî bên payîn û rawestîn.



Rojnamevan Cengîz Çandar: DIYAGOG BI OCALAN RE ÊDÎ EŞKERÊ BÛ

"PKK ne rêxistineka terorîst e. Min qet ticara hîna nekir ku rêxistineka terorîst e. Diyaloga bi Ocalan re jî gelek girîng e" "Doza KCK ji şermezariyeka giran e"

Rûşen Çakir: Ez vê bêjim; Micadela PKK e çekdar gelek derî vekir. Lê çareserî bi xwe re neanî.

## D'Allema: Diyaloga li gel Ocalan erêniye




- Serokwezîrê berê yê Îtalyayê û Alîkarê Serokê Sosyalîst Enternasyonalê Massîmo D'Allema, da diyarkirin ku, ew piştgiriyê didin diyaloga ku di navbera Dewleta Tirk û Abdullah Ocalan de hatî destpê kirin. Bi xêr be. (Foto bi Oacalan re diyalog erêniye)

Serokkomar Talebanî: Tirkiye li Iraqê têkçû

Li ser pirsekê Talebanî got: *"Tirkiyeyê piştgirî neda serokkomariya min."*

Rojnameya Milliyetê, daxuyaniya ku Serokomarê Iraqê Celal Talebanî li Fransayê daye



peyamnêra Milliyetê Asli Aydintaşbaş, ji manşetê radigihîne.

Li gorî nûçeyê Talebanî got, "Siyaseta Tirkiyeyê ku, piştgirî neda Serokomariya min şaş bû û ser neket." Di nûçeyê de ev gotinên Talebanî derdikevin pêş;

* Serokomar, Serokwezîr û Wezîrê Derve ku Enqereyê li Iraqê dixwestin, yek ji wan jî nehat hilbijarin.

* Ez nizanim, di pişt vê siyasetê de kî hebû, lê siyaseta ku Tirkiyeyê li Iraqê meşand şaş bû û ser neketin.

* Destpêkê piştgirî nedan min, lê piştre pîroz kirin. Dostê min ê xoşewîst Serokomar Abdullah Gul bo min telgrafa pîrozkirinê şand.

* Lê ev hemû di raboriyê de man. Ez hê jî dostê Tirkiyeyê yê stratejîk im û naxwazim zêde behsa raboriyê bikim.

* Bo PKKê di rêzê de gava danîna çekan û derbasbûna siyasetê heye. Divê bi Ocalan re jî hevdîtin hebe.

* Bangên vekêşana PKKê rast in. Ger li Iraqê bêdeng rawestin, dê çareserî hêsan be.

*Her wiha di heman nûçeyê de tê ragihandin ku, Talebanî gotiye ew ê destûr nede ku Tariq Ezîz bête bidarvekirin û domand, "Ew 74 salî ye û mesihî ye. Ez wek sosyalîstek, li dijî darvekirina wî me."

Îro roja çarşem ê jî roja serdana parêzera bi birêz Ocalan re ye. Lê hevdîtin pêk nehat. Roj sêşemiyê roja cejna qurbanê bû. Dîsa malbata Ocalan serî li serdozgeriyê xistibû ku herin serdana Ocalan dîsa destûr nedan ku malbat here Îmraliyê.

Belê kekê delal Dewreş û Ahmet Kaya îro 17/11-2010 a ye.

Duh û îro li her deverên Kurdîstanê ji bo we hunermend hêja Ahmet Kaya û Yilmaz Gûney konser hatin dayin û şehîdên me bi bîr hatin. Lê serokê partiya MHP bi serdana serokê CHP Kemal Kiliçdaroglu ya gora Ahmat Kaya û Yilmaz Gûney gelek hers bûye. Ew bi îxaneteê suçdar kir û Ahmet Kaya û Yilmaz Gûney jî bi "xaînatiyê" nirxandin.

Lê îro rojeva medya Tirk roportaja Milliyetê Asli Aydintaşbaş a bî Mam Celal re kiriye. Zik reşiya Tirka li dijî Kurda re eşkerê kiriye. Tirk ji bo ku Mam Celal nebe serok komarê Îraqê hemû re bi kar anîne, lê li dawiyê bi serneketine. Ew ji aliyê Mam Celal ve jî hat rast kirin.

Konferansa Kurda li parlamana Ewrûpa duh destpêkirî, îro jî dewam kir. Banga aştî û diyalogê mora xwe li konferansa kurdî da. Îro jî gelek dostên Kurda li konferansê axivin.



Hevserokê BDPê Selahattin Demirtaş jî di konferansê de got, ev 30 sal in ku şer heye, lê tu alî biserneketine û domand: Demirtaş got, hê tu hewl û niyeta hikumetê bo destûreke nû, wekhev û azadîxwaz nîne û divê hikumet zimanê xwe bo kurdan biguhere. Demirtaş got, bo ko BDP jî bikaribe rola xwe ya dîrokî bilîze, divê bawerî bide civak kurd û tirk.

Sosyologê Elman Martîn Dolzer: Dewleta Tirk sûçê şer dike

DEWLET ÊRÎŞ DIKE SIVÎLAN, ÇEKÊN KÎMYAWÎ BIKARTÎNE



Sosyologê Elman Martîn Dolzer got: "Eger ez şaredarekî Kurd bûyama min di hizûra we de ev axaftine jî kiriba, wê di derbarê min de lê pirsîn û doz bihatibû vekirin"

Dolzer, da diyarkirin ku, polîtîkayekî pêkutiyê ya mezin heye, eşkence hatine kirin û hê jî jî tê kirin."

Dolzer gotinên xwe wiha berdewam kirin: " Ji aliyê Jandermê û leşkeran ve li hember mirovahiyê sûç tê kirin. Ev pêkanîn bi çi awayî têkiliya xwe bi mafê mirovan re nîne. Ji

sala 2005'an û vir ve operasyonên leşkerî zêdetir bûne û dewlet êrîş dike ser sivîlan." Dolzer îstatîstîk derxistin û got: Binpêkirinên mafan yên di salên 2009-2010'an zivirîne binpêkirinên sala 1990'an û her wiha di derbarê ku çekên kîmyawî jî tên bikaranîn agahî tên.

## DI VAN SÊ SALÊN DAWÎ DE LI DIJÎ KURDA SÛCÊN CIDÎ YÊN ŞER HATIN KIRIN

Dolzer da diyarkirin ku, di binçavan de li rastî eşkenceyê hatin, kuştin û çekên kîmyawî bikaranîn di qada navnetewî de pêwîste bi merciyên serbixwe ve lêpirsîn were destpêkirin û xwest ku Parlementoya Ewropayê jî hêj bêhtir pêkutiyan lê bike.

Belê hevalên hêja îro 20-24/11-2010 a ye.

Îro çend rojin ez ji we re nama nanivsîniem. Ji bo ku pêvajoya şer hatibû îlan kirin. Ji aliyê Kurda da şer nabe, herêm hendik be jî sakine. Lê aliyê Tirka carcara diçên li bajar û gunda bomba diteqînin û bi balafirên şer li ser herêma parastina medya keşifa dikin. Carna jî barê xwe yî giran bi ser herêma Kurda de velo dikin.



Balafirên Îran du roja di ber vê herêm da bû ber bomba, gerilayekî bi navê Xurşît Çirav şehîd ketibû.

Xurşît Çirav li Herêma Garisa tevlî refên gerîlla bûye û 19 sal e di nav gerîlayan de têdikoşe. Herwiha hat zanîn ku gerîlla Çirav li herêmên Botan, Zagros, Xinêre, Xakurke û Kelareş gerîllatî kiriye.

Îro 20/11 a ye. Salvegera şahdeta Ugur û Bavê wî Mehmet Kaymaz e. Li gelek bajar û bajaroka ji bo wan xwepêşandinên bi deh hezara pêk hatin.



Lê gava ku Kurd ji bo Ugur bavê wî xwepêşandin pêk dihat xebera kuştine ji Şirnaqê hat. Zarokê 13 salî Ahmet Açar eskera bi guleya xwe birîndar kiriye. Lê esker dibêje, *“min agir nekir. Şeytan ew tijî kir” Ez ji bo wê xemgînim”*

Belê hevalên hêja; di cejna Qurbanê da ne malbata birêz Ocalan ne ji parêzeran bi birêz Ocalan re hevdîtin pêk anin. Carna rewşa hewayê kirin asteng, carna gotin me hê keştî tamîr nekiriye û carna gotin personal kêm e, em nikarin herin Îmraliyê.

Duh hevdîtina malbatê bi birêz Ocalan re pêk hat. Zîyaret vekirî bû. Lê li kêleka wan sê cendermê hebû. Hevdîtin bi tenê 31 deqîqa ajot.

Îro jî roja çarşem e. Nizanim hevdîtin pêk bê an ne?



Belê hevalên hêja; dadigeha Tirk di cejna qurbanê da jî vala nesekinî. Li colemêrg û Şirnak û Edenê gelek zarok ji ber malê wan birin girtingeha û qereqola li wan dan û bi seatan girtin binçava.

Serokê şaredariya Batmanê/Êlihê Necdet Atalay yî 18 mehenê ji doza KCK di girtingehê da, dadê ji bo ku gotiyê “birêz Ocalan” 2 sal nîv ceza lê birîn.

Belê hevalên hêja îro 5-6 rojin di medya Tirkiyê de sansasyonelek heye. Serokê PKK birêz Ocalan şaredarê Amedê birêz Osman Baydemîr tasviyê kiriye û Osman tûj rexne kiriye.




Hinek dibêjin Ocalan gotiyê îstîfa bike. Hinek dibêjin Ocalan Osman ma here li partiya AKP siyasetê bike. Ocalan dîktaorê. Osman Baydemîr gotiyê çekan mîada xwe tijî kir. Te çima wiha gotiyê. Çeka mîada xwe tijî nekiirye. Ocalan hê di şer da îsrar dike. Li ber mala şaredar û li ber şaredariyê medya kon vegirtine. Osman Baydemîr îro daxuyanî da rojnamevanan got. “*Ez li ser karê xwe me. Herkes dikare min rexne bike. Ocalan jî dikare min rexne bike û mafê wî jî heye.Lê hûn nûçê asparagas diweşînin. Hûn dixwazin me bi hevalên me vê li dijî hev bi kar bînin. Lê hûn bi ser nakevin*” (Foto ti dozgerê komarê tunen li ser wî sevdaliyê PKK e dozê vekk)



Dosta gelê Kurd Pinar Selek îro doza xwe li dadigeha bilind hebû. Ew deh sala di ber vê bi çalekiya bombeyî ya li Çarşiya Misirê pêk hatî suçdar dikirin. Ew ji bo wê bi salan jî di girtingehê da ma û îşkencên giran dîtin. Lê doz ducara hat rûspî kirine/berat kirin. Lê dozgerê yargitayê nekete ser dîsa li dijî wê doz vekir. Îro ew doza hat eşkerê kirin.


-Pinar Selek.............

-Ne li vir e.

-Ew çalekvana çarşiya Misirê bûye li gor tespîtên me. Dadigeh cezayê muebetê dide wê û girtina we dixwaze.

Lê ew li Almanya bû. Bavê wê parêzerekî navdarê Alp Selek. Berî ku dadigeh biryarê bide ew şandin Almanya.

Belê şehîdên delal îro 26/11-2010 a ye.



Îro hefteke medya Tirk û rêvebirên Tirkê eskerî û îstîxbaretê ji nûçeyên sansasyonelê ji bo serokê şaredariya Amedê Osman Baydemîr diweşînin wek nûçeyên flaşşş an nûçeyên deqîqa dawîyê, Ocalan Osman Baydemîr tesviyê kiriye. Ocalan Gotiyê *"ez devê te bidirînim tu çawa dibêje, "Dema Çeka tijî bûye. Êdî çek bi karî tiştî nen"*

Dewleta Tirk bi wan derewên xwe dixwazin rêber û rêvebirên Kurda bînin dijberî hev.

Lê li vî heftî rayagiştiya Tirkiye yê ji me pirtir li benda peyamên ji birêz Ocalan bên bûn.

Ka eceba Ocalan ji bo Osman Baydemir vê carê kîjan peyama bide. Ka wî tasviyê bike an na.

Belê hevalên hêja; Tirka ew rûreşiyên wiha gelek cara li ser Kurda kirine bira bi birê re kiriye dijmin, li Başûr şerê biratiyê sor dikir. Fîtne û fesadî dikirin. Bi wan fîtne fesadiyên xwe dixwast ku Kurd li dijî hev şer bikin. Hetanî roja me ya îro jî tehamûla wan ji Kurda re nîne.

Van rojên ku derbasbûyî ji bo ku ma Kurdek nebe serok komarê Îraqê li dijî Mam Celal gelek hewldan pêk anîn. Ew hewldan astengiyên Tirka ji aliyê mam Celal ve jî hatin rast kirin.

Lê vê carê di peyamên Ocalan da daxwazên wan tune bûn. Wekî mirîyên telqîn bibin gêj bûn.

Fermo va peyamên birêz Ocalan.

Ocalan: Astengiya herî mezin a li pêşiya çareseriyê AKP ye

"Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku çarşema buhurî bi parêzerên xwe re hevdîtin pêk anî bû, ji bo çareseriyek demokratîk ya pirsgirêka Kurd peyamên grîng dan. Ocalan diyar kir ku AKP li pêşiya çareseriyê dibe asteng û got; "Divê ji berî her tiştî, ew biryara aştiyê bide. Dewlet û artêş çareseriyê dixwazin lê AKP çareseriyê naxwaze û ji bo vê ne amade ye. Di rewşa heyî de astengiya herî mezin ya li pêşiya çareseriyê AKP ye."

Di navabera PKK e û dewletê da ez naveynkarim

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di serî de hevdîtinên ku bi dewletê re pêk tîne nirxandin û anî zimên ku di meha dawî de ti hevdîtin pêk nehatine û weha got;

"Hevdîtinên li vê derê pêk tên, ne muzekare ne jî diyalog in. Di rastiyê de ez navbeynkar im. Ez di navbera PKK û dewletê de navbeynkar im. Ji ber ku hîna em derbasî muzakereyan nebûne. Eger em derbasî muzakereyan bibin, wê demê dê li ser xalan guftugo pêk werin."

## HETA 1'Ê ADARÊ....

Ocalan di biwara hevdîtinan de jî weha got; 'Hîna ti xaleke ku em bi awayekî berbiçav li ser axivîne nîne. Ji ber ku hukûmetê hîna biryar nedaye. Eger em derbasî muzekereyan bibin ev hevdîtin wê çawa bi encam bibin ez nizanim. Divê heta 1ê Adarê encamek derkeve holê. 1ê Adarê demeke guncav û di cîh de ye. Heta wê demê heger ji van hevdîtinan encamek derbikeve, wê pêvajo bi aştiyeke bi wate û bi rûmet bi encam bibe. Ezê jibo vê bêjim aştiya pîroz, aştiya mezin. Yan jî wê ji van hevdîtinan ti tişt dernekeve û dibe ku pêvajoyeke hîn xirabtir dest pê bike. Heta 1ê Adarê eger ji van hevdîtinan aştiyeke bi wate dernekeve ezê ji navbeynkariyê xwe paş ve bikişînim. Ne wekî paşvekişandinê, lê ezê bêjim, min nikarîbû ez pêkbînim, ez biserneketim, dewlet jî, hukûmet jî nehatin ser riya çareseriyê, êdî ez nikarim bibim navbeynkar. Ezê êdî têkîlî karê wan nebim. Ez ji bo vê yekê, roja 1ê Adarê destnîşan dikim. Ji niha de, ber bi dawiyê ve hêjmartinê dest pê kir."

## AKP Li pêşiya çareseriyê asteng e

Ocalan helwesta hukûmetê jî weha nirxand; 'Dewlet ji bo aştiyê bi min re rûdine. Hewl dide ku ev hevdîtin bi aştiyê bi encam bibin. Lê hîna hukûmetê biryara xwe nedaye. Hukûmet ne biryara muzakerayan dide û ne jî biyara aştiyê. Kesên ku bi navê dewletê bi min re rûdinin min famdikin, talûkeya heyî ferq dikin. Rewşa li Tirkiye dikarîbû bibe weke ya Iraqê, lê min pêşî li vê yekê girt. Serokwezîr xwedî li hevdîtinên li vir jî dernakeve û dibêje dewlet pê re hevdîtinan dike. Ez ji birêz Serokwezîr Erdogan tenê vê dixwazim; bila ji parlamenê biryareke aştiyê derxîne bes e. Biryareke bi tenê ya aştiyê. Piştre wê her tişt bikeve ser riya çareseriyê. Divê berî her tiştî, ew biryara aştiyê bide. Dewlet û artêş çareseriyê dixwazin lê AKP çareseriyê naxwaze û ji bo vê ne amade ye. Di rewşa heyî de astengiya herî mezin ya li pêşiya aştiyê AKP ye."

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, pirsgir û got: "Gelo Serokwezîr wê biryar bide ku bibe kesekî weke Ozal an kesekî weke Çîllerê? Ocalan da zanîn ku Ozal rojek berî kuştina xwe ji bo diyalogê heyet şandibû cem wan û got: "Nêrîna AKPê ku dibêje ji bo aştiyê hêza me têre nake, em nikarin bikin jî ne rast e. Tu hukûmetî û divê biryara aştiyê jî tu bide."

## PKK û dewletû d idi çareseriyê da xitimîn

Ocalan anî zimên ku di 5 salên dawî de PKK û dewlet jî di mijara çareseriyê de xetimî ne û anî ziman ku ji ber vê yekê 3 mehên li pêş girîng in û got, divê herkes wazîfeyên ku dikeve ser milê xwe bi cîh bîne û Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan diyar kir ku AKPê ji bo çareseriyê hîn biryar nedaye û anî ziman ku 3 mehên li pêş gelek girîng in.

Ocalan di vê mijarê de hişyarî dan û weha got; 'Li pêşiya me 3 meh hene. Eger aştî pêş nekeve, wê şerekî civakî pêş bikeve ku wê bandorê li herkesî, li rêxistinên civaka sivîl yên li herêmê û li Amedê jî bike. Herkes wê di bin barê vî karî de bimîne. Ez bang li karsaz û derdorên kar yên li herêmê dikim; dîsa pere qezenc bikin, kes ji bo vê tiştekî nabêje. Ez bi temamî tevlî tiştên ku hun ji bo aştiyê dibêjin jî dibim û mora xwe diavêjim binê wê. Lê divê hun vê bi hukûmetê jî bidin qebûlkirin. Wekî mînak, divê sedama wê ku karsaz çima naxwazin li Kurdistanê sermayeya xwe razenîn were tesbîtkirin. Divê karibin ji hukûmetê re jî bêjin ku sedema vê yekê şer. Divê ew şertên aştiyê pêşî bi hukûmetê bidin qebûlkirin."

Ocalan xetimîna penc salên dawî jî weha nirxand: 'Di pêvajoya pênc salên dawî de PKKê asta şerê çekdarî bilind nekir û dewletê jî çareserî pêş nexist. Her du alî jî xitîmîn. Hem dewlet, hem jî PKKê her tişt avêtin stuyê min. Eger heta 1ê Adarê çareserî pêş nekeve, dibe ku şer kûrtir bibe. Lê wê vê bikin an nakin, wê şer bikin an nakin, ew bi xwe vê dizanin."

## Destûra bingehîn a xweseriya demokratîk

Rêberê Gelê Kurd anî ziman ku di pêşxistina aştiyê de roja konseyên bajaran jî girîng e û ji bo xweseriya demokratîk jî ev got: `Xweseriya Demokratîk, sîstemeke xweser ya Kurdan e. Nîvê xebata vî karî, erka şaredariyan e. Ango ji sedî pencî xebata xweseriya demokratîk dikeve stuyê şaredariyan e. Xebatên destûra bingehîn yê xweseriya demokratîk dikare were meşandin û bilezkirin. Baydemîr û şaredarên din dikarin bi vê mijarê re aleqadar bibin. Soza xweseriya demokratîk ku sala 1924ê dabûn kurdan heye. Sala 1922yê qanûna xweseriyê ji bo Kurdan hate derxistin. Behsa van nakin, lê divê ev mijar bi berfirehî werin nirxandin."

Lê vê carê dîsa medya û neyarên Kurd ketin telaşê, Serokwezir li Lûbnanê bû kê ji serokwezîr re telefon kir û kê agahî dan eskera ku Ocalan di peyama xwe pêvajoya aşitiyê ne hezîran dirêj kiriye dibêje, hetanî 1 adarê bûye û KCK yî hîşyarkirine ku xwe bi çek bikin.

Sibê 27 mijdar e. Ji îro da pîrozbahiyên cejna 27 mijdarê dest pêkirin. Artêşa Tirk li Cizîrê, Şirnaqê, Sîlopiyê û Amedê alarma çalekiyên PKK e dayê û xistiyê pîlka herî bilind. Balafir bi ser herêmê da nizm difirin û esker û polîs li kolanan numayişê dikin. Panzer ketine dûv hev şov ê dikin. Di hoperlorê de marşa "yûzinci yil" bi bangekî mezin tê strandin.

Lê ciwanên Kurd jî li dijî wan çalekiya pêk tînin û barîkata ava dikirin. Şûşê molotofê agîr bi quna wan têxistin.

Belê şehîdên delal îro 27/11-2010 a ye.



Seat: 06:30 ji sibê da li Cizîrê, Şirnaq Sîlopiyê û Colemêrgiya dest pîrozbayê cejna 27 mijdarê kirin. Lê di ber ciwanan bi sedan polîs bi panzer, cemsê û bi hezaran eskera li sûkê amedê bûn. Gelek cara di navber polîs û Kurdan da bi seata pêvçûn derketin.

Colemerg li hêviya hevserokê KCD Ahmet Tûrk û Aysel Tugluk bûn. Va hefeke gelê Colemêrgê amedekariya vê serdanê dikine.

Ahmet Turk: Tişta ku em dixwazin bibînin Kurdistanek azade. Êdî Kurd naxwazin xwe ji tenê navendekê, dixwazin xwe ji heremê rêxistin bikin û wiha pêde çû:

*"Tiştê em dixwazin Kurdistana azade. Kurd ji bo pêkanîna pêşeroja nû ji nû ve vejîn dibin. Birêz Ocalan, firsendek nû afirand. Pêwîste AKP pêvajoyê pûç neke."*

Li 30 kîlometreyan ji bajar dûr ji aliyê konvoya ji 200 wesayîtan pêk tê, hatin pêşwazîkirin. Heyeta KCD'ê li gel Şaredarê Colemêrgê Fadil Bedîrhanoglu, Şaredarê Çelê Mehmet Kanar, Şaredarê Bajaroka Bajargê Hurşît Altekîn, Şaredarê Navçeya Elbakê ya Wanê Îhsan Guler, rêveberên BDP'ê yên Wan û Colemêrgê derbasî nava bajar bû û tevî coş û hezkirina mezin ya gel heta ber avahiya şaredariyê. Dema konvoy di nav bajar re derbas bû girseya nêzî 10 hezar kesî pankarta

*"Ciwanên Apocî, hêza Kurdistana Xweser ya Demokratîke" vekirin û siloganên "Bijî Serok Apo", "PKK gele gel li vire" û "Birêz Ocalan"* berz kirin.




'Pêwîstê AKPê û nunerê dewletê vê pêvajoyê biçûk nekin û nebînin'

Turk, di destpêka axaftina xwe ya bi kurdî kîrî de wiha got: "Heta em azadî û mafên xwe bi dest bixin, wê têkoşîna me bidome" û diyar kir ku ew dixwaze ku çapemeniya din jî ji axaftina wî fêm bike û lewre bi tirkî axaftina xwe domand. Turk, destnîşan kir ku ji bo KCD'ê li Colemêrgê rêxistin bikin hatine bajar û wiha pê de çû: "Tişta em dixwazin azadiya gelê Kurde. Kurd ji bo pêkanîn pêşeroja nû xwe nû dikin. Birêz Ocalan, firsendeke nû afirand. Hikûmet di vê pêvajoyê dîsa aliya mijûl dike. Pêwîste AKP pêvajoyê pûç neke. Eger ev pirsgirêk neyê çareserkirin, demokrasiya Tirkiyeyê pêk nayê." Turk, di berdewama axaftina xwe de bal kişand ser yekitiya kurdan û bi van gotinan dawî li axaftina xwe anî: "Cîgerxwîn digot, 'Em dibêjin biratî, ew dibêjin na. Em dibêjin wekhevî ew dibêjin na'. Ji ber vê jî em dibêjin bimire koletî."

Li Sîlopiyê 50 hezar li hev civîya bû. Li Şirnaq 40, Wanê 70 hezar ji bo cejnê li sûkê bûn. Dikandara dikanên xwe venekirin. Eger ne roja şemiyê bûya zarokan jî nedikarin ku herin dibistanê.



Lê am ed dik elî ji pîr oz kiri na cej nê, bi qas î 20 00 Apocî çûn gundê FÎS e. Ji ber ku li wir PKK ê ji aliyê 25 qehremanan ve saz bû û li wî gundî biryarên girîng hatin wergirtin.

Lê polîs esker di ber çalekvanan li Gundê Fîsê bûn. Demekê di navbera çalekvan û polîsan da pêvçûn derket, lê wan nikarin ji vê lêhîyê re bibin asteng Di dilê wan da eşqa welêt û azadiya serokê xwe hebû.

Xortên Apocî xwe gihandin wî xanî yê ku civîna PKK e ewil li wî xanî pêk hatî. *“PKK e gel e gel li vir e. Em bi can û dil cem te ne ey serok, Kes nikarê rojê bi ezmanan ve ji hev dur bike”*(Foto Gundê Fîsê)

Lê piştî wê serokê BDP Selhattin Demîrtaş hat gundê Fîsê.

'Demîrtaş: Temînata aştiyê gelê Kurd û Ocalan e



Demîrtaş, anî ziman ku aştî azadî ne bi Erdogan û ne jî bi AKP'ê, dijberî vê yekê wê bi têkoşîna gelê kurd û Ocalan ku gelê kurd wekî vîna xwe qebûl dike pêk bê. Herwiha Demirtaş diyar kir ku temînata aştiyê gelê Kurd û Ocalan e.

Ez carek din hurmetê ji vê têkoşîna gelê Lîceyê re digrim.

Demîrtaş, da zanîn ku ev têkoşîn û serkeftin encama berxwedana Mazluman, Xeyrîyan û Ferhatan in. Mîmarê aşitiyê Ocalan e.

Di xwepêşandana bi mertalên 'KCK Asayîş' de 5 binçavkirî




- Li Navçeya Geverê li aliyekî esnafan dikanên xwe venekirin, li aliyê din di navbera polîs û ciwanan de pevçûn derket. Heta niha 5 kes hatin binçavkirin. Ciwana gelek niştecihên taxan jî ji ber bombeyên gazê ji malên xwe derketin. Ciwanan xwe bi mertalên ku li ser nivîsa 'KCK Asayîş' nivîsandiye xwe diparêzin, bal kişand.

Belê hevalên hêja xwe pêşandin, pîroz kirin û pêvçûn hetanê berbanga sibê dewam kirin. Li 17 bajarokê Stanbolê cejn hat pîroz kirin. Bi dehan wesaît hatin şewitandin. Li Ankarê girtin ser kongra ciwanan 40 girtin binçava. Lig elek bajarên Kurdîstanê polîsa êrîşa ser mala dikir zarok digrtin binçava.



Huseyîn Akkoç û Şukran Gursul Îro 29/11-2010 a ye

Rayegiştiya cîhanê îro çend rojin xwe dayê benda belgeyên Wikleasê ku li Amerîka ji rayagiştiya cîhanê re bên weşandine. Lê welatên wekî Tirkiye yê û Rojhilata Navîna hetanî qirikê di nava gil û gemar û kontra da bê sebîr li bende ne. Ka kê li dijî kê çi derew kirine. Ka kê li dijî kê rûreşî û bextreşî kirine. Ka kê li dûv hevdû kêr kiriye. Lê rûreşiya herî mezin jî Tirka û Sûîdi ya kiriye. Lê ew belgana hê nehatine weşandin.

Suîdî arabîstanêe xwastiyê Amerîka li dijî Îranê şer bike ya jî Îranê bombe baran bike.

Diziya serokwezîr Erdogan û 8 hesabên wî yê li Swîsrê bi dizî hatî vekirine û mijara Roj tv e qet ji rojeva Tirka kêm nebûye. Ûne kê derê ew dane ber rêvebirên amerîka û Nato û YE.

Di belgeyên Wikileaks navê Roj Tv




Di belgeyên nepenî yên diplomatîk yên DYE'yê de ku ji aliyê Wikileaks ve hat weşandin, di beşa derbarê NATO'yê de derket holê ku Tirkiye ji bo rakirina vetoya li ser sekreterê giştî yê NATO'yê kevserokwezîrê Danîmarka Anders Fogh Rasmussen, xwestiye Roj TV bê girtin. Di belgeyê de tê gotin ku Rasmussen soza ku daye lê pêk neaniye.

Li gorî belgeyên Wikileaksê weşandî, Alîkarê Wezîrê Derve yê DYE William Burns di 18'ê sibata 2010 de hevdîtinek berfireh bi Misteşarê Wezareta Derve a Tirk Ferîdûn Sînîroglu re pêk tîne. Di




vê hevdîtinê de, derbarê helwesta Rasmussen de tê gotin ku sozên Rasmussen dane Tirkiyeyê pêk neaniye. Di hevdîtina di dema civîna bilind a a NATO'yê de pêk hat de, hat gotin ku Rasmussen ji bo lêgerîna riyên hiqûqî yên ji bo girtina Roj Tv daye, ligel vê jî hatiye diyarkirin ku wê rayedarek Tirk bibe alîkarê Rasmussen. Herwiha di belgeyê de tê gotin ku, di vê civînê de hatiye diayrkirin ku hên Roj TV nehatiye girtin, Rasmussen rayedarek Elman ji bo alîkartiya xwe aniye û ve yek bi lihevkirina di navbera Rasmussen û Angela Merkel de pêk hatiye. (Foto Rasmusên serokê Nato tê Tirkiye yê pirsa PKK e û Roj tv e li ser masê)



Belê hevalên hêja; îro dîsa gelê Amedê li şehîdên xwe xwedî derket şehîdên xwe dabûn ser milê xwe bi sloganên şehîd namirin ew di axa xwe de veşartin.. Lê li rûyê wan hersek hebû. 45 roja termê wan li deştê bû.

Ji 3 cenazeyên endamên HPG'ê yên di pevçûna li Navçeya Pulurê ya Dêrsîmê qewimî de jiyana xwe ji destbûn û ev 45 roj bûn li herêma pevçûnê, Huseyîn Akkoç (Agît Amed) û Şukran Gursul (Şîlan Ekin) li Amedê ji aliyê deh hezaran kesan ve bi pankarta 'We jiyana bi rumet da me, em jî soz didin em dê serketinê diyarî we bikin' hatin pêşwazîkirin.

Îro 02/12-2010 a ye.

Duh HPG ragihand ku di vê mehê da 23 operesyonên hewayî, bejahî û bi obusa li dijî wan pêk hatin. Hêzên me hetanî ku mecbur neman bersiv nedan hêzên eskerî. Hevalekî me jî bi bombe barandina hêzên Tirk jîyana xwe ji dest dan Dilşad Kobanî-Xalid Silêman şehîd ket.

"Em pêvajoya bêçalekiyê bi baldarî dişopînin"




Belê Tirk li listika çê dikin, xwe dane bendê ku derbeyên giran li hêzên gerîla bidin. Bi dizî bi Amerîka, Rojhilata navîn re hevdîtinên dip aş deriyê girtî da pêk tînin.

Duh roja çarşemê bû parezerê hevdîtina xwe ya hefteyî bi birêz Ocalan re pêk nîna. Hevdîtin avêtin roja înne.

Belê hevalên hêja; duh dîsa ciwanekî Tirkî 16-17 sali bi bomba û şura xemilandin şandin avahiya BDP ya Ankar ê. Eger polîs li ber deriyê avahiya tunebûya wî hemû rêvebir û karkerên BDP di şur re derbas bikirina. Lê piştî du seata ew ciwanê bi şur û maytab hat berdan. Ew nexweş bûye! Lê eger ew Kurd bûya wî 15-16 sal ceza werbigirta.

Piştî cejna 27 mijdarê dest bi girtinan kirin. Li Ankarê 5 rojin 40 ciwanên welatparêz girtine binçava. Hûn amedekariya çûyina teva gerîla bibin dikin. Li Şirnaq, Colemerg û Amedê bi sedan kes girtin binçava. Şirnaq bûye kelem di çavê dewletê re diçê xar e. Îro şaredarê Şiranqê Ramazan Uysal bi 7 sala ceza kirin.





-Çi bûye suçê wî?

- Di 15'ê Şibata 2010 salvegera roja girtina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de beşdarî çalakiya protestokirinê bûye û "propagandaya rêxistinê kiriye"

Belê, 13 e Qasîdên ji maxmuran hatî îro li Amedê li ber dadigehê bûn. Parêzerê wan serbest berdana wan xwast, lê dadigehê ew daxwaza wê red kir. Bersuça xwastiyê bi Kurdî xwe biparêz in. Em ji bo wê daxwaza we red dikin. Lê ew jinên temanê xwe 50-55 salî bi ser bilindî li hember dadê parastina xwe hendik be jî dan. Dozger dîsa got; "*Bi zimanekî bîyanî em nizanin parastina xwe da ne*"

Serokê şaredariya Îxdirê Mehmet Nurî Gûneş jî li ber dadigehê bû. Wî jî wek qasîdên aşitiyê xwast ku parastina xwe bi Kurdî bike. Lê dozger ew red kir. (Foto ji şaredarê Şirnaqê xwe 7 sal ceza)

Axavtina herî bi bandor û Tirk rakirî ser linga axavtina mepûsê BDP Bengî Yildiz bû.



Bengi Yildiz di civîna xwe ya meclîsê da got: *Em ê bêjin " an Kurdistan an jî Welat*"

Li herêma Kurdîstanê gava ku te ji mirovekî pirsî tu ji kê derê tê yî an herî kê derê? Ew bersivê wiha dide *"Ji Kurdîstanê an jî welêt"* Nabêjin "Başûrê Rojhilat an jî Rojhilat"

Bengî Yildîz jî bi wê herêmê re dibêjin Kurdîstan an welat. Ne ku îro navê wê herêmê Kurdîstan ê. Di dema Sultan Sencer û Mistefa Kemal re jî gazî wê herêmê dikirin digotin Kurdîstan" Mepûsên CHP û ên AKP herêmê jî wê herêmê re dibêjin welat an Kurdîstan. Lê rojnamevana ji Hiseyin Çelîk pirsîn ew bi wê herêmê re dibêje Kurdîstan an na?




Lê berdevkê Serokwezir, peyayê Serokwezir, xulamê Serokwezir mepûsê Wanê Hiseyin Çelik derket ber medya yê got; “*Em nikarin Tirkiyê Stanbulstan û Tûrkistan bi nav bikin. Tirkiyê ji heft herêma hatiyê sazkirin. Herêma ku ez jê têm jî navê xwe Başûrê Rojhilat an jî Rojhilatê me ye*.” Belê, din av Kurda de bi kesên wiha re di dibêjin heremzede.

Belê li roja çarşem , hevdîtin bi Ocalan re pêk nehat gotin sibê bên. Parêzer sibê hatin gotin îro jî



em nikarin hewa xirab e. Roja duşembiyê bên. Vê carê jî parêzer bi malbata birêz Ocalan ve roja duşemê hatin. Bi çi zor zehmetiya hevdîtin pêk hat. Lê nizanim çima wiha dikin. Di nava vî hefteyî da gelek şaredar û rêvebirên Kurda hatin girtin. Yek ji wan şaredara Geverê Rûken Yetişkin û bi dehan xwendevanên Kurd li Unîversîta rastî êrîşa hatin hinek kêr kirin û hinek derb kirin.

Belê, îro gelê Kurd şahsiyetekî xwe ser bilind wenda kir. Neviyê Şêx Saîd kurê





Şêx Selahaddin efendî Muhammet Said Fırat çû ser dilovaniya xwe. Xwedê rehma xwe lê bike û axa wî germ bike. Kek Mesût Berzanî li Mraliyê birêz Abdullah Ocalan mesajên sersaxiyê şandin.

(Foto Şêx Selahaddin kurê wî Muhammet Said Fırat)

Îro 08-09/12-2010 a ye.

Em di hêvîyê dane ku şaredar û rêvebirên me ku 18-19 mehene di girtingehê dane ji bo doza KCK, ez bi wê re dibêjim doza derewa, doza rûreş û sextekara. Ji ber ku ew endamê BDP e ne tên darizandin. Îro Kurd li Mersînê li ber dadigehê bûn dîsa nehatin berdan. Hûn parastina xwe bi zimanekî bîyan yanî Kurdî dikine nehatin berdan.

Ji bo BDP'i yan 71 sal cezayê girtîgehê

Ji ber ku beşdarî daxuyaniya çapemeniyê ya ji bo protestokirina salvegera anîna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bo Tirkiyeyê, bi îdîaya "*Ligel ne endamên rêxistinê ne, bi navê rêxistinê tawan kirine*", "*li dijî zagona civîn û xwepêşandana rabûne*" bi giştî 71 sal cezayê girtîgehê li 10 rêveberên Rêxistina BDP'ê ya li Siwêregê hat birîn.


Milliyet
BASINDA GÜVEN
ÖZ SAVUNMA GÜCÜ KURALIM
Demokratik Toplum Kongresi, Ocalan'ın önerdiği 'öz savunma gücü' iç örgütlenme kararı aldı. Hedef, halkın kendi güvenlik birimini oluşturma
SON KARAR DİYARBAKIR'DA

Belê hevalên hêja, duh kervana KCD li di bin hevserokatiya Ahmet Tûrk û Aysel Tugluk li Cizîrê bûn ji aliyê 20 hezaran ve hatin pêşwazî kirin. Îro li Nisebînene. "Em bi we ra ne" Birêz Ahmet Tûrk axavtineka kurt kir. "*Ez ji we re spas dikim, we serê xwe li dijî zulm û zordariyê xar nekir. Hûn hertim b ime re bûn. Ez serê xwe li ber têkoşîna we ditewînim. Em ê vê têkoşîne hetanî dawiyê bibin serî. " Em ê li ser Avakirina Xweseriya Demokratîk bi îsrar bin . Ew soza me ya bi we ra ye. Êdî Tirkiyê li Ankarê nayê îdarê kirin. Îro sê çar rojin medya Tirkiyê agirekî sor dadayê dibêjin BDP li hêzên xwe ye parastine dixwazin*"(Foto hêza xwe ya parastine ava bikin)

Li Tirkiyê anket lêkolîn pêktên ji wan anketa hêjarî xizaniya me derdikeve.

Şîrketa KONDA: L i Tirkiyeyê ji sedî 53ê kurdan hejar in. Hate ragihandin ku ji sedî 23 ê kurdên li Tirkiyeyê li jêr xeta birçîtiyê û ji sedî 53ê wan jî li jêr xeta hejariyê dijîn.

Parîzerê Ocalan li ser rêya Îmraliyê ne nizanim hevdîtin pêk bê an ne.

Lê peyamên Ocalanê heftê borî ji rayageştî re ne hatin ragihandin:

Belê şehîdê delal Kekê Ahmet Kaya îro 11/12 -2010 a ye.

## “DUH XAÎN BÛ ÎRO BÛ NAVDAR”

Ji ser sala me ya nuh re gelek hendik roj ma ne. Di ser şahdeta te re deh sal derbas bûn. Stranên te



ji devê xort û ciwanên Kurd kêm nebûn, wênê te li xwepêşandin û her civîne di destê wan dabû. Di Roj tv, Newroz Tv, MMC tv û Radyoyê Dengê mezepotamya hertim dihatin guhê me. Em te serbilind in. Lê Tirk ji hezkirina me te û li xwedî derketina te hertim aciz bûn. Lê dixwast in li te xwedî derkevin ji te lêborîna xwe bixwazin lê rê nedidîn. Serokwezîr carna derdiket pêşberî medya û ji stranên t edu beyt dixwandin. Li ser te polîtîka xwe ya populîst dikir.

Carna gazî xanima te Gultên xanimê dikirin û ew vedixwandin civîn û sêmînerên xwe. Lê kesî bi derewe wan bawer nedikir.

Belê, xanima te Gulten Xanim ji bo ne heqiya li te hatî kirine wan neheqiyan bizvrîne rastiyê 10 sala li ber xwe da û dengê te yî heqlî di neyara gihand. Albuma ku te gotî ez ê te da straneka bi “Kurdî” jî bistirem derxist û gihande hezkirên te. Gelek kesên wek hunermenda xwastin ku navê te û stranên te bi kar bînin, lê destûr wernegirtin. Bi wan re got; Hûn duh li kê derê bû? Gava kevçî çetel avêtin me çima dengê we derneket?




Stranbêje Tirkî bi navê Serdar Ortaç î ku kevçî û kêr kewa te kirî ji te û ji jina te hezar carî lê borîna xwe xwast. “*Min çewt kir û ez bûm qurbana hissên xwe. Min afû bikin.*”

Ew ji tirsa nawere here tuwaletê jî. Li Ewrûpa nagere. Konsera nade û pera qezenç nake. Li Ewrûpa serê xwe lig elek avahiyên Kurdxist ku wî efû bikin. Lê suçê wî giran bû nayê efû kirin. Dilê me j ime birin.(Foto ew mirovê ku çetel avêtî hunermend Ahmet Kaya li avdestxanê kulm xwar)




Ebrû Gûndeş”a ku kevçî û kêr kewa te kirî digiriyê, Kurd konserê min sabotê dikin û nînin ku ez konser ali Ewrûpa û Tirkiye yê bidim. Wê dêlê xwast li 22/12 an bê welatê Swêd konserekê bide. Lê Kurda destûr nede

Apociyê li Swêd dijîn destûr nedan wê. Polîsê Swêd konsera wê îptal kir. Tu niarî bê yî!

Belê kekê delal, îro çend rojin hemû televizyonê Tirkiye yê ketine dorê ku ji bo te bernama çê bikin. Ji te lêborîna xwe bixwazin. Ew ên ku duh tu bi bêşerefiyê tu îtham dikirî, îro dibêjin me çewt kiriye. Ji bo te bi dehan nivîs hebûn li vî heftî. Li 16/11 an serokê CHP li Parîsê bû. Bi munesebata bîr anina te hat serdana gora te. Ew cara ewil ku Miroveki Tirkî ji

paya bilind te serdana te û Rejîsor Yilmaz Gûney. Di Trt 6 da belgeselekî ku ji aliya hinek kesan ve hatî çêkirin hat weşandin. "Navdarên me" Lê tu duh bêşeref û cudakarê wan bûyî.

Îro ji bo bîranîna te li Stanbolê li salona Lûtfû Kirdar bîr anînek pêk te. Gelek dostên tê te jê hezdikirî hatibûn.

Serokwezîrê Tirk Erdogan dikarî bihata, lê ew ji ber kar û barê nikarî bê. Elbet ew biha ne ye. Serokê CHP yî li Parîsê hatî serdana te nikarî ku bê. Serokwezîr, wezîrê çandê Ertugrul Gunay şandibû. Lê gava ku Ertugrul Gunay hatibû kitêba Ahmed Xanê Mem û Zîna ji aliyê wezarat çanda Tirkiyê ve hatî amedê kirine, diyarî Şaredarê Amedê Osman Baydemir ûserokê DTP Selhattin Demîrtaş û xanima te Gulten xanimê kiribû.

Serokê BDP Selhattin Demîrtaş li bîranine amede bû. Di axavtina xwe de wiha got "Ehmedê me" xwazî di ber wî da ma û nikarî demekê biaxive. "Em te ji bîr nakin"

Gulten Kaya: Ez li serokwezî Erdogan naxeyidim ku serokwezîr û serokê CHP Kemal kiliçdaroglu nehetiyê bîranine.

"Min hemû serokê giştî yên partiyan vexwend. Ez ê bi amadebûn wan kêfxweş bim. Kî neyê jî, ez ji wan naxeyidim. Hevserokê BDPê, Serokê Partiya HAS, Serokê ODPê, Serokê ESPê dê amade bin."



Belê pêşkêşvaniya şeva bîranîne dostê tê û hezkire te SIRRI SÜREYYA pêşkêş kir. Bi Zimanê Ermenî, Kurdî û bi Kurdî beşdar silav kirin. " *Min bi du zimanên ku neyên zanin û yekî tê zanin hûn silav kirin, lê tu li esasiyê geriyî ew zimanê din jî tam naye zanin*."



Belê kekê delal, gava ku wêneyên rojnamevan û hunermendê ku duh bi te re gotî bêşerefî jî ji mêvanan re hat nîşan dane. Lê wan yuhh ji wan re kişandin.

Stranbêj Yavuz Bîngol stranên ku te jê hezdikirî strandin. Hundirê salonê xemgîniyekê girt û çavê herkesî tijî bûn.

Mehmet Aslantuğ helbestê şaîrê mezin Ahmet Arif xwandin. Banu Güven ê bi gitara xwe stran gotin, Levent Yüksel stranên te stirand. Kerem Alışık helbesta 'An Gelir' xwand

## Şahsiyetên tevlî şeva bîranîne bûyê ew bûn



Serokê şaredariya Amedê birêz Osman Baydemîr, hev serokê BDP Selhattin Demîrtaş ji BDP' Sırrı Sakık, Gülten Kışanak, Ufûk Uras û jina Hrant Dînk Rakel Dînk bû. Ji partiya CHP Mehmet Sevigen û wezîrê Çandê Ertûgrul Gunay. Ji partiya AKP'li Dengir Mir Fırat û serokê Trt İbrahim Şahin, birayê Yilmaz Erdogan Mustafa Erdoğan, Waliyê Stanbolê Hüseyin Avni Mutlu, ji rojnama Habertûrkê rojnamevan Balçiçek İlter tevlî şevê bûn. Li jêr wêneyên mirovên li Ahmet Kaya rûreşî kirine û dostên wî ye ku ew parastî hene.






















Belê kekê delal li hundirê salona Lutfu Kirdar wiha dibûn lê li derva dîsa birek nijadperestî di bin serokatiya Partiya HEPAR ê da tu wekî xaîn şermezar dikirin. Serokê wê partiy qetîlê Kurd, serbaz Osman Pamûk oglu ye. *"Bedela îxanetê darda kirine". "Em li meclîsê PKK li ya naxwazin"*

ROJ BAŞ

*Roj baş Kurdîstan*

*Rojbaş gelê Kurd.*




Me ew hevoka hertim di Med tv, Medya tv Me tv, MMC tv, Roj tv û Newroz û radyoyê dengê Mezepotamya de dibhîst. Lê duh me ew hevokê qurt di bin banê meclîsa Tirk da jî bihst. "*Roj baş Meclîsa Tirk*"Lê bi carekê re dengê trt 3 hat birîn. "Weşan ji bo du peyvên ne bi Tirkî hat qurt kirin"

Di dadigeha Amedê de jî gotin "*Zimanekî bîyan û nayê fêm kirin xwastine parastina xwe bikin.*" Dadigehê parastina siyasetmeder, şaredar û rêvebirên me red kir.

Mepûsê Kurd Sirri Sakik got; "Bila dest ji wan durûtiyê xwe berdin. Di trt 6 ê de 24 seata weşan bi Kurdî tên kirin dengê trt 6 nayê qurtkirin. Lê gava ku em BDP li bi Kurdî diaxivin dengê trt 3 ya tê qurt kirin. Ma herkes vê wiha bizane em ê li her derê bi Kurdî bi axivin, em Kurd in. Ti kes ji zimanê me re nabe asteng"



Piştî wî mepûsê BDP û parêzerê birêz Ocalan Hasîp Kaplan rabû bi Kurdî axivî. Dîsa dengê trt 3 hat birîne. Lê birêz Kaplan axavtina xwe wiha dewam kir. "*Hûn derewa dikin, hûn derewincî ne, rîyakar in*" helbesta Cegerxwîn ya " HEVAL ROBSON xwand. Dîsa wek berê destê xwe li kursiya dan. "*Bi zimanekî ku meclîs jê fêm neke hatiye axavtin*"



Belê hevalên hêja; ne cara ewile ku Kurd di meclîsê de bi Kurdî di axivîne. Di sala 1992 an da Leyla Zana bi hevalên xwe ve sond di meclîsê da bi Kurdî kirin 11 salan di girtîngehê da man.



Wezîrê serokwezîr Bulent Ecevît Şerefattîn Elçî gotibû ez Kurd im û li Tirkiye yê Kurd hene heft sal ceza dan wî û çar sala di girtîngehê da me.

Du hefta di ber vê mepûsê BDP Bengî Yildiz bi Kurdî axivî dengê mîkrofanan kete hev. Lê wiha te xuya kirin ku Kurda ji vir şunda bi Kurdî bi axivin.

Şaredarê Silopiyê Emîn Togurlu û Serokê Rêxistina BDP'ê ya Navçeyê Bahattîn Alkiş, di danişîna doza ji ber axaftinên wan hatibû vekirin de, bi rêya tercuman parastina kurdî kirin.



Belê me şer dayê rawestandin. Lê aliyê Tirk ji bo ku şer dewam bike serê xwe li her curê provakasyonan dide. Carna herêmê ji hewa da carna bi Obusa bombe dike. Gelek cara jî bi gerîl re pêvçûn pêk hatin.

Duh Geverê Leşkeran li BDP'iyan gulê reşand: Berdevkê CWD'ê Meclîsa Ciwanên Welatparêz û Demokratîk(CWD) ê Geverê Sedat Karadag giran birîndar e. Ji ber ku ambulans li herêmê tune bû. Bi Helîkopeterê ew rakirin nexweşxana Wan ê. 8 kesên din jî bi guleyên eskera birîndar bibû.




Lê Îro gelê Geveriya bersiveka hişk dan polîs a. Bi qasî 2000 a li dijî polîsa şer kirin. Pêvçûnên giran pêk hatin. Şirnaq, Cizîrê û Sîlopiyê bi deh hezaran rabûn ser piya. Lê gava ku pêvçûn bi dawî bûn, vê carê jî furya binçav kirine dest pêkir. Li Geverê deh kes hatin binçav kirin, li Colemêrgê 15 kes hatin binçav kirin. Silopî bû qada şer, di nav de şaredar jî heyî gelek birîndar hene.

Belê ji bo ku şer bi derxînin ji serê meha ku agirbest hatî îlan kirine pêva bi dehan şaredar û rêvebir û xwendevanên Kurd hatin girtine. Bi dehan zarok hatin girtin.(Foto Colemêrg wek ciyê şer)

Li parêzerên birêz Ocalan gelek doz vekirin. Duh li parêzerê birêz Ocalan Îbrahîm Bîlmez 6 sal ceza birîn.



Di 5 salan de 270 doz li parêzerên Ocalan hatin vekirin - Parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku ji sala 1999'an heta 2005'an parêzerî kiribûn, rastî cezayê "ji parêzertiyê men" hatibûn û cezayê wan zîvirî cezayê hepsê. Piştî vê yekê di salên dawî de der barê parêzerên Ocalan de 270 doz hatin vekirin. Her wiha der barê 4 parêzeran de jî 35 sal cezayê girtîgehê hate birîn.

Belê hevalên hêja; Rûreşî ne mirovatiya ku Tirka/eskera li Kurda kirî yek û yek derdikeve ortê. Di girtingeha Amedê de şaredarê Cizîreyî kevn Kamîl Atak li xwe mikur tê ku wî li wê demê gelek kuştî û nemirovatî kiriye lê ne bi destê wî bûye.

Îro dîsa derket ortê ku dewleta Roma reş 14 gerîla kuştine û ew di çalekê da veşartine.

14 cenazeyên gêrîllayên PKK'ê komi binçal kirin

-


Di sala 1994'an de li Newala Şediki ya Qersê 16 Gêrîllayên PKK'ê di operasyonekê de jiyana xwe ji dest dabûn.



Piştî 16 salan şahidê bûyerê mikur hat û diyar kir ku, cenazeyên 14 kesan li Navçeya Qulpa Îdirê bi tomarî hatine definkirin. Şahidê bûyerê Fahrettîn Maman diyar kir ku, hemû gêrîllayên PKK'î bi kepçeya hatin definkirin.

Maman, anî ziman ku leşkeriyê wê demê kes nêzî cenazeyan nedikirin û wiha axivî: "Cenaze bi wesatiyê birin Goristana Qulpê ya Navçeyê. Me xwest em cenazeyan bigrin û bi derfetên xwe defin bikin. Lê leşkeriyê destûr neda me. Wê demê Şaredarê Qulpê Abbas Ada yê ANAP'î bû. Wî kepçe şand. Kepçeyê li nava goristanê çalek mezin vekir û hemû cenaze li ser hev avêtin çalê. Hemû cenazeyên jin û mêran bi ser hev de avêtin û pişt re bi kepçeyê ax avêtin ser wan."

Peyamên Ocalanê bi Parêzera re şandî: Em Înşaya neteweya demokratîk dikin



- Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan diyar kir ku, tiştê ew dikin avakirina neteweyeke demokratîk e, vê yekê bi gel re dikin û xweseriya demokratîk jî îfadeya projeya polîtîk ya neteweya demokratîke.

Ocalan, di hevdîtina xwe de bal kişand ser girtina şaredaran û wiha got: "Girtina şaredarên hilbijartî zêrandina şere, me dizêrînin. Girtina şaredaran û yên hilbijartî tê wateya daxwaza berdewamkirina şer. Divê demildest ev girtin bên bidawîkirin. Kesên ku derbazî cihên şaredarên hatine girtin divê zêdetirî deh qatan bixebitin. Dikarin derbazî rêbaza hevseroktiyê bibin. Li her derê şaredar têne girtin, sîstema hevseroktiyê di heman demê de li hemberî vê yekê tedbîreke."

**Meclîsên Demil dest/hema li bajaran bên avakırın.

Ocalan, "Meclisên Bajaran divê demildest bêne avakirin. Heta roja îro çima girîngî nedanê nizanim. Ji nabêjim bi niyetin, ne duristin, ez nafikirim ku tiştekî wisa ye jî, lê madem bi siyasetê re eleqedarin divê vê yekê bikin û bi ser bixin. Konseyên Bajaran jî divê li her derê ava bikin'.

Pêşniyariyên xwe pêşkêş bikin.

Ocalan, der barê nêrîna ku di nava hin STK yên li Amedê ku dibêjin '*Vesayeta Apo' heye wiha got: "Ez ji wan re vê dibêjim; bila pêşniyarên xwe yên çareseriyê pêşkêş bikin, xal bi xal pêşkêş bikin, wê demê ez vesayeta wan qebûl bikin*".

Li ser Roj tv e pêkutiya Nato

Dewlet derî vedike

Ocalan, diyar kir ku AKP heta 2005'an bawer dikir ku dê wan tasfiyê bike û wiha got: "Dema dît ku ev yek pêk nehat ji 2005'an pê de bi Gladioya Tirkiyeyê riya lihevhatinê hilbijart. Bi vî rengî dê Serfermandarî çiqas bixwaze dikare kurdan bikuje, komkujiyan pêk bîne û AKP jî beranberî vê yekê desthilatdariya xwe berdewam bike".

## Dîroka 1071 an şoreş e.

Ocalan, bilêv kir ku tifaqa kurd a 1071'ê dîrokeke girîng e û tifaqek di asta şoreşê de ye. Ocalan, da zanîn ku kurd wê demê li başûr bi talûkeyê re hevrû bû û wiha got: "Tirk jî li rojava ketibûn tengasiyê. Û herdu hêz, tirk û kurd tifaqê li dijî Bîzansan dikin. Di rastiya xwe de ev tifaq şoreşek e. Vê tifaqa hezar salî, bû destpêka biratiyê.

## 15'ê şibatê Komplo ye

"15'ê Sibata 1925'an destpêka komploya li hemberî kurdan e. Anîna min a vir jî di 15'ê Sibatê de pêk hat. Komploya li hemberî Şêx Seîd pêk anîn destpêka komploya îro ye. Dîrok-biryara ji bo 29'ê Hezîranê jî eynî ye. Li aliyekî li parçeyê mezin ê Kurdistanê li Bakur hewldana ji bo tunekirine komî ya kurdan heye, li aliyê din li Başûr jî tê xwestin ku kurd bibin xwedî hêzek. Li aliyekî planên îmhayê rêvebirine û li aliyekî jî Başûr kurd li Başûr kirine hêz û heta îro anîne. Plan û stratejiya ji 1925'an şûnde hatiye bikaranîn ev e. Di 10'ê Adara 1922'yê de ji bo kurdan biryara xweserîbûnê hatiye girtin, lê ev biryar hatiye veşartin û qet pêk nehatiye. Makeqanûna 1921'ê Makeqanûneke girîng a demokratîk e. Lê belê piştê ligel komploya 1925'ê ev qanûn qet nehate bikaranîn."

## Netwaya Demokratîk

*"Li Gever berê warekî paşvemayî bû. Niha çawa bû warê herî pêşkeftî! Ev bi xwerêxistinkirin û jiyana kolektîf mimkûn e. Dema gel bixwaze tiştekî ku nikaribe bike nîn e. Gever û Colemêrg wisa ne. Her der divê Geverê ji xwe re bike mînak. Gelê Geverê ji her tiştî re amade ye.*

*Ji sedî 99'ê wan amade ye, lê kêmasiya serkêşiyê heye. Divê her der wekî Geverê be. Wekî Geverê çend derên din jî hebin em ê pirtir bikaribin bidin zorê. Çareserî dê lezgîntir pêk bê. Tişta em dixwazin avakiriya neteweya demokratîk e. Ango tişta kurd dixwazin pêk bînin projeyeke demokratîk a neteweyî ye. Em dixwazin bi her awayî neteweya demokratîk ava bikin. Hişmendiya me ya ji bo neteweya demokratîk xwe dispêre gel. Xweseriya Demokratîk xwe îfadekirina projeya neteweya demokratîk a polîtîk e. Rawekirina wê ya polîtîk e. Divê tevî hemû hêmayên xweseriya demokratîk nêzîkbûneke ji bo hebe."*

## Çareserî Nebe Şerê pêk bê

"KCD divê projeya ji bo avakariya neteweya demokratîk xurt bike. Di parêznameyên min de jî heye. Ez vê yekê wekî 7 alî dinirxînim. Berê min 6 alî aşkera kiribûn; lê ez vê yekê sînor nakim. Dikare hêj bêhtir bê berfirehkirin. Projeya avakariya neteweya demokratîk xwe dispêre bingehên demokratîk. Aliyên aborî, sosyal, polîtîk, çandî û hwd yên wê hene. Modela ku ez li ser dixebetin Karl Marks li paş xwe dihêle".

## Projeyan bi gel re parve bikin

Belê hevalên hêja; piştî deh sala PDK kongra ya 13 emîn bi darxist. Lê va kongra ne wek yê din bû. Gelek kes û şahsiyetên serbilin, malmezin û ji qada navnetewî. Ji Amerîka da bigirê hetanî Tirkiyê mêvanên xwe hebûn. Ji Partiya AKP Abdulkadîr Aksuyê dijmine gelê xwe hebû. Omer Çelîkê ku eslê xwe wenda kirî hebû. Ji partiya BDP Bengî Yildiz, Hamît Geylanî û Leyla Zana hebû. Elbet Osman Baydemîr tune bû. Ji bo ku li ser qedexebûna derkevî dervayî welêt heye. Ahmet Tûrk û Aysel Tugluk jî tune bûn. Ji bere we bajar û bajarokên Kurda digerîn derd û kulên wan guhdar dikin û Xwesariya demokratîk ji wan re didin ragihandin. Lê bi çoş tên pêşwazî kirin. Îro serokwezîr Erdogan jî li Mêrdîne bû û gelek derew kirin rêz ê çû Ankarê. Em bên ser kongra PDK.

## Mesût Barzanî: *Kurd yek in û Kurdî yek ziman e*

-Di Kongreya PDK'ê ya têde peyamên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û Serokê Konseya Rêveber a



Koma Civakên Kurdistanê (KCK'ê) Mûrat Karayilan jî hatin xwendin de, Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê Mesûd Barzanî di gotina vekirina Kongreya 13'mîn de got ew ji bo çespandina mafê çarenivîsa gelê Kurd kar dikin û Kurd yek in û Kurdî jî yek ziman e.

Bi beşdariya bêhtirî 350 mêvan, îro li paytexta Herêma Kurdistan Hewlêrê, 13'emîn Kongreya Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK'ê) dest pê kir.

Serokê PDK'ê Mesûd Barzanî gotinek li hember amadebûyan pêşkêş kir û tê de wiha got: "*Partiya Demokrat a Kurdistanê mafê çarenûsê gelê Kurd diçespîne*."

*'KURD YEK PARÇE YE, DI KURDÎ DE ZARAVE HENE LÊ KURDÎ YEK ZIMAN E'*

Barzanî axaftina xwe wiha domand; *"Kurd yek parçe ye, kes nikare wan ji hev cuda bike û yek heyîna wan hey e." Derbarê ziman de jî Barzanî got, "Belê rast e, di zimanê Kurdî zarave hene lê Kurdî yek ziman e."*

'ÊDÎ BI TU AWAYÎ ŞERÊ BIRAKUJÎ DÊ PÊK NEYÊ'

Derheqê pêwendiyên di nav Kurdan de jî Barzanî got, "*Êdî birakujî bi hîç şêweyekî di navbera Kurdan de dê dubare nebe.*"




Mesûd Barzanî di axaftina xwe de derbarê Kerkûk û navçeyên dabirrî de got, "*Bi hîç şêweyekî em destberdariyê ji Kerkûk û navçeyên dabirrî nakin, lê wateya wê yekê nîne ku em dixwazin hukmekî tekane li wan navçeyan bikin*."

Her wiha Barzanî amaje bi wê yekê da ku ew piştgiriya damezrandina her herêmeke federal di Iraqê de dikin, ji ber ku jiyanê ew yek piştrast kir ku sîstema federal baştirîn sîstem e ji bo pêkvejiyanê û mayîna Iraqê yekgirtî.

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî di dirêjahiya axaftina xwe de got, "*Partî qebûl nake bi hîç şêweyekî rêkeftinên siyasî di navbera aliyên siyasî li ser destkeft û mafên gelê Kurd çê bibin*."



Di Kongreya PDK'ê ya 13'yemîn de peyamên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û Serokê Konseya Rêveber a KCK'ê Mûrat Karayilan jî hatin xwendin.

Di rêwresmên destpêkirina kongreyê de hejmarek pir ji mêvanên li ser asta Herêma Kurdistanê, Iraq û dinyayê beşdar bûn.

Di nav wan mêvanan de Serokomar Celal Talebanî, Serokwezîr Nûrî el-Malikî, Serokê Lîsteya el-Iraqiye Eyad Elawî jî hene. Li ser asta dinyayê jî, hinek dostên PDK'ê ji Tirkiye, Rûsya, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Îtaliyayê û piraniya welatên dinyayê hatibûn vexwendin

Karayilan: PDK xwedanê dîrokek bihêz e




– Serokê Desteya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê (KCK) Murad Karayilan, di peyamekê de pîrozbahiya 13emîn Kongreya Partî Demokrata Kurdistanê (PDK) kir. Karayilan, wiha got, "PDK, xwedanê dîrokek bêhêz e."

*Karayilan, di peyamê de wiha anî ziman*:

“Partiya Demokrata Kurdistanê, xwedanê dîrokek pir bihêz e û roleke girîng di Iraq, Herêma Kurdistan û bi taybet di çareserkirina pirsgirêka kurd de heye.”

Karayilan, da xuyakirin, encamên kongreya PDKê gelekî girîng in û hemû alî li benda encamê ne û xwest, ev kongre bikeve xizmeta yekitiya gelê kurd, parastina demokrasiyê û biratiyê li Herêma Kurdistanê.

Belê hevalên hêja, îro du rojin huquqnasê navdarê Ewrûpa qedexê bûna li ser PKK e niqaş dikin.

Îro 14/12-2010 e ye.

Belê hêvalên hêja di jîyana Kurda da şer qet ti cara ji ber deriyê me kêm nebû. Hêzên Başûr li dijî dijmên xwe 50 şer kirin. Îro ew wek dewlet gehştine merheleka baş. Du roja di ber kongra PDK li hewlerê bû. Axavtina kek Mesût dilê gelê Kurd xweş kir. ‘ÊDÎ BI TU AWAYÎ ŞERÊ BIRAKUJÎ DÊ PÊK NEYÊ’.




‘*KURD YEK PARÇE YE, DI KURDÎ DE ZARAVE HENE LÊ KURDÎ YEK ZIMAN E’ “Ez ji malbatên ku zarok û xismên xwe di şerê birakujiyê da jîyana xwe ji dest dayî re lêborîna xwe dixwazim*”(Foto destê xwe bi xwîn ji ser ciwanên me bikşînin)

Belê berxwedan têkoşîna Kurdên Başûr û Rojhilat ji wî şerê 50 salî li dijî Başûr bûyî ne kêmtir e. Îro Tevgera Azadî xwas hetanî meha hezîranê bêçalekî îlan kiriye. Bi piranî jî li ser soza xwe ye. Lê were bi gura re peymana çêke. Her firsenda ku dîtî êşrîşa ser gerîla dikine. Êrîşa ser gunda dikine. Gever, Şemzînan bûye stirî di çavê wan re diçên xar e. Ji ber ku gelê Gever û Şemzînan,

Cizîrê li ber dijwarî û zulma wan serê xwe xar nake. Birêz Ocalan heftê borî gotibû divê ji gelê Gever û Şemzînanê mînak bigirin. Eger di sê ciyê me din e wek wan bajarokan hebin, em ê hê jî pêşta herin. Divê her der wekî Geverê bibe. Lê piştî vê mesajê birêz Ocalan eskera terora xwe li suk û kolanan meşandin. Sê roja di ber nunerê BDP Sedat Karadax gulê baran kirin û ew îro sê çar





rojin di nexweşxanê dayê jîyan û mirine re li ber xwe dide. Gelê Geverê û Şemzînan bi deh hezaran daketin kolanan. Polîsa vê carê jî êrîşa ser dayika kir û gelek dayik birîndar kirin. Îro sê çar rojin jî konvoya KCD di bin hev serokatiya Ahmet Tûrk û Aysel Tuglu re li herêmê ne ji aliyê deh hezaran ve tên pêşwazî kirin. Ji bo wê nunerê dewletê wê tahmûl nakine û êrîşê dibin ser wan. Bi dehan xwendevanên Kurd ji unîversîta tên avêtin û pişt re polîs wan digirin dibêjin "hûn herine tevlî gerîla bibine"

Belê du sê roja di ber vê li Gûçlûkonak e qomutanekî bi navê Kerîm Karatay ji aliyê eskerên Tirk ve hat şehîd kirin. Duh jî gerîlayê bi navê Elî Ebdo Hambeşo/Bedran Gaba şehîd ket.




Belê, bi hinceta 10 kesan di dema daxuyaniya BDP'ê li Riha dayî de dirûşma "Bijî Serok Apo" gotine, li her yek ji wana 7 sal cezayê girtîgehê hat birîn. Di îdîanameyê de îfadeya ku dibêje '*her çendî dibêjin bêrê wan li aliyê din bû, lê diyar bû ku dirûşim gotin*' bal kişand.

Îro doza HADEP e li dadigeha DMME jî hat eşkerê kirin. DMME'yê Tirkiye ji doza HADEP'ê mehkûm kir

Dadgehê diyar kir ku bi girtina HADEP'ê 11. madeya DMME'yê hatiye binpêkirin.

Di biryar de hat gotin ku divê Tirkiye 24 hezar Euro tezmînat bide û ji ber mesrefên dadgehê 2 hezar Euro bide.(Di doza HADEP e DMME da hat mahkum kirin)

Ew gotineka me heye, ji baranê şûnda hespa cil dike.



Belê hevalên hêja, ne tenê operesyon li Tirkiyê li dijî PKK/BDP li ya pêk tê, Ji 12/12 an pêva polîsê Fransa û Îngîstanê jî li dijî Kurda operesyonan pêk tîne serdestkirina komaleyên Kurd û bi şefaqê xwe davêje ser malê welatparêza. Bi tenê li vî hefteyî 15-20 welatparêz ji aliyê polîsê Înglîz û Fransiz ve hatin girtin. Lê duh li Înglîstan û Fransayê bi deh hezara piştgiriya hevalên xwe kirin. Nunerê KNK ............... 5-6 mehene li Îtalya wek girtî nikare her ti dera.

Belê hevalên hêja îro 15/12 a ye

Kurd li şehîdên xwe xwedî derdikevin. Îro termê Qomutan Kerîm Karatay li Nisebîne ji aliyê deh hezaran ve bi sloganên şehîd namirin hat pêşwazî kirin. Diya Karatay got, "*Ez nagirim, dijmina li xwe li lawê xwe bi şakirin nadim. Ew şehîdê welatê xwe ye. Ez gazî Serokwezir dikim kanî te digot bes e ma dayik negirin, ez ji stêrkê çavê dayikan re bibim destmal. Lê ez dibînim her roj dayik digirin. Îro lawê min Kerîm şehîd ket duh qehremanekî Kurd Elî Ebdo Hambeşo/Bedran Gabar şehîd kete. Êşa di dilê min da, di dilê te jî keve*"



Belê, parêzerê birêz Ocalan bi Ocalan re hevdîtin pêk anin. Lê vê carê parêzer Îbrahim Bilmez tevlî wan parêzeran tune bû, ji bo ku dewletê li wî 7,5 ceza birîne.

Belê hevalên hêja; Tirkiyê bi qasî salekê ku niqaş tên kirin, we bi Ocalan re hevdîtin pêk anî an na.? Eger we pêk aniyê hûn aliyê terorîsta digirine.

Lê li dawiya serokwezîr li xwe mikur hat ku ji pêşiya pêşî da nunerê eskerî û îstîxbaratê bi Ocalan re hevdîtinan pêk tînine, ne ku niha. Elbet hevalên me jî ê pêk bînin. Jir rojnama Hurriyetê Ertûgrul Ozkok wiha dibêje; "Min xwast ku ez bi Ocalan re hevdîtinan pêk bînim, lê ji aliyê dewletê ve hat red kirin. Ez îro dîsa dixwazim bi Ocalan re hevdîtinan pêk bînim. Deh pirsê min ji wî re hene.

Musteşarê MÎT'ê yê berê Cevat Oneş dibêje: Daxwazên Xweseriya Demokratîk û ziman maqul in!

Alîkarê Musteşarê MÎT'ê yê berê Cevat Oneş, da zanîn ku *"Komîsyona Lêgerîna Heqîqetê" û "Xweseriya Demokratîk", "Perwerdeya Zikmakî" daxwazên maqûlin û divê bên nîqaşkirin. Oneş, diyar kir ku ji bo Tirkiyeyê dema "xwerexnekirinê"* hatiye.

Îro 5-6 rojin Ocalan bi parêzerê xwe re gotiye bi serokê cemaata GÛLÊN re hevkariyê bikin. Parêzerê serokê terorîsta bi nunerê Gûlên re Huseyin Gûlmez re hevdîtin pêk anîne û ew hevdîtina di navbera parêzer û nunerê Gûlê Huseyîn Gûlmez ragihandine Ocalan.

Lê reaksiyonên tûj hîm ji aliya Fetullah Gûlên e li Amerîka dijî hat û him jî ji aliyê rojnamevanê Zamanê Husey Gûlmez ve hat. Ma ez kur bibûyama çim amin ew hevdîtina pêk anî. Ez ji cemaata me ji serokê me hezar carî lêborîna xwe dixwazim.

Nunerê CHP jî tevlî vê festîvalê bû. "*Li me jî heqeret kirin ku em ê bi BDP/PKK li yan re hevkariya hilbijartina bikine. Lê oldarê me di ber me xwastine bi Ocalan re hevkariye bikin*."

*"Pêwîstî heye ku Tirkiye divê ber bi vî alî gavan biavêje. Ji bîlî gav avêtinê çi şansê me tune ye. Afirandina aştiyê, welatiyên wekhev û hev re jiyana hemû rengên çareseriya alternatîfa me ye"*.




Wekî din çî bû?

Navê Diyarbakirê ji aliya meclîs şaredariya Diyarbakirê ve wek AMED hat guherandine. Ew navê 80 salin ku kurd li hêviyê ne. Bajarên me din jî di amedekariya nav guherin dane da ne.

Belê hevalên hêja *Elî Ebdo Hambeşo/Bedran Gabar û Fîkrî Kaya îro 17/12-2010 a ye.*

Me şer da rawesatndin dîsa hatin ser me. Heftê borî du qehremanên Kurd Elî Ebdo Hambeşo/Bedran Gaba ketin kemîna eskerên Tirk çehîd ketin. Qomutan Fikrî Kaya li Nuseybîne ji aliyê deh hezaran ve hat pêşwazî kirin. Ciwanên Kurd sonda xwarin ku tola wan helnin. "*Em ê tola we helnî û xwîna we li erd nînin*"



Dewelta Tirk digotin, hetanî dengê çeka nayê birîn, em nikarin vê pirsê niqaş bikin û jê re li çareseriyê bigerin.

Li sal 1999 an birêz Ocalan şer bêdem da rawestandine û HPG hêzên xwe ên çekdarî kişandin dervayî sînor û Qandîl ê. Lê Tirka di nava van 5 salan da qet ti roja li dijî gerîla û welatparêzê Kurd vala nesekinin 600-700 gerîlayî jîyana xwe ji dest da û bi qasî wan jî sivîla jîyana xwe ji dest da. Bi dehan gund hatin şewitandin.

Sala hat 2004 an sekinî dîsa şer dest pêkir.

Dîsa gotin hetanî ku şer nayê rawestine em nikarin hevdîtinan bi DTP li yan re hevdîtina pêk bînin. Serokwezîr bi salan rendevu neda serokê DTP ê birêz Ahmet Tûrk.

Serokwezir di sala 200...? an da randevû da serokê DTP birêz Ahmet Tûrk vê carê jî 8 esker tirk hatin kuştin. Serokwezîr hevdîtina xwe ya bi serokê DTP Ahmet Tûrk re îptal kir. Lê paş diyar bû ku ew eskeran ne ji aliyê gerîla ve ji aliyê qomutanê xwe maînên eskeriyê ve hatine kuştin.

Lê va helwesat serokwezîr ne tenê li dijî serokê DTP Ahmet Tûrk bû.

Li dijî Kek Mesût Berzanî û Mam Celal jî bû.Ew wekî dijminê xwe ye sereka bin av dikir. Gava ku navê wan herdu qehremanê Kurd dibhîst bi şeva xewa xwe ne dihat.

Bi salan rendevû nedan wan ew biçuk wek serok eşîret didîtin û tenezûl nedikir ku bi wan re hevdîtinan pêk bîne.

Lê paşê jî ketin dorê ku wan vexwînin Tirkiye yê. Li ber lingê wan xaliyê sor rêxînin. Li dawiyê wiha jî kirin. Wezîrê dewletê Kurşat Tûzmen li Kek Mesût û mam Celal gelek heqeretê giran kirin û piştre çû Bexdayê li ber deriyê Mam Celal bi seata pa ku ew bi wî re hevdîtina pêk bîne. Li Hewlerê jî ketibû wê rewş ê. Kek Mesût randevû neda wî. Wek kuçikê ku boça xwe jê da ketî vegerî Ankarê.

Bi deh salan qire qir bûn, digotin em bi serokê terorîsta re hevdîtina pêk nînin û bi wî re li masê rûnanin. Serokê terorê, qetîlê pitika ne mihatabe me.

Lê niha dîyar bû ku ew deh salin bi birêz Ocalan re hevdîtinan pêk tînine.

Di sala 2005-2007 an da dîsa PKK e dest ji şer berda, lê dîsa şer kirin. Di jorî du hezaran siyasetmeder û nunerê DTP/BDP girtin binçava û bi salan ew di girtingehê dane. Li meha borî ew derxistin ber dadigehê û li wan gelek rûreşî û heqeret li wan kirin. Lê wan xwast bi zimanê zikmakî parastina xwe bikin, destûr nedan. Sê hefta her roj ew tînan ber dadigehê bi seata ew birçî û tî bi kelepça didan rawestandine. Lê vê carê doz avet in 18-01-2011 an.

Lê hê jî sîyasetmeder, rewşenbir û şaredarên me tên girtin. Du hefta di ber vê şaredara Geverê Rûkên Yetişken bi şaredarê......?hat girtin.

Niha jî dest bi girtina xwendevanên me kirin li vî heftî bi sedan xwendevan hatin girtin. Duh li Çorluyê 20 xwendavan û îro Trabzonê 19 xwendevan hatin girtine.

Lê ew ê ku li vê rûreşiyê dibin temaşevan ê sibê jî bên wan bibin.

Lê niha dîsa Kurda şer dayê rawesatndin û dixwazine bi rêyên demokratîk mefên xwe yê ji aliya Tirkan ve hatî zept kirin werbigirin. Lê "Dewlet topyekun êrîşî kurdî dike!"




Bi kurdî axavtina parlamenterên BDP-ê di Parlamentoyê de û herî dawî jî daxuyaniyên serokê BDP Selahattin Demîrtaş yên ji bo bikaranîna duzimanan, mijara rojeva Tirkiyeyê ye. (foto ciyê ku Kurd lê dijin hemû bi duzimanî bibine)




Parlamentera BDP-ê Bayindir di meclîsê de hat xezebê. Gopala dest xwe de nîşanî meclîsê da got; "*şerm bikin şerm bikin, ez rastî tudiya dewletê hatim, ew gopalê di dest min da Komara Tirkiyê da dest min. Gava ku em li meclîsê bi Înglîzî di axivin, hûn dikenin û kêfa wê tê. Lê gava ku em Kurdî di axivin mirûzê we tirş dibe. Emê li her deverên ku Kurd lê dijîn bi Kurdî bi axivin. Ma vê ye herkes wiha bizane*."

Hevserokê BDP Selhattin Demirtaş: !Em ê li benda dewletê nesekinin"!




Bi kurdî axavtina parlamenterên BDP-ê di Parlamentoyê de Serokê Meclîsê Mehmet Alî Şahîn, wezîrê çande û serok komar hers hatin û gazî dozgera kirin li wan doz bê vekirin. Herî dawî jî daxuyaniyên serokê BDP Selahattin Demîrtaş yên ji bo bikaranîna duzimanan, mijara rojeva Tirkiyeyê ye.

Berpirsên dewletê BDP-ê bi girtinê tehdîd dikin. Serokê Parlamentoyê bang li Dozgeriyê komarê kir da ku dest bi lêpirsînê bike.

Serokê MHP Dewlet Bahçelî got Pir zimanî destûr nade acabûna pir netweyî. Dewleta netewe û avayiya unîter destûr nede. Her kes dikare wek xwe bipeyive lê şansê wan ê afirandinê tune. Ew ê li hember xwe MHP bibînin.



Serokê grûba MHP.ê Oktay Vural jî bi daxuyaniyeke çapemeniyê got wan daxwaznameyekê daye serokatiya Parlamntoyê da ku ji bo bi kurdî ne axivin rê li ber BDPyiyan bê girtin.

Wezîrê Kulturî Ertugrul Gunay jî dibêje zimanê resmî ê Tirkiyeyê tirkî ye. Nabe mirov li dijî qanûnan derê. Bi zorê tişt çênabin.

Li ser van tehdîdan Serokê KCD Ahmet Turk jî îro ji Mûşê bersiv da û got "*Em di qada siyasetê de rastî gefan tên. Heta niha 7 partiyên me hatine girtin. Eger mantiq neyê guhertin, dibe cardin partî bê girtin. Lê hatiye dîtin ku em bi pêkutiyan û gefan nayên bêdengkirin*"



Parlamenterê Şirnexê Hasip Kaplan jî di derbarê van tehdîdan de got "*Erê serîhildan e. Em serî hildidin. Ez vekirî dibêjim ev mafeke sirûştî ye. Ji bo nasnameyê, Ji bi mafê ziman em serîhildidin. Lê ev serîhildaneke pasîf e. Serîhildaneke sivîl e. Bêîteatiyake Sivîl e*"

Belê hevalên me ji bo doza Kurdî di girtingehê da ne. Birêz Ahmet Tûrk heftê borî li herêma Serhatê axivî got; "Ez ji we re spas dikim. We serê xwe li dijmine xwe xar nekir û we di têkoşîne azadî xwastiyê da serê xwe li ber dijmine xwe xar nekir.

Rast gotiye, ew wêna şaredarên BDP yê Serhahade ne. Ji bo 28 şaredaran hezar sal ceza dixwazine. Ma wan çi kiribû ku ji wan re hezar sala ceza tê xwastine? Ma wan dizî kiribû? Keç û bûkê wan revandibû?

Lê şaredarê AKP bi mîlyonan pera didiz in. Kes li wan dozê venake.

Şaredara Weranşahrê Leyla Gûvên gava ku polîsa hat bîr bi hevalên xwe re got; "*Xizmeta gel bîr nekin, kar barê şaredariyê bikin*"

## HEZAR SAL CEZA

Der barê Şaredarê Êlih'ê Necdet Atalay de 16 doz hatine vekirin û ji van 4 bi beraat 4 jî bi ceza encam bûne. 8 dozên Atalay jî hêj didomin. Bi giştî 154 sal ceza ji Atalay re tê xwestin. Der barê Şaredarê Colemêrg'ê Fadil Bedîrhanoglu de jî heya niha 14 doz hatine vekirin û 2 doz çûne Dadgeha Bilind. Der barê Bedîrhanoglu de jî ji propagandayê, û medihkirina sûc û sûcdar 20 meh cezayê girtîgehê hatiye dayin. Ji 12 dozên Bedîrhanoglu ku didomin de jî 44 sal ceza tê xwestin. Ji Şaredarê Sêrtê Selîm Sadak re jî 30 doz hatine vekirin. Ji van 8 dozên ku çûne Dadgeha Bilind 18 ceza li Sadak hatiye birîn. Ji van dozê wî yî din jî 51 ceza tê xwestin.



Der barê Şaredarê Wanê Bekîr Kaya de 13 sal ceza tê xwestin û her wiha gelek lêpirsînên wî jî hê didomin. Şaredarê Bajarê Mezin Osman Baydemîr jî di 9 dozan de tê darizandin û 11 dosya jî lêpirsîn der barê wî de hene. Ji 3 dozên ku mahkumiyet girtiye 2'yan cezayê pere daye û dozek jî 10 meh ceza wergirtiye. Baydemîr hêj di doza KCK'ê de tê darizandin.

Şaredarê Îdirê M. Nûrî Guneşê ku hêj jî di Girtîgeha Tîpa H a Erzerom'ê de dimîne jî bi 39 salan tê darizandin.

Şaredarê Şirnexê Ramazan Uysal 7 sal û mehek ceza wergirt û niha cezayê wî li Dadgeha Bilind e. Di heman demê de ji 2 dozên din jî 20 sal ceza tê xwestin û gelek lêpirsînê wî jî li benda doz vekirinê ne.

Der barê Şaredara Sixke Nezahat Erguneş de 15 sal, der barê Şaredara Bazidê Canan Korkmaz de 17 sal, der barê Şaredarê Cizîrê Aydin Budak de jî 5 sal û mehek cezayê qetî hatiye birîn û niha li Dadgeha Bilind e. Der barê Şaredarê Qerqelî Murat Durmaz de 12 sal, Şaredarê Patnos Yusuf Yılmaz de 3 sal, der barê Şaredarê Norşîn M. Emîn Ozkan de jî 18 sal ceza tê xwestin. Şaredara Gimgim Gulşen Deger ji 28 salan, Şaredarê Kopê Ziya Akkaya jî bi 10 salan tê darizandin.

Şaredarê Şemzînan Sedat Tore bi 40 salan tê darizandin û der barê wî de 36 lêpirsîn hene. Şaredarê Bajêrke Hurşît Altekîn bi 20 salan tê darizandin û derbarê wî de 25 lêpirsîn hene. Der barê Şaredarê Çelê Mehmet Kanar de jî ji endamtiyê 6 sal û 3 meh ceza hatiye dayin û niha ev ceza li dadgeha bilind e. Ji 3 dozên din jî 15 sal ceza ji bo Kanar tê xwestin. Şaredarê Tetwanê Abdullah Ok jî bi 6 salan tê darizandin. Der barê Şaredara Nisêbînê Ayşe Gokkan de jî ji 16 dozan 47 sal ceza tê xwestin û her wiha Şaredara Dêrikê Çaglar Demîrel de jî 30 sal ceza tê xwestin.

Der barê Şaredarê Surê Abdullah Demîrbaş de 23 doz hatine vekirin û ji van 12 doz bi beraat bi encam bûne. Der barê Demîrbaş de 82 sal ceza tê xwestin û Demîrbaş hê jî ji doza KCK'ê tê darizandin. Şaredarê Farqînê Fadil Erdede bi 18 salan, Şaredara Baglarê Yuksel Baran ku hêj ji doza KCK'ê tê darizandin bi 45 salan ceza tê darizandin.

Der barê Şaredara Lice Fîkriye Aytîn de 24 sal û 5 meh, der barê Şaredara Wêranşarê Leyla Guven de 2 sal û 2 meh ceza hatiye birîn û niha li dadgeha bilind e. Her wiha der barê dozên Guven ku didomin de jî 44 sal ceza tê xwestin. Şaredarê Hezoyê M. Raşît Haşimî de 9 sal ceza li dadgeha bilind e û di dozên wî yî didomin de jî 11 sal ceza tê xwestin. Ji Şaredarê Kercewsê Esat Uner re jî 8 sal û 9 meh ceza hatiye birîn û niha ev cezayên wî li Yargitay'ê ne. Wek din jî 5 dozên Uner'î ku didomin de jî 70 sal ceza tê xwestin. Şaredarê Serêkaniyê Îsmaîl Arslan jî 15 dozan tê darizandin. 10 sal ceza li Arslan hatiye birîn û niha li Yargitay'ê ye. Ji dozên wî yê ku didomin de jî bi 30 sal ceza tê darizandin. Ji bo Tugluk ê 75 sal ceza tê xwestin.

Belê hevalên hêja duh serokê şaredariya Stanbolê Kadîr Topbaş li Amedê bû û kêfxweşiya xwe



anî ziman. Îro serokê TUSIAD e xanim Umut Boyner li Amedê bû. Bi hatina wê xanime û bi axavtina wê xanime gelê Kurd kêfxweş bû. Bi Kurdî got; "*Ji bo, biratî, ji bo aşitiyê, hûn bi xêr hatin. Em aşitî û biratî dixwazin. Dîyarbekir mala min e*" Piştî axavtina xwe digel şaredar û dewlemendê Kurda govend girt.

Mesaja birêz Ocalan. ŞEŞ MEHÊN HERÎ KRÎTÎK

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan diyar kir ku ew nikare bêje nêzî aştiyê ne rewşeke nîvî nîvî heye û wiha got: "*Şeş mehên li pêşiya me gelekî girîng in. Ez dikarim wiha bêjim: "Ji bo çareseriya demokratîk şensê dawî ye". Berovajî vê pevçûn dest pê bikin dê şerekî erjen biqewime*." Ocalan, diyar kir ku AKP li pêşiya pêvajoyê astengiya herî mezin e.



Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan bi parêzerên xwe re hevdîtin pêk anî. Di hevdîtinê de li ser şert û mercên girtîgehê sekiniye û wiha got: "Şertên min giran in. Lê dîrok mîsyonek li min bar kiriye. Di bin giraniya vê yekê de ne dikarim razêm ne jî dikarim bijîm, di danûstandina nefesê de zoriyê dikişînim. Di odeyeke biçûk de çawa dikare nefes bê girtin, çawa dikare bê jiyîn. Em di heyameke dîrokî de derbas dibin. Li vir her heyam girîng bûn, lê şeş mehên li pêşiya me ji her demê girîngtir e. Em ê van şeş mehan çawa binirxînin? Divê em gelekî baldar bin. Ez di bin barekî giran de me. Lê em ê bi ser bixin."

Em li hev hatine digerin.

Ocalan, destnîşan kir ku ji bo çareseriya pirsgirêkê bi riya demokratîk bê çareserkirin bang kiriye û wiha got: *"Armanca me ne tifaq bû. Di raya giştî de şaş tê nîqaşkirin, tifaq cuda ye, lihevhatin cuda ye. Em lihevhatinekê digerin. Di bingeha îslamê de jî lihevhatin heye. Dema li jiyana Hz. Muhemmed û kirinên wî binêre dê girîngiya lihevhatinê bibîne. Heta di heyama Roma-Bîzansê de lihevhatinên hatine kirin hene. Hewce nake kesek ji lihevhatinê bitirse. Hewcedariya Tirkiyeyê bi vê yekê heye. Min belasebeb behsa Mumtazer Turkone nekir. Turkone dibêje; tirkîtî, bi jehra neteweperestiyê tê jehrîkirin. Rast dibêje. Ez qîmetê didim van gotinan. Heke ew jî aştî û başiyê dixwazin ez bawer dikim dê bi awayekî erênî vê banga me pêşwazî bikin. Min jê piştgirî xwest. Min xwest piştgiriyê bidin aştiya civakî. Aştî, karekî pîroz e. Xizmeta herî mezin ji bo mirovahiyê ye jî. Ji bo cewherê îslamê jî guncav e."*

Asten partiya AKP ye.

Ocalan, diyar kir ku li ser salên 1925'an hûr dibe û wiha got: *"Rastiyek heye baştir tê zelalkirin û têkiliya wê bi îro re heye. Heman lîstik didome. Wekî tê zanîn mîmarê wê demê Îngilistan e. Wê demê Îngilistanê ji Mustafa Kemal re got 'tercîha xwe bike, an tê dev ji komarê berdî an jî tê dev Mûsil-Kerkûkê berdî'. Ango Îngilistanê li hemberî Mûsil-Kerkûkê komar bi sînor kir û îmhaya kurdan erê kir. Mustafa Kemal ji bo komareke bi sînor biryara xwe da lê piştre ji bo Mûsil-Kerkûkê got 'birîneke di hundirê min de ye'. Ango ji ber zextên Îngilistanê neçar maye biryareke wiha bide"*.

## Ne nêzî aşitiyê ne.

Ocalan, destnîşan kir ku talûkeya li pêş gelekî mezin û wiha got: "Em nikarin bibêjin em nêzî aştiyê ne. Ez nikarim bibêjim sedî 80 û sedî 90 aştiyê pêk bê, ez nabêjim pir xirab e jî rewşeke nîvî nîvî, li holê ye. Ez ji bo 6 mehên pêşiya me wiha dibêjim; 'Ji bo çareseriya demokratîk şansê dawî ye'. Ger wisa nebe pevçûnê dest pê bike û şerekî dijwarê biqewime. Dîroknasekî navûdeng ji bo pêvajoyên wiha tespîteke di cih de dike û wiha dibêje: 'di pêvajoyên wiha de an tê bêyî kuştin an jî tê bikujî'. Ger çareserî pêk neyê pêvajoyeke bi vî rengî li benda me ye. Ne diyar e kê bê kuştin, hemû kes di talûkeyê de ye. Serokomarê wî welatî jî di devê wî de bi kêf mir. Serokomar bû lê cem wî kesek tunebû û nehat parastin. Mirina Ozal wiha pêk hatibû. Balkêş e dema ku di sala 93'yan de Ozal ji bo diyalogê navbeynkar şandibû ez pir şaş mabûm. Wê demê min ji bo Ozal gotibû 'an ev kes pir saf e, an jî ji bo me bîne lîstikê pir qurnaz e'. Lê piştî daxuyaniyên hevser û kurê wî derket holê ku Ozal mirovekî pir saf bûye. Eşref Bîtlîs jî bi heman rêbazê ji holê rakirin.

## Plana AKP'ê xeternak e

OCALAN, helwesta AKP'ê û pêşketinên li derdora wê pêk tên mîna planeke mezin a xeternak binav kir û bi van gotinan bal kişand ser xetereyê: "Em bi planeke mezin re rû bi rû ne. Planeke gelekî berfireh a bi xetere. Meseleya AKP'ê tê zanîn, li Londonê hate sererastkirin. Londonê ji AKP'ê got, 'tu pirsgirêka kurd bê çareserî bihêle, em ê ji li Rojhilata Navîn riya te vekin'. Hemû pêşketin vê rastiyê nîşan didin ku ji AKP'ê re wiha hatiye gotin; 'Tu pirsgirêka kurd bêçaserî bihêle û li ser desthilatdariyê bimîne.' Çavkaniya desthilatdariya AKP'ê bêçarehiştina pirsgirêka kurd e. Di vê noqteyê de bi îngilîzan re li hev kirin. Ev 9 sal in desthilatdar in û çareser nekirin. Dixwazin hêj 9 salên din li ser heman bingehî desthilatdariya xwe bidomînin."

## Pêvajoya 6 mehên pêş gelekî girîng in

Ocalan, têkildarî girîngiya pêvajoya pêş de jî nerînên xwe anîn ziman û destnîşan kir ku 6 mehên pêş gelekî girîng in û banga bi hestyarî tevbigerînê li her kesî kir. Ocalan têkildarî pêvajoya pêş de wiha axivî:

"Heke ev 6 mehên pêş baş werin nirxandin dikare deriyê çareseriyê veke. Heke na dê şerekî ku tu kes nikare niha texmîn bike xeternak dest pê bike. Rast e, biryara nîhayî em ê di meha hezîranê de bidin, lê li gorî pêşketinan dibe ku ez meha Adarê jî helwesta xwe zelal bikim. Heke pêşketinên erênî pêk neyên dibe ku ez li benda hezîranê nesekinim û di adarê de jî ji navberê vekişim."

Belê hevalên hêja îro 19/12-2010 a ye.

Di dîroka Tirkiyê de rojên reş gelekin. Bi rastî di dîroka Tirkiyê de rojên reş ne yek û ne jî dudune. Bi sedan rojên reş hene. Li însanan zulm û tundî hatiyê kirin. 80 salî ber çavê gelên li Tirkiyayê dijîn zûwa nebûye. Goçberî, talan, êş bûye perçek ji jîyana wan. Di van rojên reş da mîlletê herî zulm û jenosîd dîtî jî gelê Ermenî, Kildanî, Kurd, Ereb, Rum bûne, ro bi nîvro ew gelana li ber çavê dinyayê hatine qirikirin û dinya jî ji wê qirkirine re bûye temaşevan. Îro jî ew qirkirina pêk tê. 3000 gundê Kurda hatin şewitandin, bi sed hezaran di îşkencan re derbas kirin. Hê jî girtina didomê. Di jorî 2000 siyasetmederê me 2 salin di girtingehan da ne hê jê lê zêde dibine.

Di sala 2000 an da li 19 Qanûnê li dijî girtiyên sîyasî, têkoşer û welatparêz li Stanbolê operesyonên qirkirine pêk anîn, lê operesyonên wiha ye ji dorê bûn, operesyonên ne mirovatiyê hov li dijî girtiya pêk hat. Bi qireydera bi qazên kîmyasl û bi çekên giran êrîş birin ser girtiya. Gelek ji wan mirin û gelek jî bi qazê û çekên giran bîrîndar bû. Li jêr dîmenê wê hovitiyê hene. Kuçikekî li bajarê Burdurê çepelê girtiyekî kiribî devê xwe li sûkê digerand. Ew ji aliyê gelê li qahwê rûnîştî ve hat dîtin.

Lê hemûya lêvên xwe gezkirin. “Ewqas jî na nabe lo!” Lê li welatê Romê reş dibê. Fermo li wênêyên jêr binêr in .

Wêneyên 19 Kanun e 2000 an li Girtingeha Stanbolê









Îro Amediya û Sîlvaniya xwastin ku wê rûreşiyê li dijî têkoşer û welatparêzan pêk hatî şermezar bikin. Bi hezaran daketin kolan û sukan. Lê xebera wan ji kemîna dijminan li dijî wan plan kirî tune bûn ku kuçik ketine kemîne.

Lê gava ku ew xwepêşandinan pêk dihatin hevserokên KCD Ahmet Tûrk û Aysel Tugluk bi birek ronekbirên Tirk û Kurd ve li Amedê di nava civîna Komxebata Xweseriya Demokratîk dabûn, ew



civîna îro du rojin li Amedê dewam dike. Lê wan ew niqaşbûn û civîna tehmûl nekirin. Li Sîlvanê polîsa gulê berdan ser girseya gel û gelek ji wan birîndar kirin. Lê girseya gel berve qereqol bezîn, vê carê jî bomba li hember wan li ber qereqol hatin teqandin. Penc keçikên ciwan giran birîndar bûn. Yekê çenga xwe ya din çavê xwe wenda kir. Jîyana wan li wan temirand. Xwedê jî jîyana wan li wan bitemrîne.

Serokê BDP yî Sîlvanê got, *"polîsa bi zanistî gulê berdan ser gel. Tehamûla civîna Amedê nekirin".*

Lê li Amedê jî aynî plan hatibûn amedekirine, lê bi ser neketin.

Gultan Kişanak: "*Berpirsiyarê teqîna Farqînê hikûmeta AKP'ê ye. Civîna Komxebata xweseriya demokratîk tahmûl nekirin*"

Belê hevalên hêja, Kurda îro dîsa agîr bi nava Tirkiye yê xistin. Komxebata Xweseriya Demokratîk encam nama ya "Xweseriya Demokratîk"xwe ji rayegiştî re eşkerê kirin. "*Em dixwazin xwe bi xwe xwe îdarê bikin ne li Ankarê. Zimanê me rûmeta me ye, divê em çand û Kultura xwe pêşva bibin û wê jî bi riya perwerda Kurdî bikin*"




serokê Meclîsa *Tirk bi vekirî û zimanekî tûj Kurd tehdît kirin. "Mirovên ku du dû vê eşq û sevdayê dibezin, ma bizanin jî li dawiyê çiye bê serê wan. Li welatê me zimanek heye ew jî zimanê Tirkiyê, meclîsek heye zimanê wê Tirkiyê û alek heye ew jî ala Tirkiyê û ya me hemûya yê. Em ti zimanê din nasnakin û destûr nadin k udi bin bana meclîsê da bê axaftin. Yên ku li dî vê derketê dozger û dadgerê li wan dozê vekin"*

Serok Komar jî daxuyanî xwe dedibêje; “*Bila herkes çi diaxivê wê bizane. Hassasiyetê me hene*”(Foto divê ti kes li ser zaroka siyasetê neke)




Mepûsên AKP: wek xwediyê xwe peyîvîn. Kurd tehdît kirin.

Cîgirê serokwezîr: “*Divê herkes berpirsiyar be, em di pêvejoyeka hassas re derbas dibin. Duh serokwezîr û serokkmar daxuyanî dan û ew der dorên wiha hewes dikin, dengê me bibhîzin*” Foto Me gelê li nîjerya dijî hînî Tirkî kir lê ên li Colemergê dijîn hînî Tirkî nekir)

## BDP: ŞAHÎN NE MUXATABÊ ME YE



Hevserokê BPD’ê Selhedîn Demirtaş derbarê daxuyaniyên Şahîn ên derbarê nîqaşên du zimanan de got; *“Bi awayek siyasî ew serokê meclîsê ne muxatabê me ye. Li vî welatî ji xwe du ziman hene. Bi rastî jî ger Serokê Meclîsê ewqas ji rastiya welatê xwe dûr be mirov pê diêşe. Gelo şîrovekirina mijarek wiha karê serokê Meclîsê ne ye? Jixwe bi ruhê pêvajoya derbeya 12’ê Îlonê diaxive Sed sal derbas bibe jî em ji daxwazên xwe dest bernadin. Gelê me bi biryarê xwe bi xwe xwe îdarê bike.”* (Foto Hevserokê KCD Ahmet Tûrk, Emînê Ayna û hevserokê BDP Selhattîn Demîrtaş)

## Komxebata Xweseriya Demokratîk a KCD'ê

AMED - Komxebata Xweseriya Demokratîk ku ji aliyê Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) ve li Amedê pêk hat û 2 rojan berdewam kir û îro civîn bi dawî bû. Ji aliyê gel ve bi coşeka mezin hat pêşwazî kirin.



Komxebata "Xweseriya Demokratîk" a ji aliyê KCD'ê ve li Salona Mem û Zînê ya Sumerparka Amedê pêk hat. Di niqaşên 2 rojan de îro pêşnûmeya "Kurdistana Xweseriya Demokratîk" pêşkêşi beşdarên komxebatê hatin kirin. Komxebata ku li ser pêşnûmeya "Kurdistana Xweseriya Demokratîk" niqaşên 8 qadên civakê yên wekî sîyasî, hiqûqî, parastina rewa, civakî, aborî, çandî, ekolojîk û dîpolmasiyê niqaş hatin meşandin. Îro êvarî bi dawî bû.

## Modela 'Xweseriya Demokratîk' ya KCD’ê

- Kongreya Civaka Demokratîk (KCD), pêşnûmeya modela "Xweseriya Demoratîk" amade kir. Di pêşnûmayê de pêdiviya "Xweseriya Demokratîk" çiye û ji bo çareseriya pirsgirêkan rola wê çiye cih digire. Di pêşnûmayê de ev tişt hene: *"Xweseriya Demokratîk*, ji bo civaka Kurdistanê di 8 aliyên wekî siyasî, hiqûqî, parastin, aborî û civakî, çandî, ekolojîk û dîplomasiyê de xwe bi rêxistînî bike bi vînekî wisa înşaya Kurdistana “Xweser a Demokratîk bike"

KCD, pêşnûmaya "Xweseriya Demokratîk" a ji bo çareseriya pirsgirêka kurd gelek girîng dibe û navroka wê jî ji aliyê raya giştî ve tê meraqkirin amade kir. Pêşnûmaya wekî *"Kurdistana Xweser a Demokratîk"* tê pêşkêşî beşdarên komxebata KCD'ê ya li Amedê didome kirin. Di pêşnûmeyê de kurd çima xweseriya demokratîk dixwazin û di qadên wekî siyasî, aborî, civakî û çandî de pêşketinên siyasî cih digirin. Di pêşnûmayê de hate diyarkirin ku ji gelên qedim ên Mezopotamyayê yek jî gelê kurd e û her wiha li hemberî talukeya înkar û polîtîkayên qirkirinê ye û wiha hate gotin: "Ramana dewleta netew, Kurdistanê ji bo xwe wekî netewa xwe li ser belav bike dibîne. Ji ber vê yêkê jî rêbazên asîmîlasyon, înkar û îstîsmarê bigire gelek rêbazên din pêktîne. Heke berxwedana gelê kurd a li hemberî van pêkûtiyên dijmirovahî neba dê gelê kurd winda biba."

## Kurd naxwazin wek berê bijîn

Di pêşnûmayê de esasên giştî yên projeya "Xweseriya Demokratîk" hatin vegotin û wiha hate destnişankirin: "Êdî dewleta tirk nikare polîtîkayên kevin pêkbîne. Her wiha gelê kurd jî êdî nikare wekî berê bijî. Xweseriya Demokratîk projeya ku Tirkiyeyê ber bi demokratîkbûnê ve bibe û Komara Demokratîk avabike ye. Li aliyekî em dixwazin xweseriya demokratî bi dewletê re bi riya diyalogê re pêk bînin li aliyê din jî bi rêxistina demokratîk a gel vê yêk saz bikin.

Di pêşnûmayê de hate daxuyandin ku ji bo çarseriya pirsgirêkên neteweyî modela herî baş e û wiha hate gotin: "Komên di nav dewletên netew de dijîn ên cuda li ser bingeha xweseriyê êdî bi hevre dijîn. Ji ber ku êdî cudahî li ser bingeha xweseriyê tên qebulkirin û ev yek di çaxa me de

hewildana herî demokratîk e. Xweseriya Demokratîk tenê pirsgirêka kurd çaresernake bi vê yekê re dê hemû pirsgirêkên civaka Tirkiyeyê jî bi awayekî demokratîk çareser bike."

'Armanca xweseriya Demokratîk, Avakirina Kurdîstana xweser a Demokratîk'

Di pêşnûmayê de hate gotin ku ji bîlî jîyanekî azad û demokratîk tu derfetên gelê kurd nemane û wiha hate daxuyandin: *"Xweseriya Demokratîk, îfadeya êdî gelê kurd ji rewşa heyî nerehet û vê yekê qebul nake ye. Di cîhanê de ji bîlî kurdan tu gelên din ên ji 40 mîlyonan pêkté û lê hemû mafên wan tên înkarkirin tuneye. Xweseriya Demokratîk, îfadeya êdî gelê kurd polîtîkayên dewleta tirk ên înkar û îmhayê qebul nekin û bi serê xwe jiyana xwe ya azad û demokratîk pêk bînin e. Armanca Xweseriya Demokratîk, li 8 qadên siyasî, aborî, parastina rewa, hiqûqî, civakî, çandî, ekolojîk û dîplomsiyê de înşaya Kurdisana Xweser a Demokratîk bike, dike."*

'Komara Demokratîk şopa Xweseriya Demokratîk e'

'Peyman gel ê Kurd û Tirk e'

'Asa azadiya jinê, em wekî bingeha demokratîn dibînin' û yên din.

Belê hevalên hêja, zihniyeta Tirk 80 salê li dijî Kurda û li dijî hindikayên din av xwe de dijî nehatiye guherandin. Îro 32 emîn salvegera qetliyama Gimgim e/Mareş e. Gelê Gimgimê xwestin ku wê kom kujî û wê qetliyama ku li dijî wan pêk hatî 32 sala di ber vê şermezar bikin. Ew seneryo û fîlmên 32 sala di ber vê dîsa xwastin li dijî wan a pêk bînin. Lê armanc vê provakasyonê jî civîna komxebata Xweseriya demokratîk bû. Xwastin sabotê bikin.






Lê vê carê rê neda wan. (Foto li qetliyama Mereşê mirovek li dê û bavê xwe digere)

Bi hezaran MHP bi dar, kevir, kêr û xençera daketin kolana ku dîsa wek sala 1978 an bikin.

Serokê Alewîya dibêje :"Me ji bîrnekir û em ji bîr nakin jî"

Rêxistinên elewiyan, li Kolana Cahît Zorbolu hatin cem hev bi pankarta "*Dosyaya komkujiyê vekin, darbekaran bi darizînin. Em komkujiyan Gurgumê ji bîr nakin*" vekirin û sloganên "Dersên olî yên bi zorê rakin", "Bîjî biratiya gelan", "Kiryaran peyda bikin û hesabê ji bipirsin", "Li Kerbelayê Huseyîn, li Dêrsîmê Seyît Riza, li Sêwasê Pîr Sultan"

Belê hevalên hêja îro 21/12-2010 a ye.

HAWAR KURDÎSTAN AVA DIBE!




Her halde li Tirkiye yê polîtîka jî wek zivistanê îsal sar û bi serma û seqem derbas dibe derbas bibe. Li kîjan televîzyonî û kîjan rojnamê dinêrî manşeta xwe Kurdê, zimanê Kurdî, li Tirkiye yê pêvajoya du zimana.

Li herêma Dersimê ji niha da operesyon destpêkirine.

Îro ji danê sibê da polîsa avêt ser malên xwendevanên Kurdê li metreplê Tirkiyêe yê diçin Unîversîta. Bi dehan kes hatin binçav kirin û bi dehan jî hatin girtine.

-Çi kirine wan?

-Ew ciwanên KCK ye Ûnîversîtê bûne û di amedekirina ku herin tevlî PKK/KCK e bibin dabûne.

Li Batman, Edenê û Mersînê bi dehan kesên welatparêz hatin binçav kirin.

Li navçeya Elbaka Şirnexê di 15'ê Sibata 2010'an de ji bo şermezarkirina anîna Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan a Tirkiye yê çalakî pêk hatibû û dirûşmeya "Bijî Serok Apo" hatibû gotin.

Derbarê 11 kesan de bi îdîaya "propaganda rêxistinê kirine" û "*ligel ne endamê rêxistinê ne, li ser navê rêxistinê sûc kirine"* doz hatibû vekirin. Doza ku li 4'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê hatibû vekirin bi encam bû. ji bo her kesekî 5 sal û 3 meh cezayê girtîgehê, bi sûcdariya "beşdarî meş û xwepêşandana bûne" jî ji bo her kesekî 1 salek ceza û her wiha bi sûcdariya "propaganda rêxistinê kiriye" jî ji bo her kesekî 10 meh, bi tevahî der barê 11 kesan de 79 salû 7 meh cezayê girtîgehê birî.

Ew gotineka Almana heye dibêjin; "Dengê xwe bilin bike hê dor negiheştiye te!"

Îro dadigehê Amedê li serokê karsazê Amedê Galip Ensarî oglu jî bi deh meha ceza kirin.

-Suçê wan çi bûye û çi kirine li dijî dewletê? Lê ew merivê dewletê bûn!

Li Amadê der barê 9 kesan de ku di mîtînga "Ji Aştiyeke bi Rumet re Êrê" ya di 1'ê Îlona 2009'an de dirûşme hatibûn berzkirin bi hinceta "Progandaya rêxistinê kirine" doz hate vekirin. Doz der barê 9 kesên ku di nava wan de Serokê DTSO Mehmet Galîp Ensarioglu, Serokê GUNSÎADê Şahîsmaîl Bedîrhanoglu, nûnerên Tum Bel-Sen, SES, ÎHD, Odeya Tabîban û endamên komîteye amadekar hatin darizandin. Bersucên bi berdayî têne darizandin beşdarî danişînê nebûn, parezerên wan amedê bûn.




Heyeta Dadgehê piştî parastina parêzêrên bersûcan biryar da û der barê 9 kesan de ji bo her yekî 1 sal ceza xwest. Dadgehê pişt re ji bo hewildana bersûcan a dadgehê ev ceza daxist 10 meh cezayê girtîgehê.

Belê, gava ku Kurd li Tirkiye yê devê xwe vedikin tiştekî an mafekî xwe dixwazin bi ser wan erdhêj çê dibe, ceza tê barandin.

Min duh gotibû Komxebata "Xweseriya Demokratîk" agir bi nava Tirkiye yê xistiye. Ji serokê meclîsê da bigire hetanî serokê eskera hemûya daxuyaniyên tûj û hişk li dijî Kurda û zimanê Kurdî û xweseriya demokratîk da. Yanî ji dinya yê fedî nekin cunta dest bi ser îdara dewletê de digel alîkariya nijadperestên wek MHP û dedorê din e ji sibê de hetanî yasiya dizûr in.

Serokê meclîsê Mehmet Ali Şahîn hevserokê BDP Selhattin Demîrtaş bi hevalên wî ve vexwand meqamê xwe. Ku li wan şîreta bike!

Lê îro rewş bi temamî cuda bû. Ew agirê duh li orta Tirkiye yê ketî zivîrî zirzelê. Partiyên li meclîsê û eskeran belavok li dijî daxwaza Kurda belav kirin. Gazî dozger kirin "hûn li sekinine doz ê vekin" Ew bi tundî û partî girtine tehdît kirin.




Îro li seat 11:00 an hevserokê BDP Selhattîn Demîrtaş bi birek hevalên xwe ve bi serokê Meclîsê re hevdîtin pêk anî. Pêşnumaya "Xweseriya Demokratîk " pêşkeşî wî kir. Birêz Demîrtaş got;*"Birêz serokê meclîsê ne wek medya behas dike. Medya li gor berjewendiyê xwe û girêdayî partiyên xwe vê pirsê dişewrîne. Di vê civînê komxebatê da gelek ronekbirên Tirkê bin av û deng hebûn. Misteşarê MÎT e Cawat Oneş hebû. Hemûya rabûn fikr û ramanên xwe li ser vê Xweseriya Demokratîk gotin û fikr û ramanên xwe bi reyagiştî re parva kirin. Gava ku em du bêja li meclîsê dibêjin bi ser me da fermana tînin. Me bi îxanetê tawanbar dikin. Me bi girtin û cezakirine tehdît dikin. Yanî gava ku tu li derva dinêrî herkes gazî eskera dike û dibêjin di pista wan re bigirin ji meclîsê bavêjin. Va Meclîsa meclîsa me jî. Ne a wan tenê"*

*Serokê Meclîsê got, "hûn jî usluba xwe dîqat bikin gava ku hûn axivîn. Em di pêvajoyeka tarî re derbas dibin. Di meclîsê da bi Kurdî ne axivin. Zimanê Meclîsê Tirkiyê, em ti ziman û ti meclîsê din qabul nakin".*

Belê em jî dizanin zimanê meclîsê zimanê Tirkiye. Em li Tirkiye yê 20 mîlyonin. Gava ku em du bêja diaxivîn medya li dijî me û partiyên nijad perest li dijî alên nijadperestiyê vedikin. Li meclîsê

her roj wek serxoşan li dijî me diaxivîn û li me heqeretê mezin dikin. Çima hîngê dengê we dernakev? (Foto ew kursiya kursiya Kurda ye jî)

-Kî nê ew?

-Tu bi xwe jî baş dizanî ku ew kînê. We duh em qart û qurtê nasdikirin. Îro hûn dibêjin bi zimanekî bîyan axivî. Ma va ne heqeretê li 20 mîlyona.

-Pekî pekî. Me yî niha hê hevdû baş hevdû fêm kir. Bi hevalên xwe re bêje ma careka din bi Kurdî di bin bana Meclîsê da bi Kurdî ne axaivin..

-Belê min hevalên xwe tembîh kirin.

-Spas dikim.

Lê gava ku ew axavtina di navber hevserokê BDP Selhattîn Demîrtaş û serokê Meclîsê M. Alî Şahîn da dibû. Mepûsê BDP Ozdal Uçar di meclîsê da bi Kurdî axivî. “Em dixwazin bi zimanê xwe perewerde bibin”



Piştî vê axavtina Ozdal Uçar Medya û mepûsên AKP, mepûsên MHP û ên CHP li dijî me rabûn ser piya. Eger ku kêr û çetel kevçî di destê wan da hebûyana, wan jî dikarî wek birêz Ahmet Kaya bi kêr û kevçiya linç kirin, ew jî lînç bikirana.

Welatê me perçê dibe.! Em destûr nadin ku welatê me perçê bibe. Daxwazên BDP daxwazên PKK e û serokê PKK e ne.

Lê serokê MHP Dewlet Bahçelî hê jî pêşta çû got, ma ti kes sebra nîne dawiyê. Hê hevalên me Ulkûcûya dengê xwe bilin nekirin. Eger dengê me bilind bibe hîngê dizanin çiye bibe. Divê herkes ciyê lingê xwe bizane. BDP yî û hevalbendê wan dixwazine Kurdîstanekserbixwe ava bikin û di amedekariya we dane. Em li vî welatî du meclîsa û du zimana naxwazin.(Foto ciyê lingê xwe bizanin!)




“Li Amedê kom bûn Kurdîstan ava kirin” Ewqas hêsan bibûya me hetanî niha ew a ava bikira.




Lê piştî axavtina serokê Meclîs duh di aynî seatan da ser dozgerê Amedê li dijî Komxebata Xweseriya Demokratîk doz û lêpirsin dest pê kir.

Îro jî dadigeha bilind Yargitayê ji bo BDP doz vekir û lê pirsin xwasin. Ka BDP bi KCD re têkilyên xwe hene an na?(Foto dibê ku BDP bê girtin)

Birêz Selhattin Demîrtaş got; “*KCD rêxistineka demokratîk legalê aktivitetên xwe ji rayegiştî re vekirine û hûn dikarin xebat û aktivîtetên wan di înternetê da bixwînin. Lê hinek hêz dixwazine KCD wek rêxistineka îlegal nîşan bibe û nûnerê we torîst lansê bike. Bi hemû rexistinên legal re pevendiyê me hene.*!”



-Ma hûn dixwazin dewleteka ser bi xwe ava bikin?

-Na ti armance me wiha nîne. Em dixwazin wek Tirka ma hemû mafê me hebin û em xwe bi xwe xwe îdarê bikin. Ne li Ankarê. Êdî kar û barê Ankarê giran e. Hûn dibêjin em bira ne. Lê hûn li me muamala birayên sêwî dikin.

Lê gava ku ew gengaşiyan di meclîsê de dibûn. Serok komar ji rayegiştî re da zanine ku ew ê li 30/12 an herê amedê.

Belê, rojnamavanan jî îro hendik bê dengê xwe di medya da dihat. Edî bi operesyonên Kobra, operesyona Jahr û operessonên Engirak va pirsa nayê çareser kirin. Divê em polîtîka xwe biguherin.

Lê nivîsa her balkêş ya rojnamevan Mehmet Alî Birand bû. Mehmet Alî Birand di ber wê jî gelek nivîs li ser PKK e û Ocalan nivîsandibû. Rojnamevanê ewil bi birêz Ocalan re roportaj kirîbû.

*** Em li Ocalan bigerin.

*** Em dua bikin ma Ocalan nemirê. Eger Ocalan mir tîra ji kewanê derkeve.

*** Kî çi dibêje bila ma bibêje DTP/BDP yî polîtikayê dikin

*** Kurd ne Kurdê duh ne. .(Foto ma PKK e rêxistineka terorîst e?)

Nivsa xwe ya îro: 'Enqere lê dinêre, Ocalan polîtîkayê hildiberîne'




- Ali Birand di qûnciknivîsa xwe ya îro ya bi sergotara ‘AKP dişopîne, Ocalan polîtîka hildiberîne’ de diyar kir ku Rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan polîtîka hildiberîne, Enqere jî ji ber ku polîtîka hilnaberîne, ber bi tundbûnê ve diçe. (Foto Dîsa serok ew bû)

Bîrand dibêje “Pirsgirêka Kurd ber bi cihek din ve diçe” û bal kişand ku Ocalan kontrolek ku heta niha bi dest nexistiye, niha bi dest xistiye û got; “Hertim bi peyam û hilberandina polîtîkayê awa dide pêşketinan.”

"Ocalan êdî li benda Enqereyê an jî piştî hilbijartinê namîne. Pêngavên xwe bi xwe diavêje. Sûd ji kêmbûna polîtîkaya TSK'ê ya ji bo pirsgirêka Kurd werdigire. Însiyatîfê di destê xwe de digire. Terorê rawestand, çekan bêdeng kir. Li herêmê komîteyan avakir, avakirna baskên xwe, destpêkirina kanpanaya duzimanî, ber dayîna BDP'ê, taybetmendiyên vê yekê ne."

Bîrand diyar kir ku Enqere tenê bi awayek seyr pêşketinan dişopîne û got; "Tenê nerazîbûna li dijî hemû pêngavên Kurd ne bes e. Coşa ji beriya pêşîlêvekirinê û piştî wê qediya. Serokwezîr hîn bi derdorên cûda re civîn pêk tîn, lê tiştek liberçav tune ye. Bawerim, ji ber windakirina dengên hilbijartinê nerazîbûnên tun nîşan dide."

Herwiha Bîrand got; "Berê nerazîbûn nîşanî siyastê didina, di dewletê vedigeriyan, dewlet jî li wana dixist. Lê vê carê dewleta ew lê bizivirin tune ye. Pêngavên Kurdan yên ku zêde bûne (wek pêngava duzimanî) bi hêza leşker û polîsan nayê rawestandin.

Ocalan diçe pêş…

Dîmen wiha ye.

Ez dikarim bêjim kurdan textîkên girtîn qezenç kirin. Pêvajoya heta diçe guhetina destûra bingehîn a piştî hilbijartinê, ji xwe re bikar tînin. Ger AK Partî gav neavêje, polîtîka hilneberîne, van nerazîbûnên tund berdewam bike, divê wê çaxê piştî hilbijartinên pêşîlevekirina a Kurdan ku her kes matmayî bihêle derxe pêş.

Berovajiyê dibe ev pêvajoya ber bi herikîna xwînê ve biçe. Mixabin ji bo me hemûyan jî. Xirab be''



Belê hevalên hêja; Mam Celal hat Tirkiye yê. Di dûv wî jî heyeteka Suryê ji bo ku peymana terorê îmze bike hat Tirkiye ye. Mam celal ji aliya waliyê Stanbolê û nunerê wezarata derva ve hat pêşwazî kirin. Lê heyeta Suryê li derva li ber avahiya serokwezîr li ser xaliyê sor hat pêşwaî kirin. Berî ku ew bê avahiya Serokwezir wezîrên AKP li derva li ber deriyê avahiya serokwezîr dest xwe li ber xwe girêdabûn ew û Serokwezir pêşwazî kirin.

Sibê ne du sibê jî serokê dewletê Îranê bê Tirkiye ye. Mijara duyemîn hertim PKK-PJAK û Qandîlê. Berî ku ew bê Tirkiye yê. Balafirên Tirk û Îranê li ser Qandîlê nizm firîyan û çavtirsandin Kurda.

Îro 22/12-2010 a ye

Ew gotinek li ba me Kurda heye dibêjin; ”Himî dize û him jî topuze” Li Sîlvanê li 19/12 an bombe ji aliyî polîsan ve hatin teqandin û gelek kes birîndar bû. Keçika ciwana pêçiyên wê hatibû weşandin hebû. Dozgerê Sîlvanê îro biryara girtine wê da. Lê ew li Ankarê di nexweşxanê da bû. Polîsa vê sibê hatin ew ji nav nivînan rakirin birin girtingeha Sincan e. Dozger dibêje; "Wê kevir û molotof avêtiye"

Belê Tirkiyê bi polîtîka Kurda daxwaza Kurda ya Xweseriya demokratîk dikelê.

Îro Mam Celal heyeta KCD di bin serokatiya Ahmet Tûrk da li qesrê qabul kir. Lê Serokwezir ti planên



xwe bi wî re hevdîtina pêk bîne tune bûn.

Li deqîqa dawiyê hat zanin ku serokwezîr xwastiyê bi Mam Celal re Stanbolê hevdîtina pêk bîne.

Belê, duh ti kesî tenezûl nedikir ku bi wî re bi axive. Lê îro ketine dor e!

-Peki birêz Tûrk bi Mam Celal re got çi û Mam Celal ji pêşniyarî û şîret li Tûrk kir?

-Eger ku karek bikeve ser milê min, ez dikarim bibin alîkar û ji destê min çi bê ez wê dikarim bikim. Divê dostên me Tirk ve firsende ji det xwe bernedin. PKK e jî dixwaze ku aşitî bibe. Gava ku PKK e yek alî agirbest îlan kir û dest ji çeka berda, min jî got we baş kiriye. Ez bawerim Ocalan jî i wê baweriyê da ye. Divê niha dîplomasî û mineqeşê li ser Xweseriya Demokratîk bibin. Du zimanî ne xeterê. Li herêma me ew bi kar tê, gelê herêmê bi zimanê xwe perewerde zimana perwede dikin. Erebî, Tirkî, Kurdî, Soranî. Qet ti problemên me bi hev re dernakevin. Ez ne bawerim li Tirkiyê jî derkeve. Lê ez xwe tevlî karê dostên xwe nakim.

-Rojnamevan ji Aysel Tuglukê dipirsê ji bo Ocalan mesaj dan?

Tuglukê got *"Birêz Celal Talebanî selav ji bo Abdullah Öcalan şandiye, Ez ê silavên wî bigihînim wî."*

-Birêz Ahmet Tûrk Xweseriya demokratîk....?

-Belê we got ma çek bên rawestandin em ê vê pirsê niqaş bikin. Lê niha çek hatine rawestandin em jî nîqaş dikin. Ma ne wiha ye?

-Lê esker li sînorê?

-Ew ji bo operesyonên xwe dewam bikin lê wê derê ne. Duh li ser herêmê bûn û îro herêma parastina medya bombe kirin.

-Serokok komar li 30/12 diçê Amedê. Li hinek çavkaniya ew dê here serdana şaredarê Amedê jî.

-Belê em dibêjin bi xêr hatîye.

Belê hevalên hêja, operesyonê Tirkê him hawayî û him jî sîyasî dewam dikin. Îro jî li Eden sê xwendevanên Unîversîtê hatin girtine.

Hevdîtina bi birêz Ocalan re hat asteng kirin. Çima nayê zanin?



Piştî bi birêz Tûrk re hevdîtin pêk hat vê carê serokwezîr û serok komar ketin dorê ku bi Mam Celal re hevdîtinan pêk bînin. Ewil Serokwezir hevdîtin pêk anî û pişt re jî serok komar hevdîtin pêk anî. Li gor hinek çav kaniya bi dizî esker û nunerê MÎT e jî xwastine bi Mam Celal re hevdîtina pêk bînin. Lê mam Celal ew red kirine. Lî wî wêneyî binerîn ka çiqas bêdel di destê Mam Celal re digirê.

Belê mijar PKK e bû. Mijar Xweseriya Demokratîk bû. Mijar avakirina hukumata Îraqê bû. Mijar perçekirina Îraqê bû. Mijar parastina sînor û bombe baran kirina Tirk û hêzên Îraniyê ku herêmê bombe baran dikirî bû. Mijar gelek bûn Murad Karayilan Cemîl Bayik bû.

Belê hevalên hêja, duh mêvanê HPG hebûn. Rêxistina Banga Cenevreyê çû serdana HPG'ê



- Rêxistina navetewî ya li dijî mayînan, Banga Cenevre hat serdana herêmên gerîlayan û bi fermandarên HPG'ê re hevdîtin pêk anî. Rêxistina Banga Cenevreyê diyar kir ku pratîka şer a HPG'ê di çarçoveya peymanên navnetewî de ye û ji ber wê jî spasdariya xwe anî ziman.

Di hevdîtina li Herêmên Parastinê yên Medyayê di navbera Rêxistina Banga Cenevre û HPG'ê de pêk hat, Serokê Rêxistina Cenevre ji Elisabeth Decrey Warner û dîrektora bernameyê Katherain Kramer û ji HPG'ê Fermandarê Biryargeha Navendî Nûredîn Sofî, Komîteya Parastina Rewa Narîn Engîzek û ji fermandarên YJA-STAR jî Gulan Batman amade bûn. Di hevdîtinê de nêzîkaitya HPG'ê ya piştî bûyera Êlihê û têde 4 kesên sivîl jiyana xwe ji dest dabûn, neşandina şer ya ciwanên ji 18 saliyê biçûktir, paqijkirina mayîn anît-personel û bê kontrol û pêkanîna zagonên şer hatin nîqaşkirin.

Îro 23/12-2010 a ye.



Çiqas dikin qîrê qîr çiqas dikin hawar ma bikin, çiqas li dijî Xweseriya Demokratîk derdikevin bila ma derkevin. Ewledên Kurd ketinê riya welatê xwe û Kurdîstana ku ji aliyê çar dewletan ve hatî perçe kirin. Hêzên dijmin îro bi Kurdîstan bi 300 hezar esker dagir kirine û girtine. Lê ciwanên Kurd kelemên çavê dijmin qor bi qor dikşên nava refên gerîla. Ji wer mînakeka balkêş. Ji malbeteke çar dotmam û pismam Arjîn, Kemal, Dîcle û Sîdar di ayin dem aynî rojê tevlî gerîla dibin. Di aynî demê de perewerda xwe ya gerîlatiya bi dawî dikin. Bi dil û can çekên xwe digirin û diqîrîn. "Em tên" Cîwanên Kurdê dibêjin em bên tevlî refên gerîla bibin wan herçar ciwanan mînak werbigirin.

Belê Kurda bi polîtîka rêberê xwe birêz Ocalan lingê Tirkayî kiriye tengasiyeka mezin. Doh ketibûn dorê ku herin tirsa di dilê xwe de ji Mam celal re bêjin, wek salên 1993.94-95 an ji wî alîkariyê bixwazin alîkarî xwastin. Lê li dewsa alîkariyê Mam Celal ew şîret kirin. "*Divê hûn vê firsendê ji dest xwe bernedin û ji du zimanî yê netirsin*".




Lê ew gotinên Mam Celal li kêfa ti kesî nehat in. Ji ba Mam celal vê carê jî bezin cem serok dewletê Îranê û Ehmedî Nejad re hevdîtîn pêk anîn û hevdû şîret kirin.

Mam Celal me şîret dike!

Piştî wî vê carê jî bi heyeta Surîyê re hevdîtin pêk anîn û peymanê li dijî terorê îmze kirin. Di nûçeyên da nûçeyên flaş dihatin weşandin.

Li Stanbolê di navbera heyta Surî û Ehmedî Nejad de peymanên hevkariyê hatin îmze kirin. Li dijî terorê hersê dewlet bûn gogek.

Lê Kurda bi du zimanî û Xweseriya Demokratîk agir bi dilê wan xistibû. Bazara Kurda etîketên xwe bi Kurdî nivîsandibûn. Şaredar bi cilên xwe ye netew/fîstanê xwe li oda şaredariyê rûniştibûn û kar û barê xwe dikirin. Ciwanên nuh dizewicî resmî nîkaha xwe bi Kurdî dikirin û sonda xwe bi hev re wek jin û mêr bijîn bi Kurdî dikirin. Ji bo wan xeberan ji her deh deqîqa carekê nûçê ji bajarên Kurdîstanê dihat.

Serokwezîr û serok komar ji Stanbolê vegerîn bi toza lingê xwe digel esker û nunerê îstîxbaretê û ên emniyetê bi seat pirs û tengasiya ku ew tê da niqaş kirin. Eskera roja înê hişyarî dabû siyasetmederên Kurd "*em ji polîtîka we acîz in. Em di vî warî da alî ne*"




Piştî vê civînê dur û dirêja ku eskera mista xwe li masê did û nunerên îstbaretê mista xwe diguviştin. Serokwezîr serê xwe kiribû ber xwe dengên zirav jê derdiketin. Hemûya ew suçdar dikir. We Trt şeş vekir! vê pêvajoya vebûna Kurd dest pê kir! Li ti kesî daxuyanî neda çepemeniyê. Ew kara ji Kurdên wek mepşsê AKP Omer Çelîk re cîhştin. Cigirê Serokwezir Omer Çelîk derket pêşberî rayageştî wek dîkekî axivî. Nîqaşên Xweseriyê

hewldana sûîkastê ye! Em du zimanî û xweseriya demokratîk qabul nakin/napejirînin. Omer Çelîk bi eslê xwe Kurdê ji Eden.(Foto Zirveya MGK ji bo duzimanî û alê)

Wekî din çi bû.

Balafirên şer herêma parastina medya bombe baran kir. Dadigeha bilin da Amedê li serokê Şaredariya Cizîrê Aydin Budak 7,5 ceza birîn. Birrêz Aydin ve du salin ji doza KCK di girtingehê dayê.

Suçê Aydin Budak çi bûye?



Be, bi îdiaya di çalakiya BDP'ê ya li Qesrikê "Ligel ne endamê rêxistinê ye, li ser navê rêxistinê sûc kiriye" û "Propaganda rêxistina terorîst kiriye" doz hatibû vekirin. Doza li 5'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê hate dîtin bi encam bû. Di sala 2008 an da birek ronekbir û siyaset mederê Kurd xwastibûn ku herin Qesrikê herêma şer ku şer bidin rawestandin.

Li Edenê gelek xwendevan hatin binçav kirin û gelek jî hatin girtine û wan bi nuneritiya KCK tewanbar dikine. Gava ku li Edenê xwendevan dihatin binçava li Geverê jî polîs berbanga sibê da xwe avête ser 7 malan gelek kes girt binçava.




Ji bo mepûsê DEP e yî kevn Mahmut Alinak 14 meh cezayê girtîgehê hatin birîn. Kek Mahmut va ne cara yek em ê tê ceza kirin. Ew her roj li ber deriyê dadigeha ye.

Li wî hetanî niha gelek cara ceza hatin birîn. Ew hê wan rojan ji girtingehê derketibû.

Par gundiyek ji Dîgorê bi navê Tehsîn Osman li rastî îşkenceya polîsan hatibû. Parlementerê berê yê DEP'ê derbarê vê yekê de gotibû; "Îşkence karekî heywana ye" ji ber wê doz lê hatibû vekirin.

Belê hevalên hêja îro 26/12-2010 a ye.

Ji dawiya ser sala me re 4-5 roj me ne. Serokwezîr u sê hefta di ber vê çûbû gelek bajarên Kurdîstanê wek Muş, Bîngol û Rihayê li wan derna gelek derew ji gel re kirin hat. Li rojên pêş me jî serok Komarî bi rêya wî de here Amedê dîsa wek berê bêje "tiştên baş bibine" Sal û salnîvekê di ber vê gotibû tiştê baş bibine, lê bi ser Kurda da afet hat barandin. Bi hezaran girtin û bi hezarn di qereqola da tî û birçî man û bi hezaran bombe bi ser da rijandin.

Îro çend rojin li Tirkiye yê niqaşa "xweseriya Demokratîk pêvajoya du zimanî tê kirin. Di serî da partiya MHP li dijî vê derket û eskera qîyamet derxistin, belovok li ser belavoka belav kirin. Serokê meclîsê bi girtina partiya BDP ew tehdît/çavsor kirin. Di dest wan re bihata hevserokên KCD Ahmet Tûrk û Aysel Tugluk û endamên meclîsa KCD bi dardabikin. Wezîrê hundir Beşîr Atalay got; "*Em ji meclîsa me bêtîr ti meclîsên din qabul nakin. Alyek ziman yek e û millet yeke*"

Lê vê navberberê serok dewletê Iraqê ku Tirka jê heznedikirî û wek dijminê xwe dizanî hat Tirkiye yê. Ji eskeran da bigire hetanî serok koma hemû ketin dorê bi wî re hevdîtinan pêk bînin.

Birêz Mam Celal ew ewil şîret kirin û pişt re paşva gav avêt. "*Divê hûn ji du zimaniyê netirsin. Em jî li Îraqê du zimaniyê bi kar tînin. Vê firsende bêçalekî heba nekin*"

Lê serokwezîr xwe gihand wî got- "Aman Mam Celal em di pêvajoya hilbijartinan da ne. Gotinên ku te ji rayegiştî re kirî wan nerm bike."

Lê Mam Celal jî wekî wî xwastî kir; "*Du zimanî ji Tirkiyê re hê zû ye, divê demeka din bê îlan kirin" Yanî dibêje piştî hilbijartinan*.




Lê hevserokê BDP birêz Selhattîn Demîrtaş bersiv da mam Celal. "*Divê em ji gelê xwe lêborîna xwe dixwazin ku meç ima 30 salî di ber vê dest bi pêvajoya du zimanî nekiriye. Em ji daxwaza xwe derbas nabin. Em nikarin bi vî gelî re bêjin, dest ji zimanê xw berdin!*"

Li piştî demeka dirêj ji Serokwezîr deng derneketi bû ji bo wan niqaşan, lê îro dengê qalind bi wî ket. Fermo em guh bidin wî derewine ku li bajarê Kurdîstanê kirî û li li meclîsê gote çi?(Foto zimanê vî welatî Tirkiy.. Hun serê me jêkin jî bile.....)

Miletê Erdogan bi Tirkî xeber dide!

Beriya hilbijartinê Kurd û BDP wekî bermayiyên terorê, dek û dolapkar, kemînkar û bi kirina




provakasyonê tawanbar kir. Erdogan wisa got, " Zimanê miletê min yek e, ew jîTirkî ye."

Erdogan got, "*Wekî her carê, beriya hilbijartinê alîgir û piştmêrên terorê dîsa taşeroniyê dikin, em ê hewldana wan a dîzyankirina polîtîkaya navxweyê bêbersiv nehêlin*." Erdogan got, " ew ê tawîza derbarê yek ziman, yek netew û tek dewletê nedin tu kesî." " *Em destûr nadin ku li ser axa me amelîyat bibe*" (foto zimanê wî mîlletî yeke, ew jî Tirkiyê)




Serokê CHP: "*Zimanê me Tirkiyê, em ti zimanê din nadin kêleka zimanê xwe. Zimanê duyem welêt prçe bike*".Kongra CHP li heftê pêk hat bêja Kurdî bi devê serokê CHP neket. Lê ew pirsa Rojhilat çareser bike. Kemal bi eslê xwe Kurd e.

## Wekî din çi bû?

Bi dehan xwendevanên Kurdê li Universitê dixwînin ji aliya rêvebiriya ûnivresîtê wekî kurtçû hatin nîşan dane ji Universîta hatin avêtin. Duh li Erzoromê sê xwendevanê hatin kêr kirin.

29/12-2010 a ye.

Li herêma mêrdîn Dargeçîtê duh şerekî giran pêk hat. Li gor nûçeyan du gerîla şehîd ketine. Îro jî balafirên şer derbasî aliyê Kurdîstana başûr bûn. Zatên wê bombe baran kirine her roj pêk tînin.

Li şer digerin û dixwazin gerîla bikşînin nava şer. Karayilan got, “em li ser soza xwe ne”.



Desteya Ewlekariya Neteweyî (MGK) 26 sal in bi rojeva tevgera Kurd PKK, ARGK, HPG, PJAK, PÇDK kom dibe, kom bûna xwe ya îro jî bi mijarê ‘Xweseriya Demokratîk’ û duzimanî yê kom bûn û piştî 5 seat nîva ji rayegiştî ya ragihandin.

Lê di berî kom bûnê roja înê esker tûj axivî gotin; “*Yek mîllet, yek al, yek dewlet û yek ziman Ew ên ku du zimanî yê dixwazin nîyetên wan xirab in. Em alî ne*”

Civîn li seat 13:00 dest pêkir li seat 18:30 bi dawî bû. Ji Kurda re tehdît û çavsorî derket. Bi girtî li dijî Kurda banaga lincê hat kirin, banga şer derket, banga girtina partiya BDP derket.

Helwesta eskera wek ya duh bû. *“ Yek al, yek milet, yek welat, yek dewlet’ wê were parastin û mijara ku zimanê Komara Tirkiye yê Tirkî ye wê neyê nîqaşkirin, û tu hewldanên din neyên qebûlkirin*”. (Foto piştî civîna 5,5 *Yek al, yek milet, yek welat, yek dewlet* )




Sînyala opereseyonên nuh yên sîyasî û eskerî hat dayin. Dibe ku rojên pêş me gelek kes bê girtin. Duh li meclîsê serokwezîr jî gotibû; *“ Yek al, yek milet, yek welat, yek dewlet’Em destûr nadin li welatê me li ser axa me Amelîyat pêk bê. Em ê li dijî wan hetanî dawiyê têbikoşin. Zimanê me Tirkiyê. Yên ku xwastî zimanê xwe hîn bibin bila hîn bibin ti kes ji wan re nab asteng” Ew ên ku vê dixwazin propagandakirina rêxistinê terorîsta dikin*”

Belê hevalên hêja; Ew jî bi me dide xuya kirin ku esker bi AKP ve li hev hatine. Desta danê ser vebûna AKP ji bo Kurda.

Du sê roja di ber vê cîgirê serokwezîr Omer Çelîk gotibû. “Xweseriya demokratîk û du zimanî li dijî me suikast e. Xwedê BDP li ya îslah bik.

Belê ew çi dikin bil ama bikin, Kurda rîya xwe dayê ber xwe di jîyana duzimanî de bi îsrar in.



Piştî Amed, Cizîrê Sîlopî, Colemergê, Geverê îro Wan ê jî lewheyên xwe bi zimanê Tirkî daxistin li şuna wan lewheyên bi Tirkî û Kurdî zelîqandin. Qertên ser salê bi zimanê Tirkî û Kurdî hatin nivîsandin û ji gelek mepûsên AKP, serok Komar û serokwezîr re şandin. Sala borî serokê Şaredariya Amedê Osman baydemîr ew qertên bi du zimana şandin li ser wî doz hat vekirin. Şaredarê Surê Abdullah Demîrtaş qert şandin û lewhê guherîn ew ji kar avêtin û pişt re jî ew ji doza KCK bi meha girtin. Ji ber nexweşiya wî ew berdan.(Foto Şaredarê Wanê Bekir Kaya)

Belê hevalên hêja tirseka xwe di ser Tirkiyê re girtiyê. Kurd çi dixwazin dibêjin welatê me parçê bibe. Du zimanî dixwazî dibêjin bibe sebeba perçe bûna welêt. Em destûr nadin. Kurd mafê xwe

yî demokratîk dixwazin û dixwazin xwe bi zimanê xwe îfade bikin, tên Kurda digirin davêjin girtingehê. Di jorî 2000 hevalên me ji bi wê du salin di girtingehê da ne. Hemû partî AKP, CHP û MHP, li aliyê din îstîxbarat û Emniyet li hember BDP'ê/Kurda bûne yek. Îro ew yek bûna li civîna MGK jî nîşan dan. "*Yek al, yek dewlet, yek mîllet û yek ziman*".

Sibê serok komar diçê Amedê. Du sala di ber vê jî çû bû gotibû tiştên baş pêk bên. Navê Gûrpinarê yî kevn Norşîn bi ser zimanê xwe xist çû. Lê piştî wê axavtine gelek tişt û bûyarê nexweş pêk hatin.

Îro rayegeştiya Tirkiye ye û Kurda xwe dîsa dayê benda serok koma ku rewşê nerm bike. Em sîbê bibînin û bibhîzîn ka serok komarî çi bêje.

## Demîrtaş: Encama ji MGK'ê derket nêrîna hikûmetê ye




- Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş di kongreya Rêxistina BDP'ê ya Amedê diyar kir ku gotinên di civîna MGK'ê de têkildarî Xweseriya Demokratîk hatin gotin helwesta hikûmetê aşkere dike. Demîrtaş, anî ziman ku kurd dê di daxwazên xwe yên demokratîk de israr bikin. (Foto Selhatin Demîrtaş; Serê me ji bedana me veqetê jî em ê li ser pîya wek şera bimînin)

Lê Konseya Amedê meşeka ji deh hezar welatparêz pêk tê pêk anî û 10 xalên çaseriyê ji wî re amede kirine ku pêşkêş serok komar bikin.

Di meşê de pankartên wek '*Em afirînerê Xweserîya Demokratîk silav dikin' 'Daxwaziya me Tirkiye yeke demokratîk, Kurdistanek xweser e. Ya we?' û 'Ne înkar û asîmilasyon, ne jî tunekirin, çareseriya xweseriya demokratîk*' Her wiha di meşê alên PKK'ê û Konfederalîzma Demokratîk û posterên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hatin vekirin. Girseyê bi bê navber dirûşmeyên 'Bijî serok Apo', 'PKK gel e, gel li vir e' berz kir.

"1- Meclîsa Neteweyî ya Mezin a Tirkiye yê (TBMM) biryara aşitiyê bigire û di vê mijarî de amadekariyên pêwîst bike.

2- Di bin banê Parlementoyê de Komîsyona Lêkolînê ya Heqîqatê bê avakirin, hemû bûyerên tarî yên di 30 salên dawî de li bajêr, herêm û Tirkiyeyê pêk hatine, bên ronîkirin.

3- Ji bo Rêberê Gelê Kurd Birêz Abdullah Ocalan karibe tevlî pêvajoya aştî û diyalogê bibe, rola jê tê xwestin karibe bilîze, ji bo karibe bi rayedarên dewletê, PKK, rêxistinên civakî yên sivîl, rayedarên partiyên siyasî re danûstandina fikirî bike, şert û mercên pêwîst bê sererastkirin.

4- Ji bo agirbest wergere çareseriyek mayînde û pêvajoya diyalogê, operasyonên siyasî û leşkerî û siyasî bên rawestandin.

5- Ji bo hemû girtiyên siyasî serbest bên berdan sererastkirinek zagonî bê kirin.

6- Di Makezagona ku dê bê sererastkirin de, ji bo Kurdan statuya Xweseriya Demokratîk bê qebûlkirin û bila Xweseriya Demokratîk bibe xwedî statuyek Makezagonê.

Ji bo bajarê me:

1- Hemû pêşketinên erênî an jî neyînî ku di dîrokê de dijîn, di mejiyê hevpar ê civakê de ye, di honandina paşerojê de xwedî rolek girîng e. Ji ber vê yekî piştî darbeya Leşkerî ya 12 Îlonê ji bo bûyerên hovane yê di Koxuşa 5'ê ya Girtîgeha Amedê de dubare nebin, divê ev girtîgeh wek 'Muzeya Şermê' bê rastkirin.

2- Bi sedhezar Amedî yên ku di encama pêkûtî û bi zorê ji gundên xwe derketin, ji ber nikaribûne li gor çand, aborî û civakî ya bajêr bijîn, birînek di civakê de vebûye. Ji ber vê yekî divê amadekardiyên hemû gundên hatine şewitandin û wêrankirin cardin bê avakirin, erdên ku ji hêla leşer û cerdevanan ve hatiye talan kirin, bidin xwedanê wan erdan.

3- Navê Amed, navçe, gund û taxên wê ku pişt re hatine guherandin, navên resen ên Kurdî an jî navên ku bi zimanên din in, bi fermî careke din lê bên vegerandin.

4- Hin navên parq, kolan û kuçeyên ku ji hêla Meclîsa Giştî ya Bajarê Amedê ve hatibû dayîn û ji aliyê Parêzgariyê ve hatibû vetokirin. Bila ev nav bên qebul kirin."




Belê hevalên hêja; li çarşema borî hevdîtina bi birêz Ocalan re pêk nehat. Gotin rewşa hewayê astengê. Roja pencşemiyê parêzera serî li rêvebirya Bursê dan got, rewşa hewayê didome. Roja înê serî lê dan gotin Keştî xirab e. Îro dîsa serî li rêvebiriya Bursayê dan. Keştî hê çê nebûye. Asteng kirin.

Belê Tirk esker li hikumatê qahrine û li wan hers tên. "*We vebûna Kurd pêşkêşî rayegeştî kir we hundirê wê tijî nekir. Li şuna we serokê terorîsta Ocalan tijî dike. Rojeva me serokê terorîsta tayîn dike. Serokê terorîsta li dijî web i serketiye*."

'Nexşeya Rê ya ku nedan parêzerên birêz Ocalan li DMME'yê ye.

Wezareta Dadê ya Tirk li ber daxwazê, neçar ma ku 'Nexşeya Rê' ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji DMME'yê bişîne. Ji parêzerên Ocalan Îrfan Dundar diyar kir ku ger DMME 'Nexşeya Rê' ya Ocalan têxe nava parêznameya wî, ew neçar in ku wê bidin DMME.



Birêz Ocalan di meha Tebaxa borî 2009 an de ê 'Nexşeya Rê' ya ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd amade kiribû. Lê bi hinceta 'Ne li gor berjewendiyên dewletê ye, propagandaya rêxistinê ye' Desteya Disiplînê ya Girtîgehê dest anî bû ser. Parêzeran îtîraz kir ku ew 'Nexşeya Rê' ya ji 156 rûpelan pêk tê, bê dayîn. Lê dema nedan, Ocalan wê li ser parêznameya ji 550 rûpelan ku wê didaya DMME'yê zêde kir.

Ji parêzerên Buroya Hiqûqê Perêzer Îrfan Dundar bersiv da pirsên ANF'ê yên derbarê vê mijarê de û vê yekê piştrast kir.

Îro 30/12-2010 a ye.

Belê di nav gel de gotinek heye dibêjin hatine pençşemiyê di çarşemiyê re xuya ye.




Duh 5,5 nîva li hev rûniştin di destê hev di destê da sond xwarin. Goti; "Yek mîllet, yek ziman, yek al û yek welat" Ti kes dernakeve dervayî van gotinên me. Piştî vê civînê dirêja tijî tehdîtên mezin serokwezîr diyar kir ku ew dê di demeka nêzîk de here Îraq û serok komar jî here Diyarbekir/Amedê. Lê çûyina Gûla Amedê deh rojin ji aliyê medya ve tê niqaş kirin. Herkesî digot, Gûl herê Amedê mesjên sîyasî bide û rewşa herême gergîn nerm bike. Bi Kurdî bêje; " Amed mala me" Lê berî ku serok komar here Amedê ji Amedê gelek avahiyên sivîl di nava hev da civîn pêk anîn û hineka jî berdevkiya hikumatê û berdevkiya serok komar Gûl dikirin. Gûl here Amedê bi serokê şaredariya Amedê re hevdîtinan pêk bîne û bi Kurdî gel silav bike. Em ê wî germ pêşwazî bikin. Li ser sera hatiye li ser çava hatiye.

Belê rast e Amedîya ew germ pêşwazî kirin.

Lê wî kevirên di pêşa xwe de velo nekirin. Ji ber ku du sala di ber ve gotibû "*Li benda me bin tiştên baş e bibin"* Lê piştî wê axvtine gelek tiştê xirab bûn. Serok komar ji aliya medya û raygeştî ve jî gelek hat rexne kirin. Lê vê carê d axavtina xwe de bi dîqat bû.

Gotinên li civîna MGK ne bi zimanekî tûj bi zimanekî nerm ew dubare kirin. Bi piranî ji kar û bar da bahs kir. "*Zimanê me Tirkiyê û kesên di xwaze zimanê xwe bi axivin jî dikarin bi axivin. Ez gazî dayika dikim bi zarokên xwe re bêjin her dera Tirkiye yê welatê me ye. Ew jî rewşa welatî me ya sosyolojîk e. Kurdî û zimanên din*".

Bi Şaredarê Amedê re hevdîtin pêk anî ew hevdîtina 45 deqa ajot.



Li gor medya ew mijar û pirsa Kurd li paş deriyên girtî hatiye niqaş kirin.

Hevserokê Demîrtaş wiha şîrove kir. "*Encama ji MGK'ê derket nêrîna hikûmetê ye" Gûl hat gotinên duh li Amedê dubare kirin". MGK hewldanên me ji bo şer rawesatndine "terorîst û faliyetekî terorîst dinirxîne*." "provoke" bikin û bikşînin aliyekî din. Foto Du hevserokên mîlletê Kurd Selhattîn Demîrtaş û Ahmet Tûrk)

"Pêşdarazî û bêtehamulî dibe sedema fikaran"



Şaredarê Bajarê Mezin yê Amedê Osman Baydemîr got: "Lazime biryara bêçalakitiyê baş bê nirxandin. Divê ji bo bêçalaktî berdewam bike dewlet gav biavêje. Pêngavê der barê mijarên perwerdehiya bi kurdî û xweseriya demokratîk de gav bên avêtin. Ev gav wê bingeha aştiyê xurt bike."

Şaredarê Bajarê Mezin yê Amedê Osman Baydemîr ku bi Serokomar Gul re ji çapemeniyê re girtî hevdîtin pêkanî, der barê xebatên şaredarî û pêvajoya siyasî de hin nirxandin kirin. Baydemîr, bi gotina "*Hûn bi xêr hatin bajarê qedîm Amedê yê Mezopotamyaya xwedî dîroka 10 hezar salan*"

'Ji bo ku bêçalaktî bibe mayînde lazime gav bên avêtin'

"Êdî baş hatiye dîtin ku lazime ev pirsgirêk bê çareserkirin. Her wiha hate dîtin ku bi tedbîrên ewlehiyê ev pirsgirêk nayê çareserkirin. Pirsgirêka kurd, pirsgirêka makeqanûn û ya demokrasiyê ye. Çareseriya wê jî wê bi mekeqanûn, rêbazên zêdetirê xurtkirina rêveberiyên heremî bê pêkanîn. Hikûmet dikare bi Serokomar re bi avayekî hevpar ji bo çareseriyê zagonan derxe. "Lazime biryara bêçalakitiyê baş bê nirxandin. Divê ji bo bêçalaktî berdewam bike dewlet gav biavêje. Pêngavê der barê mijarên perwerdehiya bi kurdî û xweseriya demokratîk de bên avêtin ji bo çarseriyê wê gelek baş bin. Ev gav wê bingeha aştiyê xurt bike."

'Daxwaza raya giştî berdana siyasetmedarên kurd e'

*"Pêwîste ku ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd gavên erênî bên avêtin û hin jestên pêşçav bên nîşandan. Em bi xemgîni bilêv dikim ku heta niha bêçalaktî baş nehatiye nirxandin. Hêj zêdetirê 1800 siyasetmedarên kurd girtîne. Operasyonên siyasî û leşkerî didomin. Daxwaza raya giştî berdana siyasetmedarên kurd e." Baydemîr, der birî ku bêtehamuliya li hemberî kurdî û xweseriyê dibe sedema fikaran wiha domand: "Lazime em ji bîr nekin ku ancax dikarin bi muzakeriyan li hev bên. Aştî wê ancax wiha pêk bê. Mafê tu kesî tuneye çareseriya pirsgirêka kurd qurbanê hesabên hilbijartinê bike."*

Belê alaniya civîna MGK duh di medya Alman da jî ciyekî giran girt.

Die Presse: "Erdogan û Artêşa Tirk li dijî Kurdî koalîsyon Pêk anîn"




- Li Tirkiyeyê di demên dawîn de nîqaşên duzimaniyê gelekî bal kişand. Rojameya Awusturyayê Die Pres nivîsî; "Nîqaşa zimên tesîra erdhêjê çêkir." Rojnameyê anî zimên ku Erdogan li Elmanya û îngilistanê bi israr doza perwerdehiya bi Tirkî dikir, lê bi Artêşa Kemalîst re li dijî Kurdî koalîsyon pêk anî. "Yek al, yek ziman, yek mîllet û yek dewlet" "Li dijî Kurdî îtifaqa Erdogan a bi Artêşê re"

TAZ: "Ocalan fature li Erdogan birî "




- Rojnameya Die Tageszeitung (TAZ) ku li Elmanyayê weşana xwe dike ji bo *Xweseriya Demokratîk* ku di demên dawîn de li Tirkiyeyê di rojevê de ye û gelekî tê nîqaşkirin wekî şîrove weşandiyê di rûpelên xwe de. "*Projeya Xweseriya Demokratîk Tirkiye xistiye şoqê!*" *Ocalan bi vê modelê fature li Erdogan birî*.

Di nûçeya bi îmzeya Jürgen Gottschlich de tê gotin ku "*Yekîtiyeke ku rêxistin û organîzasyonên Kurdan digihîne hev, zimanê xwe, rêveberiya xwe, al, sirûd û serxwebûna xwe dixwaze*." *"Êv modela ku Kurd didin nasîn di berdêla agirbestê de Ocalan li Erdogan biriye"*

Belê hevalên hêja; gava ku serok komar Abdullah Gûl li Amedê bû. Dadigeha Amedê jî bi ser Kurda da ceza barand.




1-Ji bo Aysel Tugluk 10 meh ceza Bi hinceta "Pesnê tawan daye" û "Propagandaya rêxistinê kiriye" 10 meh cezayê girtîgehê li Hevseroka KCD'ê Aysel Tugluk hat birîn.

2-138 sal ceza li Midûra Rojnama Azadiya Welat hat birîn

Danişîna doza Midûr û Xwediya Îmtîyazê ya Rojnameya Azadiya Welat Emîne Demîr, li 5'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê hate dîtin. Dîwana dadgehê bi îdîaya "propaganda rêxistinê kiriye" 138 sal cezayê girtîgehê li Demîr birî.

3-Ji bo şaredarê Sêrtê Sadak 10 meh ceza

Bi hinceta 'propagandaya rêxistinê kiriye", 10 meh cezayê girtîgehê li şaredarê Sêrtê Selîm Sadak hat birîn.

4-Bi Kurdî gel silav kir, 6 meh cezayê girtîgehê xwar

" Alîkarê Serokê BDP'ê Tuncer Bakirhan û Rêveberê Rêxistina BDP'ê ya Konyayê Bahattîn Yildiz ji ber ku di Newroza Konyayê de bi kurdî axivîne rastî 6 meh cezayên girtîgehê hatin.

6-BDP li ê xwendevanên Kurdê ku hatî girtin û binçav kirî jî bi deha bû. Ne tenê li Tirkiye yê tên binçav kirin. Li Îran bajarê Serdeşt ê jî ji malbata girtiyê bi nafê Lûtfullah ku li benda dardakirine jî ji malbata wan 9 kes hatin girtin û rojekê di ber jî 21 kes hatin binçav kirin.

Belê ji serê salê re du roj ma ne. HPG bilançoya şera salê diyar kir.

Bîlançoya HGP'ê ya sala 2010: 376 mirov mirin




- Biryargeha Navendî ya HGP'ê 'bîlançoya şer' sala 2010 ragihand. Li gor bîlançoyê artêşa Tirk 195 operasyon pêk anî. Di şerên ku çêbûn de, 283 lerşkerên mirin û 93 gêrîlayên HPG'ê jiyana xwe ji dest dan.

Li gor daxuyaniya Biryargeha Navendî ya HPG'ê, herçendî KCK'ê biyara bêçalaktî di sala 2010 de, operasyonên artêşa Tirk berdewam kirin. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin; "*Gêrîlayên me ji bo biryara bêçalatikiyê pêk bînin, sebirek mezin nîşan da û ji bo nekevin nava şer û pevçûna hemû derfetên xwe seferber kirine*".

JI BILÎ BERSIVDANÊ ÇALAKÎ PÊK NEHATIN

Li gor daxuyaniyê, artêşa Tirk di navbera 1'ê Çile û 31'ê Gulana 2010 de 52 operasyon li dijî gêrîlayên HPG'ê li darxistin. Di navbera van dîrokan de 6 êrişên hewayî û 158 êrişên obus û hewanan pêk hatin. Biryargeha Navendî ya HPG'ê diyar kir ku 19 gêrîlayan jiyana xwe ji dest dan û 100 endamên artêşa Tirk mirin.

Di daxuyaniyê de 1'ê Hezîran 2010 û 13' Tebaxê 2010 wek "pêvajoya nîv şer" hat binavkirin û hat diyarkirin ku di çarçoveya Hemleya Stratekîk a Qûnaxa 4. Çalakiyên gêrîlayan yên di vê demê de Tirkiyeyê hejandin. kadarki sürecin 'orta yoğunluklu savaş dönemini' olarak adlandırıldığı açıklamada, "1 Hazi

Li gor daxuyaniyê di van pêvajoyan de 58 operasyon pêk hatin, 42 gêrîlayên HPG'ê jiyana xwe ji dest dan û 152 leşkerên Tirk mirin.

## DI DEMA BÊÇALAKTIYÊ DE OPERASYON ZÊDE BÛ

Di daxuyaniya HPG'ê de hat gotin ku herçendî KCK'ê di 13'ê tebaxê de biryara bêçalaktiyê da, lê operasyonên artêşa Tirk zêde bûn. Li gor daxuyaniyê ji 14 Tebaxê heta 28'ê cotmehê artêşa Tirk 85 operasyon li dar xist, 7 êrişên hewayî pêk hatin. Di navbera van dîrokan de 32 gêrîla jiyana xwe ji dest dan û 32 leşkerên Tirk hatin kuştin.

## AGAHIYÊ BERFIREH

Bîlançoya salekê ya di daxuyaniya HPG'ê de wiha ye:

* 1 Çile-31 Gulan-Operasyon: 52

Êşira Hewayî: 6-Hewan û Obûs: 158-Temas: 33-Çalakî: 6-Polîs û leşkerên hatin kuştin: 100-Amûrên leşkerî yên HGP'ê dest danî ser: -Çeka M-27: 1 -Çeka Tam otomatîk BKC: 1 -Çeka Ferdî HK- 33: 1 -Çeka Ferdî G-3: 8 -dûrbîna şevê: 1 -Guleyên BKC: 160 -Zincîrên tije yên BKC: 1 -şarjorên G-3: 5 -Bêtêlên destan: 2

Çente: 2-Gêrîlayên jiyana xwe ji dest dane: 19-* 1 Hezîran'dan 13 Tebax'a kadar-Operasyon: 58-Êşira Hewayî: 4-Hewan û Obûs: 79-Temas: 21-Çalakî: 86-Polîs û leşkerên hatine kuştin: 152-Skorski derbe xwarin: 4 -wesayîtên hatin tunekirin: 2-Tankên hatin tunekirin: 2-Wesayîtên darbe xwarin: 13-Şewatên Leşkerên Tirk vêxistine: Yangını: 18

Amûrên Leşkerê yên ketin destê HPG'ê: -Çeka ferdî HK- 33: 12 -G-3 Çeka Ferdî: 3 -Dûrbîna şevê: 1 -Termal Kamera: 4 -bêtêla wesayîtan: 1 -Lazer: 1 -Gêrîlayên jiyana xwe ji dest dane: 42-* 14 Tebax Piştî biryara bêçalakitiyê.-Operasyon: 85-Êşira Hewayî: 7-Hewan û Obûs: 138-Şewatên di emcama Hewan û Obûs de derketin: 17-Temas: 18 -Çalakiyên bersivdanê: 16 -Polîs û leşkerên hatine kuştin: 31 (1 jê çawîşê pispor)-Bombebarana bi kobrayan:: 13-Wesayîtên hatin tunekirin: 3

Şewatên daristanan ên ji aliyê leşkeran ve hatin vêxistin.: 10-Amûrên leşkerî yên HGP'ê dest danîn ser: -HK-33 Çeka Ferdî: 1 -Demance: 1 -Flash Bellek: 1 -Çanta: 1 -Termal Kamera: 1

Gêrîlayên jiyana xwe ji dest dane: 32-Gêrîlayê HPG'ê yê ji aliyê leşkerê Tirk ve hatin gitin: 1-Sivîlên di encama êrişa polis û leşkeran de mirin; 1

## BÎLANÇOYA TOPBARANA SALA 2010

Operasyon: 195-Êşira Hewayî: 17-êrişa Hewan û Obûs : 375-Temas: 72-Çalakî: 108-Wesayîtên hatin tunekirin: 32-Tankên hatin tunekirin: 2-Skorskiyên derbe xwarin: 4 -Wesayîtên darbe xwarin: 13-Şewatên ji aliyê TSK'ê ve hatin vêxistin: 28-şewatên di encama Hewan û Obûs de: 17-Sivîlên ji aliyê polis û leşkeran ve hatin kuştin: 1-Polîs û leşkerên hatin kuştin: 283-Amûrên leşkerî yên ketine destê HPG'ê: -Çeka M-27: 1

Çeka tam otomatîk BKC: 1 -HK- 33 Çeka Ferdî: 14 -G-3 Çeka Ferdî: 11 -Dûrbîna şevê: 2 -Guleyên BKC: 160 -Zincîra BKC: 1 -Şarjorên G-3: 5 -bêtêlên Destan: 2 -Çente: 3-Termal Kamera: 5 -Bêtêlên wesayîtan: 1

Lazer: 1 -Demance: 1 -Flash memory: 1 -Gêrîlayên jiyana xwe ji dest dane: 93-Gêrîlayên ji aliyê leşkerên Tirk ve hatine girtin: 1

Ser sala we pîroz be sala 2011 an bibe sala aşitî û demokrasiyê.